



**ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YIL
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

TEZA LÎSANSÂ BILIND

**HEVOKA RÊZIMANÎ Û NERÊZIMANÎ
DI DEVOKA DEVERA BEHDÎNAN DE**

**AMADEKAR
Mahdi Saleh MIHO**

WAN-2019

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

**BEHDİNAN YÖRESİ AĞZINDA KURALLI VE
KURALSIZ CÜMLE**

HAZIRLAYAN
Mahdi Saleh MIHO

DANIŞMAN
Prof.Dr.Mehmet Zeydîn YILDIZ

VAN-2019



T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Prof. Dr. Mehmet Zeydin YILDIZ danışmanlığında, Mahdi Saleh Miho MIHO tarafından hazırlanan “**Hevoka Rêzimanî û Nerêzimanî Di Devoka Devera Behdînan De**” adlı bu çalışma, 29/03/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Prof. Dr. Mehmet Zeydin YILDIZ

İmza:

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

İmza:

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Ayhan TEK

İmza:

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylım.

Prof. Dr. Mirat DEMİREL
Enstitü Müdürü



KURTE
MAHDI SALEH MIHO
HEVOKA RÊZIMANÎ Û NERÊZIMANÎ
DI DEVOKA DEVERA BEHDÎNAN DE
TEZA LÎSANS A BÎLÎND
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YIL
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Şêwirmend : MEHMET ZEYDIN YILDIZ

2019, Wan. IX + 207 r.

Armanca me ya sereke ji vê xebatê ewe ku, bi navê "Hevoka Rêzimanî û Nerêzimanî Di Devoka Devera Behdînan De" hate dîyarkirin. Emê di vê xebatê de li ser hevoka rêzimanî û nerêzimanî bi awayekî hûrgulî bisekinin. Di lêkolînê de behis li çawanîya bikaranîna hevokên dirust hatîye kirin. Tekilîyên rêzimanî li cem axaftinkerên resen yên vê devokê çebûye. Her wisa di nava lêkolînê de bi dirêjî wan yasa û destûr didin dîyarkirin ku dibine sedemê dirustkirina hevoka rêzimanî. Ev çend jî li gor yasayên teorîya berhevanî û veguhastinê "Generative and Transformational" ya Chomsky hatîye encam dayîn. Chomsky yekem zimannas e ev babete dinava rêzimana Îngilîzî de bi taybetî di pirtûka xwe ya bi navê "Pêkhatên Sentaksî (Sintactic Structures)" a ku 1957an de belav bûyê behis kirî ye. Belê wî bi tenê bal kişandîye li serçawanîya dirustkirina hevokên rêzimanî û zêde girîngî li ser hevokên nerêzimanî ne daye. Hevokên tezê jî ji axaftinên rojane yên axaftinkerên resen ên devokê hatine wergirtin. Wate di vê devokê de ji bilî hevokên rêzimanî û guncayî hevokên nerêzimanî û neguncayî jî hene, ku axaftinkerên wê hinek caran bi kar tînin. Lewre me di lêkolîna xwe de xwast ku em cudahîyên di navbera herdu cureyên hevokan de dîyar bikin. Her wisa di vê lêkolînê de armanca me ew e ku pêwendîya di navbera rêzimanîbûn û guncandina di navbera hevokan de têxîne berhev û wan cureyên hevoka berawird bikin. Digel vê wansedemên dibine karîger ji bo peydabûna hevokên nerêzimanî ne. Her wisa behsa wan yasa û binema yên ku dibine sedemê peydabûna hevoka rêzimanî û nerêzimanî hatîye kirin. Digel vê

dinava wan hevokan de li ser hinek tiştên taybet jî bal hatîye kişandin. Weku rêzîkirina pêkhênên hevokê ji alîyê rêzîmanî ve. Wate divê rêkeftina rêzîmanî di navbera wan pêkhênan de hebe. Lewre ev teza ji bo şirovekirina hevoka rêzîmanî û nerêzîmanî hatîye nivîsîn ku herdu alîyên rêzîmanî û wateyî bi xwe ve digire. Alîyê wateyê jî me bi tenê semantîk wergirtîye.

Di vê lêkolînê de amaje bi alîyê rêzîmanîbûn û guncandina hevokê hatîye dayîn. Zêdebarî sedemên rêzîmanîbûn yan nerêzîmanîbûna wan hevokên ku ji alîyê axaftinkerên devokê ve têne gotin hatine behis kirin. Ji ber vê çende hevoka rêzîmanî û nerêzîmanî xebateke girîng e. Lê belê heya niha çî lêkolînên serbixwe ji li ser vê mijarê nehatine kirin. Eger heya niha xebatên rêzîmanî yên ku li ser vê babetê di rêzîmana Kurdî de hatine nivîsîn jî bi awayekê ekademîk nebûn e. Her wisa bêhtir berê xwe dayîn e hevokên rêzîmanî û zêde girîngî nedane hevokên nerezîmanî. Lewre ev teza ji bo wê çendê hatîye nivîsandin heya ku sedemên peydabûna hevoka rêzîmanî û nerêzîmanî xwuya bike.

Ev lêkolîn ji kurte, pêşgotin, destpêk, sê beşên bingehîn, encam û çavkanîyên têkel pêk tê. Di van beşan de bi awayekî kûr amaje bi taybetmendî û cureyê hevokên di rêzîmana Kurdî de hatîye dayîn. Her wiha teşe û erkên hevokên rêzîmanî û guncayî jî. Digel vê hevokên nerêzîmanî û neguncayî bi mînakên zanistî hatine dîyarkirin.

Beşa Yekem: Ev beşe bi navê *“Teorîya Hevokê”* bi giştî behsa têgeha hevokê dike. Behsa pênaseyên hevokê ji alîyê zimannasên bîyanî û Kurd ve zêdebarî cureyên hevokê ji alîyê pêkhatinê ve dike. Her wisa behsa pêkhênên hevokên ên serekî û neserekî û rêzîkirina wan di hevokê de dike.

Beşa Duyem: Ev beşe li jêr jî nav û nîşan *“Teorîyên Zimannasî Derbarê Hevoka Rêzîmanî û Nerêzîmanî”* dike. Bi gotinekê din, di nav de behsa çawanîya dîtina hevoka rêzîmanî û nerêzîmanî li gor yasa û destûrên çend xwendîgehên zîman hatîye behiskirin.

Beşa Sêyem: Ev beşe jî bi navê *“Têgeha Rêzîman û Wateyê”* ye. Di vê beşe de jî behsa rêzîmanîbûn û guncandina hevokê hatîye kirin. Her wisa di vê xebatê de behsa çar cureyê hevokê hatîye kirin. Mîna *“Hevoka rêzîmanî û guncayî, hevoka*

rêzimanî û neguncayî, hevoka nerêzimanî û guncayî, hevoka nerêzimanî û neguncayî”.

Peyvên Mîheng : Hevoka Rêzimanî, Hevoka Nerêzimanî, Rêzîmanîbûn, Guncandin, Hevoka Guncayî, Hevoka Neguncayî.



ÖZET

Mahdi Saleh MIHO

BEHDİNAN BÖLGESİ AĞZINDA KURALLI VE DEVRİK CÜMLELER

YÜKSEK LİSANS TEZİ

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANA BİLİM DALI

DANIŞMAN MEHMET ZEYDİN YILIDIZ

VAN, IX + 207 s.

Bu çalmayı tercih etmemizin asıl nedeni "Behdinan Bölgesi Şivesindeki Kurallı ve Devrik Cümle" yapısını tanıtmak, kurallı ve devrik cümle üzerinde ayrıntılı bir şekilde durmaktır. Çalışmada aynı zamanda düzgün cümlelerin nasıl kullanıldığı üzerinde de durulmuştur.

Dilbilgisi bakımından bu şivenin uzman kullanıcıları ile akademik bağlantı kurulmuştur. Böylece bu bağlantı da çalışma içindeki düzgün ve kurallı cümlelerin kullanılmasına sebep olduğunu göstermektedir. Bu gerçeklikte Chomsky'nin "Üretici ve Dönüşümsel" (Generative and Transformational) teorisinin kurallarına göre yapılmıştır. Chomsky özellikle ilk defa 1952 yılında "Sözdizimsel Yapılar" (Syntactic Structures) adı ile yayımlanan kitabı ile bu konuyu dile getirdiği gibi İngiliz Dilbilgisinde de bu konudan behs eden ilk dilbilimcidir. Evet, o sadece daha fazla dikkati kurallı cümlelerin yapısına çekmiştir ama devrik cümlelere çok önem vermemiştir.

Çalışmadaki günlük hayatta kullanılan yeni cümleler bu yörenin bilinçli ağızlarından alınmıştır. Bu yörenin ağız yapısında kurallı ve uyarlama cümlelerin haricinde, bazen günlük konuşmalarda kullanılan devrik ve uyarlanamayan cümleler de vardır. Bunun dolayı çalışmamızda bu iki cümle arasındaki farklılıkları göstermek istedik.

Bununla birlikte bu çalışmadaki bir amacımız da cümleler arasındaki kurallılık ve uyarlamayı yanyana koymak ve bu cümle çeşitlerini karşılaştırmaktır. Ancak kullanılmaya sebep olan bu nedenler kuralsız cümlelerin

oluşması içindir. Böylece kurallı ve devrik cümlelerin oluşmasına etki eden yasa ve kurallardan bahs edildi.

Bununla birlikte dilbilgisi kurallarına göre bu cümleler arasındaki cümle öğelerinin dizimi gibi bazı hususi şeylere de dikkat çekilmiştir. Yani cümle öğelerinin gramer dizimi ile anlamları arasında kullanım uyumu olmalı. Çünkü bu tez kurallı ve devrik cümlelerin tanıtımı için hazırlanmıştır ki kurallar ve anlam bakımından her iki yönünü de içinde barındırır. Mana yönünü sadece anlamsal olarak alınmıştır. Bu çalışma da yine cümlelerin kurallı ve uyarlama yönlerine dikkat çekilmiştir. Dahası bölgede günlük konuşmalarda kullanılan bu cümlelerin kurallı ya da kuralsız oluşlarının sebeplerine de değinilmiştir. Bundan dolayı bu çalışma çok önemlidir.

Elbette şu ana kadar bu konu üzerinde bağımsız herhangi bir çalışma yapılmamıştır. Ancak bu konu üzerinde Kürtçe yapılan çalışmalar akademik bağlamdan uzaktır. Çünkü daha fazla kurallı cümleler üzerinde durulmuş fakat devrik cümlelere gereken önem verilmemiştir. Bu tez kurallı ve devrik cümleler arasındaki farklılıkların iyice belirlenmesi için hazırlandı.

Bu çalışma özet, önsöz, giriş, üç temel bölüm, sonuç ve ilgili kaynaklardan oluşmaktadır. Bu bölümlerde Kürt dilindeki cümlelerin özellik ve çeşitleri üzerinde detaylı bir şekilde çalışılmıştır. Aynı zamanda kurallı ve uyarlama cümlelerin biçim ve görevleri üzerinde de çalışılmıştır. Aynı zamanda devrik ve uyarlanamayan cümleler de örneklerle gösterilmiştir.

Birinci Bölüm: Bu bölüm "Cümle Teorisi" adı ile genel olarak cümle kavramından bahs etmektedir. Yabancı ve Kürt dilbilimciler tarafından yapılan cümlelerin tanıtımı üzerinde duruluyor ve aynı zamanda cümle çeşitlerinin yapısına da değinilmiştir. Aynı şekilde de cümlelerin temel veya yan öğelerinden ve bunların cümledeki sıralamasından da bahs ediliyor.

İkinci Bölüm: Bu bölüm aşağıda da gösterildiği gibi "Kurallı ve Kuralsız Cümle Hakkındaki Dil Tanıtımı Teorileri" ni göstermektedir. Başka bir ifade ile birkaç dil okulunun kural ve yasalarına göre kurallı ve devrik cümlelerin özellikleri üzerinde duruluyor.

Üçüncü Bölüm: Bu bölümün konusu da "Dilbilgisi ve Anlama Kavramı" dır. Burada da cümlenin kurallılığı, uyarlanması ve cümlenin dört çeşitti üzerinde durulmaktadır. "Kurallı ve Uyarlamalı Cümle, Kurallı Uyarlanamayan Cümle, Devrik ve Uyarlanan Cümle, Devrik ve Uyarlanamayan Cümle" gibi.

Anahtar Kelimeler : Kurallı Cümle, Devrik Cümle, Dilbilgisi, Uyarlamak, Uyarlanan Cümle, Uyarlanamayan Cümle.



ABSTRACT

Mahdi Saleh MIHO

REGULAR AND INVERTED SYNTAX STRUCTURE IN BEHDINAN

REGION'S ACCENT

MASTER THESIS

WAN YUZUNCU YIL UNIVERSITY

INSTITUTE OF THE LITERATURE OF LIVING LANGUAGES

KURDISH LANGUAGE AND CULTURE DEPARTMENT

SUPERVISOR: MEHMET ZEYDIN YILIDIZ

Wan, IX + 207 p.

The reason behind preferring this work is actually to introduce grammatical and ungrammatical Structure In Behdinan Region's Accent and study it in details.

In terms of grammar, some academic connection has been set with experts using this accent. This contact has provided us the main fact of this topic in real area. This study has been established by considering N.Chomsky's theory named "Generative and Transformational" in which he firstly expressed in his book called Syntactic Structures published in 1952. He took attention to regular syntax but he found inverted syntax more critical there.

The sentences and statements used have been taken from the people who live there and use this accent in a correct form. Besides regular statements we wanted to study inverted structures of syntax used around this region. Therefore we have tried to demonstrated the differences between the two structures.

One of our aims is to compare these two structures of syntax in this accent. That's why it is disputed what factors and rules impact this occurrence.

These statements have been analysed according to grammar rules. On the other hand in terms of meaning some comparisons have been made. It is said that there must be some harmony between the elements and clauses of the sentence. But the statements urged in daily life and in literal and textual ones have been explained. The fact that why they prefer grammatical and ungrammatical modes have been analysed in details.

Despite some studies have been done about this matter, but we have come into no academic ones. Grammatical sentences have been studied but no work has been done about ungrammatical sentences and the comparisons of both.

This study is consisted of three chapters except from abstract, preword and conclusion. Through these chapters kurdsih language's aspects of grammatical and ungrammatical sentence in Behdinan region have been demonstrated in a details and academic form.

First Chapter: In this chapter, sentence concept by "Sentence Theory" is mentioned in general. It is focused on the definition of sentence made by Foreign and Kurdish linguists and it is also mentioned about types of sentence structures. Of course main or subsidiary elements of sentence and ordering them in a sentence are focused on.

Second Chapter: As it is referred below, this chapter is about "Language Definition Theories about grammatical and ungrammatical Sentence". In other words, characteristics of regular or irregular sentence according to rules of several language schools are emphasized.

Third Chapter: The subject of this chapter is "Grammar and Comprehension Concept", Grammatical, adapting and four types of the sentences are emphasized here, like "grammatical and Adaptable Sentence, grammtaical Unadaptable Sentence, ungrammatical and Adaptable Sentence ungrammatical and Unadaptable Sentence".

Key Words : Grammatical Sentence, Ungrammatical Sentence, Grammar Adapt, Adaptable.

NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	IV
ABSTRACT	VII
NAVEROK	IX
PÊŞGOTIN Ê SPASÎ	XII
FERHENG A TERMÊN RÊZIMANÎ BI KURDÎ Ê ÎNGILÎZÎ	XIV
KURTKIRINA PEYVAN	XVII
DESTPÊK	1
1. Armanca Tezê	1
2. Girîngîya Tezê	2
3. Rê û Rêbaz	3
BEŞA YEKEMÎN: TEORÎYA HEVOKÊ	6
1.1. Pênasaye Hevokê	7
1.2. Dîtina Zimannasên Bîyanî Derbarê Pênasekirina Hevokê De	8
1.3. Dîtina Zimannasên Kurd Derbarê Pênasekirina Hevokê De	10
1.4. Cureyên Hevokê Jî Alîyê Pêkhatinê ve	13
1.4.1. Hevoka Xwerû (Simple Sentence).....	13
1.4.1.1. Hevoka Xwerû Ya Nawik	14
1.4.1.2. Hevoka Xwerû Ya Berfireh.....	16
1.4.2. Hevoka Hevedudanî (Compound Sentence)	18
1.4.2.1. Hevoka Hevedudanî Ya Hevrêk (Hawrêk).....	19
1.4.2.2. Hevoka Hevedudanî Ya Berevajî (Pêçevan)	20
1.4.2.3. Hevoka Hevedudanî Ya Helbijartî (Cudaker)	21
1.4.2.4. Hevoka Hevedudanî Ya Nerênî.....	22
1.4.2.5. Hevoka Hevedudanî Ya Demî.....	23
1.4.2.6. Hevoka Hevedudanî Ya Mercî	23
1.4.3. Hevoka Aloz (Complex Sentence).....	24
1.5. Rêzkirina Pêkhênan	28
1.6. Pêkhênen Hevokê	31
1.6.1. Pêkhênen Serekî Yê Hevokê.....	31

1.6.1.1. Kirde (Subject)	31
1.6.1.2. Bireser (Object)	34
1.6.1.3. Lêker (Verb).....	37
1.6.2. Pêkhênên Neserekî Yên Hevokê (Lawekî)	43
1.6.2.1. Rengdêr (Adjective)	43
1.6.2.2. Hevalkar (Adverb).....	44
1.6.2.3. Temamker (Complement)	46
1.7. Cureyên Rêzkirina Peyvan.....	47
BEŞA DUYEMÎN: TEORÎYÊN ZIMANNASÎ DERBARÊ HEVOKA	
RÊZIMANÎ Û NERÊZIMANÎ	49
2.1. Teorîya Klasîk (Classic Theory)	49
2.2. Teorîya Binyatgerî (Structuralism Theory)	52
2.3. Teorîya Berhemanîn û Veguhastin (Transformational And Generative Theory)	61
2.3.1. Rêzimana Berhemanîn (Generative Grammar)	65
2.3.2. Modelên Rêzimana Berhemanîn û Veguhastinê.....	69
2.3.2.1. Rêzimana Bare Sinordar	69
2.3.2.2. Yasayên Pêkhênana Girêyan.....	70
2.3.2.3. Yasayên Veguhastinê.....	72
2.4. Pêkhênên Rêzimanî di Teorîya Berhemanîn û Veguhastinê de.....	81
2.4.1. Pêkhênê Fonolojî (Phonological Component)	82
2.4.2. Pêkhênê Sentaksî (Syntactic Component)	82
2.4.3. Pêkhênê Wateyî (Semantic Component)	84
2.5. Rêzimana Veguhastinê (Transformational Grammar)	86
2.5.1. Cureyên Yasayên Veguhastinê	89
2.5.1.1. Yasayên Taybet	90
2.5.1.2. Yasayên Giştî.....	96
2.6. Teorîya Desthilat û Girêdan (Government And Binding Theory).....	97
BEŞA SÊYEMÎN: RÊZIMANBÛN Û GUNCANDIN DI ZIMANÊ	
KURDÎ DE.....	105
3.1. Têgeh	105
3.1.1. Têgeha Rêzimanê.....	105

3.1.2. Têgeha Wateyê.....	106
3.1.3. Pêwendîya Di Navbera Rêziman û Wateyê	108
3.1.4. Pêwendî Di Navbera Rêziman û Lojîkî de	113
3.2. Têgeha Rêzimanîbûne (Grammaticality).....	117
3.2.1. Pênaseya Hevoka Rêzimanî.....	119
3.2.2. Pênasaya Rêkeftina Rêzimanî.....	120
3.2.3. Pênasaya Rêkeftina Wateyê	121
3.2.4. Taybetmendîyên Hevoka Rêzimanî Di Zimanê Kurdî De.....	121
3.2.5. Pênasaya Hevoka Nerêzimanî.....	122
3.2.5.1. Taybetmendîyên Hevoka Nerêzimanî.....	122
3.3. Guncandin (Acceptability)	125
3.3.1. Pêkhatêya Guncandina Hevokê	127
3.3.2. Têgeha Guncandina Wateyê	127
3.4. Sîmayên (taybetîyên) Wateyî (Simantic Features).....	128
3.5. Cudahîya Di Navbera Rêzimanîbûn û Guncandinê de	130
3.5.1. Hevoka Rêzimanî û Guncayî	131
3.5.2. Hevoka Rêzimanî û Neguncayî	140
3.5.3. Hevoka Nerêzimanî û Guncayî.....	150
3.5.4. Hevoka Nerêzimanî û Neguncayî	159
ENCAM.....	170
ÇAVKANÎ.....	173

PÊŞGOTIN Û SPASÎ

Heya niha bi vî zimanî ve gelek pirtûk, rojname û kovarên zimannasî hatine çapkirin ku bi giştî gelekê ji wan girêdayî babetê rêzimanê bûne û bi taybet jî hevokszâyê. Birastî jî ev yek rêbaz û xebateke girîng e ji bo nasandina hevoka rêzimanî û nerêzimanî ya zimanê Kurdî. Bi vî awayî hinek zaravayên din jî dibin û her wiha zaravayên vî zimanî zêdetir nêzîkî hevdu dibin. Lêkolîna me bi navê 'Hevoka Rêzimanî û Nerêzimanî Di Devoka Devera Behdînan De' ye. Dîyarehevok yek ji beşa here girîng ya rêzimana zimanê Kurdî ye. Di vê lêkolînê de behsa hevoka rêzimanî û nerêzimanî di zimanê Kurdî de û bi taybet devoka devera Behdînan de bi dirêjî hatîye xebitandin. Her wisa behsa wan yasa û binemayan hatîye kirin ku dibine sedemê peydabûna hevoka rêzimanî û nerêzimanî. Her dîsan di nava van hevokan de li ser hinek tiştên taybet bal hatîye kişandin. Weku rêzkirina pêkhênan ji aliyê rêzimanî ve, wate rêkeftina rêzimanî di navbera wan pêkhênan de hebe. Ev xebat bo şirovekirina hevoka rêzimanî û nerêzimanî hatîye nivîsînku herdu aliyên rêzimanî û wateyî bi xwe ve digire. Aliyê wateyê me bi tenê semantîk wergirtîye. Yanî di vê lêkolînê de me amaje bi aliyê rêzimanîbûn û guncandina hevokê kirîye. Mîna rêzimanîbûn û nerêzimanîbûna hevokêzêdebarî guncan û neguncana hevoka zimanê Kurdî. Her wisa behsa yasayên evê teorîyê hatîne kirin û çawanîya bikaranîna wan li ser hevoka zimanê Kurdî. Tenê xebatên bi vî awayî têra hevokszâyîya zimanê Kurdî dike yan nake ew ne dîyar e. Heya niha her çiqas hinek çawanîya pispor û zimanzanên Kurd li gor vî babetî xebat encam dayîne jî, lêbelê ne bi awayekê berfireh û komxebat darxistibin. Van xebatan jî encameke berbiçav nedaye û ev daxwazana tenê wek pêşniyarîyekî hatine pejirandin. Çi xebatên di warê ziman de, çi nivîsên rêzimanî û çi jî xebatên li gor vî babetî di zaravê devoka Badînan de. Eger hatibine nivîsanidin jî lê îro jî bê bandorin. Nivîs û xebatên rêzimanî ji bo hevoka rêzimanî û nerêzimanîya Kurdî wek bingeheke gelek nirxabilind û zexm tê qebûlkirin. Bêguman di nava her lêkolîn û tekstekên xwe de kêmasî û girift hene. Ji ber wê çendê jî hertim di her lêkolînekê de hinek arîşe û girift tene hemberî lêkolîner. Giriftên vê xebatê jî bo ne nebûna çavkanîyane. Bi şeweyek baş li dawîyê daxwaza lêborînê ji xwendevanên vê lêkolînê dikim. Eger kêmasî di nav de hebin ku bêguman jî ye hebin.

Ez berîya her tiştî spasîya mamosteyên hêja û rêzdar ên beşê zimanê Kurdî li Zanîngeha Van Yüzüncü Yil ê dikim ku bi ked û dilsozîyeke herî zêde bi me re westîyan. Her wiha ez pir spasîya Prof. Dr. Mehmet Zeydin YILDIZ dikim ku erkê serpereştîkirina vê lêkolînê bi stûyê xwe ve wergirt. Her wisa pir ji dil spasîya mamosteya qedirgiran Dr. Vîyan Îbrahîm ELÎ dikim ku bi pêşniyarî û rê nîşankirina wê ve gelek arîşe li ber min ron bûn. Hem di warê Kurdîzanebûnê de hem jî di warê akademîk de alîkarîyên wê gelek çê bûn. Ji ber parvekirina fikir û ramanên xwe yê nîrxbilind. Ji bo sererastkirin û tîkûzbûna tezê ji birêzan Dr.Şêrzad Sebrî, Dr.Dilbirîn Ebdullah ELÎ û lêkolîner Ehmed SERHEDÎ û M. Segvan Îbrahîm MÎHO re jî gelek spasdarim û mala wan ava. Her wiha di pêvajoya vê xebatê de ji bo sebr û tehemûl û alîkarîya wan ya manewî.Dîsan vê xebatê pêşkêşî dayîk û bavên xwe dikim ku hertim alîkarên min ên maddî û manevî bûnzêdebarî xoşik û bira û hemû malbata xwe dikim. Bi taybetî jî mamê xwe yê heja Omer MÎHEMMED î. Her wisa ez ji hevalên xwe ên hêja û delal Serdar EHMED û Foad EBDULHEKÎM û Xalid XEZBAN re jî bi dilgermî spas dikim. Ku gelek alîkar bûn digel min her ji destpêkê û heya dawîyê. Xwedayê mezin (c.c.) her daîm ligel wan be û wana di her du cîhanan de serfiraz û bextewar bike. Ê li dawîyê spasî ji bo her kesê ku alîkar bûye digel me ji bo bi dawî anîna vê lêkolînê.

Mahdi Saleh MIHO

WAN - 22.01.2019

FERHENGA TERMÊN RÊZIMANÎ BI KURDÎ Û ÎNGILÎZÎ

Pêkhata Ji Nav De	Deep Structure
Pêkhata Serve	Surface Structure
Girê	Phrase
Berhemanîn	Generative
Rêzimana Berhemanîn	Generative Grammar
Rêzimana Veguhastin	Transformational Grammar
Rêzimana Giştî	Universal Grammar
Teorîya Desthilat û Girêdanê	Government And Binding Theory
Teorîya klasîk Classic Theory	
Desthilatdarî Government	
Girêdan	Binding
Rêzimanî	Grammatical
Nerêzimanî	Ungrammatical
Guncan	Acceptable
Neguncan	Unacceptable
Guncandin Acceptability	
Hevok	Sentence
Hevoka Rêzimanî	Grammatical Sentences
Hevoka Nerêzimanî	Ungrammatical Sentences
Hevoka Guncayî	Acceptable Sentences
Hevoka Sade (sakar)	Simple Sentences
Hevoka Girêdayî	Compound Sentences
Hevoka Aloz	Complex Sentences
Hevwate	Synonym

Bêwate		Meaningless
Veguhastin		Transformations
Yasayên Vegusatinê		Transformational Rule
Hevoka Bend		Dependent Clause
Hevoka Serekî		Independent Clause
Kirde		Subject
Bireser		Object
Bireserê Yekser		Direct Object
Bireserê Neyekser		Indirect Object
Lêker		Verb
Serbar		Adjunct
Rengdêr		Adjective
Hevalkar		Adverb
Temamker		Complement
Guzare		Predicate
Yasayên Veguhastinê Yên Bi Zorî		Obligatory Transformation Rules
Yasayên Veguhastinê Yên Bi Arezû		Optional Transformation Rules
Tuxim (Hêma)		Element
Xalbandî	Punctuation	
Pêkhata Sentaksî		Syntactic Structures
Şariste		Matrix Sentence
Rêkeftin		Agreement
Rêje		Mood
Bimijî (Mijdarî)	Ambiguity	
Bimijîya Rêzimanî	Grammatical Ambiguity	
Peyv Dirustkirin		Wordbuilding

Peyvên Aloz	Complex Words
Lêkerên Bêhêz	Weaks Verbs
Dem	Time
Dox	Case
CînavPronoun	
Cînavên Kesî	Personal Pronoun
Yasa	Rule
Yasayên Giştî	Transformational Rules
Yasayên Fonolojî	Phonological Rules
Xwendîgehên Zimannasî	Linguistic Schools
Teorîya Zimanî	Linguistic Theory
Wateya Rêzimanî	Grammatical Meaning
Wateya Sentaksî	Syntax Meaning
Wateya Ferhengî	Lexical Meaning

KURTKIRINA PEYVAN

H	:Hevok
K	:Kirde
Bi	:Bireser
L	:Lêker
SOV	:Subject, Object, Verb
SVO	:Subject, Verb, Object
VSO	:Verb, Subject, Object
La	:Lariste
N	:Nav
GN	:Girêya navî
GL	:Girêya lêkerî
BV	:Berhemanîn û Veguhastin
GB	:Government and Binding
NP	:Noun Phrase
VP	:Verb Phrase
DS	:Deep Structure
SS	:Surface Structure
D	:Dox
T	:Tîyan
X	:Xistineser
DA	:Daçek
G	:Girêdan
NF	:Nifîş
N.NF	:Nîşana Nifîşî

Nî	:Nîşan
HK	: Hevalkar
IP	: Girêya (Dem û Kes)
I	: Dem, Kes
RN	: Rengdêr
PP	: Girêya Bend
PF	:Formê Fonolojî
LF	:Formê Lojîkî
LFG	:Teorîya Formê Lojîkî
a	:Elfa (pêkhênekê nedîyar)
Spec	: dîyrîker
Comp	:Complement (Timamker)
Ø	:Ladan
Ya	: Yasa
M	: Morfîm
→	:Pêk tê ji
⇒	: Dibe be
*	:Nîşana Hevoka Nerêzimanî
R:	Rûpel
Hej	: Hejmar
Hwd	: Her wekî din
Etc	:Her wekî din

DESTPÊK

1.Armanca Tezê

Piştî sazûna Herêma Kurdistana Îraqê li destpêka salên 90 an de û heya niha hejmareka zêde lêkolîn, pirtûk, tezên diktora û lîsansa bilind derbarê alî û radên (mijarên) cuda cuda yên zimanê Kurdî ji riwângên (nêrînên) cuda cuda hatinê amade kirin. Di alîyê rêziman de jî hejmareka zêde lêkolîn hatine nivisandin û xebitandin. Tiştê balkêş ew e ku di nav van lêkolîn, pirtûk û tezan de behsa hevoka rêzimanî û nerêzimanî qet nehatîye kirin. Eger hatibe kirin jî li gor girîngîya babetê nehatîye behis kirin. Armanca me ji destnîşankirina babetê ew e ku, bi giştî devokên din û bi taybetî devoka herêma Duhokê ye. Lêbelê girîngîya wê babetê pir zêde ye. Lewre gelek caran dema tê dîtin kesek bi wê devokê biaxive lê di axaftinên wî de şaşîyên mezin çê dibin. Mebesta me ji axaftinê anko şêwazê gotina wan hevokan ne yên ku ew kesên pê diaxifin. Eger em mînakên bidin wek “Min vexwar av”. Ev hevoka di têgeha zimanî de nerêzimanî ye û lê wateya xwe dîyar dike ku av vexwarîye. Di vê hevokê de lêker ketîye pêşîya (berî) bireser e. Her wisa di hevoka “Te ez xwarim”. Eger ji alîyê rêzimanî ve lê binêrîn hevok rêzimanî ye û lê gunçayî (minasib, bikêr) nîne. Çunkî ji sîmayên “mirovî” ew e (- xwarin), wate (mirov) nahê xwarinbelkî berhemê wî/wê tên xwarin. Lê di hevoka “Biçîkekê heyî ewê kiçê”. Ev hevok nerêzimanî ye. Çunkî rêzkirina pêkhênên hevokê ne li gor yasayên rêzimana Kurdî ne. Her wisa negunçayî ye, ji ber ku ji sîmayên peyva “Kiç” ew e (- şûkirin), wate di şîyanên wê de nîne bikare biçîkan bibe. Ev mînakên li jorê me dan kurteyên ji naverokên tezê ne ku em êbiawayekî têr û tijî li ser lêkolînê bikin. Dîsa armanceka din ya babetê ew e ku ve tezê bixe berhemeke baş û bikeve ber destê her xwendevan û xwendkarên ku sudekê jê werbigirin. Ji ber vê babetê ku di zimanên din de jî girîngîyeka taybet ya wê heye. Ev mijar jî hewildaneke bo ji hev cudakirina hevoka rêzimanî û nerêzimanî hat xebitandin. Dê ku bi şêweyekê berfireh û bi mînak behis lê bikî ka kîjan hevok rêzimanî ye û kîjan nerêzimanî ye. Digel vêbi awayekê zelal bi pîverên standard li ser xebatê bisekinin.

2. Girîngîya Tezê

Di rêzimana Kurdî de yek ji wan babetên girîng jî hevoka rêzimanî û nerêzimanî ye. Bandora vê babetê di hemû alîyên ziman û rêziman de tê dîtîn. Helbet heta niha li ser rêzimana Kurdî gelek xebat hatine çêkirin. Lêkolînerên Kurd li ser rêzimana Kurdî gelek lêkolîn kirine û pirtûk çapkirine. Belê heya niha çî tişteke weha li ser vî nav û nîşanî nehatiye çapkirin. Xebatên rêzimanî yê ku heya niha li ser zaraveyê Kurmancî hatine nivîsîn bêhtir berê xwe danê hevokên rêzimanî û zêde girîngî ne dane hevokên nerezimanî. Ji ber wê qasê em dixwazin balê bikêşînin li ser hevokên nerêzimanî yê zimanê Kurdî û wan ligel yê rêzimanî bidin berhev da ku girîngîya hevoksazîya Kurdî baştir bê fehimkirin. Her wisa bê zanîn ku zimanê Kurdî di warê hevoksazîyê de ne kême ji zimanên din wek yê cîran û ên bîyanî mîna zimanê Tirkî, Erebî, Farsî û Îngilîzî... hwd. Gava em li axaftinên rojane yê axaftinkerên devokê guhdar dikin, em dibînin ku hinek caran hevokên nerêzimanî û neguncayî dibêjin. Ev cureyên hevokan ji alîyê axaftinkerên esen ên devokê ve têne gotin. Belê behra bêhtir hevoksazîyeka rezimanî û tîkûz (bêkêmasî) bikar tînin. Her çende jî ku hinek caran kêmasîyên hevokên rêzimanî hebin jî. Ji ber wê yekê ye girîngîya teza me derdikeve holê û di warê hevokên rêzimanî û nerezimanî de da ku bibe rêberek ji bo nivîskarên modern. Her wisa girîngîya vê tezê bi vî pergalê de yeku heya niha çî xebat bi vî nav û nîşanî di zimanê Kurdî bi devoka Behdînan de nehatine nivîsîn. Dîsan girîngîyeke din jî yê vî babetî ew e ku mirov di jîyana xwe de dikare hevokên rêzimanî û nerêzimanî bikar bîne, anko pê biaxive. Di rêzimana Kurdî de yek ji wan babetên girîng jî hevoka rêzimanî û nerêzimanî ye. Bandora vê babetê di hemû alîyên ziman û rêziman de tê sehkirin. Helbet heya niha li ser rêzimana Kurdî gelek xebat hatine çêkirin. Lêkolînerên navxweyî û bîyanî li ser zimanê Kurdî gelek lêkolîn kirine û pirtûk çapkirine. Girîngîyeke mezin heye li ser vê babetê bi giştî rêziman de û bi taybetî jî di kurmancîya de vera Duhokê ya “*Devoka Behdînan*” de. Lewre em dibînin heya niha xebateke akademîk û berfireh ku bal bikişîne ser hevoka rêzimanî û nerêzimanî û bide naskirin li herêma Kurdistanê nehatiye çêkirin. Ji ber wê yekê, me bi pêwîst dît em lêkolîneka akademîk li derbarê babetê hevoka rêzimanî û nerêzimanî encam bidin.

Babetê hevoka rêzimanî û nerêzimanî weke babetekê girîng di hevoksazîyê de tê dîtin. Di berê de li dawîya salên pêncîyan de di zimanê Îngilîzî de ji alîyê Chomsky ve girîngî pê hatîye dîyarkirin. Lêbelê heya niha di zimanê Kurdî de girîngîyeka zêde pê nehatîye dîyarkirin.

3. Rê û Rêbaz

Di vê tezê de çavkanîyên me yê sereke pirtûkên rêzimanî ne. Wek mînak: Tirîfe Mûhsin “Çemkî Rêzimanê Le Tîyorî Berhemhênan Da”, Dîyar Elî Kemal “Rêzimanî Kurdî Riwaneyekî Berhemhênan û Guwêzanewe”, Segvan Îbrahîm Miho “Cihguherîna Pêkhênen Ristê Di Axftina Bajêrê Duhokê Da”, Vîyan Silêman Hacî “Rêkeftin Le Şeweyî Jorîyî Di zimanî Kurdî De”, Noam Chomsky “*Syntactic Structure*” û “*Aspects Of The Theory Of Syntax*”. Û ji bilî van ez ê çand çavkanîyên din jî bi karbînim ku lîsteya wan li jêrê di nava çavkanîyan de hatîye dayîn. Ez ê li pirtûkxaneyên zanîngehên Zaxo, Duhok, Selahedîn, Suleymanî û pirtûkxana bedirxanîyan ya li Duhokê û pirtûkxaneyên din yê hikumî jî lêkolîne bikim. Bi taybetî ez ê ji bo xurt kirina teza xwe bigehînim van çavkanîyan jê sudekê wergirim.

Teza me teqez li gor yasa û binemayên teorîya berhemânî û veguhastîne (Generative And Transformational) a Chomsky hatê nivîsandin û xebitandin. Ji ber ku Chomsky yekem zimannas e babetê hevoka rêzimanî û nerêzimanî dinava rêzimana Îngilîzî de behis kirî. Ew jî di pirtûka xwe ya bi navê *Pêkhatên Sentaksî* (Syntactic Structures) a ku 1957an de belav bûyê behis kirî ye. Her wisa tixûbê erdnîgarîya (coxrafîya) vê tezê di çarçova devoka de vera Behdînan de ye. Anko bajarê Duhok û dewrûberên wê. Wate hevokên tezê ji axaftinên rojane ên axaftinkerên devokê hatine wergirtin. Dîsan ev lêkolîn jî wek her lêkolîneka din arîşên (kêmasî) xwe hebûne wek astengîya wergêran û kêmbûna çavkanîyan. Her wisa astengîya herî mezin ji bo vê lêkolîne em dikarin bibêjin ku nebûna xebatên Kurdî ên li ser vê mijarê bûn. Bi gotinekê din wate li ser mijara hevoka rêzimanî û nerêzimanî. Ji ber ku mirov bikare sudekê jê werbigire heya niha di çarçova ekadêmîk de hîç xebatek di devoka de vera Behdînan de nehatine nivîsîn. Ji ber van sedeman hem zehmet e û hem jî dibe ku hinek cihan de me şaşî kirbin e.

Ev teza ji sê beşan pêk tê:

Beşa Yekem:Ev beşe bi navê “*Teorîya Hevokê*” ye ku heft paran bi xwe ve digire. Para yekem bi giştî behsa têgeha hevokê dike. Para duyem behsa pênaseyên hevokê ji alîyê zimannasên Bîyanî ve dike. Para sêyem behsa pênaseyên hevokê ji alîyê zimannasên Kurd ve dike. Para çarem behsa cureyên hevokê ji alîyê pêkhatinê ve dike. Da ku di nav de behsa sê cureyên hevokan jî dike jibona ku ka her curek dibe çend beş. Para pêncem bi giştî behsa rêzkirina pêkhênên hevokê û bi taybet jî di rêzimana Kurdî de behis dike. Para şeşem jî behsa pêkhênên hevokên ên serekî û neserekî û rêzkirina wan di hevokê de dike. Her wisa di para şeşem de behsa cureyên rêzkirina peyvan di her zimanekê de jî hatîye kirin. Para heftem jî bi giştî behsa rêzkirina pêkhênên hevokê di her zimanekê de dike.

Beşa Duyem:Ev beşa li jêr jî nav û nîşan a “*Teorîyên Zimannasî DerbarêHevoka Rêzimanî û Nerêzimanî*” dike. Yanî di nav de behsa çawanîya dîtina hevoka rêzimanî û nerêzimanî li gor yasa û destûrên çend xwendengehên zimanî hatîye behiskirin. Ev beşa jî şeş paran bi xwe ve digire. Her parek ji wan behsa xwendengehekê dike. Wan xwendengehan jî bi navên “*Klasîk, Binyatgerî, Berhemanîn û Veguhastin “BV”, Desthelat û Girêdan “GB*” dane. Para yekem behsa xwendengeha Klasîk dike. Para duyem behsa xwendengeha Binyatgerî dike. Her wisa para sêyem behsa xwendengeha Berhemanîn û Veguhastinê dike. Bi awayekê têr û tesel behsa herdu modelên rêzimana berhemanîn û veguhastinê dike. Zêdebarî wan binema û taybetmendîyên herdu rêzimana bi xwe ve girîfîn. Para çarem behsa pêkhênên rêziman di teorîya berhemanîn û veguhastinê de hatine kirin. Digel wan para pêncem behsa rêzimana veguhastinê û cure û yasayên wê bi giştî dike. Di para şeşem de jî behsa xwendengeha Desthelat û Girêdanê hatîye kirin. Ku her xwendengehekê li gor hinek yasa û pîveran behsa hevoka rêzimanî û nerêzimanî dikin. Her wisa me hewl daye ku em behsa serhildan, dîtî, yasa û binemayên evan teorîya bikin.

Beşa Sêyem:Ev beşa bi navê “*Têgeha Rêziman û Wateyê*” di vî beşê de jî behsa rêzimanîbûn û guncandina hevokê hatîye kirin. Ev beşe jî pênc paran bi xwe

ve digire. Para yekem behsa têgeha rêziman û wateyê dike. Para duyem behsa hevoka rêzimanî û taybetmendiyên wê di zimanê Kurdî de dike. Para sêyem jî behsa hevoka nerêzimanî û çawanîya dirustbûna wê ji aliyê yasayên rêzimanî ve dike. Û zêdebarî taybetmendiyên wê di zimanê Kurdî de jî dike. Para çarem behsa têgeha guncandinê dike, ku di nav de behsa pêkhata guncandina hevokê, zêdebarî guncandin û rêkeftina wateyî. Her wisa behsa sîmayên wateyî hatîye kirin. Para pêncem jî behsa cudahîya di navbera rêzimanîbûn û guncandina hevokê de hatîye kirin. Her wisa di evê parê de behsa çar cureyên hevokên mîna “*hevoka rêzimanî û guncayî*,” *hevoka rêzimanî û neguncayî*, *hevoka nerêzimanî û guncayî*, *hevoka nerêzimanî û neguncayî*” hatîye kirin.



BEŞA YEKEMÎN: TEORÎYA HEVOKÊ

Ziman di koka xwe de ji sê astan pêk tê. Ev jî deng, rêziman û wate ne. Ji wan her astek jî dibe du beş. Hevoksazî jî di bin astê rêzimanê de ye. Hevoksazî dawî û serektirîn astê zimane. Ji ber wê çendê hemû astên ziman di nav hevokê de têne komkirin (Refîq Şiwani, 2011: 25-26). Lewre hevoksazî mîna pirekê ye û hemû beşên ziman digehîne hev. Bitaybetî jî dengsazî û watesazîyê (Talib Hisên, 2014^a: 49). Chomsky girîngîyeka zêde daye hevoksazîyê û li gor wî “*Cihê hevoksazîyê di nava ziman de mîna cihê dilê di nava laşê mirov de*” ye (Xirma, 1978: 241). Her wisa zanistekê lêkolîne li hevok, girê (soz, gotin) û peyvê dike. Di hevoksazîyê de em rêya rêkxistina peyvan di axaftin û nivîsînê de dibînin ku, ji ber wê em bikarin hevokeke rêzimanê temam bikin (Finch, 2003: 85). Wate hevoksazî beşeke girîngê ji rêzimanê û digel peyvsazîyê bihevra beşdarîyê di pêkhatinê de dikin. Hevoksazî li gor sîstema zimaneke dîyarkirî destûra girêdan û rêzkirina pêkhênan nîşan didin (Hawser Newzad, 2014: 75). Hevoksazî û peyvsazî beşên ji rêzimanin. Anko bihevra rêziman pêk tînin. Ev zarava di binyat de ji zaravê syntaxis (sentaks) ve hatîye ku zaravekê Yewnanî ye û paşê hatîye di nava zimanê Îngilîzî. Zaravê sentaks di binyat de ku ji du beşan “*syn*” bi wateya bihevra û “*taxis*” bi wateya danan û rêkxistin pêk hatîye. Anko sentaks lêkolînê hevregirêdana peyvê ji alîyê nivîsîn û axaftinê ve dike (Ferhadî, 2013: 4). Hevoksazî dikeve nav çarçova ya sîstema ziman. Her wisa astekê girîng ê ku zimannasîya teorîyê di destûra girêdan û rêzkirina peyvan de vedikole (Dizeyî, 2011: 19). Digel vê ji alîyê pêkhatin û naverokê ve behsa hevokê dike. Ji bilî vê yekê bi rêya yasa û destûrên zimaneke dîyarkirî ve jî li ser rêzkirina pêkhênan hevokê kar dike.

Têgeha hevoksazîyê yek ji wan yekeyên bineret û serekî ye ku rêziman girîngîya xwe pê nîşan dide ku ev jîkarê rêzimanê. Bêjeyên pêkhênan hevokê çine yan çawa nin, kartêkirinê li ser hev dikin û bi wê şêweyê têne rêzkirin (Ferhadî, 2013: 4). Her wisa qala pêkhatyên girê (gotin) û hevokê dikin. Hevoksazî ji encamê girêdana peyva û pîtan pêk tên (Refîq Şiwani, 2011: 25). Hevoksazî bi wateya temam kirina hevok û wateya xwendin û lêkolînê li taybetmendiyên pêkhatyên zimani dike (Tallerman, 1998: 1). Ji ber vê hevoksazî zanista sazkirin û çêkirina hevokan e. Ew şirove dike ku bi çî şêweyî hevok ji xeberan çê dibin, çawa bendên xeberan di

hevokan de li hev tîn, çawa hevok bi hevra tîne girêdanê û çend cure hevok li xeberdanê de hene (Qenatê Kurdo, 1981: 163). Ji hevoksazîyê mebest hîlbijartina pêkhênan û rêzîkirin û ew guhartinên bi ser rêzîkirinê de tene. Anko hevoksazî li gor sîstema zimanekî dîyarkirî destûrê girêdan û rêzîkirina pêkhênanê ye (Dizeyî, 2011: 23). Digel vê di têgeha hevokê de behsa rêzîkirina pêkhênanê tê kirin. Zimannas hewl dide ku bi rêya wan hevokên rêzîmanî yên bê tixûb tîne temam kirin wan yasayên sentaksî destnîşan bike (Ebdulselam Necmedîn & Şêzad Sebrî, 2011: 178). Bêguman sadetirîn hevok ji du beşên serekî pêk tê. Wan jî girêya navî û girêya lêkerî ye (Awaz Heme Sedîq, 1996: 21).

Di asta serekî de hevoksazî mîna şaxek ji zimannasîyê tê pênasekirin. Ev jî çawanîya girêdana peyvan di ziman de mîna girê û hevokê bo çêkirina yekeyên mezintir vedikole (Mark & Janie Rees, 2003: 265). Hinek zimannas hevokê bi girîngtirîn yekeya watayê dihejmêrin û hinek jî bêhtir diçin. Hevokê bi girîngtir ji peyvê dizanin. Bi nerîna wan, peyv bi tenê wata xwe nîne belkî wata wê di nava wê hevokê daye. Dîyare ku ev wate di nav hevokê de bi kar tê (Şêzad Sebrî, 2011: 75). Hevok yekeyeke semantîkî ye. Lewre wateya wê bi rêya rêzîkirina peyvan li gor yasayên rêzîmanî bi dest ve tê ku pêkhatîye ji wateyê ron, asayî û rasteraste. Bitenê hevok dewrûberî (hemû alîyên xwe ve) li ber çav wernagire û ev çende jî dibe eger ku hemû takekesên civakî di wateya hevokê bigihînin (Şêzad Sebrî, 2011: 119). Di hevokê de awaza wate çawanîya derbirînê dibe sedemê guhartina cureyê hevokê û wateya hevokê. (Refîq Şiwani, 2011: 26). Bi şêweyekî giştî yasayên sentaksî di zimanên cîhanê de cêgîr û çespayîtirin ji astên din û gelek bi kêmî û demeke zêde divê ta ku guhartin bi ser de were (Pêşkewt Mihemmed, 2013: 58).

1.1. Pênasaye Hevokê

Dema ku mirov diaxife yan dinivîse ew e ku hejmareka girêyan dixê bal hevdû. Bi şêweyekê ku derbirînê ji wê bîrokê (nêrînê) bike ku mebesta mirovî ew e pê bigehîne hev. Wate ew girê bi şêweyekê tîne rêkxistin ku wateyeka dawî dide wergirî. Hevok jî diçe nav rexê vî karî. Wate dema mirovî divê tevgeran dike, hevokan ku çî kêmasî û kurtî têda nebe bi bedewtirîn şêwe derbibire (Dizeyî, 2013: 23).

Ji alîyê lêkolîrên zimannasî ve gelek pênase ji bo hevokê hatine kirin. Lê heya niha jî zimannas û pîsporên ziman nikarine pênaseyeke yekgirtî ji bo hevokê dîyar bikin. Her pîspor û lêkolîner li gor têgehiştin, hizr û ramanên xwe pênaseya hevokê dikin. Ev ji alîyekî din ve hebûna teorî û xwendigehên zimanî yên cuda cuda ne. Her yek ji wan zimannasan li gor ew ê teorîya zimannasî ya ku li dûv diçin pênasa hevokê dikin. Di rêzimana dêrîn de, di pênasekirina hevokê de, pişt bi alîyê watayê dihate girêdan ne ku alîyê rêzimanî ve. Di lêkolînên nû de jî, hevok bi çend şêweyan hatîye pênasekirin (Yosif Norî, 2015: 50). Anko zanayên ziman her yekê li gor teorî û dîtînen xwe ên taybet hevok dane pênasekirin. Bêhtirîyê van pênaseyan hevokê mîna komeke peyvên watedar didin naskirin. Ev çend heta niha jî ji alîyê lêkolîrên zimannasî yên nû ve rexneyeke tund lê hatîye girtin. Lewre di rêzimana nû de bêhtir teqezî li ser wan pênasan tê kirin ku hevokê bi mezintirîn yekeya zimanî didin. Lewre hevokên ku bi mezintirîn yekeya zimanî didin li ser wan di rêzimana nû de bêhtir pênasên wan tên kirin. Em ê li jor dê hinek ji wan pênaseyan ku ji alîyê zimannasên bîyanî û paşê jî ên Kurd ve bidine dîyarkirin:

1.2. Dîtina Zimannasên Bîyanî Derbarê Pênasekirina Hevokê De

Ji bo hevokê wek zaraveke zimannasî gelek pênaseyên cuda cuda hatine kirin. Zanayên ziman yên bîyanî her yekê li gor dîtina xwe û bi wî şêweyên li jêr hevok pênase kirin e:

Eflaton: Eflaton derbarê hevokê de dibêje; “Hevok ji derbirîna bîr û dîtînen me bi rêya nav û lêkerî pêkhatîye. Ew nav û lêker jî di çarçova derûnî de derbirîn yan rengvedana ramanan me ye. Ev jî ji sedemê axavtinê ji devî derdikeve” (Xalî, 1976: 77).

Eristo: Eristo bi vî awayî hevokê pênase dike; “Pêkhateyeke pêkhênên wê dengîn û hemû bihevra wateyeke dîyarkirî didin digel vê çendê jî her pêkhênekê wateyeke taybet bi xwe ve heye” (Ivic, 2000: 12).

Bloomfield: Leonard Bloomfield bi vî şêweyî hevokê pênase dike; “Hevok formeyekê serbixwe yê zimanî ye ku nakeve bin bandora çî pêkhatineke zimanî ya ji xwe mezintir” (Bloomfield, 1976: 170).

Lyons: Lyons John dibêje;“Hevok mezintirîn yekeya wesfî ya rêzimanê ye” (Lyons, 1977: 176).

Crystal û Gordon: David Crystal û Gordon Jarvie bi vî şêweyî hevokê pênasê dikin;“Hevok mezintirîn pêkhatêye di nava rêzimana zimanî de ye” (Crystal, 2008: 413;Gordon, 2007: 65).

Finch: Her wiha Finch, derbarê pênasê hevokê dibêje;“Hevok pêkhatêye ji yekeyeke temama ku di şîyan de heye bi tenê bikar were û ji alîyê wateyê ve ya serbixwe ye” (Finch, 2000: 277).

Radford: Radford derbarê pênasê kirina hevokê dibêje;“Hevok ji alîyê çavlêkirinê ve pêk tê ji peyv, girê û laristeyan û her pêkhênek ji van ser bi pûleka rêzimanîya dîyarkirî ve ye. Her wisa erkekê zimanîyê dîyarkirî di nava wê hevokê de dibîne ya ku tê da tê bikaranîn”(Radford, 2009: 245).

Teorîya Berhemanîn û Veguhastinê: Li gor dîtina teorîya “B.V” ê “Hevok mezintirîn yekeya sentaksîye ku di pêkhatina di nav hevokê de pêkhênên pêkhênerên wê girêya navî û girêya lêkerî bi rêka yasayên sentaksî bihevra têne girêdan” (Trask, 1993: 248).

“Hevok ji komeka peyvên pêk tê û ew peyvên bi rêya hinek yasa ve tînen rêzkirin. Feqet ne her rêzkirina hinek peyvên dê bibe hevok. Divê li gor yasa û destûran be” (Hîcazî, 1998: 126).

Xisro Ferşîd:Zimannasên Îranî Xisro Ferşîd derbarê hevokê dibêje;“Rûyekê zimanî ye ku awazeka teybetî û rawestîyanek li dawîyê hebe û wateyêke temam bide û di pêkhatina yekeyeka zimanî ya mezintir bikar neyê” (Xerîbe Egîd, 2012: 23).

Cambridge Dictionary: Cambridge Dictionary jî hevokê bi vî şêweyî pênasê dike;“Komeke peyvane hertim lêkerê bi xwe ve digire. Her wisa hizrekê bi şêweyê gotinê derdibire ew hizr ji yan pirse yan sersûrmane” (URL 1). Dîsa **Oxford Dictionary**;“Komeka peyvên e wateyêke temam didin, pêk tê ji kirdeyekê yan nîhadêke yan jî şaristekê. Hinek caran jî paristeka bend yan bêhtir bi xwe ve digire” (URL 2).

Hinek zimannasên din yên bîyanî dibêjin;“Hevok derbirîneka temam e ya hizreke cuda ye”. Li gor vê pênasê em dikarin bibêjin ku evên li jêr dibin hevok in (Brandon, 2011 :72)

Mînak:

Good morning : Beyanîbaş.

No parking : Cihê rawestîne nîne.

Come in here : Were vir.

1.3.Dîtina Zimannasên Kurd Derbarê Pênasekirina Hevokê De

Derbarê pênasekirina hevokê de zimannasên Kurd jî mîna zimannasên bîyanî her yek li gor dîtîna û nerîna xwe hevok daye naskirin. Pênasekirin hevoke li jêr dê dîtînen hinek ji wan zimannas ye bê qalkirin:

Nurî Elî Emîn: Nurî Elî Emîn bi vî şeweyî pênasa hevokê kirîye;“Hevok komeka peyvane em bikar tînin û wateyêke temam dide û lêkerek li kêleka wê heye” (Nurî Elî Emîn, 2013: 47)¹.

Tewfîq Wehbî: Tewfîq Wehbî du pênasa ji bo hevoke dide nîşan;

1- “Hevok dîyarkirina darazayekê ye”

2-”Hevok hejmareke peyvane e hizreke temam derdixe” (Xoşnaw, 2014: 11).

Cigerxwîn:Cigerxwîn dibêje; “Hevok ew çend gotînin ku dirust e li dawîya wan raweste, lewre daxwazîyekê pêk tîne” (Cigerxwîn, 1961: 2).

Qenatê Kurdo: Qenatê Kurdo dibêje; “Hevok ji xeberan çê dibin, wextê em xeber didin fikra xwe bi xeberan dibêjin û raman bi alîkarîya bihevra girêdana komên xeberan temam tê gotîne” (Qenatê Kurdo, 1981: 163).

¹**Têbînî:** Rêzkirina pênasên zimannasên bo hevokê me jê wergirtî rêzkirîye ne li gorî sala weşana wê pirtûke. Ji ber ku hinek ji wan çavkaniyên me mîna jê wergirtî ne weşana yekemîn e, belkî me li gorî kevniyê pênasê wergirtiye.

Hewramî: Mihemmed Emîn Hewramî di pirtûka xwe ya bi navê “*Zarî Zimanî Kurdî Le Terazûyî Berawirdî De*” bi vî awayî hevokê dide naskirin; “Hevok ew axaftine ye ku lêkerek têdaye û wateyeke temam dide. Mebest ji axaftina temam ew e ku peyvên wê li gor yasayên zimanî hatibine rêzkirin û lêker di nava wan de hebe”. Wateya hevokê pêkhatîye ji peyvekê yan bêhtir ku bi rêya yasayên zimanî hatibine rêzkirin û lêker di nav de hebe (Hewramî, 1981: 303).

Amêdî: Sadiq Behaedîn Amêdî derbarê pênasa hevokê dibêje; “Em di axaftina xwe de çend bêjeyan bikar tînin. Pêwîste ew bêjeyên em bikar tînin jî wateya rast bide û kirin jî tê de be re dibêjin hevok” (Amêdî, 1987: 445).

Wirya Omer Emîn: Wirya Omer Emîn bi vî awayî hevokê pênase dike; “Hevok mezintirîn yekeye rêzimanî ya zimanî ye” (Wirya Omer Emîn, 1986: 183).

Nesrîn Fexrî: Nesrîn Fexrî hevokê pênase dike û dibêje; “Hevok komeke peyvên rêkxistîne bo mebestê bi rêya yasayên zimanî” (Xoşnaw, 2014: 12).

“Hevok mezintirîn daneya zimanî ye ku ji alîyê pêkhatinê ve serbixwe be” (Mihemmed Me’rûf Fetah, 1990: 98).

“Hevok ji girê pêk tê û girê jî ji peyv û pîtan pêk tê” (Fattah, 1997: 188).

Awerehman Hacî Marif: derbareyî hevokê du pênasan dide dîyar kirin;

1- “Ew axaftine ku lêkerek têdaye û wateyeke temam dide” (Awerhmanî Hacî Marif, 2004: 173).

2- “Hevok ji lêker û pêdiviyên wî pêk hatîye” (Awerhmanî Hacî Marif, 2004: 175).

Kemal Mîraw Zade: Dr. Kemal Mîraw Zade bi vî şeweyî hevokê pênase dike; “Hevok peyvekê yan ji bêhtir peyvan pêkhatîye ku bihevra wateyeke temam didin. Hevok mezintirîn daneya rêzimanî ye ku pêkhateya wê bi fermana yasaya rêziman dîyare û rêkûpêk e” (Kemal Mîraw Zade, 2007: 11).

Ebdullah Hisên Resûl:dibêje;“Di ziman de tu hevok bê kar nabin, lewre hevok ji alîyê wateyê ve bûn û nebûna bûyerekê digihînin û di dema borî yan ne borî bûyerê de jî. Wate gihandina baredoxê tenê rawestayî be yan livok her ji ber vê çendê hevok bê. Girêya navî û girêya lêkerî tamam nabe” (Ebdullah Hisên Resûl, 2014: 26).

Dizeyî:Dizeyî dibêje; “Hevok li gor sîstema zimanekî taybet ew koma peyvên rêzkerîne ku rêkeftina wateyî û rêzimanî di nav de heye” (Dizeyî, 2013: 25).

Bayiz Omer Ehmed: Her wisa Bayiz Omer Ehmed çend pênase ji bo hevokê kirine;

1- “Hevok, formê zimanî yê serbixwe ye ku pêwendîya rêzimanî digel formeke zimanî yê mezintir nayê. Wate her derbirîneke ji alîyê rêzimanê ve serbixwe dê bibe hevok. Anko pîver li niha alîyê rêzimanîye”.

2 -”Yek gotina serbixweye, çi biçûkitirîn gotin be, yan jî gotineke mezinkirî be”.

3 -”Her formeke zimanî di her gotinekê de, bibe yan wekî yekeyeka serbixwe yan neserbixwe kar dike. Formê serbixwe ewê parçek nebe ji yekeyeka ji xwe mezintir û pêwendîyên rêzimanî digel ti pêkhatinên din nebin, hevok” (Bayiz Omer Ehmed, 2012: 41).

Her zimannasekî li gor bîr û dîtînen xwe hevok pênase kirîye û her yekê bi şêweyekê daye xuyakirin. Pênasekirina hevokê jî karekê hêsan nîne û bi zehmet û aloz e, lewre çî pênase bê kêmasî nînin. Hinek dibêjin hevok çend peyvên bihevra wateyêke tamam didin. Belê di rastî de ev pênase xelet e. Lewre ji pênasekirina hevokê li gor pîverê wateyî yên çûyin, mîna “*mirov kar tirumbêl*” xuyaye ku bihevra wateyeka rast nade. Lewre ne mercê ku hevok ji çend peyvekan pêk bê, lê belê hevoka ya heyî bi tenê ji yek peyv pêk tê. Mîna “*hat*”, anko ev pênaseyên li jêr heta radeyekî rast nînin. Her wisa Crystal derbareyê pênasekirina hevokê dibêje;“*Çî pênaseyên baş ji bo hevokê peyda nebûn e*”. Wate li gor axaftina wî em nikarin çî pênaseyên yekgirtî ji bo hevokê destnîşan bikin. Wate em nikarin pênaseke guncawî

ji bo hevokê dîyar bikin. Lewre her zimannasek di bîyavekê de pênase kirîye û gelek dîtinên cuda li ser pênasekirina hevokê hene.

1.4.Cureyên Hevokê Ji Alîyê Pêkhatinê ve

Zimannasan her ji kevin de bi mebesta hêskirina lêkolîn û dîyarkirina tixûb û cureyên wê bi şêweyên cuda cuda hevok ravekirine. Bi şêweyekî giştî di rêzimanê de hevok dibe sê cur *hevoka xwerû, hevedudanî û aloz*. Di rêzimana Kurdî de du cureyên serekî jî hatîne dîyarkirin. Ew jî hevoka xwerû û nexwerû ne. Her wisa hevoka nexwerû jî dibe du cure. Wan jî hevoka hevedudanî û aloz in.

1.4.1.Hevoka Xwerû (Simple Sentence)


Ew hevoka yak u bi tenê ji yekeyeka serbixwe ya astê ji xwe kêmtir pêk te.Wate bi tenê ji laristeka serbixwe pêk tê.Ew lariste jîxwedî pêkhatû wateyeka serbixwe ye anko pêdivî bi laristên din nîn e.Ew lariste bi larista serbixwe yan larista serekî yan larista bingehî tê navkirin.Ew hevoka ku bi tenê yek lêker tê de heye û wateyeka temam jî dide (Gordon, 2007: 69). Ev cureyê hevokê bi kêmahî ve ji du girêyan pêk tê. Ew jî girêya navî û girêya lêkerî ye. Dibe di hevoka xwerû de bêhtir ji girêyeka navî hebe. Lê nabe zêdetir ji girêyeka lêkerî hebe (Ebdulselam Necmedîn & Şêzad Sebrî, 2011: 180).

Her wisa di vê hevokê de cureyê lêkerî hejmar û peywira (erk) pêkhênan destnîşan dike. Yanê eger lêker gergûhêz (têper) be du pêkhênan werdigire wek kirde û bireser. Eger lêker negergûhêz be, bi tenê pêkhêneyekê werdigire ku wek kirde (Ebdullah Hisên Resul, 2014: 6). Hevoka xwerû tenê ji yek hevoka biçûk pêk tê, hevoka biçûk jî vegotîneke ku tenê yek lêker hebe (Tallerman,1998: 63). Wate xwerûtirîn hevok di pêkhatinê de ne xwerû ye. Lewre hevokên xwerû ji girêyeka navî û girêyeka lêkerî pêk tê (Mihabad Ebdullah, 2010: 39).

Her wisa hevoka xwerû di rêzimana Kurdî de ji alîyê pêkhênanê ve yek lêker tê de hey. Yanî nabe bêhtir ji lêkerekê li xwe bigire, lê dibe di hevoka xwerû de bêhtir ji navek, rengdêrek, hevalkarek ... hwd hebe (Ebdullah Hisên Resûl, 2015:103).

Mînak:

1 - Azad hat. 2 - Min Azad dît.



Her wisa di hevoka xwerû de, lêkerê hevokê helwestekî kifşe dike ku ji alîyê wateyê ve serbixweye û pêkhêneyekî ji pêkhênên hevokê ye (Ebdulbaqî Ehmed, 2012: 29).

Hevok yek gotina serbixweye çî biçûktirîn gotin be yan jî gotineke mezin. Anko hevok hene biçûkin û hevok hene hatine mezinkirin. Yanî di şîyan de heye hevok bihête mezinkirin bi zêdekirina pêkhênan li ser (Bayiz Omer Ehmed, 2012: 41). Anko hevok dibe çend cureyek, em dê li jêr bi dirêjî behsa wan curan bikin:

1.4.1.1. Hevoka Xwerû Ya Nawik

Hevoka sade ya nawik bi tenê ji girêyeke navî û girêyeke lêkerî pêk tê. Girêya navî erkê kirdeyî dibîne û girêya lêkerî jî erkê lêkerî dibîne (Bayiz Omer Ehmed, 2012: 52). Lewre biçûktirîn hevok ji du girêyan pêk tê; girêya navî û girêya lêkerî (Wirya Omer Emîn, 2004: 199). Her girêyek ji wan roleke serekî di hevokê de digire. Bi wateyeke din hevoka nawik wan hevokan bi xwe ve digire ku bi tenê ji pêkhênên serekî pêk tên (Ferhadî, 2013: 40). Lewre ev girê bi erkên kirdeyî û lêkerî ku du pêkhênên serekî ne bo her hevokê Kurdî radibin. Bi vî awayî hevoka xwerû a

nawik ew hevoka a bi tenê pêkhênên pêdivî yên hevoka sade tê de ew jî du girê ne. Girêyeke navî ku bi erkê kirdeyî radibe û girêyeka lêkerî ku bi erkê karî radibe (Segvan Miho, 2012: 52). Her wisa caran cînavêkê pêvek (nûsok) jî digel vê cureyê hevokê tê, ku dibe derbirîn bo rêkeftina di navbera kirde û lêkerî de. Ev binaxê xwerûtirîn hevoka zimanî ya Kurdî ye ji aliyê pêkhênanê ve (Qeyis Kakil Tewfîq, 1995: 20).

Mînak:

3 - Ez çûm.

Di rêzkirina bingeha (binaxê) herdu pêkhênên hevoka xwerû ya nawik de herdem kirde li berahîyê ye û lêker pêy (dûra) tê, lewre “kirde di destpêka hevokê de pêkhatîye ji bingeha rêzkirinê û her wisa bi destpêka destpêkirina axaftinê amajê bê tê kirin” (Talib Hisên, 2014^a: 14). Wate yasaya rêzkirina pêkhênên hevoka xwerû ya nawik bi vî awayî ye.

Mînak:

Kirde + lêker

4 - Serdar hat.

Di girêya navî de hemû dema serek yê heyî, ku dibe nawik û bi çî şeweyekê nahête jêbirin. Her wisa çî yek ji pêkhênên din ên hevokê jî cihê wî serekî nagirin (Xerîbe Egîd, 2012: 31).

Mînak:

5 - Van du gencan yarî dikirin.

Di hevoka (5)ê de peyva “Genc” sereke ye û hebûna wê di hevokê de ya pêdivî ye, wate bê wê pêkhata hevokê têk diçe. Anko di girêya navî de nabe sere bê teref kirin.

1.4.1.2. Hevoka Xwerû Ya Berfireh

Ew hevoka ku ji bilî beşên serekî ên hevokê mîna kirde û lêkerî beşên din ên hevokê mîna bireserê neyekser, dîyarker, hevalkar...hwd bi xwe ve digire (Xerîbe Egîd, 2012: 32). Her wiha mebesta ji berfirehkirina hevoka xwerû tenê lêker nîne. Lewre hemû hevokên xwerû tenê yek lêkerî bi xwe ve digire, belkî mebest jê berfirehkirina beşên din yê hevokê newek rengdêr, hevalkar ... hwd û bêhtir bîna hejmara peyvên hevokê ye (Ebdullah Hisên Resûl, 2014: 52). Bo mînak em dikarin evê hevoka xwerû heta astekî zor berfireh bikin:

Mînak :

6 - Çûm.

7 - Ez çûm yarîgehê.

8 - Ez d, gel hevalên xwe çûm yarîgehê.


Her wisa cara bêhtir berfirehkirina hevoka xwerû bi zêdekirina hejmara navan û rengdêran dibe (Ebdullah Hisên Resûl, 2014: 53). Hevoka xwerû ya nawik bi rêya girêyên navî têne mezinkirin. Ew girê jî bo bêhtir dîyarkirina lêkerî têne di hevokê de pêkhênên mîna bireser, tamamkerker, serbar ... hwd beşdarî di berfirehkirina sereke pêkhata girêya lêkerî de dikin. Wate hevoka xwerû ya mezinkirî, ew hevoke ya ku ji xeyirî girêya navî kirde û girêya lêkerî lêker hinek girêyên dî yê navî tê de ku bi erkên bireserê re yekser û neyekser, tamamker, hevalkara demî, cihî, çawayî radibin (Segvan Miho, 2012: 53). Ew hevoke ye ku hemû pêkhênên sentaksî yê serekî ya hevokê tê de hene; Mîna kirde, bireser, lêker ... hwd. ku yekser wateya xwe derdibire (Talib Hisên, 2014^a: 99).

Mînak:

9 - Şermînê xwarîn bo mêhvana lêna.

Şirovekirina hevoka (Şermînê xwarin bo mêhvana lêna) bi rêka darasa:

Şermînê xwarin bo mêhvana lêna.



Beşên serekî yên hevoka xwerû ya berfireh ji kirde û lêkerî pêk tên. Her wisa beşên wê yên neserekî ji bireserû temamker pêk tên (Qeyis Kakil Tewfîq, 1995: 21). Her wiha hevoka xwerû ya berfireh digel lêkerê negerguhêz de bêhtir ji du peyvan û digel lêkerê gerguhêz de bêhtir ji sê peyvan bi xwe ve digire. Wate ji keyrî peyvên lêker û kirde û bireserê neyekser pêvekan jî bi xwe ve digire (Dizeyî, 2011: 71).

Mînak:

10 - Kurê Azadê cîranê me duhî êvarî li nêzîk gelîyê Zaxo tirumbêla wî wergerîya.

1.4.2. Hevoka Hevedudanî (Compound Sentence)


Hevoka hevedudanî ew cureyê hevokê ye ku bi kêmasî ve ji du hevokên xwerû pêk tê û bihevra tene girêdan (Mukrîyanî, 1986: 71). Ew herdu hevok jî serbixwene ji her alîyekî ve wek sentaksî, wateyî...hwd (Aso Ebdulrehman, 2014:115). Her wisa hevoka hevedudanî wan cureyên hevokan bi xwe ve digire ku bêhtir ji lêkerê di nav de heye û her lêkerê hevokê serbixwe pêk te. Belê tevlibûneke hevbeş di navbera wan de heye. Mîna hevbeşî di girêya navî de çî kirde be yan bireser (Ebdullah Hisên Resul, 2014: 33). Di hevoka hevedudanî de daçeka girêdanê dewirekê girîng û serekî dibîne di destnîşankirina cureyên hevoka girêdayî de (Xoşnaw, 2014: 49). Ew girêdan jî bi rêya daçekê ye. Eger ew daçeke jî bête rakirin, wî demî her yek ji wan hevokan dibine hevokên azad û çî girêdan jî bi hevoka din ve namîne (Norî Elî, 2013: 59). Ew daçek jî nakeve di nava hevokê de, belkî bi tenê hevokan bihevra girê dide (Şilêr Resûl Mihemmed, 2004: 39). Ji ber ku daçeka girêdanê di hevoka girêdayî de bi tenê karê wê bihevra girêdana hevokane û nakeve di nava dariştina hevokan. Anko beşdarîyê di avakirina hevokê de nake. Belkî bi tenê di navbera hevokan de tê bikaranîn (Mukrîyanî, 1986: 71). Anko çî pêwendîyên rêzimanîpêkhênên pêkhata hevoka girêdayîbihevra girênadin. Lê belê pêwendîya wan bi tenê di daçekê de ye û bê we di serbixwene, çî pêwendî digel yek namîne (Pesar Mihemmed, 2013: 56). Di hevoka girêdayî de hevokbi rêya daçekê girêdanê tene girêdan (Gordon, 2007: 73).

Bi wateyake din her dema du hevok yan bêhtir digel hev hatin. Çî bi sedemê daçekê be, yan peyvekê yan jî dibe bê daçek jî pêwendîyeke wateyî di navbera wan de hebe. Vê demê herdu hevok jî di wekhev bin û yek ji wan beşek nabe ji ya din li wê demê girêdan peyda dibe (Ferhadî, 2008: 192). Her wisa bihevra girêdana hevokên giredayî bi rêya bêhnokê ye ku di navbera wan hevokan de tene û ev bêhnokê jî cihê daçeka girêdanê digrin û bi “,” diyar dibin. Dîsan her yek ji wan hevokan jî hem ji alîyê rêziman ve, hem ji alîyê wateyê ve di serbixwe ne. Çî pêwendîyeke rêzimanî ya taybet digel hevdu nînin û dikarin tenê bêne bikaranîn. Hêjayî gotinê ye, di hevokênhevedudanî de hejmara hevokan li gor hejmara lêkeraye. Anko her girêyekê çend lêker hebin, bi heman şêwe, wê hin hevok hebin (Xerîbe Egîd, 2012: 34).

Mînak:


Hevoka xwerû+ daçek + hevoka xwerû = hevoka hevedudanî.

11 - Ew hat û ez çûm.



Her wisa hejmareke bê dawî ya hevokan dikarin beşdarîyê di dariştina hevoka hevedudanî de bikin (Mihabad Ebdullah, 2010: 39). Bi alîkarîya daçekan.

Mînak:



Li gor lêkolîner û pisporên zimanê Kurdî şeş cureyên hevokên hevedudanî hene.

1.4.2.1. Hevoka Hevedudanî Ya Hevrêk (Hawrêk)

Cureke ji cureyên hevoka hevedudanî ji du hevokan yan bêhtir pêk tê û bi rêya daçekên girêdanê tên sererastkirin. Ev cureyê hevokê ji aliyê encamdana karê hevokan ve hevrêkin û bi zorî karê hevokan ji şewêya erêda tene dîtin wek araste

(Xoşnaw, 2014: 49). Her wisa ev cureyê hevokê bi zorî bo wesifkirinê tê bikaranîn (Mukrîyanî, 1986: 72). Ew daçekên bejdar di dirustkirina hevoka hevedudanî ya hevrêk pêk tên ji “û, her wisa, dûra” ne (Xoşnaw, 2014: 49). Her wisa bêhtirîn daçeka girêdanê ya vê cureyê hevokê daçeka “û” ye. Ji bilî wê yekê ku dibe, ev cureyên hevokan bi daçekên “*paş, dûra, her wisa*” bihêne girêdan. Lê gelek caran, bê daçek jî bihevra têne girêdan û di nivîsînê de bêhnokek “,” di navbera wan de tê danîn (Ebdullah Hisên Resul, 2014: 34).

Mînak:

12 - Dilşad ji xewê rabû û çavên xwe şûştin û cilkên xwe li ber xwe kirin û çû xwandingehê.

Dibe jî ku li cihê her daçeka (û) ya girêdanê yek ji van daçekên din jî bikarbîne mîna paşê, her wisa, her wiha, dûra...hwd.

Sîdra ji xewê rabû *dûra, her wisa, paşê, her wiha* çavên xwe şûştin dûra cilkên xwe li ber xwe kirin dûra çû xwandingehê. Em dikarin her li cihên wan daçekên bihevra girêdanê çî tiştî danenin bi tenê dikarin bêhnokekê”, “ danin.

Mînak:

13 - Sîdra ji xew rabû, çavên xwe şûştin, cilkên xwe li ber xwe kirin, çû xwandingehê.

Di van hevokên li jor ji bilî daçekên bihevra girêdanê du faktorên din ji bûne sedemêbihevra girêdana evan hevokan. Hevoka yekan hevbeşe di kirdeyî de ya duyem hemû lêker ji borîyê saden û yek li du yek hatine rûdan (Ebdullah Hisên Resul, 2014: 34). Her wiha ev cureyê hevoka girêdanê wan hevokan bi xwe ve digire ku lêkerê hevokên wê ên xwerû yek li du yekê rûdidin (Ebdullah Hisên Resul, 2014: 68).

1.4.2.2. Hevoka Hevedudanî Ya Berevajî (Pêçevan)

Armanç ji hevoka girêdayî ya berevajî ew hevokin, ku berevajî, cudahî û dijatî di navbera du dîyardan yan du bûyer yan du hizra...hwd nîşan didin. Sedemê

derbirîna evê cudahî dijatî çawanîya derbirîna hêzê ye ku di hevoka yekem de awaza derbirînê bilind dibe di heman dem de di hevoka duyem de nizim dibe (Mukrîyanî, 1986: 74). Wate hevoka piştî daçeka girêdanê berevajî hevoka berî daçekê dibe. Anko eger ji encamê bûyera hevoka yekem çaverê erêya hevoka duyem bîn. Ev jî berevajî dibe nerê û ger çaverê nerê bîn dê bibe erê (Yosif Norî, 2015: 111). Divê berî daçeka girêdanê hemû deman bêhnok bê.

Hinek ji wan daçekên di hevokên girêdayî ên berevajî tê. Mîna belê, belkî, eger çi, her çende, digel wê yekê jî... hwd.

Mînak:

13 - Heval qutabîyek zîreke, belê na xwînit.

14 - Eger çi Heval qutabîyek zîreke jî, belê naxwînit.

15 - Her çende Heval qutabîyek zîreke jî, belê naxwînit.

16 - Digel wê çendê jî ku Heval qutabîyek zîreke, belê naxwînit.

1.4.2.3. Hevoka Hevedudanî Ya Helbijartî (Cudaker)

Ev cureyê hevokê, pêwendîya cuda ya di navbera hevokan de dinirxîne. Cureke ji cureyên hevoka girêdayî, ji du hevokan yan bêhtir pêk tê. Di vî cureyê hevokê de, tenê caran yek ji karên wê jî bi şewazê helbijartinê bicihanîn (Xoşnaw, 2014: 50). Tenê bi rêya daçeka yan bihevra tene girêdan yan jî di destpêka herdu hevokan de dubare dibin. Ev jî behra bêhtir di gotinên mezinan de tene berçav (Ebdullah Hisên Resul, 2014: 35).

Mînak:

17 - Yan rûne yan here.

18 - Yan bila baş bit yan nekire.

19 - Yan zana be yan pirsyarker be.

Bi şêweyekî giştî ev cureyê hevoka girêdayî wan hevokan bi xwe ve digire ku nerîn yan jî karê yek ji hevokên bi şêweyê helbijartin bicih dike. Ev helbijartin jî bi şêweyê guman, pirsyar, ferman, daxwazî dibe (Yosif Norî, 2015: 114).

1.4.2.4. Hevoka Hevedudanî Ya Nerênî

Cureke ji cureyên hevoka girêdayî ye ji du hevokan yan bêhtir pêk tê. Ev hevok jî bi şêweyê nerê de tînin û ti ji wan jî nayê bicihanîn. Daçeka “*ne...ne*” dewrekê serekî dibîne di temamkirina hevoka girêdayî ya nerênî de (Xoşnaw, 2014: 51). Her wisa hevoka cudaker pêwendîya cuda di navbera hevokan de xuya dike. Gelek caran ev hevokên han mîna şêweyên danîna wan divê rêzkirina peyv û wextê lêkerên wan be (Pesar Mihemmed, 2013:38). Her wisa hinek caran pê tê gotin bihevra girêdana du nerêyan (Ebdullah Hisên Resul, 2014: 35).

Mînak:

20 - Ne diçit û ne dirûnit.

21 - Ne dawetî me û ne şabaş çîme.

22 - Ne dimrit û ne baş dîbit.

Ev daçeka “*ne...ne*” pêwendî bi şêwazê nerê ve heye. Lewre ji sedemê vê daçekê şêwazê nerêkirinê bihêztir, kûrtir û karîgertir dibe. Ev daçeke di pêkhata ji nav de ya hevokê de nîne. Belkî bi tenê di pêkhata serve de di dema lêkdana du hevokên xwerû de tevî hevokê dibe (Yosif Norî, 2015: 113).

Mînak:

23 - Xirabî nahê ji bîrkin û başî hinda nabit.

Em dikarin vê hevokê li gor hêza axaftvan û bi rêya daçeka “*ne...ne*” bi vî şêweyê lêkbidin.

Mînak:

24 - Ne xirabî dihêt ji bîrkin û ne başî hinda dîbit.

Her wisa gelek caran ev hevoke daçeka “û” jî digel wan bikar tê. Her çende em dikarin daçeka “û” di hevokê de rabikin û li cihê wê bêhnokê danin.

Mînak:

25 - Ne xirabî dihêt ji bîrkin, ne başî hinda dibit.

Di hevoka (25)ê de li cihê daçeka “û” bêhnok hatîye dayîn.

1.4.2.5. Hevoka Hevedudanî Ya Demî

Mebest ji hevoka girêdayî ya demî wan hevokan bi xwe ve digire ku ji sedemê daçekên lêkdanê pêwendîya di navbera demê hevokên girêdayî de tê ronkirin. Wate daçek rolabihevra girêdana zincîra bûyerên demî yê hevokan dibîne. Her wisa ew daçekên digel vî cureyê hevoka girêdayî tene bikaranîn eve ne “*evca, dûra, heya*” digel wan hevalkarên rola daçekan dibînin, mîna “*paşê, di heman dem de, di demekê de, di berahîye de*”(Yosif Norî, 2015: 116).

Mînak:

26 - Em çûn Duhokê paşî em çûn Hewlêrê.

27 - Heta em çûn wêrê kes li wêrê nema bû.

1.4.2.6. Hevoka Hevedudanî Ya Mercî

Wan cureyên hevokan bi xwe ve digire ku bûyera hevokeke şert be jî bo bûyera hevokeke din. Belê herdu hevok ji alîyê pêkhatinê ve heman pileyên serbixwe hebin û wekhev bin (Yosif Norî, 2015, 117). Hinek ji wan daçekên di vî cureyê hevoka girêdayî de tene bikaranîn wek “*eger ne, yan jî*”.

Mînak:

28 - Zî were, yan jî ez dê çim.

29 - Bixwîne, eger ne dreñaçî.

1.4.3. Hevoka Aloz (Complex Sentence)

Ji hevokeke serekî û serbixwe (Main or Independent Clause) digel hevokeke neserekî û neserbixwe yan bêhtir pêk tê. Hevoka bend bi tamamî wateya xwe nade û pêdivî bi hevokeke serekî heye, da ku bikare wateya xwe ya tamam bide (Gordon, 2007: 73). Ev hevokên aloz ji aliyê rêzimanî ve cudane û wekhev nîn in. Bi rêya pîtên Girêdanê (Subordinating Conjunctions) bihevra têne girêdan. Mîna “*ku, çunkî, bo ,hindê, heya ... hwd*”. Ev pîte taybetin bi hevoka aloz ve û li destpêka hevoka neserbixwe tên (Hêro Ehmed, 2008: 36). Her wisa di hevoka aloz de çend lêker hebin hin hevok jî hene. Her wisa hevoka aloz ew hevokeye ya pêkhênêkê wê bi bendeka rêzimanî bi pêkhênê din ve tê girêdan. Di şîyan de nîne ev bende bête ladan, ji ber vê çendê pêkhênêkê vê hevokê serbixwe ye û pêkhênanê din bende (Bayiz Omer Ehmed, 2012: 52). Ji bo wan hevokan tê gotin ku du hevokên cuda ji aliyê sentaksî ve bi xwe ve digire. Wate hevoka aloz ji hevokeke serekî û hevokeke bend yan bêhtir pêk tê û daçeka gihandinê herdu hevokan bihevra girê dide (Pesar Mihemed, 2013: 44). Her wisa ew daçeka gihandinêtu caran li pêşîya hevokê nayê. Hevoka aloz wan cureyên hevokên ne xwerû bi xwe ve digire, ku bêhtir ji hevokeke sade pêk tên. Di hemû hevokên xwerû de tenê hevokek serekî ye û tu nikarî bidî alîyekî ku dibêjinê hevoka serbixwe û hemû hevokên din neserekîne. Tu dikarî bidî alîyekê ku jê ra dibêjine hevoka bend. Her hevokeke bend pêkhênêkê hevoka serekî şirove û eşkere dike (Ebdullah Hisên Resul, 2014: 37).

Mînak:

30 - Eve ew malin yên te jê digot.

Li vêrê her çende larista²bend “yên te jî digot” ketîyê pişt larista serbixwe jî, belê benda wê (yên) her pêra ye û nehatîye ladan û larista bend bi wê cureyê dike.


Mînak:

31- Min ew berê girêl bûyî, dît. (Bayiz Omer Ehmed, 2012: 48).


²**lariste (clause)** : Lariste û hevok du daneyên havoksazîyê ne. Ev herdu dane ji aliyê taybetmendî û pêkhat û pêkhênan ve hinek xalên hevpişk û jihev cuda hene. Gelek caran mîna yek babet têne behis kirin. Ev herdu daneyan pêwendî bihevra hene. Lewre tê gotin lariste ji hevokê biçûktire û ji girê menzin tire (Nermîn Elî, 2017 :45).


Şirovekirina hevoka (31)ê bi rêka darasa:

Min ew berê girêl bûyî, dît.



Girêl bûyî






Hevoka aloz ji du beşan pêk tê:

A - Larista Serbixwe (Independent Clause):

Hevokêke serbixwe ye û bi tena serê xwe tê û bi tenê jî wateya xwe dide û pêwendîya rêzimanî digel derveyî xwe da nîne (Aso Ebdulkerîm, 2014: 124). Wate ji komeka peyvan pêk tê ku kirde û lêker digel da hene. Her wisa dikare hizreke rast û temam bide dest. Anko di şîyan de ye mîna hevokêke cuda bê nivîsîn (Lee Brandon & Kelly Brandon, 2011: 57). Hebûna hevoka serbixwe di hevoka aloz de bi zorî ye. Belê hevoka bend hebûna wê bi arezû ye û dibe bête ladan bê ku bibe sedemê sererastkirina hevokêke nerêzimanî (Xoşnaw, 2008: 110).

Mînak:

32 – Dilşadî stiranekdi wê ahinga ku em çûyinêgot.



B - Larista Bend (Dependent Clause):

Larista bend her dem bi bendeka rêzimanî bi larista serbixwe ve tê girêdan ku di şîyan de nîne ev benda rêzimanî bi bête ladan û ev pîverê vê cureyê hevokê ye.

Larista bend hemû deman pêkhênêke larista serbixwe dide dîyarkirin, anko dibe dîyarkerê girêyeke larista serbixwe. Ji ber hindê barê bêhtir dikeve pişt wî pêkhênê dide dîyarkiri. Anko dikeve di nav larista serbixwe de. Belê hinek caran kurt dibine pişt larista serbixwe jî, bi taybet, eger larista bend bibe dîyarkerê temamkerê larista serbixwe (Bayiz Omer Ehmed, 2012: 47). Her çendê behra bêhtir ya zimannasan larista bend bi tenê bi hevoka aloz ve girê didin. Belê larista bend di herdu cureyên hevokan de, wek “hevdundanî û aloz” bikar tê. Bi taybetî eger laristeka nerêzimanî di gel hevoka girêdayî de bikar bê, wê demê ew laristên rêzimanî yên

digel bikartên bend dikevin bi ewê larista nesîstemî. Her çende eger ji derveyî hevoka girêdayî deazad bin. Belê her dema çûne, di nava hevokê de larista nesîstemî desthilatê li ser dike û bend dike. Lewre ew lariste hejmar û rêja lêkerê wan destnîşan dike (Pesar Mihemmed, 2013: 56).

Mînak:

33 – Erêbêwar hat? La.bend La.serbixwe

Her wekî xuya larista nesîstemî ya (nerê) bi tenê daxwaza yek lariste kirîye, cureyê lêkerê wê jî divê ragehandin be. Wate hemû desthilata hevoka dîyarkirî di destê larista nesîstemî de ye, lewre laristên digel bi bend têne hejmartin.


Larista bend ew beşa serekî ye di hevoka aloz de. Her çende ku pêkhênên serekî yên hevokê tê da hene, belê bi tenê nikare wekî hevokeke temam û serbixwe bikar bê. Belkî ji alîyê wateyê ve girêdayî hevoka serekî ye (Şilêr Resûl Mihemmed, 2004: 41), û li gor erk û dewrên cuda cuda bo (sere)yî dizivire. Her wisa daçeka gihandinê jî di gel de bikar tê, anko li vir em dikarin bêjin ku larista bend ji alîyê wateyê ve mîna peyvekê yan rêxistinekê di hevoka aloz de lê te. Bo mînak “navî, rengdêrî yan hevkarî”lê tê (Xerîba Egîd, 2012: 37). Her wisa agahîyên bêhtir derbarê larista serbixwe dide dest (Dizeyî, 2013: 73). Larista bend laristeka neserekî ye. Lewre bi tenê dewrê dîyarkerî dibîne û bi tena serê xwe jî nayê û dîsan wateya xwe jî nade. Belkî wateya wê bi wateya larista serbixwe ve girêdayî ye (Xoşnaw, Nerîman, 2014: 51). Karê evê hevokê temamkirina wateya larista serekî ye ku ew larista serekî biryara serekî di nava wê de ye. Her wisa rûhinkirinekê dide li ser ew an laristêndigel alîkar bin (Yeşilöz,Zafer,2011: 124). Larista bend hertim bi bendeka rêzimanî bi larista serbixwe ve tê girêdan ku di şîyan de nîn e ev benda rêzimanî bête ladan. Larista bend hemû deman pêkhênêkê larista serbixwe dide dîyarkirin, anko dibe dîyarkerê girêyeka larista serbixwe, ji ber vê çendê bara bêhtir dikeve pişt wî pêkhênê dide dîyarkirin. Anko dikeve di nav larista serbixwe de. Belê hinek caran kurt dibine pişt larista serbixwe jî bi taybetî eger larista bend bibe dîyarkerê temamkerê larista serbixwe (Bayiz Omer Ehmed, 2012: 47). Her pêkhatyek pêwendîya rêzimanî digel derveyî xwe hebe dibe pariste. Her wiha dibe alavek ji bo

sererastkirina hevokê. Gelek caran pêkhênên wê cihên xwe di guherin lewre dibine beşek ji biwêj, caran jî dibine peyv (Dizeyî, 2011: 32). Hevokê bend dibe temamker bo hevoka serbixwe da ku ew hevok bikare wateyeka temam bide.

Ku ev hevokên alîkar têne hejmartin ji hevokên bend. Çêdibe hevoka bend bi alîkarîya daçekeka pêwendîyê bi hevoka serekî ve bête girêdan yan bê daçek jî çêdibe bêne girêdan.

Mînak:

34- Ew korê ku dixebite, hevalê min e. (larista bend)



35 - Mijê berçavên min girtin. —————→ Hevok

36 - Dema mijê berçavên min girt. —————→ La.bend

37- Azad her çende yarîzanekê zîrek bû, gol ne kir. ~~H.Aloz~~

1.5. Rêzkirina Pêkhênan

Rêzkirina pêkhênên hevokê ji zimanekê ji bo zimanekî din tê guhartin. Zanayên zimanî li gor rêzkirina berbilava kirde, bireser û lêkerî zimanan dikine sê cure wek “SOV, SVO, VSO”³ (Şuhde û...hwd,2006: 154). Pirañiya zimannasên Kurd li ser wê yekê kokin ku zimanê Kurdî ji zimanên şaxa “SOV” ye, anko rêzkirina pêkhênên serekî yê hevokê di zimanê Kurdî de “kirde, bireser, lêker”e (Segvan Miho, 2012: 51). Wateya rêzkirina pêkhênêndîyardeyeke girînge di zimannasîyê de. Lewre ji sedemê evê dîyardê dikare cihê zimanî di nava zimanên cîhanê de dîyar bike (Ebdulbaqî Ehmed, 2012: 17). Wateya rêzkirina pêkhênên hevokê di her zimanekê de li gor yasayên hevoksazî yê taybet bi wî zimanî ve têne destnîşankirin. Her wisa bi rêya wan yasayan cureyên zimanan ji hev têne cudakirin. Ew pêkhatine jî li gor rêzkirina pêkhênên hevokê berhem tîn, ji ber ku pêkhata hevokê û çawanîya berhemanîna wê di her zimanekê de li gor sîstemê rêzkirina pêkhênên hevokê tê girêdan (Nermîn Elî, 2017: 27). Di hevoka zimanê Kurdî de eger lêkera hevokê gerguhêz be, pêkhênên hevokê dê bi şeweyê “SOV” bin, anko kirde, bireser, lêker. Lê

³SOV : Subject (Kirde), object (bireser) û verb (lêker).

SVO :Subject (Kirde), verb (lêker) û object (bireser).

VSO : Verb (Lêker), subject (kirde) û object (bireser).

eger lêkera hevokê negerguhêz be, dê pêkhênên hevokê bi vî awayî “SV” anko kirde, lêker bêne rêzkin.

Xuya ye her zimanek ji bo rêzkirina pêkhênên hevokê yasayên taybet bi xwe ve hene, wate ew binemayên serekî yên di rêzkirina pêkhênên zimanekê de pabendî dibin. Anko rêzkirina pêkhênan bi şeweyekê tevlihev kirî nabe. Evçax dema axaftvanê zimanî diaxive ji yekeyên biçûk yên zimanî cure dike. Ji bo sererastkirina yekeyên mezintir, ta digihê çêkirina hevokê... hwd. Pirûsa pêkhênana yekeyên mezin bi rêya rêzkin û rêxistina pêkhênan tê encamdan (Talib Hisên, 2014^a: 14).

Hevok bihevra hatin û girêdana pêkhênan bi destve tê. Belê hemû cureyên bihevra hatina pêkhênan û girêdana wan bihevra nabe hevok. Lewre bikaranîna pêkhênan bê li berçav girtina sîstema rêzkirina taybet hevok dirust nabe (Baqirî, Mehrî, 2005: 156). Helbet di rêzkirina zimanên cîhanê de sê pêkhênên serekî hatine destnîşankirin. Ew jî kirde, bireser, lêker bi wateyeka din rêzbandîya kirde, bireser, lêker, mîna pîverekê hatine nîşandan. Di asta hevoksazîyê de bo hêlengandina zimanan li gel hev be. Lewre rêzkirina pêkhênên hevokê di zimanan ji hev cudan. Li gor evê rêzkinê em dikarin cureyên zimanan ji hev cuda bikin. Lewre ev rêzbandî ji zimanekê bo zimanekî tê guhartin. Eger her sê hêmayên lêk bidin dê şeş rêzbûn peyda bin (Nermîn Elî, 2017: 27).

Cudahîya rêzimana zimanan ji sedemê taybetmendîyên ew mijarên neguhere (parameter) ku di herdu astên morfolojî û sentaksî de tê dîtin. Eger teqezî li ser rêzkirina pêkhênan di nava hevokên zimanan de bikin, wê cudahîya rêzkirina pêkhênan ji şeweyê binema û mijarên neguher Principle û Parameter bi mijarên neguherên zimanî tên hejmartin ku rêzkirina pêkhênên zimanê Kurdî mijarên neguher yên taybet bi xwe ve hebin. Bi giştî “SOV” in û dibe bi vî şeweyê li xwarê be (Tariq Mehmûd, 2014: 97). Mînak:

K + Bi + L 38 - Dilşadî wane xwand.

K+ Bi + L + T 39 - Dilşadî pertûka xwe da te.

K + L 40 - Dilşad hat.

K + T + L 41 - Dilşad mamosta bû.

K + L + T 42 - Dilşad dê bite mamosta.

K + Bi + T + L 43 - Ez te bi zîrek nas dikim.

Bi dîtina Green Bergî ji ber ku kirde hemû deman li pêşîya bireser te. Lewre ji evan şeş rêzkirinan rêzkirina “SOV, SVO, VSO” di zimanên cîhanê de derdikevin. Ji ber vê çendê zimanên cîhanê dibine sê cur (Dizeyî, 2013: 54).

Rêzkirina pêkhênên hevokê ji zimanekê bo zimanekî din tên guhartin. Zimanê Kurdî ji zimanên “SOV” ye. Yanê rêzkirina bingehî ya pêkhênên hevokê di zimanê Kurdî de kirde, bireser, lêker e.


Mînak:

Kirde + bireser + lêker

44- Min zarok nivand

Şirovekirina hevoka (44)ê bi rêka darasa:

Min zarok nivand.



Ev cureyê rêzkirinê dema lêkerê hevokê gerguhêz be li wî demê peyda dibe. Anko li ber lêkerê bireserê hebe, li wî demê ew lêker dibe gerguhêz. Belê eger lêker negerguhêz be anko ew hevok bireser tê da beşdar nîn e bi tenê ji kirde + lêker ê pêk tê.

Mînak:

1.6. Pêkhênên Hevokê

Ziman pêkhatîyê ji komeke hevokên dîyarkirî û hevok jî ji komeke parçeyên dîyarkirî pêk tê (Chomsky, 1957: 13). Wateya hevok ji çend pêkhênên dîyarkirî pêk tê kuli gor çend yasayan hatîne dariştin e. Anko hevokpêkhênên serekî û neserekî bi xwe ve digire. Pêkhênên serekî ew pêkhênên yên ku roleke serekî di çêkirina hevokê de dibînin mîna kirde, lêker ... hwd. pêdivî ye di hevokê de hebin. Lewre bê wan hevok tamam nabe û pêkhênên neserekî jî mîna bireserê neyekser û hevalkar...hwd. arezûdar in. Em dikarin bikar neyinin.

1.6.1. Pêkhênên Serekî Yên Hevokê

Ew beşên hevokê ne di pêkhatina her hevokekî de beşdarîyê dikin û hevok ji alîyê pêkhênanê ve bê wan pêkhênan tamam nabe. Digel vê jî mirov nikare jê bibe, xurtîn û nayên lêdan. Lewre kar li pêkhatina hevokê dikin. Pêkhênên serekî li gor lêkerê hevokê tên guhartin. Di rêzimana Kurdî de eger lêker gerguhêz bû wî demî pêkhênên "kirde, bireser, lêker" dibin. Eger lêker negerguhêz kirî be wî demî pêkhênên serekî dê kirde û lêker bin (Tariq Mehmûd, 2014: 99). Her wisa axaftinker bo plana her hevokekîpêkhênên serekî di hîlbijêre û ev çende jî peykerê giştîyê hevokê tamam dike.

1.6.1.1. Kirde (Subject)


Kirde ew pêkhênanê serekîyê hevokê ye ku hebûna wî di hevokê de bi zorî ye. Kirde wekî girêyeke navî li jêr desthilata hevokê de ye. Di zimanê Kurdî de jî li pêşîya hevokê tê û bi karê hevokê radibe (Ehmed Hesên Fethullah, 1990: 5). Xwe di yekem girêya navî ya hevokê de dibîne, lewre her yekeyeka rêzimanî bikare dewrê beşekê serekî yê hevokê bibîne girêyekê pêk tîne (Wirya Omer Emîn, 2004: 199). Ji ber ku çî hevok di rêzimana zimanê Kurdî de bê kirde nînin (Dilvîn Salih, 2016: 9). Her wisa di zimanê Kurdî de dibe kirde navekê taybet, giştî, nasyar, nenasyar, yekjimar, pirjimar ... hwdbigire. Anko dibe kirde di nava hevokê de cînav

be evçax çî cînavê serbixwe be yan pêvek yan ... hwd (Xoşnaw, 2014: 67-68). Ji sedî nodê zimanên cîhanê kirde li destpêka hevokê tê (Tallerman, 1998: 16). Zimanê Kurdî jî yeke ji wan zimanan ne. Di hevoka zimanê Kurdî de lêkerê wê çî gerguhêz be yan ne kirde li destpêka hevokê tê.

Li goreyî ev çenda me li jor qal kirî, em dikarin bi vî şeweyî kirdeyî pênase bikin; Ew pêkhênanê hevokê ye ku bi erkê kirin yan ne kirina karî yan jî rûdan yan rûnedana karekî radibe û hertim girêyeka navî ye.

Mînak:

46 - Umêd hat.



 Kirde lêker


Di hevoka (46)ê de peyva Umêd bi erkê kirdeyî rabûye, anko kirdeyê vê hevokê Umêd e. Çinkî karek kirîye û bi erkê lêkerê rabûye.

Ji ber ku di zimanê Kurdî de çî hevok bê kirde nînin, lewre em hinek caran pêkhênanê din bi kirde dizanîn. Her çende ew bi xwe di binyat de kirde jî nînin, evçax li jêr dê behsa çend kirdeyan bikin ku me dabeşî sê cureyan kirine, ew jî:

A - Kirdeya Rasteqîn (Logical Subject):

Di zimanê Kurdî de nivîsarên zimanî komeke pênaseyan ji bi kirdeyî dîyar kirine, ku hemû di çarçoveyêke bingeh de kom dibin. Ew jî derketina yekser ya kirdeyê ye di nav hevokê de ew kirde jî yan nave yan jî cihanave ku di nav hevokê de erkê xwe bicih tîne (Xoşnaw, 2016: 101). Wate ew kirdeye yê ku bihez û vîyana xwe karekê encam dide yan encam nade (Bayiz Omer Ehmed, 2012: 42). Anko dibe bûyer yan encamdana karê hevokê bê encamdan yan ne. Bê ku cih û erkê beşekî din yê hevokê bigire (Kawan Îsmâîl Xelîl, 2013: 18). Wateya kirdeyê lojîk pêkhatîyê ji kirdeyê rasteqîne yê lêkerî, eger çî li cihê kirdeya asayî de bikar nehatibe yan jî hatibe bikaranîn (Xolî, 1982: 160). Di piranîya wan hevokên ku lêkerên wan gerguhêz in, ew pêkhênanê ku dibe kirdeya rêziman her di heman dem de dibe kirdeya lojîkî ji. Mînak:

47 - Dilşadî wane xwand. Kirdeyê rasteqîne




Di vê mînakê de peyva Dilşad ji alîyê rêziman û lojîkî ve kirdeya hevokê ye, lewre ji alîyê rêzimanê ve cihê kirdeyî girtîye û ji alîyê lojîkî jî ve kirdeya rasteqîn ya lêkerî ye, yanê wî ew kar encam daye. Anko di vê hevoka li jor de “lêkerê xwandin” bi hez û xwesteka kirdeya hevokê hatîye encam dan. Ji ber wê çendê di bibêjinê kirdeya rasteqîn.

B - Kirdeyê Rêzimanî (Grammatical Subject):

Di pîranîya zimanên cîhanê de hejmareke zor ya pênaseyan ji bo kirdeyê rêzimanî hatine gotin. Hemû jî li ser wê yekê lihevin ku bi tenê ne derketina kirdeyê di hevokê de ev cureyê kirdeyê derdikeve. Wate ew cureyê kirdeya ya bihez û vîyana xwe bi karekî ranebe. Anko ji ber ku kirdeya rasteqîn di hevokê de nîne, wate di hevokê de ew bi xwe kirde nîne. Lê di rêzimanê de ew cihê kirdeyê digire (Bayiz Ehmed Omer, 2012: 42). Ji ber ku kirde di hevokê de nayê dîtîn, lewre bireserê yekser li cihê wê tê danîn. Ji ber vê çendê jî dibêjinê kirdeya rêzimanî. Her wisa kirdeya rêzimanî ew kirdeye ya ku hertim babetê axaftina kesekê yan tiştekî ye ku hevok li ser wî kesî yan tiştî ye.

Mînak:

48 – Pencer şikest. Kirdeyê rêzimanî


Di hevoka (48)ê kirde nedîyar e, wate ew kesê rabûyî bi şikandina pencerê. Lewre ji ber nebûna kirdeyî di hevokê de erkê wî keftîye ser birserê hevokê ku peyva (pencer)e û di şirovekirinê de dibêjinê kirdeyê rêzimanî. Her wisa digel hevokên kirde nedîyar xweya dibe.

C – Kirdeyê Hûyî (Kara):

Curek ji cureyên din yê kirdeyê, kirdeya hûyî ew kirdeya yê bihez û vîyana xwe karekî dike yan nake. Belê bi destê xwe nake, belkî karê xwe bi kesekê din dide kirin. Wate kar bi gotina wî/wê tê kirin ne bi destê wî/wê. Lewre dibe sedemê encamdanê (Nermîn Elî, 2017: 58). Her wisa ev cureyê kirdeyî bi tenê digel lêkerê “dan” tê, ew jî pêdivîya navê lêkerî digel hebe (Bayiz Omer Ehmed: 2012: 42). Her wisa dibe bersiva pîrsa (kê)? (Nermîn Elî, 2017: 58).

Mînak:

49 – Min xanî da avakirin. Kirdeyê hûyî

Di hevoka (49)ê de pêkhênê (min) kirdeyê hûyî ye, ji ber ku bûye sedemê encamdana lêkerê hevokê.

1.6.1.2. Bireser (Object)

Hevok ji komeke pêkhênan pêk tê, ku li gor çend yasayên hatine dariştin yek ji wan pêkhênan jî biresere. Ew pêkhênê bi rola bireserî radibe girêya navî ye. Ew zarave ku di şirovekirina erkê rêzimanî de bikar tê û amajê bi sererastkirina pêkhateya hevok û girê dike. Di rêzimana çavlêkirî de bireser ew kese yan tişte ye ku karê kirdeyî dikeve ser û bi armanca karî tê nav kirin (Xoşnaw, 2008: 62). Her wisa bo wan peyvên; nav yan cînav tê gotin ku dikevinê jêr bandora lêkerê (Xoşnaw, 2014: 115). Wateya ew nave ku lêkerê wê gerguhêz dibe, hinek caran jî cînav dibe (Dizeyî, 2014^a: 192). Her wisa ew navê ku kartêkirina lêkerî bi şêweyekê yekser yan neyekser dikeve ser (Xolî, 1982: 190). Bireser ew pêkhênane ku dibin girêya lêkerî ya hevokê da ye û mezin dike û karê kirdeyî dikeve ser (Xoşnaw, 2008: 63). Her wisa ew girêya navî ye a ku dikeve bin desthilata girêya lêkerî ve.

Mînak:

50 – Mamostayîwane got. Bireser

Bi Şêweyekî Giştî Du Cureyên Bireseran Hene:

A- Bireserê Yekser (Direct Object):


Ew biresera ya ku yekser lêkera hevokê temam dike, wateya di hevokê de çi bernav (amraz) li pêşîya vê cureyê bireserê bikar nayên (Dilvîn Salih, 2016: 11). Bi tenê digel lêkerê gerguhêz tê û di hevokê de mîna girêyeke navî serederî digel tê kirin. Her wisa dikeve bin kontrola lêkerî. Tu daçekên pêwendîyê li pêşîya wî nayên (Dilbirîn Elî, 2012: 49). Wateya bireserê yekser ku xwe di duyem girêya navî ya hevokê de dibîne, lê di bin kartêkirina lêkera hevokê de ye. Her wisa pêkhênêkî serekî yê hevokê ye eger lêkera hevoka gerguhêz be (Xoşnaw, 2008: 70). Bireser yekser ew e ku yekem car û yekser kartêkirina lêkerê dikeve ser û merc nîn e di

destpêka hevokê de bê (Xolî, 1982: 76). Her wisa bo wan peyvên tê gotin ku bi şêweyekî yekser dikevine jêr kartêkirina lêkera hevokê. Mercê serekî yê bireserê yekser ew e divê lêker hevoka gerguhêz be (Xoşnaw, 2014: 115). Her wisa digel wan hevokên ku lêkerê wan gerguhêz e hebûna wî bi zorî ye û mirov nikare bide (Xoşnaw, 2008: 66). Lewre bireserê yekser ew girêya navî ye ya ku yekser di bin desthilata girêya lêkerî de ye û bi rengê neyekser di bin desthilata ristê de ye (Bergette, 2004: 283). Bireserê yekser ew pêwendîya rêzimanî ye ku ji sedemê girêya navî peyda dibe û di nav girêya lêkerî de derdikeve ku ew jî duyem pêkhênanê bi xurtî ye di lêkerê gerguhêz de ku li jêr kartêkirina lêkerekê da ye (Trask, 1993: 82). Bireserê yekser ew girêya navî ye ku li jêr girêya lêkerî ya hevokê da ye û berfireh dibe û bersiva pirsekê dide ku bi “kê” yan “çî” dibe (Xoşnaw, 2008: 68). Her wisa ji aliyê girîngî û pûtendanê ve li rêza kirde û lêkerî da ye. Lewre ladana wî di hevokê de wateya hevokê têkdîçe (Salim Hesên Ezîz, 2016: 80). Bireserên yekser ew nav in ku bûyerên lêkeran bi şêweyekî yekser li wan dibin (Deham Ebdulfetah, 2006: 121). Li gor yasayên zimanê Kurdî her lêkerekî gerguhêz yan jî hevokek divê yek bireserê yekser di nav de hebe.

Mînak:

51- Jîmanê xwarin çêkir.

Şirovekirina hevoka (51)ê bi rêka darasa:



kirde

bi.yekser

lêker

Di vê hevoka li jor de peyva “xwarin” ketîye di bin kontrola lêkerê derbaz kirîyê hevokê de, ku peyva “çêkir” e û çî daçek jî li pêşîya wî nehatin. Her wisa bûye bersiva pirsyara “kî” ye. Ji ber vê yekê bûye bireserê yekser ya hevokê.


B- Bireserê Neyekser (Indirect Object):

Ew girêya navî ye ewa digel lêkerên gerguhêz û negerguhêz de tê (Pesar Mihemed, 2013: 15). Wan peyvan bi xwe ve digire ku bi şeweyekî neyekser dikevîne jêr kartêkirina lêkerî. Şertê derketina bireserê neyekser di hevokê de ew e ku berîya bireserê pêşgîrek yan daçekek bê (Xoşnaw, 2014: 119). Mebest ji biresera neyekser ew biresera ku bûyera lêkerê wî yekser nakeve ser. Belkî bi rêya daçekekî pêwendîyê dibe (Awerehmanî Hacî Marif, 2004: 69). Ew navê ku lêkerê wê bi ser de gerguhêz dibe (Dizeyî, 2013: 52). Ew pêkhênane ku ji sedemê daçekekî pêwendîyê tê serarastkirin jêra tê gotin girêya bend û li jêr girêya lêkerî ya hevokê da ye û berfireh dike digel vê bersiva pîrsekî dide ku ji “bi, bo, li, digel + kê”yan “bi, li, digel + çî” pêk tê (Xoşnaw, 2008: 92).

Mînak:

52 - Vejîn li ser banî nivist.

Şirovekirina hevoka (52)ê bi rêka darasa:



Kirde Hk.Cihî lêker

Bireserê neyekser herdem bi şêweyê girêyeke bend derdikeve û kartêkirina lêkerî ji sedemê daçekeke bend dikete ser (Kanebî, 2015: 124). Her çendî biresera neyekser herdem bi şêweyê girêyeke bende, belê divê wê yekê jî bizanîn ku her girêyeka bend jî biresera neyekser ye. Belkî dibe di girêya bend de erkê din jî mîna hevalkarî bibîne.

Mînak:

53 - Min bi tirmbêlê kar dikir.

Her çende bireserê neyekser pêkhênê neyê neserekî yê hevokê ye. Belê hinek caran di hinek hevokan de bireserê neyekser dibe pêkhênanê serekî û nahate ladan. Lewre ladana wî kartêkirinê li rêzimanîbûn yan wateya hevokê dike (Segvan Miho, 2012: 49).

Mînak:

54 - Me şîrê xwe kir penîr. → bireserê neyekser

55 - Me şîrê xwe kir.*

Anko ji vê mînaka li jor bo me dîyar dibe. Hinek hevok hene di zimanê Kurdî de bi ladana bireserê neyekser hevok wateya xwe ji dest dide.

1.6.1.3. Lêker (Verb)

Lêker yek ji pêkhênên serekî ye di her hevokê zimanê Kurdî de, ji ber ku ti hevok di zimanê Kurdî de bê lêker nîne. Evçax çî ew lêker bihêz be yan bêhêz be. Di zimanê Kurdî de mîna pêkhêneyeke serekî serederî digel tê kirin (Dilbirîn Elî, 2012: 19). Lewre zimanê Kurdî mîna hemû zimanên din ên Hindû - Ewropî pêkhatiya wî ya hevoksazî li ser lêkerê hatîye damezirandin (Nawxoş, 2018: 141). Ev beşê hevokê ji aliyê pêkhatinê ve ji girêyeka lêkerî pêk tê (Segvan Miho, 2012:46). Her wisa êkane peyve dikare dem û bûyera lêkerî destnîşan bik. Mebest ji bûyerê ew e ku tiştêk rûda be yan hatibe encam dan, merem ji dem jî dema ne borî û borî bi xwe ve digire (Xoşnaw, 2009^a: 51). Anko derbirîneke bo bûyera karekî di dem û cihekî

taybet de ye (Dizeyî, 2014^a: 83). Wate ew kar ji alîyê kesekî/ê tiştekî ve tê encam dan. Her wisa bêjeyekî serbixwe û watedare bûyerekê derbareyî kirdeyî radigihîne yan bizavekê di demekê destnîşankirî de berçav dike (Diham Ebdulfetah, 2012: 19). Anko wateya hevokê mîna cemserekî li dû lêkerî dizivire. Lêker ji bilî ku bûyerek û kirdeyekî berçav dike, her wiha ji çendîn pêkhateyên jêkve neqedîyayî û sistemeke aloz pêk tê, ku hemû bihevra fikir û mebesta lêkerî didin xweya kirin. Ew jî “taf, espêkt, rêje, binyat, nerênî, têperandin”⁴ (Bayiz Omer Ehmed, 2002: 4). Hemû pêkhênên hevokê çî yekser yan neyekser pêwendî bi lêkerî ve hene, dîsan her lêkerek li gor cure, şîyan û sirûştê xwe pêdivî bi çend pêkhênanan heye (Ferhadî, 2013: 32). Anko lêker pêkhênêkî desthilatdar e û pêkhênên pêdivîdi hevokê de destnîşan dike (Sanya Cebar, 2012: 19). Her wisa ew peyve ya ku tê hejmartin bi dînemoya hevokê. Hemû xwêndingehên zimanî Firensî, Rusî û Îngilîzî heya dîtinên dêrîn jî Yewnanî û Rumanî ... hwd. digel hindê ne ku lêker beşeke serekî û girîngê axaftinê ye. Her wisa lêker faktorê serekî yê pêkhênanana axaftineke bi rêk û pêk û têr wate ye. Dîsan demekê taybet û kesekî destnîşankirî û bûyereke berçav bi xwe ve digire. Her wisa di asta sentaksê de girêyeke serekî ye di hevokê de ku digel girêya navî hevokê pêk tînin (Şêrzad Sebrî & Araz Monîb, 2016: 300). Lêker weke pêkhênanekî peyvsazî û hevoksazî di herdu astên peyvsazî û hevoksazî de tê qal kirin. Di astê peyvsazî de mîna beşekî ji beşên axaftinê û di astê hevoksazî de kar pêkhênanekê serekî ye di hevokê de. Çimkî yek ji girîngtirîn beşên hevokê ye ku wateya serekî ya hevokê hildigire. (Silêman Îsmâil Receb, 2015: 87). Her dîsan pêdivîyên hevokê li gor cureyê lêkerî dibê. Lewre lêker xwedî desthilata hevokê ye û yekemîn pêdivîyên wê ye (Dizeyî, 2013: 48). Di zimanê Kurdî de, lewre lêker “GL”cînavên kirde û bireserî werdigire. Bi astê serî yê hevok û derketinê de girîngîyeka zêdetir ji “GN” heye, lewre dibê girêya navî di pêkhatina serî ya hevokê de dernekeve. Belê di zimanê Kurdî de hevok bê derketina lêkerî dirust nabe (Dîyar Elî Kemal, 2002:50). Her wisa lêkera xwerû di zimanê Kurdî de nîne. Lewre lêker bi kêmasî ve dem û bûyer tê de ye (Dizeyî, 2013: 49).

Lêker di zimanê Kurdî de roleke girîng di avakirina hevokê de heye, belê ew lêker hemû deman weke yek nîne. Lewre bi rêya cureyên lêkerê hevokê em dikarin cureyên hevokê destnîşan bikin û ji hev cuda bikin. Lêker ji alîyê hebûnê ve curekê

⁴Pêkhênên pêkhata binyatê lêkerî ne. Her yekji wan jîdabeşîçendcureyandibin.

din yê hevokê dîyar dik. Lewre her lêkerê di zimanê Kurdî de ji alîyê hebûnê ve wergirîn yan lêkerê bihêze yan bêhêze. Wate lêker ji alîyê hebûna ve dibe du cure:

A - Lêkerê bihêz.

B - Lêkerê bêhêz.

A-Lêkerê Bihêz:

Ew lêkere yê ku dikare bi yek binyat ve hemû demên lêkerî yan jî behra bêhtirîya wan bikarbîne (Bayiz Omer Ehmed, 2012: 10). Di zimanê Kurdî de dîyarkirina lêkerî ji alîyê hêzê ve kartêkirina xwe li ser cureyê hevokê dike. Ji bo ku lêker di zimanê Kurdî de gerguhêz e yan negerguhêz e (Selwa Salih, 2009: 22). Wate lêkerê bihêz jî dibe gerguhêz be, yan negerguhêz be û ji alîyê demî ve dibe sê cure “borî, niha, bê” wek bi vî awayê nexşeya li jêr dîyarkirî:

Mînak	Pît	Dem	
ç : binyat Dilşad çû Ø: m.rêkeftinê		û : nî ta borî	borî
D : n.t. niha Dilşad diçît E : p.rêkeftinê		ç:binyat	niha
Dê : nî.ta.dahatî Dilşad dê çît ît : m. rêkeftinê	ç: binyat		dahatî

B-Lêkerê bêhêz:⁵

Ew lêker ya ku nikare bi yek binyat hemû tafên lêkerî yan bêhtirîya wan derbibire. Lêkerên bêhêz di dîyalêkta serî ya zimanê Kurdî de ev in “lêkerê hebûn, bûna keynûne, bûna seyore” (Bayiz Omer Ehmed, 2002: 25).

⁵ Bo bêhtir wergirtina agahîyan li dûr lêkerê bêhêz li van çavkaniyên li jor bizivire:
1.Ecîb Ebdullah,1998,kovara Metîn, hej: 79, r. 41-57.
2.Şêrzad Sebrî & Araz Monîb, 2016, Wuşesazî,r. 324-328.

Lêkerê Hebûn:Di binyat de pêşgirê “h” diçe ser “bûn” û dibe “hebûn” (Wiryâ Omer Emîn, 2004: 318). Di zimanê Kurdî de lêkerê hebûn dibite gerguhêz û negerguhêz (Ecîb Ebdullah, 1998: 53). Wate lêkerê hebûn yê bêhêz ji alîyê hêzêve dibite gerguhêz û negerguhêz (Dilbirîn Elî, 2012: 24).

Mînak:

Gerguhêz	Negerguhêz	Dem
56-Mîn kar hebû	Ez hebûm	Dema borî
57-Mîn kar yê heyî	Ez heme	Dema niha
58-Mîn dê kar hebit	Ez dê hebim	Dema dahatî

Bûna Keynûne:Cureke ji cureyên lêkerê bêhêz ji alîyê şîyanan ve lêkerê negerguhêz e. Dîsan pîta binyat di dema niha de dibe çine. Her wisa di hevokê de ev cureyê lêkerî pêdivî bi temamkerê heye ku li pêşîya lêkerî tê ji bo temamkirina wateya wî. (Şêzad Sebrî & Araz Monîb, 2016: 325). Wateya hemû dema temamker dikeve pêşîya wî û çî caran li pişt wî nayê (Dilbirîn Elî, 2012: 75). Her wisa bûyerekek tê de heye. Mînak:

59 - Jîmana zîrek bû. ~~dema borî.~~ →

60 - Jîman zîreke. ~~dema niha.~~

61 - Jîman dê zîrek bit. → dema dahatî.

Bûna Seyore:Evê lêkerê pêdivî bi temamkerî heye. Ew temamkere jî yan li pêşîya lêkerî tê yan li dawîya lêkerî tê ku ji alîyê hêzêve lêkerê negerguhêz e. Lêkerê seyore ji alîyê hebûnê ve ne temame û bêhêze û ji alîyê şîyanê ve negerguhêz e (Bayiz Omer Ehmed, 2002: 37).

Mînak:

62 - Jîman bo nojdar. — (temamker li pişt “bûn”)

63 - Jîman zîrek bû. — (temamker li berî “bûn”)

Eger em berê xwe bidene van mînakên li jor dê bînin ku di hevoka yekem de peyva “nojdar” wekî temamker hatîye bikaranîn û ketîye piştî lêkerê “bûn” û di hevoka duyem de peyva zîrek wekî temamker hatîye bikaranîn. Belê ketîye berî lêkerê bûn. Lê di van herdu hevokan de tiştekê hevbeş yê heyî ew jî ew e guhartin di sîfetê kirdeyî de dibe. Wate di van herdu hevokên li jor de guhartin bi ser sîfetê kirdeyî da hatîye û ji barekê bo barekê din hatîye guherîn. Lewre dibêjinê bûna seyore (Dilbirîn Elî, 2012: 26).

Lêker ji alîyê hêzê ve dibe du cure:

1- Lêkerê gerguhêz (Transitive Verb).

2- Lêkerê negerguhêz (Intransitive Verb).

1- Lêkerê Gerguhêz (Transitive Verb):

Ew lêkere ku du boşahîya yan bêhtir di hevokê de pir dike û yek ji wan boşayan bireserê yeksere û kirdeyê nedîyar jê nayê sererastkirin (Xoşnaw, 2008: 47). Di hevokê de pêdivî bi hebûna du pêkhênan heye ew jî kirde û bireserê yekser in. Ew lêkerin yên pêdivî bi bireserî heyî û eger bireser nehêt wateya hevokê ya kême û ya temam nîne. Wate ew lêkerin yên kartêkirina bûyer û bûyera lêkerî ji kirdeyî derbazî bireserî dibe (Şêzad Sebrî & Araz Monîb, 2016: 328). Ku pêkhênek bi encamdana karî radibe û yê din ber bi lêkerê hevokê dikeve. Wate pêkhênek bi dewrê kirdeyî radibe û yê din erkê bireserî dibin. Lewre helbijartina pêkhênan li gor cureyê lêkerî xuya dibe (Nermîn Elî, 2017: 77). Di zimanê Kurdî de zimannasan gelek pênase ji bo hevokê kirine. Lê bi kurtî bêjin lêkerê gerguhêz ew e ku hêza wî kartêkirina wî ji kirdeyî derbazî bo ser pêkhênekê din dibe ew jî bireserê yekser e.

Mînak:

64 - Hevalî goşt kirî.


Di vê mînaka (64)ê de peyva Heval, kirdeyê nava hevokê ye bi karê kirina tiştekê rabûye ku ew jî “goşt”e li vêrê hêz ketîye ser bireserê yekser. Lêker jî ku “kirîne” lêkerekê gerguhêz e.

Ji taybetmendiyên lêkerê gerguhêz ew e ku dikare bireserekê yekser wergire yan jî bireserekê yekser û çend bireserên neyekser wergire yan jî bireserekê yekser û

du bireserên neyekser werbigire (Xoşnaw, 2008: 48). Anko di zimanê Kurdî de lêkerê gerguhêz bi tenê bireserêkê yekser werdigire.

Mînak:

65 - Dilşadî sêv ji gundîyan kirîn. bireserê yekser bireserê neyekser



Pêdiviyên lêkerê gerguhêz pêkhatine ji wan pêkhênên bi zorî û mirov nikare lade. Lewre dibe sedemê temambûna hevoka nerêzimanî ew pêkhênanin jî pêkhatayên ji kirde, bireserê yekser çê dibe.

Mînak:

66 - Wî xwarin xwar.

2- Lêkerê Negerguhêz (Intransitive Verb):

Ew lêkera ku yek boşahîyê di hevokê de pir dike û ew boşahî jî kirde û kirdeyê ne dîyar jî jê nahatîye sererastkirin (Xoşnaw, 2008: 47). Di hevokê de pêdivî bi hebûna pişkdarekê bi tenê heye. Ew lêkerin yên kartêkirina bûyera wan ji kirdeyî gerguhêz peyvên din yên hevokê nabe. Wate pêdivî bi bireserî nîne û wateya hevokê bi tenê bi kirdeyî a temame (Talib Hisên, 2014^a: 116). Ev cureyê lêkerî bi tenê pêdivî bi pêkhêneyekê serekî heye yê hevokê heye. Heya ku bikare bi encamdana karê hevokê rabe ew pêkhênan jî erkê kirdeyî di hevoka de dibîne.

Mînak:

67 - Vejîn nivist.

Di hevoka (67)ê de bandora lêkerê “nivist” bi tenê li ser vejînê rawestayê ku kirdeyê û ji wî nabore û derbazî peyvên din nabe.

Lêkerê Negerguhêz Dibe Du Cure:

Negerguhêzîya Asayî (Voluntarism): Di vî cureyê lêkerî de kirde bi hêza xwe karî encam dide.

Negerguhêzîya Bûyer (Involuntary): Lêker bê hêza kirdeyê tê encam dan (Xoşnaw, 2008: 47). Anko ew kes yan tişte yê bi encamdana wî karî raboyî ne bi hêz û vîyana xwe kirîye. Belkî dûr ji kontrol û mebesta xwe bûyer û kar bi egerekê ne rasterast û nedîyar hatîye kirin (Şêrzad Sebrî & Araz Monîb, 2016: 329).

Pêdivîyên lêkerê negerguhêzîya pêkhatîye ji kirdeyî.

Mînak:

66- Azad hat.

1.6.2. Pêkhênên Neserekî Yên Hevokê (Lawekî)

Ew pêkhênin di pêkhatiya her hevokekê de beşdarîyê nakin. Her wisa ev pêkhêne bê alîkarîya pêkhênên serekî yê hevokê nikarin hevokê pêkbînin (Ehmed Hesên Fethullah, 1990: 8). Di şîyan de ye bîn ladan jî. Çunkî arezûdarin (Tariq Mehmûd, 2014: 99). Anko ladana (veqetandina) van pêkhênan ji hevokê kar li rêzimanîbûn û guncandina wê hevokê nakin. Belkî di hevokê de agahîyên bêhtir didin guhdar û axaftinker (Segvan Miho, 2012: 44). Ji bo bêhtir rohinkirina û hayidarbûn li ser pêkhênên neserekî yê hevokê dê li jêr bi dirêjî li ser rawestî.

1.6.2.1. Rengdêr (Adjective)⁶

Ew beşê axaftinê ye şêwe û cureyê tiştan nîşan dide û bi ti deman ve girêdayî nîne. Mîrov pitirîya hestên xwe bi rengdêrî nîşan dide ku wesfa barûdoxekê yan tiştêkê dike. Rengdêr peyveke yan li pêşî navî yan pişt navî tê. Di girêya navî de û caran pêdivî bi nîşaneyê xistineserîyê hey. Her wiha peyva dibe rengdêr navekê dîyar dike (Şêrzad Sebrî & Araz Monîb, 2016: 285). Her wisa bêjeyeke peyrewê bi navê berî xwe ve girêdayî ne û reng û rewşa wî navî dîyar dike. Rengdêr ne ji hêmayên hevokê yê serekî ye. Lê wê têrtir dike û wateya wê ronîtir dike (Deham Ebdulfetah, 2012: 309). Rengdêr beşeke ji beşên axaftinê ku wesfa navekê yan cînavêkê dike. Bi vî egerî dibe tamamkerê navekê yan cînavêkê an jî tamamkerê lêkerê ne

⁶Sererayî wê yekê ku piraniya zimanasên Kurd rengdêrî bi pêkhênêkê neserekî yê hevokê didin hejmartin, belê di hinek deman de weku pêkhênanekê serekî di hevokê diyar dibe. Mîna vê mînakê "Ew zîrek bû" li vêrê rengdêrê "zîrek", wekî pêkhênanekê serekî derketiye, lewre eger em peyva "zîrek" ji vê hevokê ladin. Dê wateya hevokê têk biçê. Anko weteke tamam nade dest, wate di hinek caran rengdêr dibe pêkhênanekê serekî di hevokê de.

temam. Rengdêr girêdayî navî ye. Wate dost û hevalê navî ye di hevokê de. Rengdêr jî mîna navî û hevalkarî çî nîşaneka morfolojî nîne û da ku ji aliyê rûxsarî ve bête dîyar kirin. Belkî dîyarkirina rengdêrî di hevokê de girêdayî wateyê ye (Xoşnaw, 2009: 40^b). Dîsan rengdêr dibe temamkerê navî û cînavî û girêyekê pêk tine. Her wiha nîşanên rêzimanî wernagir (Refîq Şiwani, 2011: 38). Behra bêhtir nav li pêşîya rengdêrî tê. Lê hinek deman rengdêr li pêşîya navan tê bo rwanî û bedewîya peyvê (Guherzî, 1999:44).

Mînak:

Gula sor rengdêr (sor) + nav (gul) = Sorgul

69 - Vejîn kiçeka nazdar e. (rengdêr) ↑

1.6.2.2. Hevalkar (Adverb)

Beşeke ji beşên axaftinê ku wesfa lêkerê di hevokê de dike. Lewre dem û cih ... hwd. lêkerî di hevokê de destnîşan dike. Hevalkar dost û hevalê lêkerî ye. Lewre hertim digel lêkerî tê yanê girêdayî lêkerî ye. Ev jî berevajî rengdêrî ye. Lewre rengdêr dost û hevalê navî ye û digel navî tê. Dîsan wesfa navî dike (Xoşnaw, 2009^b: 79). Her wisa hevok bê hevalkaran jî saz dibin. Lê hebûna wan di hevokan de wateyên wan têtir dikin. Bi vî tîgehî hevalkar pêgirên lêkeranin tîrkerên hevokên wan in (Deham Ebdulfetah, 2012: 309). Beşekê serbixwe û girîngê axaftinê ye pêwendîyeke yekser û mukum bi lêkerî ve heye. Evca lêker yê bihêz be yan ne (Şêrzad Sebrî & Araz Monîb, 2016: 343). Her wisa pesnê lêkerî dike yan hevalkarekî din (Îbrahîm Zaxoyî, 2008: 68). Hevalkar dibe sedemê temamkirina lêkerê di hevokê de. Wate di astê sentaksî de rola temamkirinê dibîne ku bi şêweyekî yekser pêwendî bi lêkerî ve heye û hevalîya lêkerî dike (Şêrzad Sebrî & Araz Monîb, 2016: 343). Dîsan pêkhênanekê livoke di hevokê de, cihekê destnîşankirî nîne û azadane di nava pêkhênanê din ên hevokê de rêz dibin. Cihê wî li gor xwesteka axaftvan di hevokê de tê guhartin (Ferhadî, 2013: 25). Dibe ku hevalkar mîna her pêkhênanekê din cihekî bingeh di rêzkirina hevokê de hebe. Anko ew hemû cihên ku hevalkar tê de tîne dîtin bo hevalkarê di bingeh nînin. Ji ber ku cihê bingehê hevalkaran li gor cure û hejmara pêkhênanê beşdar di rêzkirina pêkhênanê hevokê de tê dîyarkirin. Bi şêweyekê giştî

hevalkar dikevîne di navbera kirdeyê û lêkerê. Lewre hevalkar serbarin e. Binemayê serbaran jî di zimanê Kurdî de ew e ku dikevîne di navbera kirde û lêkerê di hevokê de (Segvan Miho, 2012: 56). Her wisa hevalkar pêkhênê neserekî yê di hevokê de. Lewre ladana wî nabe sedemê nerêzimanîbûn û neguncandina hevokê û dibe beşek ji girêya lêkerê (Ferhadî, 2013: 25). Her wisa hevalkar bi çend awayan pêk tên. bi alikarîya daçekan û alikarîya pêşgir û paşgiran jî çedibe. Mîna “bi şev, bi roj, ji niha ve, ji îro pê ve, di mal de, di nav re ... hwd” (Tan, Samî, 2011: 181). Hevalkar pêkhatîye ji pêwendîya rêzimanî di navbera lêker û hevokeke din de di encamê wê pêwendîyê de agahîyên heme cure derbarê bûyera lêkerê dide dîyarkirin (Azad Ehmed, 2001: 26). Dîsan bersiva pirsên “kengî? çewa? yan ta çi rade?” dide (Rozakis, 2003: 5).


Mînak:

70 - Şîrînê noke karê xwe temam kir.

71 - Şîrînê karê xwe temam kir.

Divê hevoka li jor de peyva “noke” hevalkare û bersiva pirsayara “kengî ?” daye. Her wisa hebûna wê di hevokê de bi xwestek e. Anko dibe yek ji pêkhênên neserekî yê hevokê.

72 - Azad direng nivist.



1.6.2.3. Temamker (Complement)

Ew girêya navî ye ew ya ku rola di girêya lêkerî de dibîne û wateya lêkerî tamam dike. Ev pêkhênan digel lêkerî wateyeka nû saz dike. Belê wateya tê sazkirin di ferhengê de nayê dîtin (Dilbirîn Elî, 2012: 72). Temamker bi yek ji pêkhênên serekî yê hevokê tê hejmartin. Lewre ladana wî kartêkirinê li rêzimanîbûn û wateya hevokê dike (Segvan Miho, 2012: 50). Wate ew pêkhênên ku cihê tamamkerî digirin bi zorî û ladana wan dibe sedemê peydabûna hevokê nerêzimanî û neguncayî (Umed Berzan, 2010: 83). Her wisa tamamker pêkhênekê hevokê ye ku pêwendîyeke bihêz digel lêkerî heye. Ew pêkhênanê digel lêkerî tê û hevokê dikete hevokê rêzimanî û ew wateya ku mebest pê heyî dide. Zêdebarî xwe di girêya navî yan jî girêya bend de dibîne. Li pêşîya lêkerî yan li dawîya lêkerî tê. Hêjaye bêjin ku lêkerê “bûn” hertim pêdivî bi tamamkerî heye. Herdu pêkvê girêyeke lêkerî pêk dînin (Xoşnaw, 2008: 52). Ew pêkhêne ku bo tamamkirina wateya lêkerê hevokê tê ku bêhtir digel lêkerê ne. Temam tê û bi tenê ti wateyekê nade. Lewre pêdivî bi pêkhênekê din heye ji bo tamamkirina wateya xwe. Her wisa digel lêkerê bihêz û bêhêz jî tê. Ev pêkhêne girêya navî ye di nav girêya lêkerî de. Mînak:

73 - Min ew kire mirov. —→ tamamkerê lêkerê bihêze.

74 - Ew mamosta bû. —→ tamamkerê lêkerê bêhêze.

Di hevokê de tamamkerî cihekî cêgîr û taybet bi xwe ve heye. Ew jî ji ber wê çendê ku pêwendîyî bi lêkerê hevokê ve heye. Lewre her dema ji cihê wî hate guhartin li wî demî dê bibe sedemê peydabûna hevokê nerêzimanî.

Mînak:

75 - Min wane nivîsî.

76 - Min nivîsî wane.*

Hinek ji zimannasan dibêjin tamamker pêkhênekê serekî yê hevokê ye. Mîna “kirde, bireser, lêker”î hinekên din dibêjin pêkhênekê neserekî ye. Yê kudibêjin pêkhênekê serekî ye piştî xwe bi wê yekê girê didin ku dema tamamker digel lêkerê bêhêz hat li wî demî dê bibe pêkhênekê serekî yê hevokê. Mînak:

77 - Heval bizîşk bû.

Di vê (77)ê de, eger em peyva “bizîşk” ladin dê wateya hevokê têk biçê û guhartin dê bi ser de hên. Anko eger em peyva “bizîşk” ladin dê hevoka me bi vî awayî bimîne “Heval bû”. Bi vî awayî jî wateya hevokê bi temamî guhartin bi ser de tên. Ji ber vê çendê hinek ji zimannasan li gel wê yekê ne ku temamker pêkhênêkê serekî yê hevokê ye mîna pêkhênên din.

1.7. Cureyên Rêzkirina Peyvan

Di her zimanekê de pêkhênên hevokê bi şeweyekê tene rêzkin û ev rêzkinine ji axaftina her zimanekî bi xwe tene helbijartin (Cîhan Xeyas Mihê, 2016: 3). Wate di navbera zîmanan de cudahî di rêzkirina pêkhênên hevokê de heye. Bo mînak heger em cudahîyê di navbera rêzkirina pêkhênên hevokên du zîmanan de bikin. Mîna zîmanên Kurdî û Erebi ku şewazê rêzkirina pêkhênên hevokên wan ji hev cuda ne. Bo mînak rêzkirina pêkhênên hevoka zîmanê Kurdî bi vî şeweyî ye “SOV”, lê zîmanê Erebi rêzkirina pêkhênên hevoka wê bi vî şeweyî ye “VSO”.

Mînak : bo zîmanê Kurdî:

78 - Serdarî	wane	xwand
↓	↓	↓
kirde	bireser	lêker

Mînak : bo zîmanê Erebi (lêker + kirde + bireser):

			79-أكل	الولد	الطعام
			↓	↓	↓
bireser	kirde	lêker			

Wate her zimanek li gor yasayên taybet bi rêzimana wî zîmanî ve serederiyê digel rêzkirina pêkhênên hevokê dikin. Belê di bêhtirîya rêzimana zîmanên cihanê de kirde di destpêka rêzkirina pêkhênên hevokê de tê. Anko 90% ji zîmanên “SOV” yan “SVO” kirde li despêka hevokê tê (Tallerman, 1998: 163).

1- Rêzkirina Neguher (Çespayî):

Mebest ji rêzkirina neguher ew e ku her guhartinek di rêzkirina pêkhênan de ji tixûbê girêyan de rû bide. Dibe sedemê guhartina erkê sentaksî yê hevok. Her wisa şirovekirina wateya pêkhênan di guhere (Talib Hisên, 2014^a:15). Her wisa ev cure rêzkirine nikare pêkhênen hevokê ji cihên wan bi guhere (Dizeyî, 2013: 56). Wate di vî cureyê rêzkirinê de divê pêkhên pabendî rêzkirinê bin (Hisên, 2014^a: 15).Mînak:

80 - Gurgî pez xwar.

81 - Pezî gurg xwar.

Di van herdu hevokên li jor de ji bilî ku erkê rêzimanî yên peyvên “Pez û Gurg” hatîye guhartin ji alîyê wateyê ve. Ji ber vê yekê hevoka duyem nedirust e. Wate zimanê Kurdî rêya bi vî cureyê rêzkirinê nade.

2- Rêzkirina Azad:

Di vî cureyê rêzkirinê de dibe hevok bi çend şêweyekên cuda derbikeve. Ev jî ji sedemêwan pêkhênan dibe ku bi şêweyekî azad cihên xwe diguherin (Umêd Berzan, 2011: 101). Wate ev cureyê rêzkirinê berevajî cureyê dine dikarî guherînan di cihê peyvan de bike (Dizeyî, 2013: 56). Anko pêkhatîye ji rêzkirina peyvan di nava havokê de bi çend şêweyên cuda, bê ku kartêkirinê li wateya hevokê bike. Wate her guhartinek“pêşve birin yan paşve birin” di rêzkirina pêkhênan de rû bide. Nabe sedemê guherîna erkê rêzimanî yê peyvan (Talib Hisên, 2014^a: 16).

Mînak:

82 - Ev baxçe babê min ava kirîye.

83 - Babê min ev baxçe ava kirîye.

BEŞA DUYEMÎN: TEORÎYÊN ZIMANNASÎ DERBARÊ HEVOKA RÊZIMANÎ Û NERÊZIMANÎ

Bêguman her teorîyekê bîr û dîtînên xwe yê taybet hene, çî klasîk yan nû bin. Lewre zimannasî jî ji vê çendê bê par nîne. Wate bîr û dîtînên cuda cuda çî klasîk yan nû li ser babetên rêzimanî hatine behis kirin. Ji wan her yekê jî li gorî xwe behis li rêzimana zimanî kirîye ku hînek yasa û destûr ji bo rezimana zimanî danîne. Ji ber ku babetê me jî bi tenê giredayî hevokê ye lewre me bi hewce dît her yek jî wan teorîyên zimanî derbarê hevoka rêzimanî û nerêzimanî li jêr bidene xuyakirin:

2.1. Teorîya Klasîk (Classic Theory)

Ji alîyê Panini⁷ ve li sedê şeşê berî zayînê lêkolîn li ser zimanê sanskrîtî yê hatine kirin. Lê belê Yewnanî weku hemû biwarên din yê jîyanê, di babetê zimanî dejî pêşeng bûn (Silêman Îsmâil Receb, 2015: 30). Anko li berahîya hemû wan neteweyan tên yê ku lêkolîn li ser gelek alîyên zimanî kirine. Û gelek bizav kirin ku bizanin ziman çawa peyda bûye (Şilêr Nayif Emîn, 2007: 7). Bi vê çendê şîyan binemayên rêzimanî danin. Nivîserên Girêkî xuya dikin ku Eflaton yekem kese alîyên veşartî yê rêzimanê eşkere kirin bi wê dîtina dibêje; Hevokê ji bo du beşên serekî dabeş dîke. Ew jî kirde (Actor) û lêker (Action) ne (Nawxoş, 2005: 11). Piştî wî Eristoyî pişkên axaftinê dabeşî sê cureyan kirin wek nav, lêker û daçek (Batînî, Mihemmed Reza, 1993:17). Ku bi vî rengî Eflaton û Eristo şîyan çarçoveyekê seretayî û netemam ji bo rêzimana zimanê Yewnanî danin. Yekem kesê ku rêzimana Yewnanî bi şeweyekê rêk û pêk nivîsîye Dionysios Trax bû. Rêzimana wî bi navê: "*Teknîka Rêzimanî*" bû. Navbera sêzdeh salan wekî çavkanîyekê girîng di lêkolînan de dihate bikaranîn. Bi şeweyê ku di dana hemû pirtûkên rêzimanîyên zimanê Ewropî de girîngî bi dabeşkirinê wê dihate dayîn anko bibe binema. Ji bo wan lêkolînan ew ên di bîyavê rêzimanê de hatine encam dan ku di niha de em bi rêzimana klasîk bi nav dikin (Silêman Îsmâil Receb, 2015: 31).

⁷**Panini:** Yek ji zimannas û rêzimanivîsên klasîkên Hindî yê taybetmend bi zimanê Sanskrîtî tê hejmartin. Her wisa zimanê sanskrîtî yekemîn ziman bû ku rêzimanêke taybet bo hatîye amadekirin.

Di rêzimana klasîk de heta demekê dirêj rêzimannasên Kurd û Bîyanî karîgerbûn bi dîtînen rêzimannasên Yewnanîyan mîna Eristo û Eflaton. Ji ber wê yekê Eristo bingeha vê rêzimanê dayîne. Paşê ji sedemê Yewnanîyan girîngî pê hate dayîn û bi rêya Rûmîyan li rojavayê Ewropa pêşket û ji bo destpêkek ji bo rêzimannivîsên zimanên wan. Bi renekê wiha ku heya niha bingehe û zaravên wê di piranî xwendîngehan de bi wane tê gotin (Batînî, Mihemmed Reza, 1993: 17).

Yek ji boçûnên şaş yê rêzimana klasîk ew bû ku ji bo her dîyardeyeke zimanî pênaseyeka wateyî tînin û ew dîyarda zimanî hertim bi derbirîner û dirkênerê wê wateyê dizanîn (Batînî, Mihemmed Reza, 1993: 29). Ji bo mînak Eristo hevokê bi vî awayî pênase dîke; “Hevok pêkhatîyê ji çend yekeyên dengî û bihevra wateyekê didin û her yekeyek di hevokê de jî wateya xwe ya taybet heye” (Ívic, 2000: 12). Li gor vê pênasa ji bo hevokê dîyar dibe, ku pîverê dirustîya hevokê ew e ya watedar be. Anko wateya hevokê pîvere ji bo pêkhênana hevokê û her ev pîverê jî wateyê hevokê cuda dîke ji girêyê. Lewre girê li gor rêzimana klasîk ji komeke peyvan pêk tê ku bihevra wateyekê serbixwe nadin. Bi vî awayî ji bo me dîyar dibe hevokên rêzimanî li gor dîtina teorîya klasîk. Ew hevokê yê guncayî bin ji alîyê wateyê ve. Anko rêzimana klasîk girîngîyê di alîyê wateyê bêhtir ji alîyê rêzimanî (Vîyan Silêman, 2001: 12). Ji ber vê çendê, ev teorîye ji alîyê teorîyên zimannasî yê piştî xwe hatin, ketine ber rexnegirtinê (Ebdullah Hisên Resûl, 2015: 12).

Di rêzimana klasîk de gelek caran rêziman digel zanistên Felsefî û Lojîkî tê tevlihevkirin. Her çende xwendîngeha Eskenderîye tevger kirin rêzimanê cuda bikin ji zanistên Felsefî û Lojîkî (Derac, 2009, 100). Ji bo selmandina wê şêpirzeyîyê yan felsefê tîne yan jî xelkekê ku bi wî zimanî diaxavin biserdeçûyî dizanin. Ji ber bê agahîbûn a nezanîn û nexwendewarîya wan (Batînî, Mihemmed Reza, 1993: 29). Belê serkeftî nebûn di vê tevgerê de. Lewre wan ji bo çareserkirina babetên xwe pena birin ber lojîkê. Her wisa zimanê Yewnanî wek pîver ji bo zimanên din wesifkirine.

Her wisa li cem wan kesan wisaye ku li ser her babetekê bi tenê şêweyekê rast heye. Ev şeweyê rast jî eger li gor yasayên wan nebe şaş e. Di demekê de cudahîya di navbera rast û şaşîya di zimanî de mîna cudahîya di navbera şev û rojê de dîyare û tenê nînin (Batînî, Mihemmed Reza, 1993: 41). Di zimanî de pîverê cudakirina rast û şaşîyan divê şeweyê bikaranîna wî, ji alîyê wan kesên wî ziman

diaxavin ve bin. Ne ku li ser bingeha lojîkî be. Eger biryar wisa be hevokên berbelavên zimanî bi pîverên lojîkî yan zanistên din helsengînin. Bi sedan ew peyvên ku di dirustîya wan de me guman li ser ne, hejî wê yekê ne ku rexne lê bêne girtin.

Mînak:

Sêwevê rastSêwevê şaş

Axavtin axaftin

Kojtin koştin

Helbijardin helbijartin

Noşdar nojdar

Bêguman her zimanekê taybetmendîyên xwe hene. Her çende hinek binemayên giştî jî hene di navbera zimanan de. Belê eve wê çendê nagehîne ku rêzimana hemû zimanan mîna hev e. Rêzimannasên Kurd jî di vî tevgerê de karîgerbûne bi dîtînen wan, bi vê yekê tastî gelek (tûşî çendîn) arîşeyan bûn ji bo şirovekirina hevoka Kurdî. Ji bo mînak eger hevokeke mîna:

84 - Pêşmerge hat.

85 - Pez hat.

Di van herdu mînakên li jor de eger li gor pîverê lojîkî şirove bikin. Divê ev hevokê bî vî awayî bin:

86 - Pêşmerge hatin.

87 - Pez hatin.

Ev herdu hevoke ji alîyê wateyê ve di guncayî ne. Belê ji alîyê rêzimanî ve nabe nîşana komê “in” li dawîya lêkerî bête bikaranîn. Lewre navên Pêşmerge û Pez navên “pirjimar”in. Anko ew bi xwe derbirîne ji komê dikin û ev navên “pirjimar” mîna navên “yekjimar”serederî digel tê kirin.

Aligirên dîtina rêzimana klasîk ji du alîyan ve ji bo şirovekirina hevokê diçin. Ev herdu alî hemû deman bi tevlihev têne qal kirin. Yekem ew e ku bi tenê girîngîyê

didine pêkhata serve ya hevokê. Wate ew formê pêşçavê ku hevok tê de tê dîtin. Di dema şirovekirinê de na vegerin ji bo wan pêwendîyên rêzimanîyên ku peyvekê di hevokê de bi peyvên din yê hevokê heyin. Duyem derbareyî dîyardên rêzimanî jî rêzimannasên klasîk form û wateyan tevlihev kirine pêwendîyeka yek li du yek di navbera wan de danaye. Ji bo mînak dema wan a rêzimanî ku cudaye digel dema fîzîkî weke yek lê nêrîye. Mebesta me ew nîn e ku di navbera wan du ji boçûnan çî pêwendîyek nîn. Belkî mebest ew e ku pêwendîyên wan yek bi yek nîne. Ji bo mînak lêkerê ne ji borî vedigere ser dema ne ji bor. Belê gelek caran lêker bi rêja ne ji borî de wateya ji borî digihîne (Vîyan Silêman, 2001: 13).

Mînak:

88 - Eger ew hatiba ez da çim.

Wate rêzimana klasîk li ser çî binemayên giştî ên teorîyên zimanî nehatine danîn. Hebûna dîtinan derbarê sirûşt û karkirina zimanî bi giştî mîna çirayekê ye ku rêya lêkolerî şirovekirina wî zimanê ku bala xwe ron dike û sistemekê zanistî dide bi karê wî. Eger bê rêzimannas yan lêkolînerekê zimanî bi teorîyêke wiha nayê girêdan, li wê demê wê bikeve di nava taryatîyêkê û rê lê bête girtin. Ji ber wê çendê ku rêzimana klasîk li ser bingeha dîtineke ron û aşkera ya zimanî nehatîye danan (Batfînî, Mihemmed Reza, 1993: 73).

2.2. Teorîya Binyatgerî (Structuralism Theory)

Bêguman peydabûna her teorîyêkê li ser destê kesekê yan komeke kesan peyda dibe. Ev teorî li destpêka sedsala 20an de, li ser destê Ferdinand De Saussure peyda bû (Ebdulselam Necmedîn & Şêrzad Sebrî, 2011: 83). Ku çêker û binyatgerê vê teorîyê ye ku xelkê bajarê Cenevre ye. Ev jî yekemîn kesê ku hizra zimannasîya nû berçavkirî di navbera salên 1906-1911an de di wan gotinên xwe de zimannasî li jêr bingehê zanistî avakirîye. Dûra ev waneyên wî ji alîyê xwendekarên wî ve li jêr nav û nîşanên “*Cours De Linguistique Gernerale*” hatine komkirin. Paşê jî di sala 1916an de hatin belavkirin. Derçûna vê pirtûkê bi mezintirîn şoreş û girîngtirîn bûyera zimannasîya sedsala 20an tê hejmartin (Wirya Omer Emîn, 2011: 18). Her ev e ku gelek caran bi “bavê mezin yê zimannasîya nû” tê naskirin. Hizr û dîtinên wî di

dîyarkirina teorîyên zimanî ên nû de gelek karîgerbûn. Lê piştî wî gelek xwandingehên cuda yên zimannasî serhildan ku ji hemûyan girîngtir xwandingehên Praha, Kopenhagen û American bûn (Batînî, Mihemmed Reza, 1993: 77). Her wisa di wan waneyan de Saussureyî daxwaza wê yekê kiribû ku cudahî di navbera lêkolînên wesfî Sînkronîk û lêkolînên dîrokî Dayikronîk de bi hate kirin (Ebdulseam Necmedîn & Şêrzad Sebrî, 2011: 83). Her çende xwuya ye Ferdinand De Saussureî binemayê hizra binyatgerî daniye. Lê heya ku Leonard Bloomfieldî pirtûka (Ziman) li 1933an de belav nekirî. Ev xwêdingehe mîna xwêdingeheke zimannasî belav nebû (Nawxoş, 2008: 39). Bi belavbûna wê pirtûkê teorîyeke nû ji bo zimanî peyda kir ku ew jî bi teorîya binyatgerî hate naskirin.

Eger çî ku De Saussurî binaxê zaravê binyatgerî ya (Structuralist) bi kar neanî. Belê ji ber wê çendê ku ew xwandingehên zimannasî ên ku li şûn, pey wî diçûn bi giştî nîve wan binyatgerî (Structuralist) bu. Ji ber vê çendê Ferdinand De Saussure bi damezrênerê xwandingeha binyatgerî tê hejmartin (Batînî, Mihemmed Reza, 1993: 77). Her wisa teorîya binyatgerî wekî şoreşekê ji bo dijî teorîya klasîk. Her teorîyeke nû peyda dibe, li ser kêmasîyên teorîya berî xwe disekine. Ev teorîya bi şêweyekê serekî girîngîyê dide şêwe û formên zimanî. Bîngeha wê ya serekî di zimanî de ji dengên zimanî cure dike. Heya ku digihe mezintirîn yeke ku ev jî di zimanî de hevok e (Sanya Cebar, 2012: 41).

Hêjayî gotineyê ku di vê teorîyê de pêdivîye li ser lêkolîner, wesfa zimanî her wekî ya heyî bike. Neku penasayê bibe ber boçûnekê ku bikaranîna xwe nebe. Her wisa pêdivîye di ravekirina wê dîyarda lêkolînê lê dike piştî xwe bi grêmanekê ve girê nede ku bibe sedemê derketin û dûrketin ji rastî û duristîyê. Dîsan ev teorîye pêgir nîne bi dîyarkirina rastî û şaşîyan di zimanî de. Belkî pabende bi wesifkirina dîyarde û pêkhênên zimanî her wekî heyin û bikarhên bi vî awayî ku yekem car bi gumankirina van kereste û dîyardan radibe. Paşê van pêkhên û dîyardan wesif dike. Li dawîyê jî rêsa û yasayan ji van pêkhên û dîyardan derdixe (Ebdulseam Necmedîn & Şêrzad Sebrî, 2011: 84).

Fredric Jameson zanayekê zimanî ye ku dibêje; “Resenatîya De Saussureyî bi wê yekê dîyar dibe ku yê xwegir (hezdar) bû li ser wê rastîyê ku zimanî sîstemekê tijî ye. Di her demekê de bê ku girîngîyê bide dîrokê û her zimanekê hebûna xwe ya heyî

û bi wê yekê serbixwe ye ji dîrokê û ziman tê naskirin. Anko sîstemeke yê pêkhatîye ji denga û ev deng jî ji devê axaftvan ku niha diaxivin û dîrokê pişt guh diavêjin”e. De Saussureyî dest bi lêkolîna xwe dike, li ser binyatgerîya zimannasî bi wê yekê ku zimanî du rehendên serekî yên heyin: Ew jî rehendê zimanî û axaftinê ye. Ev cudahîya De Saussureyî kirî di navbera van herdu rehendên navbirî girîngîyeka mezin hebu ji bo geşendina zimannasî yê bi şêweyek giştî û binyatgerî yê bi şêweyekê taybet cudahî navbera sîstemê zimanî û bûyera axaftinê ew e ku sîstemê zimanê nabînok. Abstract e ku di dibêjinê ziman û axaftinê takekesî ku têne darêtin ji alîyê axaftikeran ve li her bûyereke ji bûyerên jîyana wî ya rojane dibêjinê axaftin (Heval Teyib, 2006: 79).

Axaftvanên zimanî dema peyvekê yan hevokê bikartînin. Hizra wê çendê nakin ku berî niha ew peyv yan hevok dihate bikaranîn. Ji ber vê çendê bikaranîna peyvekê di qonaxeka dîrokî de çî kartêkirinek li ser bikaranîna peyvyan di qonaxên niha da nabe (Mihemmed Mihemmed Yonis Elî, 2010: 78).

Binyatgerîya zimannasî amajê dide ji bo ew pêwendîya di navbera zimanî û axaftinê de dîyar dibe. Demê ziman desthilata xwe li ser axaftinê diçespîne. Bi vê yekê girîngîyê bi zimanî dide wek zanistek serbixwe: Lewre bêhtir girêdaye bi babetê pêwendîya ve (Heval Teyib, 2006: 87). Bi dîtina binyatgera rêziman liqekê zimannasî ye. Rêziman li çawanîya rêxistina yekeyên pîtan ji pêkhateyekê mezintir ji peyvyan vedikole. Ji bo bêhtir şirovekirina têgeha rêzimanê binyatgera çendîn amrazên hevoksazî bikaranîn (Nawxoş, 2005: 45). Mîna rêzîkirina peyvyan.

Rêzîkirina peyvyan divê li gor pêkhateyên rêzimanî yên zimanî be. Her paş û pêşîyek bi temamî wateya girê yan jî hevokê di guhere (Nawxoş, 2005: 46).

Mînak:

89 - Azad Newzadî digrit.

90 - Newzad Azadî digrit.

Di van herdu hevokên (89, 90) ê de peyvên herdu hevokan weke yekin. Belê di pêş û paşîkirina peyvên herdu hevokan da wateya wan hatîye guhartin. Mînak ji bo zimanê Îngilîzî kiça xwendîgehê **A school girl e**. Anko kiça xwendîgehê gelek

cudaye ji **A girl school**. Anko xwendengeha kiçan di zimanê Kurdî jî de “gula sor” û “sorgul” ji hev cudan di vêre de pêkhateya hevoksazî dewrekê girîng dibîne di pêkhênana peyva girêdayî (Nawxoş,2005: 46). Her wisa dîyarkirina cihê hêzê di girê û hevokê de roleke berçav didîne pêkhênan ya pêkhata hevoksazîyê. Di zimanê îngilîzî da eger hêz li ser peyva yekem bû di girê de eve ev peyve peyveke girêdayî ye yan jî navekê girêdayî ye. Ji bo mînak **High chair** ku peyva **High** hêzê wergirit eve wateya girê ye “kûrsî taybet bi zarokan ve” digehîne belê eger hêz li ser peyva yekem nebû eve ew girê tenê pêkhateka rêzimanî dibe û nabe navek ji bo tiştê belkî weke rengdêrek û navek şirove dike. Ji bo nimûne **bluebird** bi wateya balindekê tê ku rengê wî şîn e (Nawxoş,2005: 46).Binyatgera hevokê ji bo pêkhênerên wê vedigerand. Hevok ji alîyê wan ve pêkhatibû ji bêjeyên nîhad subject û guzare predicate.

Binyatgera bi tenê lêkolîn li ser pêkhateya serve (rûxsar) ya hevokê dikirin.Di wê bawerê de bûn ku hevok tenê pêkhateya serve a heyî ye. Lewre bi dîtina wan hemû ew hevokên ji alîyê sentaksî ve yek “kirde, lêker û temamaker” hebin tenê yek pêkhateyan heye (Nawxoş,2005: 52). Ku ev yeke jî berevajî dîtina Chomsky⁸ bû. Ku ew di wê bawerê de bû ku hevokê herdu astên serve û ji nav de yên heyin. Anko li dawîyê li gor teorîya binyatgerî girîngî bi alîyê formî bi tenê hatîye dayîn. Her wisa zimannasîya binyatgerî bêhtir girîngîyê bi şirovekirina axaftinê dide. Ji bo wê çendê da ku wan binyatan ji bo me dîyar bike. Ku kontrola prosesa dariştina hevokê dikin yan helwesta xwe li ser zelalbûna wateyê dikin yan jî siruştê binyata peyv sazîyê

⁸ Noam Chomsky : (1928- ?) Navê wî yê dirust Avram Noam Chomskî ye. Li wilayeta Philadelphia (Pennsylvania) ya Emrîkî hatîye dinyayê. Chomsky ji binemaleka cuhî ya rewşenbîr e. Bi şeweyekê dayik û bavên wî bi du rêzimanivîsên mezin yên Îbrî tene hejmartin. Bavê wî xwendengeha zimanê Îbrî li wilayeta Philadelphia dameziran dibû ji bo mamostayên zanîngehê. Dîsan bavê wî xwedî çendîn pirtûka ye mîna *Ziman û Yasayî Îbrî Di Sedê Hejdehem Da*. Chomsky her ji zarokatiya xwe kesekê behremend bû. Lewre her di temenê deh (10) salî da vexwandinek ji bo pirtûka babê xwe kir. Lê belê belav nekir. Cihê amajekirinê ye Chomsky derçûyê beşa matematîke li zanîngeha Philadelphia. Zanistên zimannasî û matematîk û felsefe di heman zanîngeh de xwandine. Her wisa li ser destê zanayê zimannasî yê Emrîkî Harrisî fêrî zanistê zimannasî bibû. Harris mamosta bû li zanîngeha Philadelphia. Chomsky dibêje ; ew pirtûka gelek bandor lê kirî û zanistê zimannasî bo dayî diyarkirin pirtûka *Şeweyên Zimannasî* ya Harrisî bû. Her evê çendê wekir ku ez berev zanistê zimannasî ve biçim.Li 1951an de Chomsky bawernameya masterê li heman zanîngehê wergirt.,Dûra li sala 1955an de bawernameya doktora jî wergirt. Her wisa Chomsky xwedî çendîn pirtûk û gotarên zimannasî û rexnên siyasî ye. Dîsan xwediyê teorîyên "berhemanîn û veguhastin" û "desthilat û girêdanê" ye tê hijmartin. Ji zimannasên cîhanê yên xwedî teorî ku mezintirîn guhartin di dîroka zanistê zimannasîyê da kirine. Yek ji wan kesan, ku sûdgirtineke zêde ji berhemên wî tê wergirtin di aliyê zimannasîyê de.

didin dîyar kirin. Ji vî sedemî teorîya binyatgerî girîngîyeke zor bi zimanê axaftinê dide (Îbrahîm Xelîl, 2016: 88). Her wisa binyatgera çî girîngî nedan wê çendê ku di şîyanên mirovî de hene hejmareke bê dawî ya hevokan bêje bê ku berî nîha bihîstibe. Her wisa di şîyanên mirovî de heye li ser bi dest ve anîna hejmareke hevokên bê dawî yên ne hatibine gotin berî niha (Xewle Talib, 2006: 104). Her wisa bi bawerîya binyatgeran çî pêkhateyeka zimannasî di mêşkê mirovan de xwezayî nîne. Belkî ew pêkhate divê bête fêrkirin (Nawxoş,2005: 51). Her wisa binyatgeran di lêkolînên xwe de bêhtir girîngî bi alîyê formî (rûxsar) dane, ne ku alîyê wateyê. Lewre bi dîtina wan tenê form berceste ye (Dizeyî, 2013: 23).

Li gor şarezayên zimanî li dema mirov peyvan di nav ferhenga zimanî de bikar tîne du cureyên pêwendîyên wateyî çêdibin:

Yekem: Pêwendîya Asoyî (Syntagmatic Relation)

Pêwendîya asoyî pêkhatîye ji pêwendîya sentaksî di navbera peyvan û derketin û guncawa wan digel hevdu di nav çarçoveya hevokê de bi şêweyekê asoyî (Talib Hisên, 2014^a: 45). Wate ev pêwendîye bi ewê rêyê sererast dibe. Dema peyv digel hev bi şêweyekê asoyî tîne (Crystal, 2008: 86). Lewre serencema pêkhênên hevok di rêzkirineke lojîkî û rêzimanî dayîn (Nawxoş,2005: 34).Pêkhênên hevokê di pêwendîyeke asoyî de li gor yasayên sentaksî tîne rêzkirin û dixine bal hev. Pêwendîyeke sentaksî û semanîkî di navbera wan de heye ji bo wê çendê hevokeke dirust hem ji alîyê rêzimanî ve û hem ji alîyê wateyê ve berhem tîne (Umed Berzan, 2010: 88).

Mînak:

91 - Dergeh vebû.

92 - Min dergeh vekir.

Hêjaye bibêjîn her dema peyvek li cihê peyveke din hat li wî demî pêdivîyê ew peyv ji alîyê lojîkî ve ya guncayî be.

Mînak:

93 - Min sêv xwar.

94 - Zarok girî.

Pêwendîya di navbera peyvên “Min sêv”û “girî” pêwendîyeke neguncayî ye. Her wisa peyva zarok digel “xwar”da nagunce. Belê peyvên “Min sêv” û “xwar”. Her wisa zarok di gel “girî” de diguncinîn.

Wate em dikarin bêjin pêwendîya asoyî ew pêwendîya lojîkî ye ku peyvên zimanî di nav rêzkirineke sentaksî de tamam bin (Silêman Hişyar Mihemmed, 2016: 36).

Duyem: Pêwendîya Stûnî (Paradigmatic Relation)

Mebest ji evê pêwendîyê ew e ku li dema peyvekê li cihê peyveke din danî pêdivîyê ew herdu peyvan li dema cihguharînê de pêwendîyeke lojîkî di navbera wan de hebe (Silêman Hişyar Mihemmed, 2016: 40). Ev jî egerekê serekî ye ji bo hev cuda kirina polên rêzimanî yên cuda wekî polkirina “nav, rengdêr, lêker... hwd”. Bi wateyeke din di şîyan daye beşên axaftinê her yek ji wan li bin pola rêzimanîya wê da bête polîn kirin. Wekî dema navek li cihê navekî din yan rengdêrek li cihê rengdêreke din di heman jîngehê de bête danîn (Şêrzad Sebrî, 2011: 26).

Mînak:

95 - Azad yê zîreke.

96 - Newzad yê dirêje.

97 - Hejar yê xirabe.

Di hevoka hejmare (95) ê de peyva Azad ser bi pola “nav” î ye û peyva “zîrek” ser bi pola rengdêrî ye. Peyvên Newzad, Hejar û Bêkes di hevokên (96) û (97) ê de herdu “nav”in û li cihê Azadî hatine bikaranîn û peyvên “dirêj” û “xirab” di hevokên (96) û (97)ê de hemû “rengdêr”in û li cihê rengdêrê ‘zîrek’ hatîne bikaranîn. Bi vî awayî polên rêzimanî ji hev têne cuda kirin. Wate di astê sentaksî de şîyan de ye hejmareke bê dawî ji hevokan berhem bînin. Ew jî li dema peyvên her poleke rêzimanî bi şêweyekî stûnî li gor yasayên rêzimanîyên zimanekê dîyarkirî li cihên hevdu bêne bikaranîn. Her wekî di van mînakên li jor ku ev çendê bêhtir ron dibe (Şêrzad Sebrî, 2011: 26-27).

Mînak:

98 - Dilşad hat.

99 - Bêwar çû.


100 - Dîyar mir.

101 - Sîdra keft... hwd.

Di van hevokên li jor de peyvên Dilşad, Bêwar, Dîyar û Sîdra ... hwd. “kirde” in û “hat”, çû, mir û keft ... hwd. “lêker” in. Wate li gor ewê yasaya li jor “kirde + lêker” di şîyan de ye hejmareke bê dawî ya hevokan berhembînin (Şêrzad Sebrî, 2011: 27).

Wate ji bo cudakirina pêwendîya stûnî û pêwendîya asoyî di şîyan daye bibêjin di pêwendîya asoyî de peyvek ji peyvan pêwendîyeke asoyî yan sentaksî digel peyvên din heye. Belê di pêwendîya stûnî de di şîyan de ye di girê yan hevokê de peyvek li cihê peyveke din bête bikaranîn (Silêman Hişyar Mihemed, 2016: 41). Di vî nexşeyê li jêr da hêmayê pêwendîya asoyî amajê ji bo rêxistina pêkhênan yan axaftina nivîskî yan jî hatîye gotin dike. Her wisa hêmayê pêwendîya stûnî jî amajê ji bo wan pêkhênanêna dike ên ku hemû eger ji bo vekirî di nava mêşkê mirovî de dike ku derbirîne ji çend alternatîf (vebijark) an dike. Ew pêkhênanê ku me amaje ji bo kirî amade dike (Îbrahîm Xelîl, 2016: 25). Di nexşeyê li jêr de dê behsa çawanîya şirovekirina hevokê ji alîyê pêwendîya stûnî û asoyî ve kin.

Mînak:



Wate di pêwendîya asoyî de du cur yên heyin ew jî “pêwendîya rêzimanî” ku bi şêweyî ve girêdaye û “pêwendîya wateyî” ku bi wateyê ve girêdaye (Silêman Hişyar Mihemmed, 2016: 41). Her wisa pêdivîye di pêwendîya stûnî de amajê bi wê çendê bidin ku lêker di hevokê de desthelatdare û biryarê dide. Ka çend pêkhênan werbigir, ji evê riwangehî ve lêkerî ji alîyê xwe ve rol heye. Ji bo encamdana rêkxistina peyvan bi şêweyekê asoyî, asayî û lojîkî di tixûbê girê yan hevokê de (Şêrzad Sebrî, 2015: 382). Anko pêwendîya ferhengî di navbera peyvan de di nav çarçovê hevokê de bi rêya wateya hevokê tê şirovekirin. Belê cudahîya di navbera pêwendîya sentaksî û pêwendîya ferhengî de di wê çendê deye ku her hevokek dikare ji alîyê rêzimanî ve tamam be. Belê ji alîyê ferhenga peyvan ve tamam nebe.

Mînak:

103 - Dilşadî tirumbêl avda.

Ev hevoke ji alîyê rêzimanî ve tamam e. Lêbelê ji alîyê ferhengî ve anko guncana peyvan digel hevdu tamam nîne. Lewre derketina peyva “tirumbêl” digel lêkerê “avda” nagunce ye. Wate eger hevokek ji alîyê rêzîkirina pêkhênan ve tamam be. Lêbelê ji alîyê ferhengî ve tamam nebe. Anko wê çendê derdixe ku rêziman û ferhenga peyvan du tiştên ji hev cuda ne.

Binyatgeran ji bo şirovekirina hevokê rêya dabeşkirina binçî bikar tînin ku pêk hatîye ji dabeşkirina hevokê ji bo yekeye biçûktir heta wî radeyî ku yekeya wisa bi dest dikeve ku ne wate hebe û ne erkê rêzimanî. Evçax bi sedemê pêwendîya cihgirtinê pola rêzimanîya wan yekeyan destnîşan dike. Bi wê yekê ku di çarçovekê dîyar kirî de cihguherîn pê tê kirin. Eger ev cihguherîn nebe sedemê guhartineke bingeh di çarçovekê de ew yekane ji yek pola rêzimanî têne dayîn. Ji ber wê yekê taybetîyên sentaksî mîna hev dibin. Ji bo mînak peyvên “mirov û xan” ser bi yek pola rêzimanî ve ne ku nav e (Ivic, 2000 : 287).

Ji alîyê sentaksî ve bi dîtina teorîya binyatgerî her hevokekê bi tenê yek pêkhataya serve ya heyî. Anko bi tenê girîngî bi pêkhataya hevokê daye. Mîna herdu hevokên li jêr:

104 - Azadî nan xwar.

105 - Nan hate xwarin ji layê Azadî ve.

Her çende ji alîyê têgehî û wateyê ve herdu hevok yek wateyê didin. Lê belê ji alîyê formî ve bi du hevokên cuda ji hev têne hejmartin. Ev çende jî dibe xala lawazîya evê teorîyê.

Her wisa, li gor binemayên teorîya binyatgerî, her hevokeke ji alîyê formî ve rêzimanî be anko li gor rêzkirina yasayên rêzimana zimanî be “Her zimanekê taybet” bi hevokeke rêzimanî tê hejmartin. Belê ev pîver gelek caran hevokên neguncayî peyda dikin. Lewre çî kotên wateyî nasepîne li ser pêkhênên hevokê bi vî awayî hevokên mîna li xwarê dîyare di zimanê Kurdî de hevokên guncayî ne:

106 - Wî berek xwar.

107 - Av şikest.

Di herdu hevokên (108) û (109) ê de her çende hevokên guncayî ne di zimanê Kurdî de. Lê belê li gor teorîya binyatgerî hevoka “Wî berek xwar” digel hevoka mîna “Wî nanek xwar” çî cudahî di şirovekirinê de nîne. Ji ber ku ev teorîye bi tenêgirîngîyê bi alîyê rêzkirina pêkhênan dide wate rûyê serve yên wan pêkhênan. Lewre ev teorîyê girîngî bi pêkhata ji nav de a hevokê nade. Her wisa li gor wan her hevokeke zimanî bi tenê yek pêkhata heyî.

	108 - Wî berek xwar		
Wî	berek	xwar	
Wî	berek	xwar	
Wî	ber	ek	xwar

	109 - Wî nanek xwar		
Wî	nanek	xwar	
Wî	nanek	xwar	
Wî	nan	ek	xwar

(Ber) (- xwarin) , (nan) (+ xwarin)

Bi vî awayî ne cudahîkirina di navbera van herdu hevokan de rêyê xweş dike ji bo berhemanîna hevokên neguncayî.

2.3. Teorîya Berhemanîn û Veguhastin (Transformational And Generative Theory)

Eger sedê 20ê bi wê çendê bête naskirin ku bêhtirîya teorî û dîtinên zimannasî yê girêdayî bi lêkolînên zimanî di tevger û pisporîyên cuda de serhilda be. Ev rêzimana berhemanîn û veguhastinê şîya di demekê kurt de yê balê bikêşe bi ser hemû dîtinên din da. Ev teorîye ji bo binema teorîyên dine. Her wisa hemû teorîyên nû naverok û helwestên xwe di tevgerê zimanî de bi pîla yekem digel rêzimana “BV”ê de berawirdikirin. Her wisa herdu zaravên Berhemanîn û Veguhastin (Generative and Transformational) di naverasta salên pêncîyan de serhilda (Mûhsin Elî, 2013: 3). Bi taybet piştî belavbûna pirtûka pêkhatên sentaksî “Syntactic Structures”ya Chomsky li sala 1957an de destpêkeke girîng ji bo derbarî lêkolînên zimannasî û serhildana xwendîngeha mezin ya zimanî bû ku cudahîyeke mezin hebû digel xwendîngehên din yê zimannasî werçerxaneka girîng peyda kir di tevgera berev pêşçûna zimanî de. Ev teorîye li ser destê zanayê zimanî Chomsky pêşkeft ku wî her ji destpêkê rexneke tund li xwendîngeha Bloomfieldî girt û bi vê yekê ji bo serkêşê xwendîngeha zimanî li Emrîka (Merîc Nesîm & Mekdud Ferîd, 2017: 7).

Teorîya “BV”ê çareserîya zimanî dike, bi wê yekê ku pêkhateyeka hizrî ya mirovîye û taybete bi mirovî ve. Wate rêzimana zimanî di mêşkê mirovî de bi şewê sîstemî bi taybetî alîyê dengî û pêkhatan û wateyî dikare hejmareka zêdeya hevokan berhembîne (Mûhsin Elî, 2013: 3). Chomsky dibêje; “Di rastî de em zimanî fêrnabin belkî rêzimana zimanî di mêşkê me de geşe dike. Her wisa armanca serekî ya xwendîngeha “BV”ê ew bû ku kar li ser teorîyeka zimannasî a giştî dikir ku girêdayî hemû zimanên cîhanê be” (Chomsky & Halle, 1968: 4). Ev rêzîmane bizavan dike wê çendê xwuya bike ya ku di nava hevokê de rû dide di dema berhemanîna wê di mêşkê mirovî de. Her wisa wan bizavan yan qonaxên bêhişî (Unconscious) dîyar dike. Yê ku di qonaxa berhemanîna hevokê de di nava mêşkê axaftinkerî de derbaz dibe (Nehir, 2011: 174).

Chomsky bi vî awayî zimanê pênase dike “ziman pêkhatîye ji komeka hevokên “sinordar û bê sinor” her hevokê dirêjîya wê sinor daye. Her wiha her hevokê ji çend yasayên sinordar pêk tê” (Chomsky,1957:13). Anko li gor vê pênasê hejmara yasayên pêkhênana hevokê û hejmara hevokan bi çî renekê weke yek nînin. Belkî ji sedemê çend yasayan hejmareke bê dawî ya hevokên nerêzimanî tamam dibe. Her dema hevoka nerêzimanî berhemanî eve wê yekê digehîne ku ji yasayên rêzimanî derketîye û peyrewa yasayan nehatîye kirin (Mihabad Ebdullah,2010:5).“Hevok” gewherê ewê rêzimanê ye ya ku Chomsky bingeha ji bo danayî (Nawxoş,2005: 58). Bi bawerîya Chomsky mêşkê mirovî çend pêzanînên xwezayî derbarê zimanî bi xwe pê hatîye dayîn. Ew behra xwedayî ji bo mirovî bingehêk bû ji bo biryardan li ser rastî û ne rastîya hevokê dîyar dike. Bêguman ew pêzanînên hişekî qonax bi qonax pêdivî bi geşe kirinê heye. Ew yasayên ku Chomsky amaje ji bo kirin ku di mêşkê mirovî de hene derbarê zimanî bê kêmasî in. Lewre rê xweş ker dibin ji bo ji hev cuda kirina hevoka rêzimanî û nerêzimanî. Her wisa ew pêzanînên hişekî wel mirovî dikin ku hejmareka bê dawî ya hevokan berhembîne ku her di heman dem de tê bigehe (Fromkin... hwd, 2011: 82). Her wisa vê teorîyê redkir ku mêşkê mirovî mîna laperekê spî be dema ji dayik bûnê bi dîtina Chomsky mirovî dema ji dayik dibe şîyanên xwezayî hene ji bo wergirtina zimanî (Dizeyî, 2014^b, 227). Chomsky resenatîya teorîya xwe wiha şirove dike ku şoreşeke rasteqîne bû bi ser zimannasîya binyatgerî de (Mûhsin Elî, 2013: 4). Her wisa hizra teorîya xwe vedigerîne ji bo sedsalên pêştir bi taybetî sedsalên hevde û hejde. Çerxê geşekirina hizra fikirî bi taybet Rene, Descartes û qeşên Port Royal li Frensa. Her wisa Chomsky hem ji Boldt bi serçavê hizra berhembênanê dizane. Ji alîyekê din ve Chomsky vedigere ser ewê gotinê ku rêzimana berhemanîne li piranîya alîyên wê pêkhatîye ji şirovekirina alîyên têgehiştin ku rêzimana klasîk têbînî li ser hebû (Xilfan, 2010: 97).

Chomsky gelek girîngî bi alîyê sentaksî da û bi dîtina wî “cîhê hevoksazîyê di zimanî de mîna dilê di leşê mirov daye” (Xirma, 1978: 241). Her wisa Chomsky di pirtûka xwe de bizav kirîye wê çendê xuya bike ku rêziman bi tenê amîrekê berhemanîna hevokên rêzimanî ye. Di berhembê xwe de bêhtir teqezî li ser alîyê sentaksî kirîye û girîngîya wateyê berçav wernegirtîye. Chomsky dibêje;“Divê hevoksazî bête cudakirin ji watesazîyê. Wate hevoksazî bi tenê ji bo hevoksazîyê

bête bikaranîn” (Dizeyî,2013: 87). Du sedemên serekî hebûn ji bo durxistina wateyê di rêzimana berhemanînê de.

Yekem: Ji ber wê çendê ku wate bixwe mijdare û girêdana wateyê bi hevokê ve dibe sedemê bimijîya hevokê.

Duyem: Ji ber wê çendê bû eger derbirînên rêzimanî bi wateyê ve bêne girêdan, ev li wî demî pêwendî dê cîyawaz bin. Digel derketina watesazîya berhemanînê careke din girîngî dan bi wateyê serhilda ve û digel serhildana rêzimana “BV”ê (Dizeyî, 2014^b: 17). Ev jî yek ji kêmasîyên vê teorîyê bû.


Di pirtûka xwe de Chomsky mijûlî wan lêkolînên rêzimanî bû ku girêdayî bûn bi wateyên belavbûyî û dijatî kirina wan dîtînen belavbûyî ku dibêje rêzimana ser ne girî mebesta me jê têkil kirina rêziman û wateyê ye. Lewre dibe gelek caran hevokek ji alîyê rêzimanî ve tamam be. Lê belê ji alîyê wateyê ve tamam nebe. Wateya me gelek hevok hene ji alîyê rêzimanî ve tamam in. Lê wateya wan tamam nîne.

Mînak:

110 - Te dîwar xwar.

Ev hevokê ji alîyê rêzimanî ve tamam e. Lê ji alîyê wateyê ve tamam nîne. Çunkî peyva “dîwar”digel lêkerê “xwar” nagunce. Belkî peyvên mîna “fêkî ,goşt ... hwd”. digel peyva “xwarin” diguncinîn .

Chomsky di pirtûka xwe ya ku li jêr nav û nîşanên “Pêkhatyên Sentaksî”(Syntactic Structures) de ew ya ku li sala 1957 an de belav kirî, yek ji yasayên wî ew ji bo hevok dabeşî du beşên serekî kirin. Bi vî şêweyê li xwarê:



⁹ Girê peyveke yan komeke peyvan e ku yek “sere” tê da ye ew sere jî yan nave yan lêker e (Dilvîn Salih, 2016: 3). Her wisa ev girê ye xwediyê pişka serekî a hevokê ye. Wate xwediyê kirdeyî ye ku li wî demî dibe girêya navî yan jî xwediyê lêkerî ye ku li wî demî dibe girêya lêkerî. Di girêya navî de nav sere ye û di girêya lêkerî de lêker sere ye. Lê di hevokê de lêker sere ye û peyva desthilatdar e (Ebdulselam Necmedîn & Şêrzad Sebrî, 2011: 177). Zêdebarî girê mîna yekeye sentaksî ji aliyê

Bi bikaranîna evê yasayê anko pêkhatayên girê, tenê pêkhatê ji nav de bi xwe ve digire. Têgeha hevokê jî bi vê yekê dawî pê ne dihat. Belkî divîya çend yasayên din hebin ji bo ewê çendê ku pêkhatê serve (ji derve) jî tamam bibe. Chomsky peyva veguhastinê li rêzimana xwe zêde kir da ku bibe rêzimaneka veguhastina pêkhênanê (Nawxos, 2005: 64). Bi bawerîya Chomsky tenê bi rêya yasayên veguhastinê mirov dikare hejmareke bê dawî ya hevokan sererast bike. Lewre Chomsky di pirtûka xwe de bizav kirîye wê çendê dîyar bike ku sentaks bi tenê wekî amûreke berhemanîna hevokên rêzimanî ye. Ev teorîyê ji destpêka xwe û heya bûyê teorîyeka bernas, di warê lêkolînên zimannasî de di gelek qonaxan de derbaz dibe. Lê em dê bi tenê behsa du qonaxan bikin. Qonaxa yekem ji sala 1957an de destpê dike. Ew ji bi belavbûn pirtûka Chomsky ya bi navê *Pêkhatayên Sentaksî* (Syntactic Structure) û qonaxa duyem ji sala 1965an de destpê dike. Ew ji piştî bilavbûna pirtûka wî ya bi navê *Hindêk Alîyên Teorîya Sentaksî* (Aspects Of The Theory Of Syntax). Em dê bi dirêjî li ser van herdu qonaxan rawestin.

pêkhatinê ve ji hevokê biçûktir bi wê yekê ku cihê pêkhatêka ji hevokê nizimtir digire. Anko ji peyvê jî mezimtir e. Ji ber ku cihê pêkhatêka ji peyvê bilindtir dibîne. Bi vê yekê girê pêkhênanekê navînî ye dikeve di navbera peyvê û hevokê de (Fettah, 1997: 182). Wate her yekeyeka rêzimanî bikare rolê beşeke bingeha hevokê bigire girêyekê pêk tîne (Wirya Omer Emîn, 2004: 199). Bi wê wateyê ku hevok ji girêyan pêk tê û girê jî ji peyv û pîtan pêk tê (Teha Reşîd, 2015: 20).

Girê Dibe Du Cure :

1- Girêya Navî (Noun Phrese) : Girêya navî ew pêkhêna hevokê ye ku di xwerûtirîn pêkhênanê de ji navekê pêk tê û bo mezimtirîn pêkhat jî dawiyeye vekirî heye. Lê belê ji aliyê lêkerî ve her girêyekê dawiyeka girtî heye. Lewre sinordarkirina şîyanên derbirîna axaftvan û sinordarkirina şîyanên têgehiştina wergirî, rêyê li bê dumahîbûna dirêjiya girê digirin. Diyarda berfirehkirinê jî taybet e bi siruştê girêve (Diyar Elî Kemal, 2002: 39). Ji aliyê pêkhatinê ve girêyên navî yên xwerû û girêdayî û aloz hene. Lê girêya lêkerî tenê xwerû ye. Her wisa girêya navî di hevokê de heft erkan dibîne. Mîna "kirde, bireser, bireserê neyekser, hevalkarên demî, cihî û çawanî û tamamker". Lê girêya lêkerî bi tenê erkê lêkerî dibîne (Bayiz Omer Ehmed, 2008: 77). Her wisa di girêya navî de hemû pêkhenanên dikevine di bin desthilata navî de (Ferhadî, 2013: 12).

2- Girêya Lêkerî (Verb Phrese) : Xwerûtirîn girêya lêkerî bi kemasî ve ji lêkerekê pêk tê. Di pêkhata her lêkerekê da pêdivî ye du pêkhêner hebin. Ew jî binyatê lêkerî (base) û taf (tense)in ku hebûna yek ji wan bûna ye din diselmîne. Ji bilî van jî dibe her yek ji nîşana nerê, rêje, aspêkit jî digel lêkerî de derbikevin (Bayiz Omer Ehmed, 2008: 85). Girêya lêkerî pêkhênekê serekî ye din ye hevokê ye mîna pêkhatekê neguher (çespayî) di nav çarçovê hevokê de tê dîtîn û bê wê hevokê tamam nabe. Lewre her pêkhênekê em jêra bêjin lêker bi kemasî ve divê ji du beşan pêk bê (Talib Hisên, 2014: 23). Anko bi şeweyekê giştî her lêkerekê di Kurdiya serî de pîtan xwe ên serbixwe "binyat û taf" hene (Sanya Cebar, 2012: 21). Wate ev herdu pêkhêne di serekîne di girêya lêkerî de. Her wisa digel girêya navî bihevra wateya hevokê tamam dikin (Dilvîn Salih, 2016: 5). Dîsan hebûna girêya lêkerî di hevokê de ya bi zor e. Lewre di hevoka Zimanê Kurdî de bê hebûna lêkerî "GL" hevokê tamam nabe (Mehmûd Fethullah, 1988: 16).

2.3.1. Rêzimana Berhemanîn (Generative Grammar)

Rêzimana “BV”ê di nirxandina pêkhatayên rêzimanê de bi du qonaxên serekî de derbaz bûye. Di qonaxa yekem de ku bi rêzimana berhemanîn “Generative Grammar” hatîye navkirin. Chomsky bizavkir wesfa pêkhênên hevokê bike û yasayên giştî yê hevokê “ferhengî, dariştî, girêkan” destnîşan bike. Her wisa mebesta serekî ya vê teorîyê ew e ku bi şeweyekê zanistî, lojîkî û matematîkî ew yasayên zimanî ku dibine bingeheke xurt ji bo berhemanîna hemû cureyên hevokên sererast di zimanî de. Lewre bi radeya yekem pûteyekê (ihtimam, giringî) zor bi yasayên sentaksî daye. Bi şeweyekê ku hevok bi daneyeka bingehî danîye di pêkhênên zimanî de ji bo wê çendê ku yasa jî bihayekê temam pê bête dayîn ku pêdivîye seranserî zimanî bigire. Di heman dem de bikare hemû hevokên temam di zimanekê de berhem bîne ji bilî wan hevokên jî rêyê bi hevoka nerêzimanî ne. Dê ku ji alîyê axaftvanê zimanî veguncayî nîne. Wate rêzimana berhemanîn ji alîyê ve sûd ji bo sererastkirina hevokan heye digel wesifdana pêkhênên wan hevokan ji alîyê din ve dikare hinek ji bimijîya¹⁰ rêzimanî di hinek hevokan de girê bide (Talib Hisên, 2014^a: 85). Her çende peyva berhemanîn di binyat de ji bo têgehiştina rêzimanê hatîye ronîkirin mîna sîstema wan yasayên dubare têne bikaranîn. Niha ev peyve bi giştî bêhtir tê bikaranîn, bi taybetî ew tiştê karî li ser rêzimana berhemanînê dike. Armanca wê wesifkirina rêzimana zimanî ye bi şeweyekê rêk û pêk (Mark & Janie Rees, 2003: 297).

Têgeha berhemanînê yek ji girîngtirîn têgehan evê teorîyê ye. Chomsky gelek girîngî dayê û li ser rawestîya ye. Her wisa mekanizma wê ron kirîye (Elyewî, Şefîqe, 2004: 41). Ev teorîye tekzê li ser bingeha berhemanîna hejmareka bê dawî ya hevokan dike ji alîyê axaftvanê zimanî ve. Hizra serekî ya berhemanîna zimanî di wê çendê de ye ku axaftvan her zimanekî ew şîyan hene hejmareka bê dawî ya hevokan sererast bike û berhembîne. Dîsan tê bigihe jî, bê ku pêştir ew hevok bihistîbûn (Mihemmed Mihemmed Yonis Elî, 2010: 102). Her wisa gewherê hizra berhemanînê pêkhatîye ji dirustkirin û berhemanîna hejmareka bê sinor û bê dawî ji hevokan ji hejmareka sinordar û bi dawî û dîyarkirî ji pêkheyên û yasayan (Elyewî, Şefîqe, 2004:

¹⁰ Mebest ji peyva "bimij" yan jî "lêl" ji bo ewan peyv, girê û hevokan tê gotin ku bêhtir ji wateyekê bi xwe ve digirin. Mînak "Mîn şîr îna" ev hevok du wateyan dide. Wate hevoeka bimije, ji ber ku peyva "şîr" hevdenge bo du wateyên cuda bikar tê. Mînak: Şîr 1. Şîrê vexwarinê. 2. Şemşîr; şîrê şêrane.

41). Ev jî zatê ewê çendê ye ku mirovî ji amîr û gîyandaran cuda dike. Ev jî eger zarok şîyan hejmareke zêde ya hevokan bikarbînîn ku ji alîyê mezinan ve guncayî bin. Ev jî bi wateya wê yekê tê ku ev babete tenê lasayakirina wan hevokan nîne ku ji alîyê mezinan ve guh lê dibe. Belkî tiştê peyda dibe. Ew jî ew e ku zarok bi şîyanên zimannasî ji dayik dibin ku wiha kartêkirinê li wan dike ta bikaribin bi axivîn (Mihemmed Mihemmed Yonis Elî, 2010: 102). Her wisa Chomsky bi rêya teorîya berhemên hewla wê yekê da ku bigihê rêzimaneka giştî, bi rêya rêxistina pêkhatiyên hevokê di nava hemû zimanan de. Ev jî ji ber hebûna hejmareka zêde a faktorên hevbeş di nava zimanan cihanê de û ev faktore jî wan wekhevîyên di navbera zimanan cihanê de nîşan dide. Ev rêzimanê bi xwe dikare hevokên rêzimanî berhem bîne (Elwe'ir, Mazin, 1992: 12). Di vê qonaxê de Chomsky gelek rexne li binyatgeran girt ku bi ji boçûna wî binyatger her mijûlî wergirtina axaftinan ji axaftvanan bûn. Lewre hevoka rêzimanî ji sedemê axaftina axaftvanekî dîyar nabe. Her wisa Chomsky di vê qonaxê de ji boçûna wî ew ji bo ku hevoksazî cudaye ji watesazîyê. Wate naskirina yasayên ziman û ferhengekê ye (Xoşnaw, 2014: 182). Her wisa li cem vê teorîyê berevajî teorîya binyatgerî (wesfî) hevok bi mezintirîn û girîngtirîn kerestê zimanî hate zanîn û bi rêya şirovekirina hevokê li ser girêyan û dîyarkirina rêk û rêyasayên pêkhatina girêyan rêzimana her zimanekê tê xwuyakirin. Lewre her axaftvanek dikare hevokan sererast bike. Ev yasa û rêyasayên Chomsky bi rêya pêkhênên dîyarkirî yên zimanî hevokên bê dawî hene berhemên û bi rêya yasayên veguhastinê di zimanî de rûyê ji nav de yê zimanî aşkera kir teorîya berhemên û veguhastinê bi nêrîneka dîlayanî dinêre hevokên zimanî. Ew jî rûyê ji nav de û rûyê ji serve, rûyê ji nav de girîngî yê dide peywendîyên watayê û ji alîyêkî din ve girîngîyê dide rêxistina wan peyvan li dîv rêyên ji hev cuda ku eve nûnerayetiya rûyê serve dike (Sanya Cebar, 2012: 44).

Ew bîroka Edward Sapir¹¹ amaje kirîye, ji bilîdestnîşankirina wî li ser mêjî yan hizrê ji bo peydabûna teorîya berhemên û veguhastinê alîkar bû. Vê xwendîngeha nû hinek ji binemayên xwendîngeha binyatgerî (wesfî) retkirin ji alîyê:

¹¹**Edward Sapir** : (1884-1939) Li welatê Elmanîya hatîye ser dinyayê. Hêştta zarok bû dayik û bavên wî koçberî welatê Emrîka bûn. Yek ji zimannasên Emrîkî ye. Her wisa yek ji wan kesên ku rûlekê dîyar di pêşvebirina zanistê zimannasiyê de heyî. Dîsan tê hijmartin ji damezrênerên zanistê dengsaziyê.

- 1- Babet: Ev teorîye babetê xwe ji şîyana axaftvan li dûr sererastkirina û berhemhênana wî ji bo wan hevokên ku wî çî caran guh lê nebûye wergiritîye. Lê rêbaza binyatgerî babetê xwe ji deqên zimanî werdigire.
- 2- Armanç:Di teorîya “BV”ê de alîgirên wan bi dîyarkirina yasayên sentaksî radibin ew ên ji hevokan peyda dibin. Lê alîgirin binyatgerîyê armanca wan ew e regezên zimanî polîn bikin.
- 3- Alîgirên vê teorîyê dibînin ziman li ser astên mebestdar (pêkhat yan rûyê ji nav de) wekhev in. Lê alîgirên teorîya binyatgerî dibînin ku her zimanekê pêkhatê xwe ya cuda heye ku wî zimanî ji zimanên din ji alîyê pêkhatyê zimanî ve cuda dike.
- 4- Teorîya yekê girîngîyê bi watayê di şirovekirina zimanî de dide. Lê bêhtirîya zanayên binyatger zêdetir girîngîyê bi rûxsar (from)î didin (Ebdulselam Necmedîn &ŞêzadSebrî, 2011: 87-88).

Rêzimana berhemanîne sîstemeke ji rêzimana ku di avakirina pêkhatyên hevokê de pêşketineka berçav bi xwe ve dît. Mebest ji rêzimana berhemhênanê û her axaftvanek bi zimanekê di axive dibe ku bikaranîna wî destpêkek be berev rêzimana berhemhênanê eve wê yekê negihîne ku ewî pêzanînen heyin li ser wê rêzimanê ya ku bikaranîna yan jî wê bikar bîne (Elyewî, Şefîqe, 2004: 40-41). Her wisa têgeha berhehênan tê hejmartin ji giringtirîn têgehan ku rêzimana “BV”ê li dûv xwera anî. Mebest jê şîyanên çêkirina hejmareka bê dawî ya hevokan ji hinek keresteyên dîyarkirî yên rêzimanî di her zimanekê de. Her wisa têgehiştin û cudakirina wan ji hevokên nerêzimanî, zêdebarî derxistina hevoka nerêzimanî ji gorepana zimanî. Ev jî bi alîkarîya şîyanên xwezayî yên rêzimana zimanî (Elyewî, Şefîqe, 2004: 41-42). Teorîya berhemanîne pêkola wê yekê kir ku bersiva wê pirsê bide ya ku divê bê kirin. Çawan dibe axaftvan bikare hejmareke bê dawî ya hevokan beherhem bîne ji hejmareka destnîşankirî ya pêkhênen zimanî. Her wisa çawan dibe cudahîyê bike di navbera hevoka rêzimanî û nerêzimanî ji wan hevokan, zêdebarî ku wergirtina yasa û pêkhatyên bê dawî ku bersiva wê em dê bêjin (Nehir, 2011: 174). Mebest ji berhemanîne berhemanîna bercesteji “maddî” ya hevokê nîne. Wate derxistina dengî (fonetîk)î ya hevokê nîne. Lewre heta niha hevok di vî astê pêkhênanê de hêla serî ne vekirî ye heya ku hebûneka fizîkî hebe. Belkî mebest ji berhemanîne şîyanên yasayên rêzimanî bi xwe ne ji bo cudakirina hevoka rêzimanî ji hevoka nerêzimanî. Bi

şêweyek din her rêzkirineke peyvan ligorî yasayên rêzimanî be dê bibe hevok ku berevajî wan yasayan be û nabe hevok (Xolî, 1999: 8). Ew çendê jî lê zêdekir ku mirov dikare bi rêya wan yasayên rêzimanî du hevokan yan bêhtir çekê ji alîyê wateyê ve yek wateyê bidin. Lê ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve ji hev cuda bin û dikare hukmî li ser wan hevokên weke yek di rêzkirina pêkhênan de bide û ji hev cuda di wateyê de.

Her wisa Chomsky bizavkir bighe rêzimaneka giştî ji bo rêkxistina pêkhatayên hevokê di hemû zimanan de. Ev jî ji ber hebûna hejmareke faktorên wekhev di navbera mirovan de ku ev yasayên hene, tenê ji alîyê rêzimanî ve bi xwe dikarin hevokên rêzimanî çekin. Her wisa ev rêzimanê divê wesfekê bide pêkhatayên her hevokeke nerêzimanî (Elwe'ir, Mazin, 1992: 27). Rêzimana "BV"ê pêkoleke ji bo dîyarkirina şêweyekî Matematîkî di zimanî de ji bo wê çendê ku yasayên wê bikarin hevokên zimanî tenê hemû hevokên sererast berhem bînin û rêya ji berhemanîna hevokên nerêzimanî bigire (Dîyar Elî Kemal, 2002: 22). Chomsky ev hizr ji Matematîkê wergirtîye. Wate matematîksîstemê wê pêkhatîye ji hejmareka kêma û sinordar ji "nîşan" û "yasayan" ku bi sedemê wê yekê hejmareka bê dawî ya "bihayan" derdibire (Wirya Omer Emîn, 1987: 226). Ji bo mînak "Mirov dikare bi rêya tenê 10 hejmaran "0,1,2,3,4,5,6,7,8,9" komeke hejmarên bê dawî sererast bike li gor rêzkirina çendî¹² û çawanî¹³ ya evan hejmaran" (Şe'ban Şe'ban Ehmed, 2000: 143). Derbareyî alîyê cuda kirin û lihevçûna di navbera ziman û Matematîkê de. Em dikarin bêjin herdu alîyan pêkhênan heyin "peyv û hejmar". Dîsan herdu alîyan yasa hene. Anko yasayên hevokê ji bo zimanî û ên komkirinê jî ji bo Matematîkê. Ji alîyê din ve hizra rûnana pêkhênan hevokê bi bawerîya Chomsky mîna dîtina danana kivanaye di Matematîkê de (Dîyar Elî Kemal, 2002: 22). Her wisa di qonaxa yekem de gelek girîngî de alîyê formî (şikil) digot her zimanekê hebe sê yasa beşdarîyê di avakirina wî de dikin (Zêmar Mihemmed, 2017: 18).

¹² Çendî: Mebest jê çend xanên hijmara hebin (12) du xane (132) sê xane... hwd.

¹³ Çawanî: Mebest jê rêzkirin û bi hevra hatina wan (123) (321) (231) ...hwd(Diyar Elî Kemal, 2002 : 21).

2.3.2. Modelên Rêzimana Berhemanîn û Veguhastinê

Chomsky di rêzimana berhemanîn û veguhastinê de ji bo encamdana lêkolînên rêzimanî sê binema bi pêdivî dizane ku pêkhatine jî:

- 1 – Rêzimana bare sinordar.
- 2 – Yasayên pêkhênana girêyan.
- 3 - Yasayên veguhastinê.

2.3.2.1. Rêzimana Bare Sinordar

Ev binemaye wekî yekem binemayê rêzimana “BV”ê tê hejmartin ku cureke ji sîstemê şirovekirina pêkhatiya hevokê û li ser binemayê hizra matematîkê hatîye dariştin. Pêwendîya di navbera çend bizavan dîyar dike (Sebah Reşîd, 2009: 17). Di vî binemayî de hevok ji sedemê zincîreke helbijartinan ku bi arastê ji çep ji bo rast nizbet zimanê Îngilîzî têne berhemanîn. Her pêkhênanek pêkhênê du xwe heldibijêre. Em mînake tenê dikare hejmareka kêma ya hevokan berhembîne (Vîyan Silêman, 2009: 14). Ev sîsteme di piranîya zimanan de tê peyrew kirin. Araste jî li gor taybetmendiyên zimanan têne guhartin, mîna di zimanê Kurdî de, rêzkirin ji rast ji bo çep dibe (Tirîfe Mûhsin, 2016: 21). Her wisa xwertirîn pergala rêzimanî ye ku bi rêya dubarekirina yasayan şîyanên berhemanîna hejmareke bê dawî ya hevokan heye ji hejmareka kêma û sinordar (Vîyan Silêman, 2009: 14). Her wisa merc nîne. Hertim ew pergala ji aliyê pêwendîya di navbera pêkhênên hevokê de rast û dirust be. Wate ne merce hertim peyva yekem desthilat li ser peyva du xwe da hebe. Bi taybet di hevokên ne xwerû de (Dara Hemîd, 2012: 22).

Mînak:

111 - Ew bajêrê ew lê dijîn navê wê Zaxoye.

Di vê hevoka li jor de ku hevokeke aloze. Peyva çara “dijîn” neçar nîne peyva pêncê ku peyva “nav”e helbijêre.

2.3.2.2. Yasayên Pêkhênana Girêyan


Yasayên pêkhênana girêyan pêkhatine ji komeke yasayên ku ji bo pêkhênana girêyan têne bikaranîn. Ew yasayane ji mezintirîn yekeyên şirovekirina zimanî destpê dikin. Hevokan ji bo yekeyên girêyan şirove dike. Ev modele kar li ser pêkatên rêzimanî dike û ne ku pêwendîyên rêzimanî. Lewre ev du yekeyên zimanî ji hev cuda ne. Ji ber ku pêkhatayên rêzimanî erkên rêzimanî bi xwe ve digirin mîna “kirde, bireser... hwd” ku pêştir û di rêzimana klasîk de ji bo destnîşankirina wan pişt bi wateyê dihatê girêdan. Belê di rêzimana berhemanîne de bi rêya derasa û li gor cihê pêkhênên erkên rêzimanî têne destnîşankirin. Lewre peyv bihayê xwe yê rêzimanî ji wê derê werdigire ku tê de tê bikaranîn. Her wisa tixûbê pêwendîyên rêzimanî berfirehtire ji erkên rêzimanî kirde û bireser dikarin bibin beşek ji pêwendîya rêzimanî. Bi vê çendê pêkhênên rêzimanî dibine beşek ji pêwendîya rêzimanî girêya navî pola rêzimanîye ku dibe bibe beşek ji girêya navî ya serekî û di rola pêkhênanê kirdeyî de be. Yan jî bikeve di nava girêya lêkerî û di rola pêkhênanê bireserî de be. Bi vî awayî pêwendîya rêzimanî sererast dibe (Dara Hemîd, 2012: 23). Bi dîtina Chomsky ev modela baştir û bihêztire ji modela yekem. Her wisa guncayî ye heya ku bibe teorîyeka hizrî ji bo şirovekirina binyatê zimanên siruştî eger hinek arasteyên din ji bo bêne zêdekirin (Xilfan, 2010: 57). Bi vî awayî yasayên pêkhênana girêyan ku di rûyê ji nav de kar dikin. Wate girêdayî şîyananin, rêya bi bikarhênerê zimanî dide ku hevoka rêzimanî berhembîne. Lewre pêngava yekem berhemanîna her hevokekê ji rûyê ji nav de destpê dike û dûra digel bikaranîna wan yasayan hevoka sererast ji alîyê rêziman û wateyê ve tê berhemanîn (Tirîfe Mûhsin, 2017: 22-23).

Derbarê kêmasîyên yasayên pêkhênana girêyan em dikarin bibêjin ev yasaye li ser her zimanekê nayê bicihanîn. Tenê ew zimanan nebin ku ji alîyê rêzkirina pêkhênên rêzimanî ve. Mîna zimanê Îngilîzî bin û nabe em rûyê ji nav de ji bo mînak zimanê Kurdî sererast bikin. Ji bo wê çendê digel yasayên bi guncaw yan eger yasa bête bicihanîn. Dûra pêdivî bi yasayên veguhastinê yê din dibe (Sebah Reşîd, 2009: 23). Ji bo mînak ev yasaya li jor digel zimanê Kurdî neguncayî ye:

$$H \longrightarrow GN + GL$$

$$GL \longrightarrow L + GN$$

112 - Delshad is eatingfood.



Eger em vî cureyê rêzkirinê bi ser rêzkirina pêkhênên hevoka Kurdî bicihbînin. Ev li wî demî dê hevok pileka rêzimanî ya nizimtir wergire. Her weku di mînakên li jor hatine dîyarkirin:

113 - Dilşad dixot xwarinê.

114 - Dilşad xwarinê dixot.

Ev cureyê rêzkirinê di zimanê Kurdî de bi şeweyekê dine mîna hevokên li jêr dîyarin. Wate rêzkirina pêkhênên hevokê ji zimanêkê ji bo zimanekê din cudaye. Her wisa yasaya “GN → Article+N” ku di zimanê Îngilîzî de sedemê hatina wê heye û li ser hevokên zimanê Kurdî nayên bicihanîn. Lewre di zimanê Kurdî de di girêyeka navî de daçek dikeve pişt navî neku berî navî. Wate hemberî yasaya “GN N+Article” sedemê hatina wê di hevokên zimanê Kurdî de heye (Tirîfe Mûhsin, 2017: 23).

Mînak:

Kurek the boy

Her wisa yasayên pêkhênana girêyan bixwe sinordarin. Lê belê dibe gelek bêne berfirehkirin û di hemû cureyên hevokê de derbikevin. Lê li wî demî rêziman dê aloz bibe. Her di yasayên pêkhênana girêyan de kêmasîyên di jî hene mîna gelek caran yasayên pêkhênana girêyan penaseyê ji bo wan lihevçûn û cudahîyan nabe ku di hevokan da derdikevin. Ev jî ji bo wê çendê vedigere ku ew hevok şirovekirinên cuda ji bo tene kirin ji alîyê wateyê ve. Ji ber vê yekê yasayên pêkhênana girêyan hinek hevokên cuda ji pêkhatinê kom dike û caran wiha divê hevoka lihevçû ji hev bête veqetandin (Sebah Reşîd, 2009: 26-28). Mîna van hevokên li jêr:

115 -Azadî tirûmbêla xwe ji Newzadî kirî.

116 - Newzadî tirûmbêla xwe firot Azad.

2.3.2.3. Yasayên Veguhastinê¹⁴

Sêyem modele ji modelên rêzimana berhemanîn û veguhastinê û ji hemû modelên berî xwe bihêztir tê hejmartin. Ji ber wê çendê ku yasayên veguhastinê şîyanên destkarîkirina pêkhênên hevokan hene. Berevajî yasayên pêkhênana girêyan ku ew şîyan nînin (Dara Hemîd, 2012: 26). BoMînak:

117 - Evro dilşad li xwandingehê keft.

118 - Dilşad evro li xwandingehê keft.

Yekem hizra Chomsky ku di pirtûka xwe ya sala 1957an de belav kirî de pirsê serbixwe kirina sîstemê rêzimanê bû. Çunkî sîstemê rêzimanê li cem wî berpirse ji destnîşankirina hevokên rêzimanî û nerêzimanî. Wate bihevra hatina fonîman dibe hevok ya dirust be. Lê dibe jî hevokeke nerêzimanî jî peyda bibe. Piştî evan tiştê Chomsky pirsê kir. Dibêje ew binema çine ji bo cudakirina yekeyên rêzimanî û nerêzimanî piştî pê tê girêdan? Chomsky di bersiva vê pirsê de dibêje; “Nabe rêzimanîbûn bi hemû wateyan bête destnîşan kirin. Lewre dibe hevok rêzimanî be. Lê çî wateyek nebe” (Bogire, Ne’man, 2016: 205). Anko têgeha rêzimanê bi tenê girêdayî wateyê nîne. Wate ji ber vê yekê em nikarin têgeha rêzimanîbûnê li gor çî pîvereyê wateyî destnîşan bikin. Ka hemû ewên wate hene yan ewên ku meremekê digehînin rêzimanî (Hatim Wilya, 2006: 9). Ji bo bêhtir ronîkirina dîtina xwe. Chomsky hevokek anîye ku dibêje; Hevokên (119) û (120)ê xwedî wate nînin. Lê belê her axaftvanê zimanê Îngilîzî dizane ku hevoka yekem bi tenê rêzimanîye. Lê belê ji alîyê wateyê ve guncayî nîne (Chomsky, 1957: 19).

119 - Colorless green ideas sleep furiously.

120 - Hizrên keskên bê reng dinivin. Bi tundî.

121 - Furiously sleep ideas green colorless.

122 - Bi tundî dinivin hizrên keskên bê reng.

¹⁴ Ji bo bêhtir wergirtina agahîyan li gor yasayên veguhastinê binêre rûpelên vê tezê di navbera 89-96.

Eger em şirovekirina evan hevokên li jor bikin. Dê bînin di hevoka yekem de ji alîyê rêzimanî ve. Anko rêzkirina pêkhênan sererast e û lê ji alîyê wateyê ve ne guncayî ye. Lewre çî hizr xwedî reng nînin, heyaku bikarin bi tundî bibin. Her wisa di hevoka duyem da hem ji alîyê rêzimanî ve û hem ji alîyê wateyê ve sererast nîne. Li gor teorîya xwe Chomsky di hevoka yekem de bi tenê girîngî bi rêzkirina pêkhênan daye û li gor dîtina wî hevoka yekem rêzimanî ye û dîsan guncayî ye jî lê hevoka duyem nerêzimanî ye. Her wisa neguncayîye jî. Anko di qonaxa yekem ya teorîya xwe de Chomsky bi tenê girîngî bi alîyê rêzimanî dide û alîyê wateyê pişguh dike. Em dikarin bêjin ku sîmayê serekî yê qonaxa yekem a evê teorîyê ew bû ku Chomsky hêj li jêr kartêkirina bîr û dîtînen teorîya wesfî rizgar ne bibû bi taybetî dema digot; “karên sentaksî divê serbixwe bin ji karên wateyî”. Dibe hinek hevok di zimanî de guncayî nebin, “wate û bêwate bin” belê rêzimanî bin (Hatim Wilya, 2006: 9). Her wisa rêzimana “BV”ê kar li ser eşkerekirin û destnîşankirina yasayên şîyanan dike û bayexek wiha bi xebatên zimanî nade. Lewre ev teorîya zimanî ji bo şîyanan û xebatan dabeş dike. Her wisa di vê dabeşkirinê de şîyan amaje ye ji bo bizavên hemû axaftvanê resen yê zimanî ji bo tegehiştin û berhevanîna hevokan ku dibe pêştir qet guhlê nebû be, yan jî berhem ne anîbe. Ev şîyane jî ji alîyê zikmakî “fitrî” ji bo alîyê din ji wan hejmaran tê ku jîngeheka zimanî bi axaftvan dibexşe (Dîyar Elî Kemal, 2002: 13).

1. Şîyan (Competence):

Her mirovek di jîngehekê de ji dayik dibe, mezin dibe û bi zimanê wê jîngehê diaxive. Ji ber hindê di şîyanên wî/ê de heye, hejmareke berçav û bê dawî ya hevokên wî zimanî tê bigêhe (Bogire, Ne’man, 2016: 220). Chomsky dibêje; “Sîstemê rêzimanî yê her zimanekî ew gotin û axaftinên sinordar û herêmî yên têbînî kirîne ku rengvedana civakî ye. Wiha tê pêşbînîkirin gotinên rêzimanî yên bê sinor bi xweve digire. Anko sîstema rêzimanî li gor vî têgehî dibe rengvedana rewîştê axaftvan ku dikare zimanî berhembîne. Dîsan tê bigehe” (Chomsky, 1987: 19).

Chomsky dibîne ku cudahî di navbera şîyan û çalakîyan de pêdivîyeke serekî ye di wesifkirina zimanî de. Ji ber ku şîyan zanîna axaftvan yê ku şarezaye di zimanê xwe de. Çalakîya axaftinê jî bi karanîna zimanîye ji alîyê axaftvan û guhdarî ve di

helwestên dîyarkirî de (Hemase, Mihemmed, 2000: 32). Di teorîya xwe de Chomsky zimanî ji bo şîyan û çalakîyan dabeş dike û giringîyê nade çalakîya. Di derbarê vê yekê de dibêje; “Şîyan zimane û çalakî bêhtir zanistekê derûnî ye” (Dîyar Elî Kemal, 2002: 20). Chomsky, di pirtûka xwe ya bi navê “*Hinek Alîyên Teorîya Rêzimanî*” de, dibêje; “Babetê yekem yê teorîya zimanî ew axaftvan û guhdarê resene yê ku girêdayî komeke zimanî a hevregz bi tamamî û yê ku zimanê xwe bi başî dizane û dema ku şîyanên xwe di çalakîyeke rasteqîne da bikardîne li wî demî ew li gor yasayên rêzimanî yên neguncayî mîna kêmiya hizrê yan bê agahî yan xeletî kirin” (Chomsky, 1965: 10). Şîyan di teorîya “BV”ê de pêkatîye. Ji wan agahîyên veşartî yên axaftvan ji bo yasayên zimanê xwe ku derfetê ji bo çeke. Hejmareka bê dawî ya hevokan berhembîne ji hejmareka fonîmên dengî ên dîyarkir. Digel şîyanên biryardanê ji bo rastîya wan hevokên em guh lê dibin ji alîyê pêkhata rêzimanî ve. Paşê şîyanên bihevra girêdana dangan û komkirina wan di pîtekê de ku di hevokê de têne rêkxistin ku eve hemû di komeka kiryarên hizrî navxweyî de rû didin (Atif Fezil, 2005: 81).

Ev têgehe wan yasa û destûrên zimanî bi xwe ve digire ew ên ku di nava hişê takekesên zimanekê dîyarkirî de. Di parastî ku pêkhatine ji yasa û destûrên fonolojî û rêzimanî û wateyî ku bi rêya wan yasa û destûran di şîyanên axaftvanên her zimanekê de heye hejmareke bê dawî ya hevokan berhembîne (Şêrzad Sebrî, 2011: 125). Ji bo bêhtir ronkirin li ser şîyan û çalakîyan temaş berê xwe bide nexşeyê li jêr hatîye dirustkirin:

Zanistê zimanî yê her kesekê



yên helwestî. 2- Dirustkirin û dahênan:

2- Bikaranîna hejmareka

Bikaranîna zîmanî

bêdawî ya hevokan. di dewrûberkê nû de.

(Ferhadî, 2008: 42).

Di vî wêneyî de bi bawerîya Chomsky zanistê zimanî yê her axaftvan pêgîre bi wan şîyanên rêzimanî ku wî kesî heyin û bi rêya wan şîyana dikare hevoka nû sererast bike (Ferhadî, 2008: 42).

Her wisa yek ji taybetmendiyên vê teorîyê ew e ku Chomsky retkir hişê mirovî mîna rûpelekê spî bedema ku ji dayik dibe Chomsky hizra mirovî ji bo pergala zanîna hizrî rakêşa. Li gor wî mirov dema ji dayik dibe şîyanên xwezayî hene ji bo wergirtina zimanî (Dizeyî, 2013: 87). Bi bawerîya Chomsky hişê mirovî çend agahiyên xwezayî derbareyî zimanê hene ku bi rêya wan agahîyan dikare hevoka rêzimanî û nerêzimanî ji hev cuda bike. Her wisa ew agahiyên hizrî qonax ji bo qonaxê pêdivî bi geşekirinê hene. Her wisa dayik, bab û civak bi giştî faktorên giringîn ji bo geşe kirina wan agahiyên xwezayî yên derbarê zimanê mirovî (Nawxoş, 2005: 59). Her wisa Chomsky di pirtûka xwe de amaje ji bo teorîyeke zimanî kir ku bikare şirovekirinê ji bo hevokê dirust bike. Bi wateyeka din amaje ji bo şîyanan dike ku hevoka wiha berhem bîne ku pêştir nehatibe bîstin û dûra jî tê bigehe (Dizeyî, 2013: 88).

Şîyan ew jêrxaneyê zanyarîyane ku di her axaftinekê de hevok piştî xwe pê digire di berhemên de. Anko şîyan zanyarîyên axaftvanên derbarê zimanê xwe. Bi wî awayî ku şîyanên zimanî di berhemên 1957-1965an de şîyanên rêzimanî ne taybetin bi teorîya pêkhateyên zimanî. Her wisa ew yasa û destûrên veşartî ne ku qonaxa rêzimanê bi giştî pêktîne. Her wisa şîyanên rêzimanî şîyanên navxweyî yên zimanî ne û pêkhatîye ji zanyarîyên axaftinên resen beramberî rêzimana zimanê xwe ji aliyê têgehiştin û axaftinê ve ku bi şeweyê şîyanên zimanî berceste dibe (Dîyar Elî Kemal, 2002: 17).

Chomsky şîyanan dabeşî sê curan dike:

1 - Şîyanên Sentaksî (Hevoksazî): Ev cureyê şîyanên xistina kerestane li ser hev ji aliyê rêzêkirin û curan ve ji bo sererastkirina hevokê rêzimanî.

Mînak:

123 - Me xwar nan. *

124 - Me nan xwar.

Şîyanên rêzimanî yê axaftvanên zimanê Kurdî rêyê nadin hevoka (123) ê beramber hevoka (124) ê de berhem bê. Lewre di hevoka (123) ê de rêzkirina pêkhênan şaşî têketîye. Li gor yasayên rêzkirina pêkhênan hevokan di zimanê Kurdî de nehatîye kirin.

2 - Şîyanên Semantîkî (Wateyî): Pêkhatîye ji şîyanên helbijatina mercan ji bo ew yekeyên ferhengî yê hevokê heya ku wateyeka lêksîkî û lojîkî ya sererast hebe.

Mînak:

125 - Ew kiç bîjine.

	{ + Şîkirî }	{ - Şîkirî }
+ mê	{ + mê }	{ }

126 - Ew jin bîjine.

Şîyanên semantîkî yê axaftinkerên zimanê Kurdî rê nadin hevoka (125)ê li cihê hevoka (126)ê bête gotin. Lewre peyva “bîjin” ji bo wan jina tê gotin yê dimînin bê zilam bi her egerekê hebe. Wate peyva “bîjin” ji bo keçê nayê gotin.

3 – Şîyanên Fonolojî: Şîyanên li dûv yek hatina fonîman û pêkhatyên fonolojî ên hevokê ye.

Mînak:

127 - Min xwarin xwar.

128 -Min xwarin vexwar.*

Di herdu hevokên (127) û (128)ê de dîyar dibe ku şîyanên fonolojî yê axaftvanê zimanê Kurdî rê nadin bi lêvkirina hevoka (128)ê li cihê hevoka (127)ê. Lewre di hevoka yekem de peyva “xwarin” ji du kitan pêkhatîye û wateyeke temam dide û guhdar tê dîgehe. Lê belê di hevoka duyem de peyva “xwarin” ji alîyê axaftvanên zimanê Kurdî wate ji bo ne danîne. Lewre axaftvan û guhdarê zimanê Kurdî vê peyvê wernagirin.

2. Çalakî (Performance):

Mebest ji çalakîya axaftinê yan karê axaftvan ew encameye, axaftvanan jî wergireke dîyarkirî digehê. Ew jî li dema encamdana karekê yekser ji bo zimanî. Wate çalakîya axaftinê bikaranîna nîha ya zimanî ye di dewrûbereke dîyarkirî de. Di heman dem de berhemê karê amîrê zimannasîyê ye di çalakîya axaftinê de. Axaftvan bi şeweyekê asayî ji bo wê rêzimanê vedigere ku di nava şîyanên zimannasî yên axaftvan de di dema bikaranîna zimanî de heye. Ew jî di her rewşekê de axaftinê de derbaz dibe û wênê axaftin û axaftvan ji kesekî ji bo kesekê din tê guhartin (Bogire, Ne'man, 2016: 227).

Her wisa çalakî pêkhatîye ji axaftin yan hevoka berhem hatî ku bi şeweyê fonîm (deng) yan pîtê (peyv)li gor pêkhata hevokê hatîyê rêkxistin. Dîsan girêdayî rêziman û yasayên zimanekî veşartî ku ev jî bipirse ji rêkxistina fonîm û pîtan di pêkhateyinan de çalakî rûyê derbirîna dîyar, veşartî û ya nedîyar ya zimanî dîyar dike. Belêdi navbera şîyan û çalakîyede pêwendîyake kûr heye. Lêbelê dibe di navbera şîyan û çalakîyan de guncandineke tamam nebe. Her wisa dibe şaşî rûbidin ji encamê komeka egeran mîna sedemê "hizrî, derûnî, civakî ... hwd" (Emayre, Xelîl Ehmed, 2004: 250-251). Her wisa merc nîn e ew peyv û hevokên di nava hişê mirovî de weke xwebigihê wergirî. Lewre axaftin bi çend qonaxan derbaz dibe heya digihê qonaxa bîstinê ji ber wê yekê çalakî ew dengên zimanî ne ku axaftvan di darêtin (dirkandin) û merc nîn e dîmeneke rast û dirustê zimanî bin. Lewre gelek caran dubare kirin, rawestan, şaşîyên rêzimanî û kirtandinî tê de peyda dibe li gor barûdoxê (rewşa) gotinê (Dîyar Elî Kemal, 2002: 18). Her wisa Chomsky înkara çalakîyê nake. Ji ber ku çalakî xwedî xezîneke pêzanînên zimanî û ne zimanî ye, ku dibe cihê giringîdan hemû zanistên mirovayetî, ne bi tenê zanistê zimannasî. Çalakî pêdivîyên girîng dide xwendîgehên zimannasî hem yên nivîskî û her wisa yên zarekî ku girêdayî wî zimanî ne. Digel vê yekê jî çalakî bi dîtina Chomsky ne ku armanc rengvedana şîyanên zimanî û wêneyekî nêzî wê ye (Xilfan, 2010: 45). Çalakîya axaftinê karê pragmatîkê ye. Lewre bi rêya vî zaravî wergir dikare wateyeke guncayî ji bo hevokên neguncayî û neasayî bibîne. Ew jî destê xwe bi wî dewrûberî ve girê dide ewê firêker wan hevokan tê de dibêje ku bi rêya wî dewrûberî wergir dikare di mebesta hînkerekî bigihê.

Mînak:

129 - Tirumbêlê Dilşad kuşt.

Ev hevoke ji alîyê hevoke ve neguncayî ye. Lêbelê wergir bi rêya çalakîya axaftinê dikare di mebesta hînkerekî bigihê û wateyeke guncatî ji bo wê hevokê bibîne û mîna “dîwar bi ser Dilşadî da herift bit”. Anko ji encamê wê, wê heriftinê Dilşad mirî be.

Têgeha çalakî bikaranîna zimanî ye. Gelek caran axaftvan di bikaranîna zimanî de ji ber her egerekê hebe çî amûran be yan jî her egerekê din dikeve nava hinek şaşîyan. Lêkolîn li van şaşîyan karê zimannasî nîne. Lewre çalakî yê dawîyeke vekirî heye axaftvan şîyanên cudahîya şewazê derbirinê di dema axaftinê de heye. Lê belê demê wergir guh li hevokeke nerêzimanî dibe bizavan dike sererast bike. Lewre şîyanên wî rêyê pê didin ku sererast bike (Mihabad Ebdullah, 2010: 6). Chomsky û hevalên xwe wiha dibînin ku em nikarin giringîyê bi teorîya çalkîyê bidin. Da ku em pişt girê din bi teorîya şîyanan ev dîtine jî rêyê xweş dike ji bo çend asoyeyên nû ji pirsîyarên teorîyên cuda cuda yên zimanî ku zehmete bê çalakî bête encam dan (Dizeyî, 2014^a: 234). Ev teorîya lêkolînê li ser zimanî ji alîyê rûyê serve û ji nav de dike. Ji ber vê yekê şîyaye bi şeweyekê baştir ji teorîyên klasîk û binyatgerî alozîya babetî bi rêya rûyê ji nav de ku ji alîyê semantîkî ve tê xuyakirin dîyar bike (Sanya Cebbar, 2012: 46). Chomsky cudahî di navbera du rûyên pêkhatayên hevokê de kir. Ev jî ji bo asayîkirina xwandina hevoka bilêvkirî û nivêskî û têgehiştina wateya wan anko li gor teorîya “ BV”ê her hevokê du pêkhatayên serve û ji nav de hene û bi rêya pêkhênan veguhastinê bihevra tene girêdan (Elyewî, Şefîqe, 2004: 52).

1-Rûyê Serve (Surface Structure): Ev jî rû yan pêkhata ji derve a hevokê bi xwe ve digire ku pêkhatîye ji wan peyvên li dûv yek hatî ew ên axaftvan berhem tîne. Ev jî dibe şirovekirineke fonetîkî ya hevokê “Son Interpretation Phonetique” (Elyewî, Şefîqe, 2004: 53). Pêkhata serve pêwendî bi rêzkirina pêkhênan heye her ji dangan heya digihêje pêkhênanên ji dangan mezintir (Mihabad Ebdullah, 2010: 11). Eger hevokê du wate dan ew hevok yek pêkhata ji derve û du pêkhatayên ji nav de hene. Wate hevokê bimij (lêl) e (Dîyar Elî Kemal, 2002: 28). Rêziman “BV”ê bi vî awayê li jêr çareserîya hevoka bimij dike.


Mînak :

130- Ez birsîme. ~~rûyê~~ derve

131 - Ez dê çim xwarinê xûm. ~~rûyê~~ ji nav de

132 - Ez neşêm kar kim. —→ rûyê ji nav de

2-Rûyê Ji Nav De (Deep Structure): Ev jî rû yan pêkhata ji nav de ya hevokê bi xwe ve digire ku di nav hiş de her axaftvanan de heye. Her wisa hebûna wê xwezayî (zîkmakî) ye. Ev jî yekem qonaxe ji kiriyara berhemanîna wateyî a hevokê ku pêkhateka veşartî ye ya ku pêkhênên şirovekirina wateyî bi xwe ve digire (Elyewî, Şefîqe, 2004: 52-53). Wate her rêzimaneka rûyekê ji nav de û rûyekê serve bide her hevokekê û bi rêya pergaleke taybet herdu rûyan bihevra girêde dibe, bibe rêzimana veguhastinê. Her çende wê bi vî awayî xwe wesif nekirîye (Lyon john, 1981: 246). Her wisa jêderê hemû yasayên sentaksî, pêzanîn û şirovekirinên wateyî ye. Bi rêya yasayên veguhastinê hevok ji rûyê ji nav de ji bo rûyê ji derve tê veguhastin (Ebdulselam Necmedîn & Şêrzad Sebrî, 2011: 89). Her wisa ev pêkhata ji nav de wateyeka serekî dide hevokê. Dîsan ev pêkhate a ferzîye û wateya hevokê li ser ra diweste (Xolî, 1999: 7). Rêzimana “BV”ê girîngîyê bi pêkhata ji nav de dide ku pêk tê ji yasayên pêkhênana girê û yasayên ferhengî. Ev pêkhata ji nav de bi rêya yasayên veguhastinê pêkhata serve pêk tînin û dûra yasayên “fonolojî” bi vî awayê li jêr:



Lêkdana fonolojî(Vîyan Silêman, 2009: 16).

Chomsky wê çendê dişopîne ku rûyê serve di şîyanên wî de nîne. Çareserîya hinek ji arîşeyên wateyî di hinek hevokan da bike. Ji bo têgehiştina evan cureyên hevokan em neçar in penayê bibine ber rûyê ji nav de. Ji bo mînak hevokên mîna: “Gelek ji xelkê hinek ji pirtûkan dixwînin” û hevoka “hinek ji pirtûkan ji aliyê hejmareke zêde a xwendevanan ve têne xwandin”. Di van herdu hevokan da neçar in penayê bibine ber herdu rûyê serve û rûyê ji nav de ji bo wê çendê daku hest bi cudahîya di navbera wan herdu derbirînan bikin (Claude Germain & Raymond Leblanc, 2006: 96-97). Her wisa Chomsky cext ji wê çendê dike pêkhata ji nav de binemayeke ji bo têgehiştin ji axaftin û şirovekirinê ku eve jî tişteke di nava hişê axaftvan û wergirî de ye. Di wê diçûna axaftina tê gotin rengvedide ku di pêkhata ji nav de ye. Pêkhata ji nav de bi ditîna Chomsky tenê pêkhateka rehayê û binem berhem tîne û hemû pêwendîyên rêzimanî û erkên pêkhatan û agahîyên wateyî bi

xwe ve digire. Ji bo şirovekirina hevokan û hemû sedemên bikaranîna wan pêdivî ne (Bogire, Ne'man, 2016: 234-235).

Chomsky dijî wê çendê ji bo ku bi tenê li wateya serve ya zimanî vekole. Lewre eger em li rûyê serve yê zimanî temaşeyî ew wateya hevokê bikin. Dibe ku me berev şaşiyê bibe. Lewre Chomsky li 1965an de, amaje bi wê çendê kir ku astekê rêzimanî yê ji nav de heye. Em dikarin di vî astî de hevoka kirde dîyar û nedîyar bihevra girêdin (Talib Hisên, 2014^b: 86).

Mînak:

133 - Polîsî dizîker girt.

134 - Dizîker bi destê polîsî hate girtin.

Avahîyê ji nav de yekem qonaxa berhemhênana hevokê ye ji aliyê formî ve ji avahîyê ji serve cuda ye. Lewre bi rêya yasayên cuda berhem tê. Ev astê hevokê bicihanîna yasayên bingehî, avakirina girêyan û danana yekeyên ferhengî tê berhemanîn. Dîsan avahîyê ji nav de bipirse ji destnîşankirina erkên sentaksî yên pêkhênên hevokê. Her wisa rêxistin û rêzkirina wan pêkhêna di hevokê de (Segvan Miho, 2012: 3). Pêkhata ji nav de ji yasayên serekî tê berhemanîn ku ew jî yasayên ferhengî û yasayên pêkhatina girêyanin (Mihabad Ebdullah, 2010: 8).

2.4. Pêkhênên Rêzimanî di Teorîya Berhemanîn û Veguhastinê de

Di qonaxa duyem ya rêzimana “BV”ê de Chomsky bizava wê çendê kir bi şeweyekê hûr û karekî pêwendîya di navbera pêkhênên zimanî de destnîşan bike. Mebest ji pêkhênan jî ew zaraveye di zanistê zimanê berhemanînê de ji bo wan pêkhatan tê bikaranîn ku rêxistina rêzimana berhemanînê ji wan pêkhatîye. Ev jî piştî ewê çendê tê ku Chomsky karî pêwendîya aliyê wateyî bî sentaksê ve girê bide. Her wisa pêkhênê wateyî jî bi yek ji pêkhênên serekî yên zimanî bihejmêre (Tirîfe Mûhsin, 2016: 15). Wate ev teorîye di çend binemayan de kurt dibe yek ji wan ew e ku rêzimana her zimanekê van pêkhatan bi xwe ve digire. Ewan jî:

1-Pêkhênê Fonolojî (Phonological Component)

2-Pêkhênê Sentaksî (Syntactic Component)

3-Pêkhênê Wateyî (Semantic Component)

2.4.1.Pêkhênê Fonolojî (Phonological Component)

Pêkhênên fonolojî mîna yek ji sê pêkhênên zimanî. Ev pêkhêne pêkhatîye ji wan yasayên fonolojî ew ên têne bikaranîn ji bo derbirîneke fonolojîya sererast de şirovekirina alîyê dengî bike di derbirîne de (Şilêr Nayif Emîn, 2007: 13). Her wisa ev pêkhênane di rêzimanê da şewê dengê wan hevokan dîyar dike, bi rêya yasayên sentaksî hatine berhemanîn. Wate pêkhata berhemhatî bi pêkhênên hevokê bi şewê dengî digehîne bi amajekirin (Chomsky, 1985: 39). Ew yekeyên zimanî ku pêkhatine ji çend parçe gotinan di pêkhênên dengî da emê behis bikin. Wate bilêvkirina (telafûz) wan heye (Mûhsin Elî, 2013: 15). Anko yasayên wê nimayendeya fonolojî li ser pêkhata serve bicihtîne ji bo girêdan û derxistina fonolojî (Claude Germain & Raymond Leblanc, 2006: 91).

2.4.2.Pêkhênê Sentaksî (Syntactic Component)


Ev pêkhêne nîşanên girêyan bikartîne. Wate pêkhata serve ya hevokan nîşan dide mîna pêkhênê serekî di rêzimana “BV”ê derdikeve. Lewre dikare hejmareke bê dawî ya hevokan berhembîne (Mişêl Zekerîya, 1986: 157). Her wisa ev pêkhêne komeka bê dawî ya pêkhênên hevokê dîyar dike (Chomsky, 1985: 39). Ji bo berhemanîna hevokê. Lewre tê gotin erkê pêkhênê sentaksî berhemanîne hevokê bikartîne (Dîyar Elî Kemal, 2002: 29). Wate ji bo her hevokê pêkhateka serve û pêkhateka ji nav de dîyar dike (Chomsky, 1985: 39). Bi vî awayî pêkhênên sentaksî li ser du pêkhatan kar dike ku pêkhata berhemanîn û pêkhata veguhastine. Digel herdu pêkhatên din da ku fonolojî û wateye bihevra pêkhatyên rêzimanê tamam dikin (Tirîfe Mûhsin, 2017: 27).

Pêkhênên sentaksî ji du beşan pêk tê: Beşê yekem, binemayeke ku pêkhata ji nav de sererast dike û beşê veguhastinê ku ew jî pêkhata ji nav de digel pêkhata serve diguncîne. Pêkhata ji nav de ya hevokê girêdayî pêkhênên semantîkî ye ji bo şirovekirina semantîkî. Her wisa pêkhata serve jî diçe di nava pêkhênên fonolojî da û dikeve di bin şirovekirina fonetîkî. Wate dawî kartêkirina rêzimanê ew e ku

şirovekirina semantîkî bi şirovekirina fonetîkî girê dide. Ev jî wê çendê digihîne ku çawan hevokek tê şirovekirin (Tirîfe Mûhsin, 2016: 28).

Rêzimana “BV”ê ji sê pêkhênên serekî pêk tê her yek ji wan xwedî pergaleke taybet xwe ye. Her sê pêkhên jî di çarçovê zimanî da bihevra kom dibin û deng û wateyê bihev digehînin. Lêbelê pêkhênê sentaksî bi yekem pêkhênê berhemanîne tê hejmartin. Wate ew pêkhênê ku wesfa pêkhata ji nav de a hevokê dike. Di demekê de du pêkhênên din şîkarîn (tehlîlîn), piştî wê çendê ku pêkhênanê sentaksî şeweyê hevokê dîyar dike. Pêkhênanê wateyî wateya hevokan şirove dike û pêkhênanê fonolojî jî şirovekirina dengên dike (Mîşel Zekerîya, 1986: 157).

Formê rêzimanê dibe ku bi vî awayê li jêr be: Rêzimanek pêkhênanê sentaksî û pêkhênanê semantîkî û pêkhênanê fonolojî bi xwe ve digire. Pêkhênanê semantîkî û pêkhênanê fonolojî bi aşkerayî têne şirovekirin û herdu jî çî rolek di avakirina pêkhateyên hevokê de nîne. Pêkhênê sentaksî jî ji du beşan pêk tê: Yê yekem beşê binçî ye û yê duyem jî beşê veguhastinê ye. Beşê binçî ji çend beşên cur bi cureyên biçûktir û peyvan pêkhatîye. Beşê binçî pêkhata ji nav de dirust dike. Ew pêkhatine jî ku diçe di nava pêkhênanê sîmanîkî de şirovekirina semantîkî werdigire. Pêkhata ji nav de bi awayê nexşeyî digel yasayên veguhastinê tê guncandin di pêkhata serve de. Pêkhata serve jî şirovekirineke fonetîkî pê tê dan ji aliyê yasayên pêkhênên fonolojî ve. Bi vî awayî rêziman şirovekirinê semantîkî dide bal amajeyan û ew têkelkirin jî ji aliyê yasayên pêkhênanê sentaksî ve navbeynkarîye dike (Tirîfe Mûhsin, 2016: 29-30). Di vî nexşeyê de bi rûnê wê bê aşkera kirin:



2.4.3. Pêkhênê Wateyî (Semantic Component)

Digel wê çendê jî ku teorîya Chomsky girîngîyeka zor bi alîyê sentaksî daye. Her wisa evê teorîyê her ji destpêka peydabûna xwe qonaxeke nû anîye di nava lêkolînên zimannasî de ku karî bi şêweyekê ronî pêwendîya alîyê wateyê bi sentaksê ve destnîşan bike. Her wisa ji alîyê wateyê ve hevokên zimanî şirove bike. Ev kare jî ji bo sedemêwê çendê, careka din lêkolînên li ser wate, wateya peyv û wateya hevokê geşe bike. Di heman dem de bi yek ji her sê pêkhênên zimanî pêkhênê “fonolojî, sentaksî û wateyî” (Talib Hisên, 2014^b: 33).

Ew pêkhênanê rêzimanî ye ku erkê wateya hevokê digihîne û radibe bi şirovekirina sîmanîkî ya hevokê, li gorwan agahîyên wateyî yên ku ew pêkhên bi xwe ve digirin (Dîyar Elî Kemal, 2002: 31). Wate ev pêkhêne şirovekirina wateyî dikeve ser. Wate erkê darizandina wateya hevokan bi xwe ve digire ji sedemêwan agahîyên (input) ku yasayên pêkhata rûyê ji nav de berhevanîne. Wate sîmayê wateyî her yek


ji peyv an û rêkirina wan di hevokê de li gor destûrê zimanê kiryara wateyê digihê encam (Mûhsin Elî, 2013: 17).

Bi giştî pêkhênanê wateyê bizavan dike ji bo dubarekirina mînakê ku şîyanên girêdana rasteqîne ya di navbera deng û wateyê de. Lê belê ji aliyê veguhastinê ve tenê her rûxsarekî rute. Her rêzkerîye û em nikarin guhartinan li wateyên rûyê ji nav de bikin ku pêdivîye di vî bîyavî de bête bi girîng bê wergirtin ku bi teorîya nimûne hatîye binavkirin. Pêkhata ji nav de destnîşana nimayendeya wateyê û pêkhata serve jî destnîşana nimayendayîna dengî dike (Claude Germain & Raymond Leblanc, 2006: 93). Pêkhata sentaksî jî di navbera wan de kar dike ji bo gihandina herdu aliyên wate û dengbihevra qalibê rêzimanê temam dikin (Tirîfe Mûhsin, 2016: 31).

Chomsky ew çende jî dîyarkir ku pêwendîya di navbera deng û wateyê pêwendîyeke yekser nîne. Belkî ew deng in ku bi astekê din de derbas dibin ku astê rêzimanê ye. Wate ew deng li gor destûr û yasan bihevra tene girêdan di astê morfolojî de ji bo pêkhênanan peyv û pîten zimanê. Her wisa peyv di astê sentaksî de bihevra tene girêdan ji bo pêkhênanan girê û hevokên zimanê ku her yek ji wan yekeyan peyv, girê û hevokan li gor yasayên wî zimanê wateyê werdigirin (Talib Hisên, 2011: 18).

Derbarê pêwendîyên pêkhênan û pêwendîya wan digel astê ji nav de û ji serve weha tê xuya kirin ku herdu pêkhatên fonolojî û wateyê bi tenê erkê wan şirovekirin dibe. Ê her yek ji wan ew agahîyên ku pêkhata sentaksî dide wan bikar tînin. Ev koma agahîyan pêk tê ji sîmayên taybet yê pêkhênan. Zêdebarî çewanîya pêwendîya di navbera wan de di hevokê de dîyarkirî de. Lewre divê pêkhata sentaksî bo her hevokê d du astan de bê. Astê ji nav de bo şirovekirina wateya hevokê û astê serve bo dîyarkirina çewanîya guh lêbûna hevokê bi rêya pêkhênanê wateyê bi destve tê. Yê duyem bi rêya pêkhênanê fonolojî (Vîyan Silêman, 2009:22).

Di vî nexşeyê de bi rûnê wê bê aşkera kirin:



2.5.Rêzimana Veguhastinê (Transformational Grammar)

Qonaxa duyema geşekirin û guhartina teorîya “BV”ê di wî demê de dest pêdike. Ji ber vê Chomsky pirtûka xwe ya duyem ya bi navê “Hinek Alîyên Teorîya Rêzimanî” (Aspect Of The Theory Of Syntax) li sala 1965an de belavkirî ku bi teorîya Standart bernîyas e. Chomsky di vê pirtûkê de ji hinek ji dîtînen xwe yê kevin poşman dibe û daxwazê dike wan xeletîyan rast bike (Hatim Wilya, 2006: 10). Her wisa di çarçovê pirtûka xwe de bizavkirin berxwedanekê li wan alîyan bike ku di berhemê xwe yê yekem de piştguh avêtîbû bi taybetî alîyê wateya hevokê û çawanîya pêwendîya wê bi rêzimanê ve (Vîyan Silêman, 2009: 16). Ev berheme teorîyeke nû bû di warê rêzimanê de berçavkirî û bêhtir rolê wateyê di rêzimanê de dîyarkir. Û dibêje; “Rêziman ji komeka yasayan pêk tê ku pêwendîye di navbera dengî û wateyê de pêdivîye bi tenê ji van yasayan hemû hevokên zimanê peyda bibin û wateyeke

sererast bidin û bi taybetmendîyên fonetîkî yê sererast bine derbirîn” (Hawkins, 1978: 43). Anko ev teorîye dirêj pêdana teorîya klasîk e. Lêbelê digel hinek guhartin û zêdekirinên nû. Yek ji wan karên girîng ên vê teorîyê berçav kirina rolê semantîkê bû. Her wisa ev teorîye teorîyeke temame û seranserî ye ji hemû alîyan ve mercê wesifkirina hemû zimanên mirovan tê de hene. Dîsan ew yasayên bingeheên ku di her zimanekê de hebin di vê teorîyê de hatine behis kirin ji ber vê çendê navê wê kirîye teorîya stander e (Şilêr Nayif Emîn, 2007: 12). Chomsky di vî berhemî yan jî qonaxê de hewla wê yekê da ku ji hinek wan dîtinên xwe yê ku di qonaxa yekem de poşman bibû û hewla wê yekê da ku rûhinkirineke wateyî bide bizava teorîya “BV”ê û heya radeyekê pişt bi wateyê girê dide (Amir Bin Şetoh, 2014: 49). Wate sîmayê serekî yê vê qonaxê ku ji qonaxên din cuda dike ew bû ku Chomsky şirovekirineke wateyî ji bo hevokê zêde kir û ev şirovekirina wateyî bi temamî li ser bingeha pêkhata ji nav de ya hevokê bû. Anko hemû wate divê di pêkhata ji nav de cêgîr bibin û ev wate ye di pêkhata ji serve de jî bine parastin. Bi wateyêke din evê teorîyê wisa hizr fikir ku guhartin di pêkhata ji nav de nabe sedemê guhartina wateyê. Divê wateya pêkhata ji nav de û pêkhata serve wekhev bin (Hatim Wilya, 2006: 10).

Chomsky bêhtir guncandina ewê cure rêzimanê dike ku jêra tê gotin rêzimana veguhastinê. Bihaneya Chomsky jî ji bo guncana evê rêzimanê wekî ew dibêje; vedigere ji bo ewê çendê ku tenê bi rêya yasayên veguhastinê çendîn hevokên din ji hevokekê dirust bike (Nawxoş, 2005: 65). Veguhastin yek ji wan karên hevoksazî ye ku girîngîyeke zêde di pêkhata teorîya “BV”ê de heye û yeke ji pêkhênên ewê rêzimanê. Veguhastin karekê hevoksazîye li ser komeke pêkhatayên rêzimanî kar dike û diguhere ji bo komeka pêkhatên nû û pêkhateka dariştî jê sererast dike (Yosif Norî, 2015: 24). Rêzimana veguhastinê hejmareke zêde ya hevokan berhem tîne her ji destpêka pêkhata ji nav de berev pêkhatên serve yê cuda e ve jî bi rêya bicihanîna yasayên berî niha me dayîn dîyar kirin (Merîc Nesîm & Mekkûd Ferîd, 2017: 13). Di teorîya veguhastinê de rêziman êdî xwe li tixûbê hejmartina hûr pêkhênên hevokê û dabeşkirina wê ji mezintirîn pêkhênên wê yê yakser ji bo biçûktirîn pêkhên ne rawestîya. Belkî ji bo şîyanan ji bo pêşkêşkirina wesfeka hûr û giştî ji bo avahîyên hevokên zimanî di rewşên cuda de, ev çende girêdayî wênekirina wan sîstemaye yê ku axaftvan di bikaranîna zimanî de bi şeweyekê asayî li ser diçe. Ew şîyan jî berhemanîna hevokên rêzimanî ye û çî tiştêke din ne ji bilî hevokên rêzimanî û ji bo

bicihanîna vê armancê Chomsky pêkhênêkê nû da digel pêkhênên sentaksî ku ew jî pêkhênê veguhastinê ye (Xilfan, 2010: 98). Bêguman hizra veguhastinê berfireh dibe da ku bikaribe hemû hevokên zimanî yên nivîskî û ne nivîskî bi xwe ve bigire. Wate her hevokeke zimanî ya nivîskî û ne nivîskî pêkhateka ji nav de ya heyî (Hemase, Mihemmed, 1990: 76).

Destpêka lêkolînê li rêzimana veguhastinê vedigere ji bo belavbûna babetekê ji alîyê Harris¹⁵ ve ku li sala 1952an de bi nav û nîşanên “Transformer Grammer” di kovara “International Journal Of American Linguistics” de belavkir ku tê de daxwaz bi giringîya destnîşankirina kotên rêzimana zimanî di nava pêkhênên serekî de ku bêhtir bêne ronîkirin (Emayre, Xelîl Ehmed, 1984: 49). Wate hatina teorîya veguhastinê mîna yek ji binemayên rêzimana “BV”ê ji bo çareser kirina arîşeyên pêwendîya di navbera hevokan û pêwendîya di navbera pêkhata ji nav de û pêkhata ji serve ku yasayên pêkhata girêyan nedikarî çareserîya wê bikin. Her eve ji bo eger ku ev teorîya rêzimanî di şirovekirin û guncankirina rêzimanî de serkeftinê bi dest ve bîne (Hêro Ehmed, 2008: 10).

Ew rêzimana ku kontrolê di veguhastina hevoka serekî de dike rêzimana veguhastinê ye. Ew rêziman hinek pêkhênên pêkhata ji nav de teref dide yan jî cihekê ji bo cihekê din vediguhêze yan jî guhartina wan ji bo pêkhênên cuda yan jî hinek pêkhênên din lê zêde dike. Yek ji karên wê yên serekî veguhastina pêkhata ji nav de ya hevoka gumankirî ye ya ku pêkhatî ji wateya hevoka serekî ji bo pêkhata serve ya berceste ya ku pêk tê ji avakirina hevokê û şêwazê wê yê dawîyê (Chomsky, 1965: 88).

Pêkhata veguhastinê dema ku dest bikar dike li ser gehandina pêkhatayên rêzimanî yên veguhastinê destpêkê bi şêweyekî yekser li ser pêkhata ji nav de karî nake ji bo yekser berhemanîna pêkhata serve. Wate pêkhata veguhastinê

¹⁵**Harris:** Navê wî yê dirêj Zellig Sabbetai Harris e (1909-1992). Nivîserekê Emrîkî ye di warê ziman û zanistê matematîkî da yê naskiriyê ku hizira pêkhata veguhastinê aniye di nava lêkolînên zimannasî de. Li bajarê Podolia li ser demê îmbiratoriya Rosî ku niha welatê Ukraniya ye hatiye dunyayê. Dema ku temenî wî çar sal bûn dema malbata wî koçberî welatê Emrîka bû û li wîlayeta Philadelphia akencî bûn. Li sala 1941an-de jiyana hevîniyê digel Bruria Kaufman pêkaniye. Ev xanima şarezaya zanistê fîzîkî bûye. Dîsan li sala 1930ê belgenameya bekelaryos û xwandina bilind 1932 û doktora 1934an de di pişka lêkolînên rojhelatî di zanîngeha Philadelphia. Her wisa Harris yê karîger bû bi şîyanên Edward Sapir û Leonard Bloomfield sererayî wê çendê ku digel kes jî wan jî kar nekiribû.

pêwendîyeka yekser di navbera pêkhata ji nav de û serve nîne. Belkî bi şeweyekê giştî em dikarin bêjin komeka pêkhatayên veguhastinê beşdarîyê di berhemanîna pêkhata serve ya hevokê de dikin û zorîya hevokan bi rêya bêhtir ji veguhastinekê tene veguhastin ji bo astê pêkhata serve. Ev jî wê çendê digihîne ku veguhastin ji pêkhata ji nav de cur dike û bi pêkhata navendî yan pêkhatên navendî da derbas dibe berev pêkhata serve (Diyar Elî Kemal, 2002: 58).

Yasayên veguhastinê dikevîne piştî yasayên pêkhatina girêyan. Her wisa yasayên veguhastinê li ser pêkhata berhemhatî ya yasayên pêkhatina girêyan kar dikin û arasteyî jor tene kirin. Yasayên veguhastinê piştî yasayên pêkhatina girêyan û yasayên ferhengî tene bicihanîn (Xolî, 1999: 22). Her wisa ew yasa na tene guhartin çî zêdekirin yan ladan yan jî cihguhartinê pêkhenên hevokê yan jî kar li ser wan avahîyên berhemhatî ji karê hinek yasayên pêştir dikin. Armanç ji kiryarên veguhastinê gihandina avahîyê hevokê ye ji bo şewê wî yê serve (Mirteza Cewad, 2002: 64). Lewre “yasayên veguhastinê” hinek caran bi “yasayên temamker”(Supplementary Rules) tene bi nav kirin. Di demekê de yasayên pêkhatina girêyan bi “yasayên seretayî”(Elementary Rules) tene navkirin. Lewre rêziman ji wan yasayên seretayî cur dike (Xolî, 1999: 23). Wate yasayên veguhastinê bi erkê veguhastina hevokê ji avahîyê ji nav de ji bo avahîyê ji serve radibin û ev yasayê berpirsin ji wan guherînên bi ser hevokê de tene li demê veguhastina wê ji wî astene diyarê ji nav de ji bo astê maddî û bercisteyî yê ji serve (Segvan Miho, 2012: 6). Her wisa danîna rêzimana veguhastinê pêdivîyêke giring bû ji bo çareserkirin û ronkirina pêwendîya di navbera hevokan. Ew guhartinên di nava hevokê de rû didin. Her wisa mîna pêdivîyêkê bû ji bo ronkirina wan guhartinên ku di pêkhata berhemhatî ya yasayên pêkhatina girêyan rû dide. Li cihguhartin, ladan, zêdekirin... hwd û ronîkirina pêwendîya hevokan digel hev.

2.5.1.Cureyên Yasayên Veguhastinê

Rêzimana veguhastinê komeka yasayan bi xwe ve digire ku bi yasayên temamker qayideyên pêkanîn (Supplementary Rules) ku pêwendîyên di nava hevokê de di tene diyar kirin. Ev yasayê pêkhata ji nav de ya neberbiçave ku wateya hevokê heldigire diguhere ji bo pêkhata berceste ya diyar ya hevokê û şeweyê dawîyê bête

dîyar kirin. Ev yasaye hinek ji wan xwestekên rêbazên hûrdûyî (yasayên xwestekî)(Optionsl Rules) û hinek jî bi zêdeyî rêbazên mecbûr (Obligatory Rules) û hinekên din jî di livokin û hinek ne livokin. Her wisa hinek fer in û hinek cot in (Mîşêl Zekerîya, 1986:16).

2.5.1.1. Yasayên Taybet ¹⁶

Yasayên taybet di nava xwe da ji sedemêwan erkên ku dikin dibine du cur:

1 - Yasayên Bi Zorî (Obligatory):

Ew yasayanen ku mirov nikare destan jê berde, divê hertim bêne bikaranîn û nabe bicihanîna evan yasayan li gor hêz û xwesteka axaftvan be. Lewre eger ev yasaye neyên bikaranîn li wî demî çî dema hevokeke rêzimanî nayên berhemanîn (Îvic,2000: 384). Bicihanîna evan yasayan li ser hevokê pêdivî ye û nabe hevok destan jê berde û hevok ji aliyê pêkhata serve de bê bicihanîna wan berhem nayê (Dîyar Elî Kemal, 2002: 59). Anko mebest ji vê yekê jî berhemanîna hevoka rêzimanî ye.

Bêguman mebest ji yasayên bi zorî ew e ku divê li ser hemû ew pêkhatayên cuda ku dikevîne di bin yasayên veguhastinê ya taybet mîna yek bêne bicihanîn. Ji bo mînak di zimanê Kurdî de her dema hevalkarê cihî û demî bihevra bî hertim hevalkarê demî berî hevalkarê cihî dikeve (Vîyan Silêman, 2001: 20).

Mînak:

Hevalkarê cihî + hevalkarê demî — ~~Hevalkarê demî~~ + hevalkarê cihî

Li mal + duhî —————→ Duhî + li mal →

135 - Ez li mal duhî bûm. —————→ Ez duhî li mal bûm.

2 - Yasayên Xwestekî (Optional):

¹⁶ Bo bêhtir wergirtina agahiyan derbarê yasayên taybetên bi zorî û xwestek di zimanê Kurdî de binêre (Diyar Elî Kemal, 2002: 59-76).

Ew yasayen ku bicihanîn yan jî ne bicihanîna wandi hevokê de li gor xwastek û arezûya kesî ye. Ji bo mînak gorîna hevoka erê ji bo na (Vîyan Silêman, 2001: 20). Anko di zimanî de tiştek bi navê zorî nîne (Xilfan, 2010: 105). Her wisa yasayên bi zorî evan yasayan bi xwe ve digire “dem, pêvek, tixûb û cudakirin” e (Elwe’ir, Mazin, 1988: 146).

Mînak:

136 - Ez çûm xwandingehê (erê).

137 - Ez ne çûm xwandingehê (na).

Her rêzimanekê ku bi rêya wê hevokek bihête veguhastin ji bo hevokekê din ku ji aliyê wateyê ve wateya wan wekhev be. Her wisa zêdebarî têbînîya pêwendîyên hevokên hemwate. Her wisa wan lêpîrsînên ku rû didin da ku hevokê ji aliyê pêkhata serve cuda dike ji hevokên din (Hîcazî, 1998: 125). Ku bi rêya:

a - Ladan

b - Cihgirtin

c - Zêdekirin

d - Veguhastin

A- Ladan (Deletion):Ladan dîyardeyêke zimanî ye di her zimanekê de berçav dikeve. Ev dîyarde ji bo xwedî axaftvan vedigere ji bo ladana hinek ji pêkhênên zimanî bi mercekê ladana wan pêkhênan nebe sedemê sererastkirina kirina hevokekê bimij di wî dewrûberê zimanî de ku kiriyara ladanê tê encam dan (Yosif Norî, 2015:139). Her wisa yek ji yasayên rêzimana veguhastinê pêk hatîye ji yasaya ladanê. Ladan beşekê ji veguhastinê bi wateya ladana beşekê ji hevoka serekî ji bo meremekê di wateyê de di demekê de hevokê heman wateyê digire (Atif Fezil, 2005: 89). Hinekê caran axaftvan zimanî evê dîyardê bikartîne bi tenê ji bo xwe ladan ji dubarekirinê (Derûn Salih, 2012: 154). Di her hevokekê ku mirov dibêje zêdehî tê de bi wî awayî mirov dikare hinek ji pêkhênên hevokê la bide bê ku wateya hevokê têk biçe û guhdar tûşî (rastî) hîç arîşekê bibe (Xirma, 1978: 23). Xwedîyên vê xwendingehê dibînin ku ev kiriyare kartêkirineke wiha nake ser pêkhata ji nav de

mîna “Zarokî pênûs şikand”. Lê derbirînê ji hizreke kûr dike û çî ji wateya wê naguhere dema ku em bêjin “Pênûs şikand”. Her wisa ladan hemû pêkhênên serekî digire mîna “kirde, bireserû lêker” yê neserekî mîna “rengdêr, hevalkar, tamamker” bi xwe ve digire. Ev dîyarde di her sê astên Fonolojî, Morfolojî û Sentaks de tê berçav (Necar, 2006: 90). Her wisa ladan weke dîyardeyeke hevoksazî di rêzimanê de hinek pêkhênên zêde û dîyar têne ladan di hevokê de (Trask, 1993: 76). Wate ladana wan pêkhênên hevoka bimij sererast neke ji alîyê wergirî yan xwandevanî ve. Lêbelê bi mercekê ku ew ladan nebe sedemê têkçûna wateya hevokê (Ferhadî, 2008: 191). Her wisa sererastbûna pêkhata serve ya hevokan tenê bi rêya yasayên veguhastinê nahê encam dan. Belkî proseya din jî tê de beşdare ku yasaya ladana pêkhêna ye. Ev pêkhêna jî li ser astê semantîkî hebûna xwe hene. Lê belê li ser astê pêkhata serve têne kurisandin (Karwan Omer, 2008: 37).

Yasaya vî cureyî bi vî awayî ye:

$$A + B \implies \emptyset + B$$

Mînak:

138 - Tu here.

139 - \emptyset Here.

B - Cihgirtin (Replacement): Pêktê ji guhartina pêkhênêkê rêzimanî bi pêkhênêkê din yê rêzimanî. Wate ev cureyê veguhastinê dibe sedemê guhartina wateya hevokê (Xoşnaw, 2014: 185).

Di zimanê Kurdî de eger kirde û bireserê hevokê yek kes bin. Li wî demî dê cînavê xwe “xwe” li cihê bireserî bête dayîn (Vîyan Silêman, 2001: 20). Cînavê xwe ew e ku kirde û berkar amaje ji bo yek kesî bikin û li cihê berkarî cînavê xwe bikar were (Dizeyî, 2014^a: 232). Lewre eger cînavê xwe bikar neyê li wî demî dê hevokê nerêzimanî peyda bibe.

Mînak:


$$\text{Yasa: } A \implies B$$

140 - Dilşadî Dilşad kuşt.

141 - Dilşadî xwe kuşt.

Şirovekirina hevoka (140) ê bi rêka darasa:

Dilşadî Dilşad kuşt.



Gelek caran ev cînavê “xwe” ji bo tekez kirinê tê bikaranîn (Dizeyî, 2014^a: 232).

Mînak:

142 - Min bi xwe pare ji bo birin.

3 - Zêde Kirin (Addition):Pêktê ji zêdekirina pêkhênêkê rêzimanî ji bo nava hevokê. Bê ku ew pêkhênan bandorê li ser wateya hevokê bike. (Xolî, 1999: 23). Ev zêdekirine jî bi tenê ji bo baştirkirina pêkhata serve ya hevokê ye û çî bandorkirin di pêkhata ji nav de ya hevokê nake (Emayre, Xelîl Ehmed, 2004: 260).

Yasaya vî cureyê veguhastinê bi vî rengê li xwarê ye:

$$A + B + C \implies A + B + D + C$$

Mînak:


143- Mamosta hat.

144 - Mamostayê zîrek hat.

145 - Mamostayê zîrek bi trumbêlê hat.

Şirovekirina hevoka (Mamostayê zîrek bi trumbêlê hat) bi rêka darasa:

Mamostayê zîrek bi trumbêlê hat.



Hinek caran di pêkhata serve ya hevokê de pêkhênên zêde têne dîtin ku di pêkhata ji nav de nayên dîtin (Emayre, Xelîl Ehmed, 2004: 260).

Mînak:

146- Newzadê birayê azadî hat.

147- Newzad hat.

Herdu hevokên (146) û (147) ê yek hizrê derdibirin ku ji rêya derbirîna wateya herdu hevokan têdigehtin ku Newzad hatîye. Lewre pêdivî ne dikir girêya navî “birayê Azadî” li piştî peyva Newzad hatiba ku di pêkhata serve de mîna zêde kirinekê hatîye bikaranîn.

D -Veguhastin (Permutation):Cihguherîna pêkhênên hevokê yek ji kiryarên veguhastinê ye û bi kiryareke giştî di zimanê mirovî de tê hejmartin. Lewre her zimanekê rêzkirina xwe ya taybet heye. Paşî ev rêzkirine bi rêya hinek yasayên veguhastinê ji bo şêweyen cuda cuda di axaftina karekî de û di pêkhata ji serve de tê guhartin (Fayiz Sobhî, 2010: 203). Wate veguhastina pêkhênên hevokê di avakirina ji serve ya hevokê de rû dide.

Ev cureyê veguhastinê bi şêweyekî dibe ku mirov dikare pêkhênên hevokê cihên wan lihev biguhere. Lê belê bi mercekê divê wateya ji nav de ya hevokê

guhartin bi ser da neyê (Yosif Norî, 2015: 27). Her wisa ev hevokê hem ji alîyê rêzimanî ve. Hem ji alîyê wateyê ve ya guncayî be. Bo mînak di zimanê Kurdî de veguhastina di navbera kirde û birserî de bi mebesta dakokî kirin li ser bireserî guncayî ye. Lê belê hatina lêkerî li destpêka hevokê şaş e û hevok dibe nerêzimanî û morkê (şêwe, sitîl) Kurdî pêve namîne (Vîyan Silêman, 2001: 20). Ev cureyê veguhastine bi tenê di pêkhata ji serve ya hevokê de tê encamdan û di pêkhata ji nav de ya hevokê çî kartêkirina xwe nîne û wateya wê naguhere.


Yasa: $A + B + C \rightarrow A + C$ (Xolî, 1999: 24).

Mînak:

148 - Min wana xwe nivîsî.

149 - Wana xwe min nivîsî.

Şirovekirina hevoka (148) ê bi rêka darasa:



Li sepandina yasayê veguhastinê li ser hevokê, rêzbûna bingeh ya pêkhênên wê tê guhartin. Pêkhênên yan bêhtir ji cihê xwe yê bingeha di hevokê de tê veguhastin ji bo cihekî din, ev pêkhênan yan di hevokê de têne pêş yan diçe paş (Segvan Miho, 2012, 9).

Mînak:

150 - Karzan evro çû \Longrightarrow Evro Karzan çû.

151- Karzan ji mal derkeft \Longrightarrow Karzan derkeft ji mal.

Di hevoka (248) ê de, hevalkarê demî “evro” ji cihê xwe yê bingeh, ji bo pêşîya kirdeyî hatîye veguhastin. Anko li vêrê pêkhên hatîye pêş. Lê belê di hevoka (151) ê de, hevalkarê cihî “ji mal” ji cihê xwe yê bingeh ji bo piştî lêkerî hatîye veguhastin. Anko li vêrê pêkhên çûye paş.

2.5.1.2. Yasayên Giştî

Ew yasayên li ser du hevokên berhem hatî kar dikin, herdu hevokên berhem hatî ji alîyê yasayên pêkhata girê ji bo girêdana hevokan yan sererastkirina hevoka aloz.

Yasayên giştî ~~da girêdanê~~ $(\hat{u}) + h1 + h2$ $h1 + \hat{u} + h2$

Mînak:

Hevoka hevedudanî ~~152~~ Ez hatim paşî ew çû.

Hevoka aloz ~~153~~ Eger bihar hat, emê çin seyranê.

Yek ji taybetmendiyên evî cureyê veguhastinê ew e pêkhênên hevokê di nava xwe de nayên paş û pêş kirin. Lewre daçeka girêdanê digel beşa duyem de ye û ji alîyê wateyê ve jî paş û pêşî kirin hev wateyê sererast nake (Dîyar Elî Kemal, 2002: 60).

Teorîya “BV” ê ji bilindtirîn pêkhat cur dike ku hevokê, li cem wan yekeya ji hevokê mezintir di astê hevoksazîyê de nîne. Heya digihê nizimtirîn pêkhat ku peyve û li gor wan daneya ji peyvê biçûktir di astê hevoksazîyê de nîne (Hatim Wilya, 2006: 35). Li gor xwendigeha berhemanîn û veguhastinê girêya navî û girêya lêkerî ji pêkhênên hevokê ne hevok mezintirîn yekeya sentaksî ye ku di avakirina ji nav de ya pêkhênên “girêya navî” û “girêya lêkerî” bi rêya sentaksî bihevra têne girêdan (Trask, 1993: 44). Her wisa xwendigeha “BV” ê avahîyê hevokê bi mezintirîn

daneya sentaksî dihejmart anko pêkhate û nabe pêkhêna daneyeka ji xwe mezintir. Bi wateyêke din hevok pêkhên nîne ji bo çi pêkhateyên ji xwe mezintir. Anko hevok ew yekeye a pêwendîya rêzimanî digel yekeyên din ên zimanî ne nebe. Ev xwendingeha rêzimanî hevokê li gor pêwendîyeka heremî şirove dike (Segvan Mihemmed, 2016: 95).

Serhildana evê teorîyê mîna çareserîyêkê bû ji bo wan arîşên ku teorîya standerd rastî bibû. Ji bo mînak tûntirîn kût li ser yasayên veguhastinê danan ji bo wê çendê rêyê bi guhartina wateyê nede. Merem ew e veguhastin dibe bergirî ji wateyê bike û wateya hevokê di pêkhata serî de eynî wateya pêkhata xwarê hebe. Lewre di şirovekirina hinek ji hevokên zimanî de derdikeve, veguhastin dibine sedemê guhartina wateya hevokê yan hevoka bimij peyda dike. Ji encama bi serve çûna teorîya standerd berfireh di dawîya salên 1970an de teorîya desthilat û girêdanê cihê wê digire (Derûn Salih, 2012: 142).

2.6. Teorîya Desthilat û Girêdan (Government And Binding Theory)

Piştî berhema xwe ya yekem ya bi navê “Syntactic Structures”, Chomsky, dûra hêdî hêdî guhartinê di rêzimanê xwe deli pêy hev kirin (Nawxoş, 2005: 89). Ev qonaxe ji sala 1981an de destpê dike. Ew jî paş belavbûna pirtûka *Teorîya Desthilat û Girêdan* (Government And Binding) li sala 1981an de ku ev teorî bi “GB” nas e (Xoşnaw, 2014: 188). Rêzimana desthilat û girêdan bi rêya komeka waneyan li jêr nav û nîşanên *Çend Waneyek Derbarê Teorîya Desthilat û Girêdan* hatin komkirin. Paşê teorîya desthilat û girêdan ji bo modeleka din a rêzimanîya Chomsky (Nawxoş, 2005: 89). Cudahîya vê teorîyê ji teorîya standart ya berfireh ew bû ku du alîyên rêzimanî hatibûne pişguh avêtin. Vê teorîyê bal kişande ser du tiştan ew jî Desthilat û Girêdan bûn (Sîrwan Ehmed, 2015: 27). Wate teorîya Desthilat û Girêdan (Government and Binding) du teorîyan bi xwe ve digire. Ew jî teorîya Desthilat (Government) û teorîya Girêdan (Binding) ku hatîye kurt kirin wek “GB”. Ev teorîye ji bo yekem car ji alîyê Chomsky ve behsa wê hatîye kirin di pirtûka *Lectures on Government and Binding*. Dûra di pirtûka *Knowledge Of Language*. Anko zanîna zimanî da ew babet bêhtir hate ronîkirin (Dizeyî, 2013: 108).

Chomsky li sala 1991an de pêxweşbû ku navê teorîya Binema û Tixûb (Principle And Parameters) li cihê teorîya “GB” bikar bînê. Lewre teorîyeka rêzimanî ya giştî ye û hemû teorîyên “GB” bi xwe ve digire (Vîyan Îbrahîm,2015: 4). Ku armanca serekî ya vê teorîyê pêkhatina rêzimanêke giştî ye, ku yasayên serencam zimanên cîhanê bi xwe ve bigire, ne bi tenê taybet be liser zimanekê dîyarkirî (Derûn Salih, 2012: 150). Her wisa bi dîtina vê teorîyê rêzimana giştî taybetmendîyêke xweserî (zatî) ya mejîyê mirovî ye ku rûyê bihêz yê rêzimanê destnîşan dike û ji alîyê wê ve rûyê bihêz yê zimanî derdixe (Chomsky,1982:1).

Li gor teorîya desthilat û girêdanê rêzimana giştî taybetmendîya xwedî ya hişê her kesî ye ku binemayên giştî yên rêzimanê destnîşan dike. Bi vê çendê jî rûyên dîyar yên ziman derdikevin. Ji bo her zimanekê rêzimanêke taybet ya xwe heye, nabe di dema nivîsînê de bitê jibîr kirin. Ji ber wê yekê giş ew binemayên rêzimanî dibine sîstemeka zimanî ku darazî zimanî û astên wê dike. Lewre darazkirin di teorîya desthilat û bihevra girêdanê de yeke ji binemayên serekî ku kokeke kevnar heye ku vedigere ji bo dema rêzimana kevnar. Chomsky amaje bi wê yekê kirîye ku “N” ji alîyê “PP” û “L” hukim lê tê kirin û bi giring dizanî girêdanek di navbera nav û peyvên din de hebe (Tariq Mehmûd, 2014:16). Di vê teorîyê de desthilat pêkhatîye ji pêwendîyeka taybet ya bingeşê ku dibe di navbera du girê (node) darêkda hebe. Her wisa ew pêwendî ye bi girîngîyêke serekî bête danîn (Nawxoş, Selam, 2005:89).

Teorîya girêdanê liqeka din ya teorîya desthilat û girêdanê ye. Ji bo yekem car teorîya girêdanê li sala 1973an de ji alîyê Chomsky ve hatîye pîşan dan. Dûra dinava salên 80 an de careka din geşe kir. Her wisa ev teorî digel teorîya desthilat roleke girîng hebûn di teorîya “GB”ê de mîna nerîneke nû di zimanî de hate pîşan dan. Her wisa ji bo beşek ji nav û nîşanên teorîya desthilat û girêdanê. Teorîya girêdanê bi şêweyekê giştî li fenomena hevîşan (referential co-) navbera girêyên navî yên nav hevokê de lê vedikole û dîyar dike. Digel destên vala girêya navî li gor teorîya girêdanê ji bo enaforên cînavkên kesî amajekirî kom dibin (Tara Qadir ,2011:49). Bi dîtina vê teorîyê beşekê mezin yê rêzimanê di hemû zimanan de hevbeşe her ji ber vê çendê teorîya “GB” beşeke ji rêzimana giştî (Sîrwan Ehmed,2015: 27). Her wisa di vê teorî de karîgerbûna Chomsky bi De Saussuerî xwuya ye derbareyî dîtînen wî yên derheqa şêwê kereste û pêkhênên hevokê. Bi

taybet hebûna herdu cureyên pêwendîyên asoyî û stûnî di nav daneyên pêkhênên hevokê de û nerîna lihevçûna wê bi lîstika şetrencê ku Chomsky di nava herdu nerînên pêwendîyên pêkhênên nexşeyê derasa û liqên teorîyên yê kar lihev kirî bi baştirîn şêwe derbirîye (Vîyan Silêman, 2009: 43). Her wisa ev teorîya yek ji wan teorîya ne ku pêkhata zimanî dîyar dike û girîngîyê bi binema û paramîterên teorîya rêzimana giştî dide. Binemayê vê teorîyê, binemayên giştîyên zimanê mirovî di hemû zimanan de dîyar dike (Sanya Cebbar, 2013: 7). Bingeha serekî ya vê teorîyê ji desthilata pêkhênê nava hevokê ye ji bo ser pêkhênerê din yê nava hevokê mîna di lêkerê gerguhêz (têper) de lêker desthilat li ser pêkhênên din heye. Ew jî kirde û bireserê yeksere. Her wisa di lêkerê negerguhêz de lêkerî desthilat li ser pêkhênên din jî heye ew jî kirde û lêkerê ne tamam in. Dîsan lêkerî desthilat li ser hinek pêkhênerên din jî heye. Ew jî nîhad û guzare ye (Xoşnaw, 2014: 188-189).

Di çarçoveyê teorîya “GB” de hevoka rêzimanî li gor hinek pîveran tê destnîşankirin ku ev pîvere girêdayîne bi binemayên liqe teorîyên cuda cuda mîna “rolên wateyî, dox, girêdanê” ên desthilat û girêdanê.

Di teorîya rolên wateyî de Chomsky dîyar kirîye ku her pêkhênê di hevokê de pêdivîye rolekê wateyî hebe.

Mînak:


154 - Dilşad evro ji mal Zaxo derkeft.

Di vê hevoka li jor da peyva Zaxo rolê wateyî nîne ji ber vê çendê dê hevoka li jor bibe hevokeke nerêzimanî.

Pêdana rolê wateyî ji bo her pêkhênê dihêle ew pêkhên berçav be. Visibility ku eve merceke ji bo pêdana doxî ji bo wî pêkhênî. Sererayî vê çendê di hinek zimanan de rolên wateyî ên cuda cuda yê pêkhênana doxên cuda cuda peyda dikin (Vîyan Îbrahim, 2015: 17). Ev jî erkê teorîya doxî ye di hevokê de ku her girêyeke navî pêdivîye doxek hebe.

Mînak:

155 – Nazdarê sêv ji bo Nesrînê kerkir.


 tewang tewang

Derbarê cînavê hevpişk (hevî) her weku cînavê xwe divê girêdayî be bi girêyeka din ya navî ve. Lêbelê divê ev girêya navî helgira sîmayê “+ pirjimar”be. Anko pêdivî bi kirdeyekê pirjimar heye (Vîyan Îbrahîm, 2015: 20). Mîna van hevokên li jêr:

156 - Wan êkûdu vîya.

157 - Ewî êkûdu vîya.*

Hevoka (156) ê hevokekerêzimanîye. Lewrecînavê “êkûdu” digel “wan” rêkkeftîye ji alîyê hejmarê ve. Lêbelê hevoka (157) ê ne rêzimanîye. Lewre “êkûdu” digel girêya navî “ewî” rêkkeftî nîne. Wate pêdivîye hevyehtîli berçav werbigirîn. Ku dibêje; enafor pêdivîye digelbovegerê xwe de ji alîyê kesî û hejmarê wekhev bin (Vîyan Îbrahîm, 2009: 20).

Têgeha Hevoka Rêzimanî Di Teorîya “GB” De:

1 - Binemayê Doxî: Li gor vî binemayî divê her girêyeke navî doxek di hevokê de hebe. Çi negor yan abstract anko xwerû be (Sebah Reşîd, 2009: 75). Binemayê doxî di teorîya “LFG” de ji alîyê herdu mercên bihevra girêdana têkistî û deqgîrî kar dike ku me berî niha amaje bi wê çendê da bû ku li gor mercê deqbestî bihevra girêdanê nabe ti pêkhênek mîna pêkhênekê erekî yê desthelatdar di hevokê de hebe. Eger ji alîyê guzare ve ne hatibe daxwaz kirin, çunkî hevok dê bibe nerêzimanî. Ev jî vedigire ji bo wê çendê ev pêkhêne xwedî çî doxekê nîn e û ti doxek pê nehatîye dayîn. Wekî vê mînaka li jêr:

158 - Nîhad xwarinê Bêwar dixwe.

Di mînaka (158) ê de pêkhêne Bêwar çî doxek nîne û yê bûye sedemê nerêzimanîbûna hevokê, çunkî ji alîyê kirdeyekê hevokê ve nahatîye daxwaz kirin.

2 - Bendbûna Pêkhatî: Hemû prosên rêzimanî bi zanyarîyên mirovan derbarê pêkhata hevokê û girê ve bende mîna lihevhatina di navbera kirdeyî û lêkerî de bi

pêkhata hevokê ve bende. Di hevoka yekem de pîta rêkeftinê “Ø” e û di hevoka duyem de “t” e. Lewre pêkhata herdu hevokan bi cureyê tafî ve bende (Sanya Cebar, 2013: 7).

Mînak:

159- Dilşad hat.

160- Dilşad dê hêt.

3 - Binemayê Projesazdan: Pêkhateka semantîkî ye hevgirtina taybet ya sentaksî wate hevgirtina pêkhata sentaksî û derwaza ferhengî mîna haletekê ferhengî digihîne yan pêvegirêdana astên pêkhata ji nav de û serve û formê lojîkî ye. Bihevra ji bo gehîştina bi şirovekirina giştî ya wateya hevokekê ji sedemê pêngav bi pêgav projesazdanê wateya yek bi yeka pêkhatayên wê ji nizimtirîn astê veguhastine ji bo bilindtirîn ast. Bi vî awayî yasayên projesazdanê li ser pêwendîya heremekî pêkhatîye ji pêkhata ji nav de wiha derdikeve ku yasayên projesazdanê mîna ew helwestên awazîyane bin ku ji alîyê axaftvan û wergirî ve ji bo derxistina wateya giştî ya hevokê tê bikaranîn (Şîlan Omer, 2011: 62). Ev binemaye agahîyên derwazeya ferhengî di hemû hevokên rêzimanî de “D-S, S-S, LF” cêgîr dike. Wate pêkhata “x-bar”¹⁷ ji projesazdana sereyî ku ji alîyê ferhengê ve hatîye helbijartin pêk tê. Wate li gor sîmayên rêzimanî û ferhengî pêkhata girê yan hevokê peyda dibe. Ji bo mînak agahîyên derwazeya ferhengîya lêkerê “xwarin” xuya dike. Ev lêkere pêdivî bi du tiştan heye (Sanya Cebar, 2013: 8).

1 - Kesek bi wî karî radibe.

2 - Tiştêk bihête xwarin.

Wate agahîyên ferhenga zimanî li gor binemayên wateyî yên pêkhata girê xuya dike, “xwar” sereye û kesek bi wî karî radibe dê bibe “spec” û tiştê bête xwarin “comp”e (Sanya Cebar, 2013: 38).

¹⁷Teorîyeka rêzimanîye di nava rêzimana desthilat û girêdanê de. Teorîya (X-bar) yan sîstemê (X-bar) sîstemekê rêzimanîye di buwarêzimannasîya nû de berev pêş çû. Mîna cihgirtina şirovekirinên dêrîn yên pêkhatayên girêyan hate bikaranîn. Bi wateyeka din bo çêkirina hizra dêrîn (sereyê pêkhatan) û dawî înanan wan sedemên zor ên ku di yasayên pêkhênana girêyan de heyîn. Her wisa ev sîstemê rêzimanî digel naveroka wê ya aloz ku komeka kiryarên sazgerî yên yek li dû yek bi xweve digire (Sebah Reşîd, 2009: 29).

Li gor binemayê agahîyên semantîkî û sentaksî yên her sereyekê dihate xuyakirin. Wateya binemayê projesazdanê pêkhata girê yan hevokê xuya dike. Her wisa teorîya “X”dîyar dike, ka sere dê li destpêkê yan li dawîya wê pêkhata girê yan hevokê tê eve paramîtere. Wate di nav her yek ji van binemayên giştî de hinek pîverên cuda hene ku dibêjinê parameter. Sedemê cudahîya zimanan ji hevdu ji bo hebûna paramîteran dizivire. Ev binemayê zikmakî bi şeweyekê xwezayî (ji bomaweyî) di hişê mirovî de heye ji ber hindê ji bo fêrbûna zimanekê pêdivî bi binemayên giştî nîne. Belkî pêdivî bi fêrbûna paramîterên cuda yên zimanî heye (Sanya Cebar, 201: 38).

Rêxistina teorîya “GB” di zimanî de di vê nexşeyê li jêr de dîyar dibe:

Lexicon ——— D.structure

Move.a

S.structure

PF

LF

(Şilêr Nayif Emîn, 2015: 50).

Wate teorîya “GB” çîwar astên zimanî destnîşan dike “D-S, S-S, LF, PF”

Ferhenga zimanî ji sîmayên semantîkî (wateyî) û sentaksîyê her peyvekê pêk tê û hejmara pêkhênan û rolê wateyî yê wan pêkhata ji nav de ya hevokê destnîşan dike.

Pêkhata ji nav de “D-S” ya girê yan hevokê divê li gor binemayê teorîya “X” bête danan û ev binemayên teorîya “X” di hemû zimanan de gehiştîne. Pêkhata ji nav de jî ku bi rêya yasaya teorîya “X” û agahîyên rêzimanî û wateyî yên peyvan pêk tê. Bi rêya yasaya cihguherîna elfa yê (move – a) dibite pêkhata serve. Wate piştî bikaranîna yasayên cihguherîna elfa pêkhata serve “S-S” peyda dibe. Ev herdu pêkhate abstractin. Wate di hişê me da ye û çî esasê maddî ji bo wan nîn e tenê hinek


prosene ku di hişê mirovî da sererast dibin. Di pêkhata ji serve de sîmayên wateyî yên sentaksî ji bo formê lojîkî “LF” diçin û di formê lojîkî da têne şirovekirin, ka aya ji alîyê wateyî ve dirustin yan ne? Û sîmayên dengî di pêkhata ji serve de ji bo formê dengî “PF” diçin da ku wan sîmayan ji bo dangan biguhere (Sanya Cebar, 2013: 39).

Di formê lojîkî “LF” de ew agahîyên ferhengî û sentaksî ewên di ferhengê de taybet bi sereyî ve têne şirovekirin ji alîyê hejmar û rolên wateyên pêkhênan ve û ji alîyê doxî ve û ji alîyê girêdanê ve. Eger ev binemaye bicih ne hatibin em dê bêjin ev hevokê nerêzimanî ye û di xiradibe. Eger tamam nebe dê bêjin hevok ne gehiştîye astê ravekirina tamam deng diçine “PF” ê li gor yasayên fonolojî yên wî zimanî têne girêdan û dikine axaftin (Sanya Cebar, 2013:10:).

Mînak:

161 -Ez dê namekê nivîsim.

DS



Li gor agahîyên ferhengîya lêkerê “nivîsîn” pêdivî bi du pêkhênan heye. Kesek bi vî karî radibe û yê din jî kar li ser tê kirin. Wate lêkerê “nivîsîn” digel temamkerekê “namekê” tê girêdan dê bibe “V”, “V” digel argîyomentekê derekî. Ez xwe lêk dide û dibe “GL” û her lêkerekê pêdivî bi dem û rêkeftin heye. Lewre “GL” xwe digel “I” cihê wan agahîyên ku pêwendî bi tafî û rêkeftinê hene diçine wêrê lêk

dide û dibe “I” û paşî “I” digel (Spec) girêya taf û kesî “IP” sererast dike. “IP” binemayê projesazdana hevokê ye (Sanya Cebar, 2013: 10).

Rêzkirina pêkhênên hevoka (161) ê digel rêzkirina pêkhênên di nexşeya li jor de ji hev cuda ne ji ber hindê emşê dê bêjin ku lêker nikare doxî bide kirdeyî. Belkî taf dide û kirde dê çit. Spac, “IP” û binyatê lêkerî doxî dide bireserî, bi rêya yasa cihguherîna elfa “S-S” peyda dibe û du binemayan bicih tîne:

1-Binemayê doxî.

2- Binemayê projesazdana berfirehkirî (Sanya Cebar, 2013: 10).

Di formê lojîkî de “LF” eger hevok ji hemû alîyan ve sererast be binemayên giştî yên wî zimanî bicih tîne. Hevok digihê ravekirina temam eger ravekirina ne temam be hevok diherife. Wate hevok nerêzimanîye û bendek bicih nehatîye (Sanya Cebar, 2013: 11).

Mînak:

162- Min Dilşad dîwar dît.*

Hevoka (162) ê nerêzimanî ye û nagihê ravekirina temam ji ber bicihnehatina van bendên giştî yên zimanî yên li jêr:

1- Binemayê Projesazdanê: Binemayê projesazdanê lêkerê “dîtin” divê du pêkhên hebin, di hevoka (162)ê de sê pêkhên hene. Anko bendê projesazdanê bicih nehatîye (Sanya Cebar, 2013: 11).

2- Pîverê Wateyî: Binemayê pîverê wateyî dibêje ku her pêkhênek rolekê dibîne û her rolekê wateyî pêdivî bi pêkhênekê heye ne du pêkhênan (Sanya Cebar, 2013: 11). Di hevoka (162) ê de “dîwar” çî roleke wateyî nîne û ev hevokê dema digihê “LF” tê herifandin. Lewre çend bend û binemayên zimanî mîna doxî hatîne têkdan.

3- Fîlterê Doxî: Binemayê pêdana doxî heriftîye û nagihê astê ravekirina giştî di “LF” de. Lewre binyatê lêkerê “dît” doxî dide. Dilşadî û taf jî dide; Min û “dîwar” bê dox dimîne. Li gor binemayê teorîya doxî her navekê divê doxek hebe.



BEŞA SÊYEMÎN: RÊZIMANBÛN Û GUNCANDIN DI ZIMANÊ KURDÎ DE

3.1.Têgeh

3.1.1.Têgeha Rêzimanê

Rêziman asteke ji astên zimanî ji ber wê yekê herdu alîyên morfolojî û sentaksî bi xwe ve digire. Di rêzimanê de behsa wan yasayên ku deng û watayê digehînin hev tê kirin (Xoşnaw, 2009^b:15). Bi wateyeke din pêkhênên zimanî bihevra mîna pergalekî herdu pêkhênên deng û wateyê bihevra girê dide û her pêkhênek jî beşek ji rêxistina rêzimanê bi xwe ve digire. Wate pêwendîya di navbera deng û wateyê de pêwendîyeke yekser nîne. Belkî ew denge divê di astekê din de derbas bibin ku ew jî astê rêzimanê ye. Anko ew denge li gor destûr û yasayan bihevra di

astê morfolojîyê de ji bo pêkhênana peyv û pîten zimanî têne girêdan. (Tirîfe Mûhsin, 2016: 29-32).

Her wisa rêziman yan jî zanistê rêzimanê liqeke ji zanistê zimanê teorî ye. Girîngîyê bi kurtkirina reftarên zimanî dide ku neteweyek di axaftin û nivîsînê de bikartîne yan peyrew dike (Xolî, 1982: 109). Rêziman bi şêweyekî rast û durist axaftin û nivîsîna zimanekê fêrî me dike (Norî Elî, 2012: 22). Wate rêziman zanistekê serbixwe ye. Lê belê dibe wê çendê jî bizanîn ku rêziman ji zimanî bête wergirtin, ji ber ku ziman girêdayî jîyana netewe û miletîye. Digel pêşkeftina miletan ziman jî pêş dikeve. Anko rêziman dîwarê zimanî ye, ziman jî deyiika rêzimanê ye. Lewre rêziman ji zimanî derdikeve û fêrîkirin jî dibe her bi rêya derhênanê be eva ku cihê balkişîyê ye ew e ku rêzimanê pêwendî heye bi wî zimanî ve ewê ku xwendekar pê diaxivin. Anko wan bizanin yan ne rêzimana zimanê xwe bikartînin. Her zimanek xwedîyê rêzimana xwe ye ji ber wê yekê rêziman wek zanistek li ser keresê dupat kirina wî zimanî de tê dariştin (Ebdulstar Fetah Hesen, 1996: 3). Anko merem ji rêzimanê ew e wan dîyardeyên zimanî bi xwe ve digire ku di her zimanekê de hebûna wan heye. Bi wê wateyê ku bêhtirîya babet û pêkhênanên rêzimanî diçine li jêr çetir e rêzimana giştî de. Bi dîtina Chomsky ew pêkhêne di her zimanekê de hevbeşin mînak “nav, cînav, rengdêr, biker, lêker, bireser ... hwd”. (Xoşnaw, 2014: 171).

Digel wê çendê jî derbareyî çawanîya girêdan û rêzîkirina wan pêkhênan zimanî di çarçoveya hevokê de ku bi rêya yasayên zimanî têne bercestekirin (Tirîfe Mûhsin, 2016: 79). Wate destnîşankirina siruşt û çawanîya pêkhatina evan pêkhênan “deng, fonîm, birge,pît, peyv, girê” û pêşandana cureyê pêwendîya di navbera wan û çawanîya bihevra hatina wan di nav çarçoveya hevokê de rêzimana zimanî ye (Wirya Omer Emîn, 2010: 148).

3.1.2. Têgeha Wateyê

Watesazî dîrokeke dûr û dirêj ya heyî, destpêka wê vedigere ji bo hindîya û ew lêkolînên zimannasî ku ji bo xizmeta ayin û paristinê li ser pirtûka *Vîdayan* kir bûn û miştûmireka zor li ser peydabûna zimanî anîbû wicûdê. Lê hineka digot ji îlhamê hatîye û karê Xwedê ye; û hinekên din jî digotin:Nexêr dahênana mirovan e.Vê havrikîyê gelek mijar azirandin ji wan xweristîya ewê pêwendîya ku di navbera

form û wateyê de heyî (Dizeyî, 2011: 19). Watesazî astekê zimanîye û girîngîya taybet di şirovekirina alîyekê zimanî de dibîne. Lewre cihê evî zanistî di nav bazinê lêkolîna zimanî de heye. Watesazî ew zaniste ku lêkolînê li kêşeya wateyê dike (Şêrzad Sebrî, 2015: 12). Her wisa watesazî wek zanistek destpêka serhildana wê vedigere ji bo naverasta sedê 19 an de Max Muller bi yek ji damezrênerên binyatê watesazîyê tê naskirin. Dema di herdu pirtûkên xwe (The Science Of Language) 1862an de û (The Science Of Thought) 1887an de amaje bi wê yekê kirî ku ziman û hizr li hev diçin. Lê belê watesazî wek zanistek serbixwe di zimannasîyê de dîroka wê vedigere ji bo sala 1839 an. Lê belê ne li jêr navê Semantics (Dizeyî, 2011: 21).

Her wiha destpêka bikaranîna zaravê Semantics vedigere ji bo sala 1897an de dema zimannasê Frensî Michel Breal lêkolînek li jêr nav û nîşanên (Gotarek Derbarê Wateyê Essai De Semantique) û piştî sê salan ew lêkolîn hate wergêran ji bo zimanê Îngilîzî ku yekem kes bû ev zarave bikaranî (Ehmed Mûxtar, 1982: 22). Zaravê watesazî Semantic ji peyva girîkî Sema ku bi wataya nîşane yan sembol tê (Mihemmed Fetah, 2011: 159). Xwuyaye tê gotin ku ziman bê wata sererast nabe watesazî jî wek zaravekê teknîkî bikar dihê bi amajekirin ji bo lêkolîna watayê ji ber wê yekê wate bi beşek ji zimanî tê danîn. Lewre watesazî dibe beşek ji zimannasî yê (Talib Hisên, 2014^a: 34). Her wisa bi pêşenga lêkolînên zimannasî tê hejmartin. Lewre çareserîya kêşa nîşaneyên zimannasîyê li peyv û hevok de dike. Wate dîyardeyeka dijware pêwendî bi hemû bîyavên cuda cuda heye çî berceste û çî ne berceste be. Lê belê ev dîyarde ye bi tenê pêwendî bi dîyardên zimannasî ve nîne. Belkî pêwendî bi hinek dîyardên din jî heye ku ji derveyî ziman de wek mînak (Jîyana Civakî û Jîngeha Xwezayî...hwd).

Girîngîdana vî zanistî bi tenê alîyê ferhengîya wateyî nagire. Belkî alîyê rêzimanê jî bi xwe ve digire. Her wisa mijarên wê tenê li ser wateya peyvan nasekine (naraweste). Belkî wateya hevokan jî bi xwe ve digire. Her çende zimannasên serdemê berî salên heştêyan wiha bi pêdivî dizanîn bi tenê behsa wateya ferhengî a peyvan bikin. Bê ku behsa toxmên rêzimanî û pêkhata hevokê bikin (Mihemmed Mihemmed Yonis Elî, 2010: 11-12). Her dîsan di astê hevoksazîyê de zanayên watesazîyê bi şeweyekê mezin girîngî bi bihayê rasteqîne yê derbirînên zimanî didin. Bi wateyeke din lêkolînê li çawanîya dirustkirina hevçenîyeka cîhanîya rasteqîne ji

bo peyv, hevok û pirsayaran dikin. Pîsporên watesazîyê hêlekê di navbera rastîya şirovekarî û rastîya nerasteqîne “sererastkirî” dikêşin. Digel hemû alîyên din ewên girêdayî bi lêkolîna wateya hevokê ve (Şêrzad Sebrî, 2015: 23). Ev jî ji ber girîngîya wate yê di nava astên zimanî de tê dîtîn ku her yek li gor dîtina xwe behsê girîngîya wateyê dike. Ev jî nîşana qedir û behayê wateyê ye di nava zimanî de. Lewre her wekî tê gotin “zimanê bê wate yê bê biha ye” (Mûxtar, Ehmed, 1982: 5).

Hejayî amajekirinêye bibêjîn ku her guherînek di rêkxistina dengên her peyveka destnîşankirî de rû bide yekser ew peyv dê wateya heyî ji dest bide û dê watayeka din de û renga jî çî watayan nede. Eger ew peyv di ferhenga wî zimanî de nebe (Şêrzad Sebrî, 2011: 15).

3.1.3. Pêwendîya Di Navbera Rêziman û Wateyê

Chomsky di teorîya standard de li 1965an de bizava wê çendê kir, ku girîngîyeka temam bi alîyê wateya hevokan bide. Bi wê çendê ku pêwendîya di navbera rêziman û wateyê ji sedemê pêkhênên rêzimanî ron dibin (Tirîfe Mûhsin, 2016: 64). Rêziman bi tenê morfolojî û sentakse nîn e. Belkî semantîk jî beşeke ji rêzimanê. Hebûna wateyê di rêziman de gelek girîng e. Lewre bê ew morfolojîyê û sentaksê çî wateya xwe nîn e (Nawxoş, 2018: 190).

Her wisa di rêzimana “BV”ê de pêkhênanê semantîkî bi yek ji pêkhateyên zimanî tê danîn û di nexşê endazeyî wê rêzimanê de girîngî pê tê dayîn (Tirîfe Mûhsin, 2016: 64). Mebest ji nexşê endazeyî yê rêzimanî yan pêkhata rêzimanî dariştina rêzimanê ye. Ji bo cureyên yasa û dîyarkirina taybetmendî û rûxsarên yasayan ku di çawanîya karlêkirin û pêwendîkirina cureyên cuda de digel hevdu bipirsyar in. Lewre her yek ji wan yasayan di dîyarkirina rûxsarê taybet yê astên niwandinê de berpisyar in. Wek pêkhatine ji pêkhata fonolojî, sentaks û semantîk (Şîlan Omer, 2011: 51-52). Wateyê girîngîyeke zor di rêzimanî de heye di gelek babetan de rêziman penayê ji bo wateyê dibe. Lewre pêwendî bi têgehiştinê ve de heye. Her çend rêziman bi dîqet be pêdivîya me bi wateyê dibe ji bo şirovekirin û ronkirin û rêzkirina hinek hevokan. Girîngîya lêkolînê li binyatê wateyê digel binyatê rêziman di wê çendê de ye. Binyatê wateyê astê ronkirinê digehîne û hevokên ne ron û mijdar ronî dikin. Girîngîyeke zêde ya vê jî heye ji bo binyata rêzimanî. Lewre

derbirînameya wateyî ya hevokê bi tenê di rêzimana hevokê de nîn e. Belkî di guncandina wateyê jî de ye, bi vê çendê giringîya şirovekirina astê binyatê wateya hevokê dibe cihê giringîdana rêzimanê. Lewre rêziman giringîyê dide erkê peyvê, pêkhênên hevokê, kirde û bireser... hwd ku binyatê rêzimanê ne pêdivî bi binyatê wateyê be. Ji bo hindê da ku prosa ronkirina mîna dîyarkirina dergehê ferhengîya hevokê, hevgerêdana rolê wateyî ji bo her pêkhênekê. Piştî dîyarkirina sîmayên ji hev cudakirina pêkhênan bi vî awayî rêzkirina rolê wateyî dibe mînak ji bo dîyarkirina taybetmendiyên hevokê û bi hevgerêdana erkê rêziman li gor bihayê wateyê (Dizeyî, 2014^b: 18).

Herduzimannas Katz û Fodor pêşnîyara wê çendê dikin ku divê rêziman mîna sîstemekê yasayan hizr li bête kirin ku ew yasa girêdayî wan formên derekî yê hevokên zimanekê ne. Û formê wan hevokan peywest dikin bi wateyên wan ve û ew wate jî mîna şirovekirineka semantîka ya cîhanî têne derbirîn. Her wekî wê çenda ku çawan deng ji sedemê şirovekirineka fonolojî ya cîhanî têne derbirîn. Ev jî ji bo wê çendê bû ku semantîkê bikin bi beşekê dîyar yê rêzimana berhemana. Ji bo wê çendê ku di lêkolînên xwe de têgehiştineke baş û ron ji bo bête kirin (Tirîfe Mûhsin, 2016 : 32).

Chomsky pêkhata semantîkê (Semantic Component) bi pêkhata dawî di rêzimanê de dîyarkirîye. Ev jî girêdana semantîkê ye bi rêzimanê ve û merem jê dîyarkirina tixûbê wateyê ye bi şîyanên zimanî ve û ew alîyên wateyê jî mîna mebesta axaftvan derdor... hwd. ku di çalakî û şîyanên zimanî de têne wergirtin. Nîşanên sîmanîkî (Semantic Features) pêkhênê serekî yê yasayên semantîkîne. Nîşanên semantîkî “toxim, mirov, canewer ... hwd” bi xwe ve digire. Eger bê peyvek yan komeka peyvan ji yek yan bêhtir ji nîşanên semantîkî “+ mê + bişîr ...”î yan heye. Her çende (- mirov)in, ev nîşane sîmayên wateya serekî yan kolgehên semantîkî pêk tînin (Şîlan Omer, 2011: 54). Wate dibe pêwendîya di navbera rêziman û wateyê di nava wan xalan de bêhtir derkeve. Dema çend peyvek ji sedemê hevbeşîya wan di sîmayên wateyî de şîyanên cihguhartinê hene û li cihê hevdu têne bikarandî nava hevokê de. Ev rewşe hemû deman û ji bo hemû peyvên xwedî sîmayên wateyî yê hevbeş naguncin. Lewre divê cihguherê wan peyvan di tixûbe

hevokê de wateya hevokê tê nede û hevokê neke nerêzimanî û digel lojîkî jî de bigunce (Tirîfe Mûhsin, 2016: 64).

Mînak:


163 - Bêwarî av vexwar.

Dibe di hevoka li jor de li cihê peyva Bêwar ew peyve be ku ji alîyê sîmayên wateyî ve digel hevbeşin mîna “zelam, jin, kor, kiç, çîçik... hwd” bibin cihguherê ewê peyvê. Lewre sîmayê wateyî “+ canewer, + zindî...” yan heye, bi heman şêwe li cihê peyva av jî em dikarin wan peyvan li cihê wê bikarbînin. Di nava wê hevokê de ku amadeyî vexwarinê bin û sîmayên “+şil + ne zindî ...” tê de be. Lê belê nabe peyva weha li cihê wê bê bikaranîn ku ji alîyê lojîkî ve neguncayî be yan jî wateya hevokê têk bide û biguhere. Ji bo mînak li cihê peyva Bêwar peyva Xanî bête danîn mîna “Xanî av vexwar” ku li wî demî dê hevokeke ne guncanî ji alîyê wateyê ve sererast bike. Her wisa ji alîyê lojîkî jî ve hevokeke neguncayî ye. Lê belê ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve hevokeke rêzimanî ye. Wate bi vî awayî pêwendîya di navbera rêziman û wate û lojîkî ron û aşkira bi şêweyekê dîyar derdikeve. Bi şêweyekê ku pêwendîyeke alîgir û bihêz di navbera wan de peyda dibe. Ew pêwendîye di nava hevokên zimanî de berceste dibin. Her wisa alîyê wateyî û naveroka hevokan tê de dîyar dibe (Tirîfe Mûhsin, 2016: 65).

Digel wê çendê beşa dawî ya şirovekirina wateyî li ser bingeha rûyê serve yê. Li derê pêkhata sentaksî hatîye avakirin ku teqez kirin û pêşbînîyan bi xwe ve digire. Agahîyên wergirî derbarî babetê behskirî û agehdarbûna axaftinkerî ji radê agahîyên guhdar û radê piştrastbûna wî bi wan agahîyêndibe li ser cure hevokê û derbirînekarişer bin. Cihê hêzê di hevokê de awaza hevokê û di hinek cihan de dubare kirina dîyardekê yan dirêj kirina wê dibe ku karî li ser wateya hevokê bike (Vîyan Silêman, 2009: 27). Lewre ji bo derxistina alîyê wateya hevokê yasayên veguhastinê roleke girîng di vî barî de dibînin.

Her wisa yasayên veguhastinê bi xwestekî - ladan - erkê wê kêmkirin û parastina enerjîya di axaftinê de dibîne. Di dema ladan û kêmkirin de rêzimana “BV”ê bi rêya vegeşîyan ji bo rûyê ji nav de yê hevokê em dikarin resenetîya hevokê destnîşan bikin û wateya wê ya tamam kifşbibe (Dîyar Elî Kemal, 2002: 35). Ji ber

ku yasayên veguhastinê di navbera herdu astên ji nav de û ji serve kar dikin. Bi eynî teşe wate di herdu astên ji nav de û ji serve de hebûna wan heye. Guman têde nîne, ku cihê wateyê pêkhata ji nav de ye. Belê dikarîn bêjîn ew wateya ku di pêkhata ji nav de ye wateya veşartîye, anko wateya mebest nîne. Belkî şirovekirina wateya wê ye. Wateya dirust ya axavtvanî di pêkhata ji serve de derdikeve. Wate di dema veguhastinê de di pêkhata ji nav de bo pêkhata ji serve wate jî tê veguhastin. Belkî gelek deman peyrewkirina zatê yasayên veguhastinê ji pêxemet gehandina wê wateyê ye ku di pêkhata ji serve da ye (Dara Hemîd, 2012: 28). Mîna vê nexşeyê li jor hatîye xweya kirin:



Pêkhata Fonolojî

Pêkhata Wateyî

(Tirîfe Mûhsin, 2016: 66).

Her peyvekê di nava hevokê de pêwendîyeke girêdayî di navbera wateya delalî û erkê sentaksî de heye. Lewre eger cihguherîna peyvan di nava hevokê de tuneba, sedemê guherîna wateyê, li wî demî çî cudahî di navbera evan herdu hevokan de nebû (Şêrzad Sebrî, 2015: 70).

Mînak:

164 - Pişikê mişk xwar.

165 - Mişkî pişik xwar. (Şêrzad Sebrî, 2015: 70).

Her yek ji hevoksazî û watesazîyê alî û girîngîyên xwe yên serbixwe hene. Her wisa encamdana erkê dirust yê her yek ji wan girêdayî merc û taybetmendîyên xwe yên teybet hene (Leech, 1981: 181).

Her wisa Leech amajê bi hinek prosên hevbeş di navbera hevoksazî û watesazîyê de dike (Şêrzad Sebrî, 2015: 70). ji wan:

Ferheng (Loxicalization): Pêkhatîye ji helbijartina yekeyên ferhengîyên guncayî ji bo encamdana derbirînê ji naverokê yan wateyeke dîyarkirî.

Fişara Pêkhatîyê (Structural Compression): Ev proseya kurtkirin yan kêmkirina pêkhênên pêkhatîne. Ew jî bi rêya ji nav birina zimanî yan her rêyeka din be. Mîna :

166 - Ew mamostayê zîrek hat.

Ew hat girêya “Ew mamostayê zîrek” hatîye ladan û li cihê wê cînavê ew hatîye bikaranîn.

167 - Min evro wane xwand.

168 - Min wane xwand. Ladana hevlakarê demî (evro).

Rêkxistina dirêjîyê bo zincîreya axaftinê (linearization): pêk tê ji veguhastina peyamê bo zincîreka dirêj anko bineretên derbirînê li ser têne danan. Bi wateyeka din Pêkhatîye ji veguhastina alîyên wateyê ji bo zincîreka temam ya li dû yek hatina guncayî. Ji ber ku di her zimanekê de zincîreke cuda ji bo rêkxistina yekeyên sentaksî di nava pêkhatê de heye.

Mînak:

Zimanê Kurdî “SOV” mîna 169 - Wê xwarin çêkir.

Zimanê Erebî “VSO” mîna 170 - Ekele elweledu eltifahe.

Zimanê Îngilîzî “SVO” mîna 171 - Dilshad drinks water.

Evca demê girêyên din di nav pêkhatê de tîn, her yek li gor ewî cihê ji bo guncayî be tê bikaranîn. Bêguman eve dibe sedemê wê çendê ku pêkhate bikare peyamê yan wateyê bi dirustî bigehîne (Şêrzad Sebrî, 2015: 72).

3.1.4. Pêwendî Di Navbera Rêziman û Lojîkî de

Bi heman şêwê pêwendîya wateyê bi rêzimanê ve lojîkê jî pêwendîyeka zor bi rêzimanê ve heye. Mîna:

172 - Ew zelame bi jin e.

173 - Ew zaroke bi jin e.

Axaftinker dikare di zimanê Kurdî de bi du şêweyan pêkhatekê ji cihê bingeh xwe bîne derve ku her yek ji van du şêweyan taybetîyên xwe hene û di heman dem de xalên hevbêş yên bingeh di nava wan de hene. Herdu şêwe jî pêk tîn ji:

1- Deranîna rêzimana pêkhate.

2- Deranîna lojîkîya pêkhate.

Taybetîya wan xwe di wê çendê de dibîne ku şêweyê yekem bêhtir girêdayî sentaksê ye û naskirin û dîyarkirin û pênaskirina wê girêdayî rêsa û yasayên zimanî Kurdî ye. Belê şêweyê duyem bêhtir girêdaye bi astê wateyê. Naveroka herdu

şêweyan jî xwe di wê çendê de dibîne ku hem deranîna rêzimanî û hem deranîna lojîkîya pêkhate bêhtir ji bo berdest kirina agahî û wateyî ew pêkhate hatîye deranîn. Wate axaftinker bi vê deranînê merema xwe di hevokê de anîye derve û ji bo yê beramber derbirîye (Karwan Omer, 2008: 131).

Dariştina lojîkî ew e eger me vîya em tekezîyê li ser wateya hevokê bikin, dê ya guncayî be em her pêkhênê ladin. Heya wî radeyî ku kartêkirinê li wateyê ne bête kirin mîna “Qutabî bi tirûmbêlê çû” dê veguhêzîn ji bo “Qutabî tirûmbêlê çû” di zanistê lojîkî de. “Qutabî û tirûmbêl” li vêrê dibine derbirînên amajedar û “çû” derbirînek êxbarî yan xebere. Ev zimanê lojîkî ye, ne ku zimanê sîntkasî ye. Ladana daçeka “bi” nabe sedemê wê çendê ku têgehiştin nemîne. Ev cureyê nîşanê (\implies) ji bo veguhastina hevoka asayî ji bo hevoka lojîkî tê bikaranîn (Xolî, 2001: 210).

Dariştina semantîkî wake dariştina lojîkî ye, bi rêya lojîkê em dizanin ku xelk çawan hizrên xwe rêk dixin û çawan ew bi xwe ji şaşî, gîro kirin û bimijîya xwe dur digirin di nava pêkhênên xwe de (Leech, 1981: 158). Derbareyî lojîkî ji bihayê rastîya zaravan di nava pêkhênanan de bi pileya yekem dê û li hinek baran de şaşîyeke lojîkî ji neselmandin û aşkeranekirina zaravan serhildide û ne pênasekirina wan mîna eva heyî di rastî de arîşe di lojîkbûna hevokê de dirust dike. Pêkhênên lojîkî pêkhatine ji “zaravan, pêkhênan û yasayên lojîkî” mîna mercekê belge nexwaz dibe. Zarav ji alîyê beha û wateyê ve aşkerabin û durbin ji bimijî û ew hizra axaftvan heyî mîna ew bixwe bigehîne bê dirustkirina wateya veşartî berbilavbûna hizra guhdarî. Ev jî beşeke ji armanca bikaranîna lojîkî ku dibe bi curekê pêkhên bêne rêzîkirin di kiriyara gîhandinê de ku guhdar yekser ji hevokên ku hatine derbirîn ji alîyê axaftvanî ve têbigihê. Ê bihayê axaftinê jî ji girîngtirîn ji bo girîng nas bike û li gor pêdivî û bihêzîya belgeyên hatine bikaranîn ji mebest û kiriyara pêwendîkirina axaftvan bigihê (Bekir Omer, 2014: 54).

Binemayên ziman û lojîkê xwezayî bi şêweyekê bê agahîyane hatîne zanîn û heya radeyekê zor jî binemayên ziman û lojîkê xwezayî bi mercê destpêkî yê wergirtina zimanî têne hejmartin. Ne ku babetê xwe û nerît û rahênan pêkirin ku bi şirovekirineke matematîkî ya zimanî bişêweyekê giştî hatinê girêdan. Her çende ku Chomsky pêdivî bi wê çendê nebû, ku xwe peywest û sinordar kiriba bi wê bîroka Ramosi ku derbarê lojîkê xwezayîyê hişî ye. Derbareyî bîr û dîtinên xwezayî, her

mirovêkê sê cureyên binemayê xwezayî yê zimanî hene ku digel pêdivîyên sercem kiryan têne guncandin. Ew jî “zanîn, amadebûn, bi destveînan”e. Di her mirovêkê de binaxê agahîyan heye ku jêra “têgehan berbilav” tê gotin (Tirîfe Mûhsin, 2016: 67).

Hevok di zimanê Kurdî de û di hemû zimanên cihanê de pişt bi herdu dariştên deng û wateyê girê dide. Ji bo lihev gihîştin û ev lihev gihîştinê jî tenê di wî bîyavî de nayê rûdan ku hevok ji alîyê pêkhata sentaksî ve sererast bin û merc, yasa, prensîp û qeydeyên asta sentaksî bicih anîbe. Belkî hevok dibe ji alîyê darišta sentaksî ve pêkhate û wateyên wan sererast û rast bin û pêwendîya bihevra girêdana wateyî di navbera pêkhênên hevokê û hevokên zimanekê de hebin. Lojîk di vî astî de rola xwe dibîne ku divê hevok sererast bin li gor yasayên lojîkî û ladan di nav hevokan de û pêwendîya di navbera peyvan de nebe. Lewre her ladanek ji yasa û dîyardên lojîkî dibe sedemê ji hev veqetîyan û temam nebûna kiryara lihev gihîştin û derkeftina valatîya di nava prosa hizrkirinê de (Bekir Omer, 2014: 52). Wate sentaks û semantîk bihevra rolî dibînin di nava hevokê de û lojîk jî di vî bîyavî de rola xwe di sererastkirina hevokan de dibîne (Tirîfe Mûhsin, 2016: 68).

Karanb dibêje; ziman bi tenê pêkhatin û rêkeftina rêzimanê nîne. Belkî helgirê lojîk û derbirînê ye. Her wisa John Air û Friedrich û Eisenman dibêjin; “hevokê çi wate nîne, heya ku rastîyê îzbat neke û her rastîyeka bi destve bê jî ya rêjeyî ye” (Dizeyî, 2011: 96). Lewre tê nirxandin ku lojîk hertim girêdayî zimanî ye (Fraassen, 1971: 139).

Di semantîkê de lêkolîn li ser pergala lojîkî li gor dîtina xwandinên cuda ji bo tê kirin digel amajekirineke taybet ji bo ronkirineka mebestdar. Ev çende jî ji bo sedemê şirovekirinên kûr ji bo bingeha zimanî ku ji bo gelek kesayên felsefî ji bo cihê giftûgo û girîngî danê (Fraassen, 1971: 13). Lewre sentaks, semantîk û lojîk her sê bihevra pêwendî hene. Lewre semantîk û lojîk jî di nav hizr û bîrên mirovî de kar dikin û pişt xwe girêdin bi rastîyên zimanî û formî û rastîya her yek ji wan pêgdigire. Bi reftara hişî û şirovekirinên mêjî û ev egere jî weha dike pêwendîya mukum hebe di navbera semantîk û lojîkê di sentaksê de (Bekir Omer, 2014: 57). Li jêr dê behsa hinek ji wê pêwendîya di navbera rêziman û lojîkê de heyî xwuyakîn:

Pêkhênên Sentaksî Amajên Pêkhênan Di Semantîkê De Pêkhênên Lojîkî

Çi caran	+ dem	nerê
Kî	+ kes	pirsyar
Hatin	+ livîn	rûdana karekê

Lojîk û ziman bi taybet semantîk di wênekirinên hizrî de hev digirin. Lewre wêneyê yekeyeka biryardanê ya bingeha ku dibe ji aliyê take peyvekê ve derbibire û ew peyve jî yekeyeka awazeyî ye û berhengarî hestan dibe. Bi wateyeka din ew hestên ku ji aliyê zimanî ve tene derbirîn bi vê çendê wêneyan pêwendîyeke tund bi zimanî û dabeşkirina wî ve hene (Bekir Omer, 2014: 57).

Lojîk lêkolînê li dîtin û meseleyan dike, bi evê çendê divê pêwendîyeke bihêz digel beramberên xwe hebe ku ew peyv û destewajên zimanî ne (Şêrzad Sebrî, 2015: 86). Her wisa derbirîn di zimanî de hevokin û di lojîkî de mîna mesele Proposition serederî digel de tê kiri. Lojîk jî di sîstemê zimanî de serederîyê digel dirustî û nedirustîya wateyê dike, ne ku digel helwesta rasteqîneyê din yê axaftinê. Bi wê wateyê lojîk serederîyê di gel meselan Proposition de dike (Tirîfe Mûhsin, 2016: 68).

Cureyên Hevokê Ji Aliyê Lojîkê ve:

Lojîk hevokên zimanî li gor polîna zimanî dabeşî sê curan dike ji wan:

1-Hevoka Şîkarî (Analytic): Ev cureyê hevokê rastîya wan di nava hevokê de ye û pêdivî nake em vegerin ji bo cîhana ji derve (Şêrzad Sebrî, 2015: 90). Wate ev cureyê hevokê ti tiştêkê derbareyî cîhana ji derve nabêje. Belkî tiştêkê derbareyî wêneyê giştî yê cîhana derve didin (Lawîn Tehsîn, 2012: 36).

Mînak:

174 - Mamostamirove. (Lawîn Tehsîn, 2012: 36).

2-Hevoka Hevdij: Di vî curî de divê hevok hertim nedirust û nerast be (Lawîn Tehsîn, 2012: 37). Ji ber ku hevoka hevdij hertim hevoka şîkarî ya

rast dike nerê. Wate ev cureyê hevokê ji encamê nerê kirina hevoka şîkarî bi dest ve tê (Şêzad Sebrî, 2015: 91).

Mînak:

175 - Mamosta mirove.(Şêzad Sebrî, 2015: 91).

Hevoka (175) ê hevokeke şîkarîya raste. Lê belê eger em bikin nerê dê bibe hevokeke hevdij.

Mînak:

176- Mamosta mirov nîne.(Şêzad Sebrî, 2015: 91).

3-Hevoka Pêkhatî:Ev cureyê hevok dibe rast yan ne rast be. Ji bo dirustî û nedirustîya evan cureyên hevokan divê em vegerin ji bo lojîkê. Wate cîhana ji derve (Lawîn Tehsîn, 2012: 37). Her wisa divê penayê bibine ber mîtûdeka zanistî ji derveyî nax (zat) ê hevokê. Lewre ev cureyên hevokê agahîyan derbareyî babetên cîhana ji derve didin. Wate agahîyan derbareyî wan babetan didin ku dikevîne derveyî tixûbê zimanî (Tirîfe Mûhsin, 2016: 72).

Ev cureyê hevokê bi rêya cîhana ji derve bi dest ve tê. Evçax eger hevok digel cîhana ji derve ya hemeçur be li wî demî ew hevok dê ya rast be û eger ne li wî demî ew hevok ya rast nebe (Şêzad Sebrî, 2015: 90).

Mînak:

177 - Rêjîn mamostaye.(Şêzad Sebrî, 2015: 90).

Rastîya vê hevokê bi tenê bi vegeyîyanê ji bo cîhana ji derve bi dest ve tê. Ew jî eger bi sererast; Rêjîn mamosta be eger ne dê bibe hevokeke ne rast. Wate dibe girêdayî dewrûberî ye.

3.2.Têgeha Rêzimanîbûne (Grammaticality)

Chomsky di wê bawerîyê de ye binaxê fêrbûna rêziman di nava hişê mirovan de heye. Wate şîyaneke di nava hişî de bê ku fêr bibin. Ew bi serê xwe derdikeve û hemû zimanên mirovan ên cuda hevbeşin tê de ku têgeha rêzimana giştî di her hişî de

di barê asayî da li gel hev rêk dikevin. Ramana serekî ya Chomsky ji rêzimana giştî ew bû her zimanekê bingeheke giştî heye û axaftvanê her zimanekê baş dizane kîjan gotina wî guncayî ye û kîjan neguncayîye û dikare jî sererast bike. Di vêrê de pirsîyarek peyda dibe. Gelo çawan ev axaftvan guncan yan neguncana gotina xwe dizane? Û çawan ji hev cuda dike. Wate çawan dikare çi raste û çi xelete ? Bi dîtina me eve destpêka bîra rêzimana giştî ye. Lewre zanîna zimanî wate zanîna tixûbên ewî zimanî ye. Bi vî egerî zarok pisporî zimanê xwe dibe û dikare hevokan sererast bike (Tariq Mehmûd, 2014: 5-6). Her wisa lêkolînê li wan yasa û destûr yên ku bi rêya wan peyv têne girêdanê ji bo sererastkirina û pêkhênana hevokan. Wate lêkolînê li pêkhênana girê û hevokan dike (Chomsky, 1957: 74). Lewre peyv, girê û hevokan pêktînin. Di rêzimanê de rêzkirina pêkhênên hevokê li gorhejmareka yasa û destûrane ku peyv tê de têne rêkxistin û her peyvek erka xwe werdigire mîna kirde, bireser, lêker.

Rêzimanîbûn bi wê watayê ye ku zimanî hinek yasayên dîyarkirî ji bo pêkhatan hene. Li du hinek yasayan deng dihêne lêkdan ji bo sererastkirina birgê, birge li du hinek yasayan dihêle lêkdan ji bo sererastkirina payvê û ...hwd. Wate di zimanê Kurdî de pêkhata “sîr” heye. Lê pêkhata “risî” nîne. Her wisa ji bo hevokê “Dilşadî nan xwar” heye lê pêkhata “xwar nan Dilşadî” nîne. Ev çende li cem gîyaneweran nayê dîtin (Ebdulsalam Necmedîn & Şêrzad Sebrî, 2011: 38). Wate merem ji têgeha rêzimanîbûnê ew e pêkhênên zimanî ewên di tixûbê girê û hevokan de tên yasayan peyrew bikin û neşkênin (Şêrzad Sebrî, 2015: 168). Her wisa pêkhênên hevokê divê ji aliyê rêzimanî ve sentaksî û morfolojî rêkeftin di navbera wan de hebe (Vîyan Silêman, 2001: 86). Her dîsan biçûktirîn û xwerûtirîn pêkhên di zimanî de ew take dengî yên ku bi sedemê endamên axaftinê sererast dibin, mezintirîn dane di rêzimana zimanî de hevok e (Wirya Omer Emîn, 2009: 148). Her wisa rêzimanîbûn wate di zimannasîyê de şewazê sererastîya hevoka rêzimanî û yasayên rêzimanî dîyar dike. Lewre biryardana li ser rêzimanîbûn yan jî nerêzimanîbûna hevokê gelek zehmete. Ji ber ku ji bo axaftinkerên resen jî cudaye û cur bi cure dibe. Eger hevokê digel yasayên rêzimanî yên wî zimanî rêkeft li wê demê dê bi hevokê rêzimanî bê danîn. Eger berevajî yasayên rêzimana zimanî be li wî demî dê bi hevokê nerêzimanî bê hejmartin. Ji aliyekê din ve hinek deman hevok pêkhateka dirust ya heyî. Lê belê wateyeke rast nîne, evçax ev jî li wî demî bi

hevokeke rêzimanî nayê hejmartin. Lewre hevoka nerêzimanî ew hevoke yeke û li gor yasayên rêzimana zimanî nehatibe avakirin (Crystal, 2008: 219).

Pêdivîyê yasayên rêzimanî bi tenê hevokên rêzimanî yên zimanî berhembîne, ne ku hevokên nerêzimanî. Her wisa asayî ye, bibêjin ku axaftvanên ne resen. Wate yên ne şareza di zimanî de mirov dikare li gor axaftvanên wan hevokên nerêzimanî yên ku ew dibêjin bizanin (Archibald Hill, 1961: 1). Hevok bi nerêzimanî tê danîn, eger pêkhênên wê hemû rast jî bin di zimanî de ji ber ku eger ji aliyê rêzkirina pêkhênên ve ne li gor yasayên zimanî be li wî demî dê bi hevokeke nerêzimanî bête hejmartin. Her wisa hevokên nerêzimanî pêdivî bi komeka rastvekirinanin hene da ku bi şeweyekê yasayî bêne dîyar kirin. Ev kare jî ji bo axaftvanên resen ên wî zimanî vedigere (Hashemi, 2017: 3).

3.2.1. Pênaseya Hevoka Rêzimanî

Me pêştir jî dîyarkirî bû ku ziman ji komeka hevokên bê dawî pêk tên. Ku rêzimana berhemânîne pîranîya hevokên zimanî ku bi tenê ev hevok ku axaftvanê her zimanekê şîyan hene. Bi komkirin û rêxistina komeka peyvên bihevra hatî hejmareke hevokên rêzimanî bibêje. Wate ne bi tenê zimannasan ew şîyan hene ku biryarê li ser sererast û nesererast hevoka rêzimanî bide. Belkî her axaftvanê resen yan fermî yê zimanekê ew şîyan hene ku hejmareke bê dawî ya hevokên rêzimanî sererast bike. Her wisa têbigehe. Dibe ku axaftvanê resen ew şîyan nebin hemû wan yasa û destûrên giştî yên hevoka rêzimanî bizane. Lê belê şîyanên wî yên xwezayî wê çendê dîyar dike ku kîjan hevok rêzimanî ye û kîjan nerêzimanî ye (Haegeman, 1998: 6). Wate pêdivî nake ku zimannas bi yan jî rêzimana zimanê Kurdî bi başî bizanî ji bo wê çendê ku hevokeke mîna “Ew kor hej wê kiçê dikit” hevokeke rêzimanî ye. Di demekê de ku hevokeke mîna “kiç û korî hejê dikit” hevokeke rêzimanî ye (Tirîfe Mûhsin, 2016: 90). Anko hevoka rêzimanî ew hevoka ya ku li gor yasayên rêzimanî yên zimanî bête avakirin. Ew yasayên girêdayî şîyanên zimanî yên axaftvanê wî zimanî. Anko yasayên rêzimanîyên zimanî biryara rêzimanîbûn û nerêzimanîbûna hevokê didin (Segvan Miho, 2012: 5).

Hevok pêk nayên ji komeka peyvyan yan komeka pîtan heremkî. Belkî ew koma peyvyan yan pîtan perewa çend yasayên dîyarkirî dikin ku bi rêya yasayên

rêzimanî yên zimanî têne dîyarkirin. Ev gotin ji bo hemû zimanên cîhanê rastin. Ew jî raste ku axaftvanê zimanekê her hemû dikarin cudahîya di navbera formên rêzimanî û nerêzimanîyên hevokan de bikin. Behtirîya deman ew axaftvan dizanin ku çawan hevokên nerêzimanî sererast bikin û bikin bi hevokên rêzimanî. Ev jî agahîyên wan kesen dide nîşan derbarê yasayên sentaksîyên zîmanê wî. Wate şîyanên wî kesî yan jî bi wateyeka din bêjin agahîyên navxwe ên wî kesî radibin bi rastkirin û dirustkirina hevoka nerêzimanî û guhartina wê ji bo hevokeke rêzimanî (Tirîfe Mûhsin, 2016: 91). Em dikarin herdu zaravên “rêzimanîbûn û guncayî” di van herdu mînakên xwarê de ronî bikin:

178 - Min sêv xwar.

179 - Min sêv vexwar.

Hevoka (178) ê hevokeke rêzimanî û guncayî ye ji ber wê çendê ji herdu alîyên rêzimanî û watayê ve guncayî ye. Balê di hevoka (179) ê de her çende ji alîyê rêzimanî ve sererast e. Lê ji alîyê watayê ve neguncaye. Lewre sêv ditêne xwarin lê nayê vexwarin.

3.2.2. Pênasaya Rêkeftina Rêzimanî

Rêkeftina rêzimanî pêkhatîye bi hevra girêdana pêkhênên hevokê di astê hevoksazî de ku ji alîyê rêzimanî ve digel hevrêk dikevin. Her wisa rêkeftin ji alîyê sîmayên rêzimanî ve mîna “hejmar, kes û nifişî” ve (Vîyan Silêman, 2001: 26). Anko rêkeftin di navbera sîmayê kirdeyî digel lêkerî di kes,hejmar, nêr û mê de evî pêkhatîye şewazekê serbixwe wergirtîye (Dizeyî, 2013: 124). Wate rêkeftin dibe sedemê wê çendê ku bêhtir ronkirina sîmayên pêkhênên rêkkeftî û ew rolê di hevokê de dibînin. Bi vê çendê li cem guhdarî wateya girê, yan jî hevokê bêhtir ronî dibe (Vîyan Silêman, 2001: 27).

Mînak:

180 - Ez ji Zaxo çûm.

(+1 yekjimar) (+1 yekjimar)

Rêkeftin di kes û hejmarê de

3.2.3. Pênasaya Rêkeftina Wateyê

Pêkhatîye ji bihevra hatin û guncana pêkhênên hevokê digel hev ji alîyê wateyê ve ku pêwendî di navbera wan de ji bo berhemanîna hevokeke û guncayî ye (Vîyan Silêman, 2001: 85). Wate ev rêkeftina wateyî di navbera pêkhênên hevokê de sererast dibe ji sedemêwan kodên wateyî ne ku pêkhênên xwedî desthilat bi ser pêkhênên bê desthilat diçespînin. Mîna hevoka li jêr:

181 - Ewê zigord hevîna xwe berda.

Di vê mînaka li jor de, çî guncan û rêkeftina wateyî di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Ji ber ku peyva Zigord ji bo wî kesî tê bikaranîn, yê ku bê hevîjn be. Wate “- bi jin”.

3.2.4. Taybetmendîyên Hevoka Rêzimanî Di Zimanê KurdîDe

Kakilka dîyardeya rêkeftina rêzimanî di wê çendê de ye ku ew peyv yan pêkhênên ku pêwendîyeka sentaksî bihevra hene. Hinek pîtên wekhev yan hevseng di erkî de werdigrin. Bi wateyeka din rêkeftin ew dîyarda rêzimanî ye ku di tixûbê hevokê de derketina pêkhênê bi pêkhênê din bend dike ku pêwendîyeka rêzimanî di navbera wan de hebe. Ji alîyê vê pêwendîyê ve rêkeftin vedigere ji bo du cureyên sîstema polkirina formê sentaksa pêkhênan ku pêwendîya desthilatdarî û pêwendîya derbas kirinê ye. Ev herdu dikevîne di bin têgeha kartêkirinê di çarçova bikaranînê de. Wate di vê pêwendîya sentaksî de du cureyên pêkhênan tene destnîşankirin: Pêkhênên serekî yan jî bi desthilat û pêkhênên lawekî yan jî bê desthilat. Pêkhênên bi desthilat li gor ew çarçova ku tê de hatîye bikaranîn biryarê li ser derketin yan jî derneketina pêkhênên bê desthilat dide (Vîyan Silêman, 2001: 26).

Hevoka rêzimanî di her zimanekê dîyarkirî de eger ya pêkhatî be ji rêzkirineka rêzimanî ya sereraste. Her wisa dê bibe nerêzimanî, eger derket ji wan yasayên ku ji bo hevoka rêzimanî hatine dîyarkirin. Di rêzimana her zimanekê de

anko rêzimana dîyarkirî ya ku kiryara birêve birina axaftinê awa ku axaftvanê zimanî bikartîne bi şêweyekê ne berceste e. Yek ji taybetmendiyên hevoka rêzimanî ew e, divê xwe ji çî yasayên rêzimanî yên ku li gor pêkhênên zimanî di her sê astên zimanî de mîna astê dengî, astê rêzkirina pêkhênan û astê wateyî (Mîşêl Zekerîya, 1986: 108).

3.2.5. Pênasaya Hevoka Nerêzimanî

Yasayên çawanîya pêwendîya rêzimanî di navbera pêkhênên hevokê de ne bêne peyrew kirin. Wate derketin ji van yasayan hinek daran dibe sedemê nerêzimanîbûna hevokê û hinek carên din dibe sedemê rêknekeftina pêkhênên hevokê ji aliyê wateyê ve (Vîyan Silêman, 2001: 87). Her wisa çawanîya rêzkirina pêkhênên hevokê berevajî yasayên rêzimanî yên zimanî bin. Zimanê Kurdî ji zimanên “SOV” ye. Wate rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî bi vî awayî ye: “kirde + bireser + lêker”.

3.2.5.1. Taybetmendiyên Hevoka Nerêzimanî

Pêkhênên neserekî yên hevokê di nav xwe de rêzkirineka taybet bi xwe ve hene. Ji bo mînak, hemû deman daçek dikeve berî temamkerî (Vîyan Sileman, 2001: 89).

Mînak:

182 - Ez li bazarî dîtîm \longleftrightarrow Ez bazarî li dîtîm (Vîyan Sileman, 2001: 89).

Nîşaneyên nerê “ne, na” hemû deman dikeve berî lêkerî û eger ji cihê wê hate ladan di nava hevokê de, li wî demê ew hevok dê bibe hevokê nerêzimanî. Mîna van hevokan:

183 - Dilşad ne çû ji bo qutabxanê.

184 - Dilşad ne ji bo qutabxanê çû.*

Hemû deman da dîyarkirî dikeve berîya rengdêrî (Vîyan Silêman, 2001: 89). Mîna van hevokên li jêr me dayîn xweyakirin:

185 - Tu mirovekê mezinî.

186 - Tu mezine mirovî.*

Hinek caran guhartina cihê peyvên pirs di nava hevokê de dibe sedemê peydabûna hevoka nerêzimanî (Tirîfe Mûhsin, 2016: 98).

Mînak:

187 - Tu dê kengî çî ?

188 - Tu dê çî kengî ?*(Tirîfe Mûhsin, 2016: 98).

Di tixûbê yek girê de dîyarkirî jî berahîya rengdêrî tê (Vîyan Silêman, 2001: 89). Ew jî eger nîşaneyê xistinserî di navbera dîyarkirî û rengdêrî de hebe. Evca eger di heman dox de anko twang “doxê xistinser” rengdêr bikeve berî dîyarkirî. Li wî demî dê hevoka me bibe hevokê nerêzimanî (Şêrzad Sebrî, 2015: 170).

Mînak:

189 - Kiça baş. Nîşaneyê regezê mê di doxê xistinser de

190 - Baş kiça.

Di zimanê Kurdî de bireser di pêkhata serve de li cihê serekîyê xwe dîr nakeve û her di bin desthilata “GL” de dimîne. Lewre eger hat û dibin desthilata “GL” de nebû, li wî demî dê bibe sedemê nerêzimanîbûna wê hevoka tê de hatîye bikaranîn (Tirîfe Mûhsin, 2016: 95). Mîna van hevokên li jêr:

191 - Zarokî xwarin xwar.

192 - Xwarin Zarokî xwar.

193 - Xwar Zarokî xwarin.*

Weku tê xuya kirin ku hevoka li jor hevokê nerêzimanî ye. Lewre peyva “xwarin” dibin desthilata “GL”. Anko girêya lêkerî dîrketîye.

Wate di zimanê Kurdî de daçeka pirs ku cihê ne pêkhênêkê tijî dike, ew livîne bi zorî nîne ku şûnpêyêke di du xwe ra dihêle. Ji bo wê çendê ku ew daçeka pirs

mîna enaforê şûnpêyî kar bike û bête girêdan (Sebah Reşîd, 2009: 149). Mîna van hevokên li jêr hatine xweyakirin:

194 - Ew cilkan dikite berxwe.

195 - Ew dikite berxwe çi ?*

196 - Çi ew dikite berxwe ?*

197 - Ew çi dikite berxwe ?

Hevokên (194) û (195) û (196) û (197)ê hevokên nerêzimanî ne ji ber ku veguhastin û cihguherîna peyv yan jî girêya pirs di zimanê Kurdî de rê pê nayê dayîn. Anko bi vî awayî nabe hevokeke mîna (194)ê di hevokeke mîna (195) û (197)ê bête veguhastin. Di hevoka (197)ê de çi livînek bi cihê “cilkan” nehatîye kirin. Belkî daçeka pirs “çi” di heman cihê “cilkan” hatîye cêgîr kirin. Sedemê nebûna veguhastinê di zimanê Kurdî de ji bo wê çendê vedigere ku doxê rêzimanî bi pêkhênên serekî yên hevokê tê dayîn (Hêro Ehmed, 2008: 15). Lewre bi çi regekê di zimanê Kurdî de peyva pirs nayê veguhatin (Hatim Wilya, 2006: 156).

Di zimanê Kurdî de ladana serbarî¹⁸ di nava hevokê de nabe sedemê nerêzimanîbûna hevokê. Lewre yek ji taybetmendiyên serbarî ew e ku bi ladana wî di nava hevokê de nabe sedemê nerêzimanîbûna hevokê (Tirîfe Mûhsin, 2016: 96). Mîna van hevokên li jêr:

198 - Dilşad ev sale di nava pola xwe de bi yekem derçû.

199 - Dilşad derçû.

Belê guhartina cihê serbarî di nava hevokê de, hinek caran dibe sedemê nerêzimanîbûna hevokê (Tirîfe Mûhsin, 2016: 96).

¹⁸Serbar (Adjunct) : Ew pêkhênên serpişkin û arezûdar in ku dibe di nava hevokê de bêne ladan, bê ku kartêkirinê bike li ser aliyê rêzimanî û nerêzimanîbûna hevokê. Her wisa hinek agahiyan derbarê "çawanî û dem û cih... hwd" rûdana lêkerî pişan dide. Wate dibe hevoka xwerû bi alikariya hinek pêkhênên din bête berfirehkirin, mîna bireser, rengdêr... hw. Ku dibine serbarên hevokê û hevokeka xwerû ya berfireh pêk tînin (Tirîfe Mûhsin, 2016: 51). Serbaran di hevoka zimanê Kurdî de cihekê çespayî nîn e û heya radeyekê azadin di livînên xwe de. Ev azadiye jî li wî demî sererast dibe, ku bêhtir ji serbarekê di hevokê de bihevra bîn û paş û pêşkirina wan di nava yek de asayî ye (Tirîfe Mûhsin, 2016: 52). Serbar di zimanê Kurdî de dikevîne di navbera kirde û lêkerî di nava hevokê de (Fattah, 1997:238).

Mînak:

200 - Pêşmergeyî zarok ji şerî rizgarkir.

201 - Zarok di şerî da rizgarkir pêşmergeyî.

202 - Zarok rizgarkir diji şerî pêşmergeyî.

203 - Ji şerî rizgarkir zarok pêşmergeyî.(Tirîfe Mûhsin, 2016: 90).

Bikaranîna pîtên nasyarî û nenasyarî û pirjimar digel navê taybet di rolê kirdeyî de, dibe sedemê nerêzimanîbûna hevokê (Tirîfe Mûhsin, 2016: 90).Mîna hevoka li jêr:

204 - Nesrînekê dergehê mala me vekir.

Di mînaka li jor de nîşana ne nasyarî “ek” ya ketîye li ser dawîya navê Nesrîne ku di binyat de navê Nesrîn navekê taybete. Lewre xuya dibe ku her dema nîşana ne nasyarî bikeve dawîya navekê taybet. Li wê demê dê ew nave wê hevokê bike hevokeke nerêzimanî.

Hemû axaftvanên zimanê Kurdî dikarin hevoka rêzimanî û nerêzimanî ji hev cuda bikin. Her wisa hevokên nerêzimanî jî sererast bike û bike rêzimanî. Lewre pergala zimanê Kurdî li ser hişê axaftvanê zimanî bi guhlêbûn yan dîtîne ew hevokên li jor neguher bûye. Guhdar yan xwandevan yekser hest bi nerêzimanîbûna wan hevokan dike û ew şîyanên di hişê wan de heye, wiha li wan dike nedirustîya hevokê û çawanîya rastvekirina hevokan bizanin û hestpê bikin. Her wisa evên ku bi zimanê Kurdî diaxivin bi çi şêweyekê nehatine fêrkirin yan ji wan ra nehatîye gotin ku kîjan hevok ji alîyê rêzimanî ve sererast e û kîjan hevok sererast nîne (Tirîfe Mûhsin, 2016:93 :-94).


3.3.Guncandin (Acceptability)

Berî ku em behsa wê bikin divê em wê çendê bizanîn ku Chomsky di pirtûka xwe ya yekem de çi girîngî bi alîyê wateyê neda bû. Ev jî vedigere ji bo wan helwestên giştî ên di lêkolînên zimannasî de ku ji alîyê xwendingeha pêkhata Emrîkî hemberî watesazî hebû. Guncandin pêkhatîye ji gişt gotinên xwezayî ku yekser em tê

digehin bê ku em vegerin ji bo nivîsînê. Her wisa ew hevok jî seyr û bimij nînin (Chomsky, 1976: 21). Wate biryara kesî girînge demê gotinekê dibîze divê pişt bi şîyanan girê de neke çalakîyan (Mûhsin Elî, 2013: 9). Derbarê ronkirin û dîyarkirina alîyê guncanê di hevokên zimanî de. Chomsky amaje bi yasayên veguhastinê dide, bi mebesta ronkirina vê dîyardê û hevber kirin bi wan encamên ku di binemayên veguhastinê de bi destve tîn, ji bo bi destxistina wê mebestê Chomsky pêşnîyara çend fîlterêkên pêkhatên dewlemend kirîye derbarê ronkirin û axaftin li ser guncana wan fîlteran ku dibe bibine xala lihevhatina teorîya çalakkirin û teorîya şîyanan her wekî çawan hinek ji derfet û mercên ser veguhastinê dîyar dike. Ji bilî wê çendê ku barên zor ronî hene ku hevbeşin û rêkeftineka kêr li ser wê pirsê hebûye ku gelo veguhastinek fîltera pêkhata şirovekirineka baş tişteke birêk û pêk e (Tirîfe Mûhsin, 2016: 84).

Guncandin wateya wê ew e ku agahîyên zimannasî divê ji alîyê axaftvanên resen yê zimanî ve biryar li ser guncan yan neguncana hevokê bête danîn. Lewre axaftineke guncankirî yan hevokek ew gotine yan ku wekî hevok yan gotineka rêk pêdayî yan tê bikaranîn di zimanê rojane de. Lewre biryardan li ser gotineka guncankirî dibe zehmet be. Lewre gelek caran axaftvanên resen jî li ser hevokekê lihev nakin ku ew hevok ya asayî yan guncayî be yek ji sedemên lihev nekirina wan cudahîya mîna “navçeyî û agahîyên civakî û temen... hwd”. Evçax dibe hevokek di dîyalêktekê de asayî be. Lê belê di dîyalêkteka din de neyê pesendkirin. Ev jî pêwendî bi alîyê perwerdeya kesî ve heye (Crystal, 2008: 4). Her wisa Jacobsen derbarê herdu têgehên rêzimanîbûn û guncandinê dibêje; axaftinkerên resen biryar li ser rêzimanîbûnê didin. Her wisa Jacobsen ji bo rêzimanîbûnê biryara wê çendê dide ku tamamîtişteke cuda ye jî guncandin ê. Dîyare mebesta Jacobsen jî vê gotinê ew e ku herdu dîyarde mîna du babetên jihev cuda tene dîtin (Tirîfe Mûhsin, 2016: 84).

Bi dîtina John Lyonsî zehmeta tixûb di navbera rêziman û wateyê bête danîn. Lewre hevok li ser du binemayan bende guncandina rêzimanî û guncanidina wateyî (Lawîn Tehsîn, 2012: 37). Ku divî nexşeyê li jêr dê bêhtir bête ronîkirin:



Guncandina Rêzimanî

Guncandina Wateyî

Rêkeftin

Helbijartin

Wiha xuya yeku pêwendîya ferhengî di navbera peyvan de di nava çarçovê hevokê de bi sedemê wateya hevokê tê şirovekirin. Lê belê cudahîya di navbera pêwendîya sentaksî û pêwendîya ferhengî di wê çendê de ye ku her hevokê dibe ji alîyê rêzimanî ve temam be. Lê belê ji alîyê ferhenga peyvan ve temam nebe (Talib Hisên, 2014^a: 47). Mîna vê hevoka li jêr:

205 - Qutabî wane xwar.

Ev hevok li jor ji alîyê rêzimanê anko rêzkirina pêkhênanan ve rast e. Lê belê ji alîyê ferheng-guncana peyvan digel hev sererast nîne. Lewre hatina peyva “wane” digel lêkerê “xwarin” nagunce ye ji ber ku sîmayên wateyî yên peyva “wane” digel sîmayên wateyî yên peyva “xwarin” naguncin. Wate ev hevokê ji alîyê wate û lojîkî ve bi neguncayî tê hejmartin.


3.3.1. Pêkhateya Guncandina Hevokê

Guncandina hevokê girêdayî çalakîyê ye û komeka egera di vî astî de kartêkirinê lê dikin. Ew jî sedemên zimanî, civakî, rewşenbîrî û derûnî ne. Ev wê çendê digehîne ku guncandina hevokê girêdayî rewşenbîrîya axaftinkerî û amadebûna derûnî û astê wî ye zimanî û rewşa gihandinê ye (Xilfan, 2010: 37).

3.3.2. Têgeha Guncandina Wateyê

Mebest ji guncandina wateyê ew e ku rêkeftineke wateyî ya guncayî di navbera pêkhênan girê û hevokê de hebin ku di encamê bihevra hatina wan pêkhênan de dive hevokê sererast û lojîkî bête sererastkirin. Evçax her dema ew pêkhêne ji alîyê wateyê ve digel hev ne guncin, li wî demê dê têgeha ne guncandinê peyda be (Şêrzad Sebrî, 2015: 162). Mîna vê hevoka li jêr:

206 - Dîwarî axift.



Wate her peyvek xwedî hinek ji sîmayane ku bi rêya wan sîmayan mirov dikare ji peyvên din cuda bike. Li gor vê dîtîne her peyvek rêyê dide bi rêya sîmayên wateyî bêne şirovekirin û ev sîmaye dibine sedemê destnîşankirina wateya hûr ya her peyvekê. Li gor vê çende her şirovekarekê zimanî dikare destnîşana wateya her peyvekê li gorhejmareka pêkhatan yan sîmayan bike. Ew sîmayên dibine sedemê cudakirina wê peyvê ji peyvên din ên wî zimanî. Her wekî destnîşankirina wateya peyva “zalam”, ev peyve pêkhatîye ji evan sîmayên wateyî “+ mirov + pêgehiştî + nêr – zigord”, lewre eger sîmayek ji peyva navbirî bête guherîn, bêguman wateya wê peyvê jî bê guhartin (Ebdulselam Necmedîn & Şêrzad Sebrî, 2011: 190-191). Belê merc nîne ji bo sîmayên wateyî¹⁹ hemû deman em van nîşanan (+) (-) (±) bikarbînin. Belkî em dikarin li gor pêdivîyan nîşanên hemecur bikarbînin (Xolî, 2001: 196).

Yek ji rêyên lêkolîne li wateya hevokê û destnîşankirina çawanîya rêkeftina peyvan digel hev li gor wateya wan û têgeha nuwezeya wateyî û sedemên serhildana wê rêya şirovekirina hevokê ye li gor sîmayên wateyî (Vîyan Silêman, 2001: 90). Ev cure dîtîne ji bo cara yekem li sala 1963an de di lêkolîneka Katz û Fodor de li jêr nav û nîşanên (Pêkhata Teorîya Wateyî) hate belavkirin. Ev teorî di çarçova teorîya Chomsky de hatîye dariştin, ku tê hejmartin yekem teorî ji vî curî di zanistê wateyî de tê pêşnîyarkirin (Loyns, 1987: 166). Merem ji şirovekirinê bi rêya sîmayên wateyî kertkirina peyvê, girê yan hevokê ye ji bo yekeyên wateyî (Vîyan Silêman, 2001: 90).

Hevok	Yasayên Rêzimanî	Yasayên Wateyî
-------	------------------	----------------

¹⁹ Cureyên sîmayên wateyî:
 “1- Sîmayê komkirin: Ev sîmaye nîşana (+) bo tê bikaranîn û her dema ev nîşane li ber sîmayekê ji sîmayên peyvekê hate danan, li wî demî ew peyv wateya wê çendê dide, ku ew sîmaye li cem heye.
 2- Sîmayê kêmkirin: Ev sîmaye nîşana (-) bo tê bikaranîn û her dema ev nîşane li ber sîmayekê ji sîmayên peyvekê hate danan, li wî demî ew peyv wateya wê çendê dide, ku ew sîmaye li cem nîn e.
 3- Sîmayê du alî: Ev sîmaye nîşana (±) bo tê bikaranîn û wateya wê çendê dide, ku peyvekê di heman dem de sîmayê komkirin û kêmkirin hebe” (Xolî, 2001: 195-196).

Rêzimanî	+	+
Nerêzimanî	+	-
	-	+
	-	-

3.5.Cudahîya Di Navbera Rêzimanîbûn û Guncandinê de

Rêzimana berhemanîn û veguhastinê du têgehên girîng yê bîyavê zimannasî ji hev cuda dike. Ew jî guncan û rêzimanîbûna hevokên axaftinê ne (Dîyar Elî Kemal, 2002: 32). Chomsky cudahîyeke girîng di navbera rêzimanîbûn û guncandinê dike. Ev herdu têgehe têkelîdarin digel herdu têgehên şîyan û çalakî. Wate rêzimanîbûn têgehekê teorîya her wekî çawan têgehên doxê rêzimana girêya navî têgeha teorîne. Hevokê rêzimanî ye eger ji alîyê rêzimanî ve hatibe berhemanîn. Hevokê din nerêzimanî ye eger ji alîyê rêzimanî ve hatibe berhemanîn bi wateyeka din tenê dikarin behsa rêzimanîbûnê bikin. Bi rêya amajekirin bi şirovekirineka fermî ya dîyarkirî ji bo şîyanên kesê axaftvanê resen ji ber vê çendê ev ji alîyê zimanî ve hatîye avakirin. Rêzimanîbûn beşeke ji bazneya zimanî ya navxwe ye. Anko zimannase ku rêzimanî şirove dike dikare biryara rêzimanîbûnê bide ji vê çendê zimannas ew kese ku agahîyên ronî derbarê zimanî navxwe heye (Tirîfe Mûhsin, 2016: 86). Belê zimannas jî wê çendê dişopînin ya ku axaftvan encam dide ne ku wê çendê dikin ya ku zimannas dibêjin ku çî pêdivîye li ser wan bête kirin. Wate hevokê de bi guncayî bête hejmartin, eger bi şêweyek guncayî ji alîyê axaftvanê resen ve yan jî kesekê şareza di wî zimanî de bi şêweyekê giştî bête gotin. Her wisa şert nîne hevokên di dema ji borî de ku bi rêzimanî di hatine hejmartin di dema niha de jî her bi rêzimanî bêne hejmartin. Lewre dibe di dema niha de bi nerêzimanî bêne hejmartin (Lynn Berk, 1999: 4).

Ev herdu zarave ji alîyê pêweran ve jî cudahîyên wan hene. Ev cudakirine li ser wî binemayî tê ku pîverê guncanê pabende bi lêkolînên çalakîya zimanî, her çî pîverê rêzimanîbûnê ye. Ew jî pabende bi lêkolînên şîyanên zimanî ve, piştrastbûn ji bo vê çendê ku hinek hevok dibe ku di zimanî de guncayî bin. Lê belê di beramber de ji alîyê rêzimanîbûnê ve sererast nebin (Dîyar Elî Kemal, 2002: 32).

Mînak:

207 - Ew zelumê dûhî di fîstevale da me dîtî ku pertûkeka derbarê coxrafiya Kurdistanê nivîsî bû kume axaftin li ser fikir evro hate def min(Dîyar Elî Kemal, 2002: 32)..

Ev hevokê guncayî nîne. Lê belê rêzimanî ye.

Li gor vê polkirinê hevokê ji aliyê guncanê ve bi ast û pilên cuda cuda tene rêzkin. Wate hevokê heye pileya guncana wê nizimtire ji hevokê din.

3.5.1. Hevoka Rêzimanî û Guncayî

Li gor xwandina me ji bo wan çavkanîyên ku girêdayî rêzimanî û guncana hevokê, em dikarin wiha bêjin ku hevoka rêzimanî û guncayî di rêzimana zimanê Kurdî de li gor yasayên rêzimana zimanî. Anko rêzkinina pêkhênan hevoka zimanê Kurdî tê dirustkirin. Wate divê rêkeftineka rêzimanî ji aliyê rêzkinina pêkhênan û sîmayên rêzimanî hejmar, kes û nîfîsî ve di navbera pêkhênan hevokê de hebe. Her wisa ji aliyê wateyê ve guncayî bin. Anko em behsa wê hevokê dikin ya ku ji aliyê axaftvanên resen yê zimanî ve guncayî bin. Wate ew hevokên ku pêkhênan wan ji aliyê sîmayên wateyî ve guncan di navbera wan de hebe. Anko rêkeftineka wateyî di navbera wan pêkhênan de hebe. Lewre eger hevoka me li gor evan yasayên li jor be li wî demê de hevoka me bibe hevokê rêzimanî û guncayî. Em dê li jor hinek ji van cureyên hevokan wate rêzimanî û guncayî dene xuyakirin.

Mînak:

208 - Dilşadî zevî kêla²⁰.

Hevoka (208)ê ji aliyê rêzimanîve anko rêzkinina pêkhênan ve sererast e. Lewre lêkerê hevokê ku peyva “kêla” ye pêdivîyên xwe ji kirde û bireserî helbijartine. Bi wateyê din kirde li destpêka hevokê ku peyva Dilşade û lêkerê jî li dawîya hevokê û bireserê jî ku peyva “zevî” ye ketîye di navbera herdu pêkhênan de. Wate pêkhênan hevokê li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdîbî vî awayî “kirde + bireser + lêker”hatine rêzkin. Lewre rêkeftineka rêzimanî jî di navbera wan de heye


²⁰Hesen Salih, 67 Salî, Cotkar, Devera Sêmel.

ji alîyê “kes, nifiş,hejmar”ê ve. Anko hevoka (208)ê bi hevokeke rêzimanî tê hejmartin. Ji ber ku lêkerê hevokê ji borîyê gerguhêz e. Lewre rêkeftin di navbera bireserî û lêkerî de dibe. Wate pîta rêkeftinê (Ø)^{e21} ji ber ku bireserê hevokê kesê sêyemê yekjimarê di kurmancîya Behdînî de eger lêker ji borîyê gerguhêz be rêkeftin di navbera bireserî û lêkerî de ye. Bi vê yekê hevoka (208)ê bi hevokeke rêzimanî tê hejmartin.

Her wisa hevoka (208)ê ji alîyê wateyê ve jî bi hevokeke guncayî tê hejmartin. Wate di tixûbê hevokê de pêkhênên wê rêkeftineka wateyî di navbera wan de heye. Anko pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derneketîne û guncandin di navbera wan de heye. Lewre sîmayên wan digel hev diguncin wekî sîmayên peyva Dilşad ku kirdeyê hevokê ye di heman dem de şîyanên kirina karê “kêla” hene. Wate ji sîmayên peyva “Dilşad” ew e “+ pêgehiştî”. Anko şîyanên kirina karê “kêlan”ê hene. Bi vê çendê hevoka (208)ê ji alîyê rêzimanî ve û her wisa ji alîyê wateyê ve jî hevokeke sererast e.

Şirovekirina hevoka “Dilşadî zevî kêla” bi rêya nexşeyê derasa:

208 - Dilşadî zevî kêla.



²¹ Di kurmancîya Behdînî a herêma duhokê de de digel lêkerê borîyê gerguhêz cihnavên pêvek li dawîya lêkerî dernakevin. Wate (Ø) in.

209 - Serdarî nameya hevalê xo Azadî xwand²².

Hevoka (209)ê bi hevokeke rêzimanî tê hejmartin ji ber ku pêkhênên hevokê li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî hatine rêzkirin, ku kirdeyê hevokê peyva Serdar e ketîye destpêka hevokê. Her wisa lêkerê hevokê jî ku peyva “xwand” e ketîye dawîya pêkhênên hevokê. Dîsan bireserê hevokê jî ku girêya navî “nameya hevalê xo Azadî” e ketîye di navbera herdupêkhênan de. Wate rêzkirina pêkhênên vê hevokê bi vî awayî ye “kirde + bireser + lêker”. bi vê çendê rêkeftineka rêzimanî di navbera pêkhênên hevokê de heye ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve. Her wisa ji alîyê sîmayên rêzimanî ve jî rêkeftin di navbera bireser û lêkerê hevokê de ye, ji ber ku lêkerê hevokê ji borîyê gerguhêz e. Ligel lêkerê ji borîyê gerguhêz rêkeftin di navbera bireserî û lêkerî de ye di vê hevokê de ji ber ku bireser kesê sêyemê take. Wate nîşana rêkeftinê ji bo kesê sêyemê tak nîne. Anko (Ø) e mîna “Serdarî nameya hevalê xo Azadî xwand Ø”. Cînavê pêve li dawîya lêkerî derneketîye. Wate (Ø) e. Lewre hevoka (209)ê bi hevokeke rêzimanî tê danîn.

Zêdebarî vê çendê jî hevoka (209)ê ji alîyê wateyî ve jî bi hevokeke guncayî tê danîn, ji ber ku rêkeftineke wateyî di navbera pêkhênên hevokê de heye ku bihevra têne guncandin û wateyeka sererast dide guhdarî. Anko pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derneketîne û guncandin di navbera wan de heye. Ji ber ku lêkerê hevokê ku peyva “xwand” e di şîyanên kirdeyê hevokê de heye ku peyva “Serdar” e ewî karî encam bide. Wate “+ mirov”. Her wisa rêkeftineka wateyî di navbera peyva “name” û lêkerê hevokê jî de heye ku ji sîmayên peyva “name” ew e “+ xwandin”. Anko rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevoka (209)ê de heye. Wate hevoka (209)ê ji alîyê rêzimanî û wateyî ve bi hevokeke rêzimanî û guncayî tê danan.

210 - Bêkesî du peyker dirust kirin²³.

Hevoka (210)ê ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve bi hevokeke rêzimanî tê hejmartin, ji ber ku pêkhênên serekî ên hevokê li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî hatine rêzkirin. Wate “kirde + bireser + lêker” ku kirdeyê hevokê peyva “Bêkes” e û ketîye destpêka hevokê. Lêkerê hevokê jî peyva “dirust kirin” ku lêkerê gerguhêz

²² Heval Serdar, 19 Salî, Xwendekar, Devera Duhok.

²³ Nijyar Umer, 28 Salî, Mamoste, Devera Duhok.

e. Her wisa peyva “du peyker” jî bireserê yekser yê hevokê e. Anko rêkeftineka rêzimanî di navbera pêkhênên hevokê de heye ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve. Her wisa ji alîyê sîmayên rêzimanî ve jî rêkeftin heye. Ji ber ku lêkerê hevokê lêkerekê ji borîye gerguhêz e. Wate rêkeftinê dê di navbera bireserî û lêkerî de be²⁴. Lê di vê hevokê de li dawîya lêkerî nîşana cînavê pêve derketîye. Ji ber ku bireserê hevokê kesê sêyemê kome û digel kesê sêyemê kom nîşana rêkeftinê heye ku “n”e. Lewre rêkeftina rêzimanî ji alîyê sîmayên rêzimanî “kes û hejmar” ve di navbera pêkhênên hevokê de heye. Bi vê çendê hevoka (210)ê bi hevokeke rêzimanî tê danan.

Her wisa hevoka (210)ê ji alîyê wateyî ve jî bi hevokeke guncayî tê danan, ji ber ku rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de ya heyî. Ji ber ku pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derneketîne û guncandin di navbera wan de heye mîna rêkeftina di navbera kirde û lêkerê hevokê de ku kirdeyê hevokê peyva “Bêkes” e ku mirove û şîyanên dahênan û sererastkirina tiştan hene. Wate sîmayê “+ dahênan û diruskirin” li cem mirovan heye. Anko rêkeftineke wateyî di navbera wan de heye. Her wisa ji bîlî rêkeftina kirde û lêkerê hevokê jî rêkeftin di navbera bireser ku girêya navî “du peyker”e û lêkerê hevokê ku peyva “diruskirin” jî de heye. Wate hevoka (210)ê ji alîyê rêzimanî û wateyî ve bi hevokekeguncayî tê danîn.

211 - Em dê welatê xo parêzîn²⁵.

Hevoka (211)ê li gor rêzkirina pêkhênên wê bi hevokeke rêzimanî tê hejmartin, ji ber ku pêkhênên hevokê li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî hatine rêzkirin. Wate “kirde + bireser + lêker” ku kirdeyê hevokê cînavê serbixwe “Em” e û ketîye destpêka hevokê. Lêkerê hevokê jî peyva “dê parêzîn” ku lêkerekê gerguhêz ê neji borîye. Dîsan girêya navî “welatê xwe” erkê bireserê hevokê bi xwe ve girtîye ku peyva “welat” navekê take û giştîye peyva “xwe” cînavê xwe ye hemû bihevra “welatê xwe” dibe bireserê yekser yê hevokê. Lewre rêkeftineka rêzimanî di navbera pêkhênên hevokê de heye mîna rêkeftina di navbera kirde û lêkerê hevokê ji alîyê “kes, hejmar”ê ve ji ber ku lêkerê hevokê lêkerekê negerguhêz e. Wate rêkeftina rêzimanî di navbera kirde û lêkerê hevokê de ye. Her wisa rêkeftina sîmayên

²⁴ Di kurmançîya serî de eger lêkerê hevokê borîyê gerguhêz be rêkeftina sîmayên rêzimanî dê digel bireserî be û lêkerê hevokê dê cihnavên pêveyî yên komela duyem ‘m-în, î-n, Ø -n’ wergire. Û ev cihnavên pêveyî komela Ez ‘Ez - Em, Tu - Hûyîn, Ew - Ew’ werdigirin.

²⁵ Ûmêd Salim, 22 Salî, Xwendekar, Devera Duhok.

rêzimanî di navbera kirde û lêkerî de dibe, ku kirdeyê hevokê cînavê serbixwe ne “Em” e ji bo kesê yekemê kom. Wate divê lêkerê hevokê jî cînavê pêve ji bo kesê yekem kom werbigire ku “în”e û ketîye dawîya lêkerî. Anko rêkeftineka rêzimanî di navbera pêkhênên hevokê de heye ji alîyê “kes û hejmar”ê ve. Bi vê çendê hevoka (211)ê ji alîyê rêzkirina pêkhênanan ve bi hevokeke rêzimanî tê hejmartin.

Her wisa hevoka (211)ê ji alîyê wateyî ve jî bi hevokeke guncayî tê danan. Ji ber ku rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de ya heyî mînabihevra guncana sîmayên her yek ji kirdeyê hevokê ku cînavê serbixwe “Em” e. Lêkerê hevokê jî peyva “dê parêzîn”e. Sîmayên kirdeyê hevokê di mînakê de jî ew e (+ mirov). Wate şîyanên parastina tiştan hene. Lewre pêkhênên hevokê sîmayên wan digel hev têne guncandin û wateyeka sererast dide guhdarî. Anko pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derneketîne û guncandin di navbera wan de heye. Wate hevoka (211)ê ji alîyê rêzimanî û wateyî ve bi hevokeke guncayî tê danîn.

212 - Tu dê subahî berev ji derveyî welatî çî²⁶.

Hevoka (212)ê ji ber ku pêkhênên hevokê li gor yasayên rêzimana zimanî ne li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî bi hevokeke rêzimanî tê dîtîn. Bi vî awayî “kirde + hevalkarê demî + hevlakarê cihî + lêker”. Wate pêkhênên hevokê li cihên xwe yên rast hatine bikaranîn ku kirdeyê hevokê cînavê serbixwe ji bo kesê duyemê yekjimar e “Tu” ye. Lêkerê hevokê girêya lêkerî “çî”e ku lêkerekê ne ji borîye negerguhêz ye û girêya “subehî” hevalkarê demî ye. Her wisa girêya navî “berev ji derveyî welatî” hevalkarê cihî ye ji ber ku lêkerê hevokê neji borîyê negerguhêz ye. Wate rêkeftina sîmayên rêzimanî dê di navbera kirde û lêkerî de be ku kirdeyê hevokê cînavê serbixwe “Tu”ye ji bo kesê duyemê yekjimar e. Wate divê lêkerê hevokê jî cînavê pêvek ji bo kesê yekem pirjimar werbigire ku “î”e û ketîye dawîya lêkerî. Anko rêkeftineka rêzimanî di navbera pêkhênên hevokê de heye ji alîyê “kes,hejmar”ê ve. Wate hevoka (212)ê ji alîyê rêzkirina pêkhênanan ve bi hevokeke rêzimanî tê hejmartin.

Derbareyî alîyê wateyî jî hevoka (212)ê bi hevokeke guncayî tê danan, ji ber ku pêkhênên hevokê rêkeftineka wateyî di navbera wan de heye û bihevra hatina wan

²⁶ Xewla Mecîd, 30 Salî, Fermanber, Devera Duhok.

bûye sedemê dirustkirina hevokeke guncayî ji alîyê wateyê ve. Çunkî sîmayên wan digel hev têne guncandin. Mîna sîmayên kirdeyê hevokê ku cînavê serbixwe “Em” e digel sîmayên lêkerê hevokê ku girêya lêkerî “dê çîn” e diguncin. Ji ber ku ji sîmayên kirdeyê hevokê ew e “+ mirov”. Wate şîyanên çûnê hene. Anko bihevra guncandin wan bûye sedemê çêkirina hevokeke sererast ji alîyê wateyê ve. Bi vê çendê peyvên hevokê ji alîyê ferhengî ve digel hev hatine guncandin. Lewre li dev axaftvanên resen ên zimanê Kurdî hevoka (212)ê ji alîyê rêzimanî û wateyê ve bi hevokeke guncayî tê hejmartin.

213 - Min biryarda cigaran nekêşim²⁷.

Hevoka (213)ê li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî bi hevokeke rêzimanî tê danan, ji ber ku pêkhênên hevokê li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî hatine rêzkirin. Wate pêkhênên hevokê li cihên xwe yê rast hatine bikaranîn. Lê ji ber ku hevoka (213)ê hevokeke aloze. Wate du cureyên rêzkirinê hene ku hevoka yekem “min biryarda” ye ku rêzkirina pêkhênên wê bi vî awayî ne mîna “kirde + lêker” ku kirdeyê hevokê cînavê serbixwe ji bo kesê yekem yekjimar “Min” e. Lêkerê hevokê jî girêya lêkerî “biryarda” ye û lêkerê jî borîyê gerguhêz e. Hevoka duyem jî “cigaran nekêşim” di hevokê de kirdeyê hevokê nehatîye, wate (Ø) e. Peyva “cigaran” erkê bireserê yekser wergirtîye û lêkerê hevokê girêya lêkerî peyva “nekêşim” e. Di hevoka duyem de rêkeftin di navbera kirdeyê û lêkerî de ye ku nîşana rêkeftinê “m” e. Li dawîya lêkerî derkeftîye ku vedigere ji bo kirdeyê hevokê. Di binyat de jî cînavê serbixwe ye “Ez” e. Ji bo kesê yekem yekjimar e. Di hevoka (213)ê de ku hevokeke aloz e. Wate ji du hevokan pêk tê ku hevokê serbixweyê û ya din bende hevoka serbixwe “cigaran nekêşim” hevoka bend jî “Min biryarda” hevoka serbixwe bi pêkhênên xwe ve dibe bireser ji bo hevoka bend. Li gor van rêzkirinên li jor hevoka (213)ê bi hevokeke rêzimanî tê hejmartin.

Her wisa ji alîyê wateyê ve jî hevoka (213)ê bi hevokeke guncayî tê hejmartin. Ji ber ku pêkhênên hevokê sîmayên wan digel hev diguncin wekî sîmayên kirdeyê hevokê ku cînavê serbixwe “Min” ew e “+ pêgehiştî”. Anko şîyanên encamdana karekê hene. Zêdebarî ku lêkerê hevokê jî peyva “nekêşim” e ku ji sîmayên wî ew e “+ mirov”. Wate divê ew kesê bi vî karî rabe kesekê bi ruh be. Anko

²⁷ Ebdullah Mihemmed, 55 Salî, Bêkar, Devera Sêmêl.

şîyanên encamdana wî karî hebe. Bi vê çendê rêkeftineka wateyî di navbera kirde û lêkerê hevokê de heye û bihevra hatina wan bûye sedemê sererastkirina hevokeke guncayî ji alîyê wateyê ve. Wate pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derneketîne û guncandin di navbera wan de heye. Bi vê çendê ji alîyê axaftvanên resen ên zimanê Kurdî hevoka (213)ê ji alîyê rêzimanî û wateyî ve bi hevokeke guncayî tê dîtîn.

214 - Bîrhatî tu li bazarî dîtî.

Hevoka (214)ê ji alîyê rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî ve bi hevokeke rêzimanî tê hejmartin. Ji ber ku pêkhênên wê ên serekî mîna “kirde + bireser + hevalkarê cihî + lêker” li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî hatine rêzkirin. Zêdebarî pêkhênên neserekî jî ku di hevokê de hatine mîna cihanavê “xwe” dîsan girêya navî “li bazarî” ku di hevokê de erkê hevalkarê cihî wergirtîye û ketîye piştî bireserê yekser kucînavê serbixwe “Tu” ye û ketîye berî lêkerê hevokê peyva “dît”. Wate rêkeftineka rêzimanî di navbera pêkhênên hevokê de heye ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve û ji alîyê sîmayên rêzimanî ve jî rêkeftin heye mîna rêkeftina di navbera bireser û lêkerê hevokê de. Ji ber ku lêkerê hevokê derbaskirîye ji borîye. Wate rêkeftinê dê di navbera bireserî û lêkerî de be ku bireserê hevokê cînavê serbixwe “Tu” e û pîta “î” ya dawîya lêkerê “dîtî” ku di heman dem de cînavê pêveye ji bo kesê duyemê yekjimar e û vedigere ji bo bireserê hevokê “Tu” ye ku cihanavê serbixwe ji bo kesê duyemê yekjimar e. Bi vê çendê rêkeftin ji alîyê “kes û hejmar” ve di navbera pêkhênên hevokê de heye. Lewre hevoka (214) ê bi hevokeke rêzimanî tê danan.

Her wisa hevoka (214)ê ji alîyê wateyê jî ve sererast e. Lewre pêkhênên hevokê rêkeftineka wateyî di navbera wan de heye û hatine guncandin digel hev. Ji ber ku pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derneketîne. Mîna rêkeftina di navbera kirdeyê hevokê de ku peyva “Bîrhat” e û lêkerê hevokê ku girêya lêkerî “dît” e ku ji sîmayên kirdeyê hevokê ew e “+ mirov” e. Watê şîyanên dîtîne hene. Bi vê çendê hevoka (214)ê ji alîyê rêziman û wateyê ve bi hevokeke dirust tê hejmartin.

215 - Şirîne biçîkên xo nivandin.

Hevoka (215)ê ji alîyê rêzimanî ve. Anko rêzkirina pêkhênên hevoka Kurdî ve sererast e, ji ber ku pêkhênên wê mîna “kirde + bireser + lêker” li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî hatine rêzkirin. Her wisa di hevokê de navê “Şîrîn” ku di heman dem de kirdeyê hevokê ye li destpêka hevokê hatîye. Dîsan peyva “biçîk” jî bi bireserê hevokê tê hejmartin. Zêdebarî cînavê serbixwe “xo” ku karê wî di hevokê de mîna tamamkerê hevokê tê danîn. Lêkerê hevokê jî peyva “nivand” e ku lêkerê gerguhêz ye ji ber ku lêkerê hevokê lêkerê ji borîyê gerguhêz e. Wate rêkeftina rêzimanî dikeve di navbera bireserê yekser û lêkerî de. Lê nîşana rêkeftinê ku cînavê pêveye ji bo kesê sêyemê kom “n” e li dawîya lêkerî derketîye, ji ber ku bireserê hevokê kesê sêyemê pirjimar e. Bi vê çendê hevoka (215)ê bi hevokerê rêzimanî tê danîn.

Her wisa hevoka (215)ê ji alîyê wateyê jî ve ya sererast e. Lewre sîmayên pêkhênên hevokê digel hev tî guncandin mîna ku ji sîmayên peyva “Şîrîn” ku di heman dem de kirdeyê hevokê ye ew e “+ mirov” û lêkerê hevokê jî ku peyva “nivand” e ku mirovî şîyanên wî karî hene. Wate pêkhênên hevokê rêkeftin di navbera wan de heye û hatine guncandin digel hev. Anko pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî dernekeftîne û guncandin di navbera wan de heye. Bî vê çendê hevoka (215)ê ji alîyê rêziman û wateyê ve bi hevokerê rêzimanî tê danan.

216 - Hikumetê biryara kêmkirina bihayê panzînê derkir²⁸.

Hevoka (216)ê hevokerê rêzimanî ye. Ji ber ku ji alîyê rêzkirina pêkhênên hevokê ve sererast e. Wate pêkhênên hevokê li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî hatine rêzkirin. Kirdeyê hevokê peyva “Hikumet” e û bireserê hevokê jî ku di heman dem de girêyeka navîye jî “biryara kêmkirina bihayê panzînê” e. Her wisa lêkerê hevokê jî peyva “derkir” e. Anko kirde + bireser + lêker. Wate her sê pêkhênên serekî yê hevokê “kirde, bireser, lêker” tê de beşdarin. Zêdebarî rêkeftina rêzimanî ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve, herwisa rêkeftin ji alîyê sîmayên rêzimanî ve “hejmar û kes” î ve heye ji ber ku lêkerê hevokê ji borîyê gerguhêz e. Wate rêkeftin di navbera bireserî û lêkerî de dibe. Lê nîşana cînavê pêve li dawîya lêkerî derneketîye. Wate (Ø) e. Anko rêkeftineka rêzimanî di navbera wan de heye ji alîyê sîmayên rêzimanî

²⁸Salih Mihemmed, 52 Salî, Ajokar, Devera Zaxo.

mîna “hejmar, kes û nifîş”î ve. Bi vê çendê hevoka (216)ê bi hevokeke rêzimanî tê hejmartin.

Her wisa hevoka (216)ê ji alîyê wateyê ve jî guncayî ye. Lewre peyvên hevokê digel hev hatine guncandin. Wate rêkeftineka wateyî di navbera wan de heye jî berku kirdeyê hevokê ku peyva “Hikumet”e desthilat di danan û derkirina biryaran de heye. Wate ji sîmayên peyva Hikumet ew e “+ biryardan”. Anko rêkeftineka wateyî di navbera kirde û lêkerê hevokê de heye. Lewre bihevra hatina wan bûye sedemê sererastkirina hevokeke guncayî ji alîyê wateyê ve. Ji ber ku pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derneketîne. Bi vê çendê hevokê (216)ê ji alîyê rêziman û wateyê ve bi hevokeke rêzimanî û guncayî tê hejmartin.

217 - Ewê li parêzerekê baş digerît²⁹.

Hevoka (217) ê li gor rêzkirina pêkhênên wê bi hevokeke rêzimanî tê danîn, ku pêkhênên wê bi vî awayî hatine rêzkirin “kirde + bireserê neyekser + lêker”. Wate rêzkirina pêkhênên hevokê li gor yasayên rêzimana zimanî ne ku kirdeyê hevokê cînavê serbixwe ji bo kesê sêyemê yekjimar “Ew” e û ketîye destpêka hevokê, zêdebarî lêkerê hevokê ku girêya lêkerî “digerît” e û ketîyê dawîya hevokê. Dîsan girêya navî “li parêzerekê baş” ku di heman dem de bireserê neyekserê hevokê ye. Ketîye di navbera kirde û lêkerê hevokê de û bihevrahevokeke rêzimanî ava kirine. Ji ber ku lêkerê hevokê ne ji borîyê negerguhêz ye. Wate rêkeftina sîmayên rêzimanî di navbera kirde û lêkerê hevokê de ye ji ber ku kirdeyê hevokê kesê sêyemê yekjimar e. Wate divê hemberî kirdeyî nîşana rêkeftinê ji bo kesê sêyemê yekjimar be ku “ît”e³⁰. Wate rêkeftineka rêzimanî di navbera pêkhênên hevokê de heye.

Her wisa hevoka (217)ê ji alîyê wateyê ve guncayî ye. Lewrepêkhênên hevokê rêkeftineka wateyî di navbera wan de heye mîna rêkeftina di navbera kirde û lêkerê hevokê de ku kirdeyê hevokê cînavê serbixwe “Ew” e û lêkerê hevokê jî peyva “digerît” e. Lewre ew tiştê bi vî karî radibe divê ji sîmayên wî “+ mirov” be. Wate pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derneketîne û guncandin di

²⁹ Serdar Mûsa, 35 salî, Bazirgan, Devera Duhok.

³⁰ Di kurmancîya serî de eger lêkerê hevokê neborîyê gerguhêz û negerguhêz be rêkeftin dê digel kirdeyî be û komela sêyem “m-în, î-n, ît/t-n” wergire. Û ev cihnavên pêveyî jî komela Mîn werdigrin “Mîn – Me, Te – Hewe, Wî/Wê – Ewan”.

sîmayên pêkhênên hevokê digel hev naguncin. Wate di lojîkê de bi hevokeke neguncayî tê hejmartin. Lê belê yasayên rêzimanî tê de têne parastin. Em dê li jêr hinek ji wan hevokan dene dîyar kirin ku ji alîyê rêzimanî ve sererast bin. Lê belê ji alîyê wateyî ve nesererast bin.

Mînak:

218 - Tu kiçeka gelek dijwarî!³¹

Hevoka (218)ê ji alîyê rêzimanî ve sererast e, ji ber ku rêzkirina pêkhênên wê li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî ye ku pêkhênên hevokê bi vî awayî hatine rêzkirin “kirde + bireser + lêker”. Wate pêkhênên hevokê li gor yasayên rêzimana zimanî hatine rêzkirin. Kirdeyê hevokê cînavê serbixwe “Tu” ye û ketîye destpêka hevokê girêya navî “kiçeka gelek dijwar” erkê wê di hevokê de tamamkerê lêkerê bêhêze. Pîta “î” ya dawîya tamamkerî cînavê pêveye ji bo kesê duyemê yekjimar û vedigerê ji bo kirdeyî. Lêkerê hevokê jî derneketîye. Wate (Ø). Lewre rêkeftineka rêzimanî di navbera pêkhênên hevokê de heye ji alîyê “hejmar, kes û nifiş” ve. Wate hevoka (218)ê bi hevokeke rêzimanî tê hejmartin.

Hevoka (218)ê ji alîyê wateyê ve neguncayî ye. Wate ji alîyê lojîkî ve bi hevok nayê hejmartin. Lewre yek ji binmayên hevoka dirust ew e ku guncandin di navbera pêkhênên wê de hebe ji ber ku sîmayên peyva “dijwar” digel sîmayên peyva “kiç” hevdu nagirin ku ji sîmayên peyva “kiç” ew e “- dijwar”. Wate rêkeftina wateyî di navbera peyvên hevokê de nîne. Belê em dikarin li cihê peyva “dijwar” mîna “baş, zîrek, ciwan ... hwd komeka din ya peyvên guncayî bikarbînin. Her wisa em dikarin peyva “dijwar” di warê xarin û vexarinê de jî bikarbînin mîna vê hevokê “Ev xwarinê ya dijware”. Lê belê em nikarin bêjin “Tu kiçeka gelek dijwarî”. Lewre peyva “dijwar” cihê wê yê guncayî nîne. Wate pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derketîne û guncandin di navbera wan de nîne, wate hevoka (218)ê hevokeke rêzimanî ye. Lê belê ji alîyê wateyê ve guncayî nîne.

219 - Biçîk yê mirarbûyî!³²

³¹ Jîman Ehmed, 18 Salî, Xwendekar, Devera Sêmêl.

³² Vîyan Silêman, 45 Salî, Fermanber, Devera Duhok.

Hevoka (219)ê ji alîyê rêzimanî ve wate rêzkirina pêkhênan ve sererast e, ji ber ku pêkhênên hevokê li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî hatine rêzkirin ku bi vî awayî hatine rêzkirin “kirde + lêker”. Wate rêkeftineka rêzimanî jî di navbera pêkhênên hevokê de heye ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve ku kirdeyê hevokê girêya navî peyva “biçîk” e û lêkerê hevokê jî girêya lêkerî peyva mirarbûyî ye ku lêkerê jî borîyê gerguhêz e temam e. Her wisa ji alîyê sîmayên rêzimanî “hejmar, nifîş û kes”î ve, rêkeftina di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Çunkî lêkerê hevokê temam negerguhêz e û kirde jî kesê sêyemê yekjimar e. Wate digel lêkerê ji borîyê negerguhêz dernakeve. Anko (Ø)e. Bi vê çendê hevoka (219)ê bi hevokeke rêzimanî tê hejmartin.

Hevoka (219)ê ji alîyê wateyê hevokeke neguncayî ye. Çunkî ji alîyê lojîkî ve bi hevokeke guncayî nayê hejmartin ji ber ku yek ji binmayên hevoka sererast ji alîyê wateyê ve ew e ku rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de hebe. Belê di hevoka (219)ê çî rêkeftinên wiha nayên dîtin ji ber ku sîmayên peyva “biçîk” digel sîmayên lêkerê hevokê ku peyva “mirarbûyî” ye hevdu nagirin. Lewre ew kirdeyê ku divê digel lêkerê “mirarbûyî” bê divê yek ji sîmayên wî ew be ku “+ gîyanewer” be. Wate çî rêkeftinên wateyî di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Belê em dikarin li cihê peyva “mirarbûyî” peyva “mir” bikarbînin ku di gel kirdeyê hevokê de digunce. Lewre em dikarin bêjin “biçîk mir”. Lewre rêkeftinên rêzimanî û wateyî di navbera pêkhênên hevokê de heye. Her wisa em dikarin bêjin “gurgê mirarbûyî”. Wate pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derketîne û guncandin di navbera wan de nîne. Bi vê çendê hevoka (219)ê hevokeke rêzimanî ye. Lê belê ji alîyê wateyê ve guncayî nîne.

220 - Dilê wî ber bû.!³³

Di hevoka (220)ê pêgêrî bi yasayên rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî hatîye kirin, ji ber ku rêzkirina pêkhênên hevoka (220)ê mîna bi vî awayî “kirde + lêker” li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî hatine rêzkirin. Kirdeyê hevokê girêya navî “Dilê wî” ye peyva “ber” jî temamkerê lêkerê bêhêze “bû” jî lêkerê ji borîyê negerguhêz ye vedigere ji bo kirdeyî. Lêkerê hevokê jî derneketîye. Wate nîşana rêkeftinê nîne. Anko (Ø) e. Lewre kirde kesê sêyemê yekjimar e. Bi vê çendê

³³ Umer Hesên, 33 Salî, Dukandar, Devera Zaxo.

rêkeftineka rêzimanî ji alîyê rêzkirin û sîmayên ve di navbera pêkhênên hevokê de heye. Lewre hevoka (220)ê bi hevokeke rêzimanî tê hejmartin.

Hevoka (220)ê ji alîyê wateyê ve ya guncayî nîne. Wate ji alîyê lojîkî ve bi hevokeke guncayî nayê hejmartin. Lewre peyva “ber” bi wateya xwe ya ferhengî nehatîye bikaranîn ku ew jî cureke ji cureyên kanzayan. Belê di hevoka (220)ê de li gor dewrûberî bi wateya mirovekê “bê rehim” hatîye. Wate ti rêkeftinên wateyî di navbera pêkhênên wê de nîne ji ber ku yek ji sîmayên peyva “dil” ew e ku “+ nerim”. Lê belê di hevoka (220)ê amaje bi peyva “dil” hatîye kirin weku pêkhênêkê “+ req”. Wate ev sîmaye digel peyva “dil” nagunce. Her wisa ji sîmayên peyva “ber” ew e ku “+ req”e, ne ku peyva “dil”. Anko ti rêkeftinên wateyî di navbera herdu pêkhênan de nînin. Belê em dikarin li cihê peyva “ber” komeka din ya peyvên guncayî bikarbînin mîna sor, goşt ... hwd. Bi vê çendê hevoka (220)ê bi hevokeke rêzimanî û neguncayî tê hejmartin.

221 - Kiçê korik xwast!³⁴

Hevoka (221)ê hevokeke rêzimanî ye wate ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve sererast e. Lewre di hevokê de pêgêrî bi yasayên rêzimana zimanê Kurdî hatîye kirin. Wate pêkhênên hevokê bi vî awayî “kirde + bireser + lêker” hatine rêzkirin. Peyva “kiç” kirdeyê hevokê ye û peyva “kor” bireserê yekser yê hevokê ye. Her wisa lêkerê hevokê jî peyva “xwast”e û ketîye dawîya hevokê. Wate rêkeftineka rêzimanî ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve di navbera pêkhênên hevokê de heye. Her wisa ji alîyê sîmayên rêzimanî ve rêkeftin di navbera pêkhênên hevokê de heye mîna rêkeftina di navbera bireser û lêkerê hevokê de ji ber ku lêkerê hevokê ji borîye gerguhêz e. Wate rêkeftin di navbera bireserî ku peyva “kor” ye lêkerî ku peyva “xwast”e. Lê nîşana nîfşî li dawîya lêkerî derneketîye. Wate (Ø)e. Lewre hevoka (221)ê bi hevokeke rêzimanî tê hejmartin.

Her wisa ji alîyê wateyê ve bi hevokeke neguncayî tê hejmartin. Lewre çî rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Wate pêkhênên hevokê ji alîyê sîmayên wateyî ve bihevra hatina wan digel hev naguncin. Ji ber ku peyva “kiç” ji sîmayên wê “- xwastin”. Wate di civakê Kurdîde ji sîmayên “kiçê”

³⁴ Metîn Qadir, 22 Salî, Bêkar, Devera Zaxo.

nîne,”korî” bixwaze. Belkî karê xwastin ji sîmayên korî ye. Wate kor “+ xwastin” ne ku “kiç” bi vî karî radibe. Dibe ku di civakê din de karekê guncayî be ku “kiç korî bixwazit”. Belê di nava civakê Kurdî de bi karekê neasayî tê dîtîn. Anko axaftvanên resen ên zimanê Kurdî hevoka (221) ê bi hevokeke neguncayî dibînin. Wate hevoka (221)ê ji alîyê rêzimanî ve rast e. Lê belê ji alîyê wateyê ve sererast e. Anko hevoka (221)ê bi hevokeke rêzimanî û neguncayî tê hejmartin.

222 – Biçîkîber xwarin!³⁵


Hevoka (222)ê ji alîyê rêzimanî ve. Anko rêzkirina pêkhênan ve sererast e, ku ji “kirde + bireser + lêker” pêk tê. Kirdeyê hevokê peyva “biçîkî” e û ketîye destpêka hevokê. Dîsan lêkerê hevokê jî ku peva “xwarin” e ketîye dawîya hevokê ji ber ku lêkerê me gerguhêz e. Wate em pêdivî bireserekê yekserin ku peyva “ber” di hevokê de ew erke wergirtîye. Ji ber ku lêkerê hevokê lêkerê gerguhêz e. Lewre rêkeftina rêzimanî dê di navbera bireserî û lêkerî de be ji ber ku “n” dawîya lêkerî cînavê pêveye ji bo kesê sêyemê kom û vedigere ji bo bireserê hevokê. Wate ji alîyê kes,hejmarê ve bihevra hatine guncandin. Wate rêkeftineka rêzimanî ji alîyê rêzkirin û sîmayên pêkhênan ve di navbera pêkhênan hevokê de heye. Bi vê çendê hevoka (222)ê bi hevokeke rêzimanî tê hejmartin.

Her wisa ji alîyê wateyê ve hevoka (22)ê hevokeke neguncayîye. Lewre peyva “ber” di heman dem de ku bireserê hevokê ye digel peyva “xwarin” ku lêkerê hevokê ye naguncin. Ji ber ku ji sîmayên peyva “ber” ew e ku nayê xwarin. Anko “-xwarin”. Wate pêkhênan hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derkeftîne û guncandin di navbera wan de nîne. Lewre di çarçovê hevokê de ew girêyên ku bi erkê kirdeyî yan bireserî bi xwe ve digirin. Hinek ji sîmayên rêzimanî mîna “kes,hejmar û nifîş”î bi rêka yasayên veguhastinê bi ser lêkerê hevokê de disepînin. Wate digel hev rêk dikevin (Vîyan Silêman, 2001: 45). Anko divê rêkeftin di navbera pêkhênan hebe ji bo çêkirina hevokeke sererast hem ji alîyê rêzimanî ve û hem ji alîyê wateyî ve.

Şirovekirina hevoka “Biçîkî ber xwarin!” bi rêka nexşeyê darasa:

³⁵Meryem Salih, 65 Salî, Devera Zaxo.

222 - Biçîkî ber xwarin.!



223 - Gorî ji navçavên ewî diçû.!³⁶

Di hevoka (223)ê de pêgêrî bi yasayên rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî hatîye kirin. Anko rêzkirina pêkhênên hevokê ên serekî li gor yasayên rêzimanî yên zimanê Kurdî hatine rêzkirin ku rêzkirina pêkhênên wê “kirde + lêker”. Ku kirdeyê hevokê peyva “gorî” ye giryêya navî ji navçavên ewî jî erkê bireserê neyekser yê hevokê wergirtîye. Lêkerê hevokê jî girêya lêkerî peyva “diçû” ye ku lêkerê ji borîyê negerguhêzê ye. Wate rêkeftineka rêzimanî ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve heye. Her wisa ji alîyê sîmayên rêzimanî ve “hejmar û kes”î ve ji ber ku lêkerê hevokê ji borîyê negerguhêzê ye. Wate rêkeftinê dê di navbera kirde û lêkerî de be. Lê ji ber ku kirdeyê hevokê kesê seymîn yekjimar e. Wate nişana rêkeftinê li

³⁶ Umer Mihemmed, 47 Salî, Ajokar, Devera Sêmêl.

dawîya lêkerî derneketîye, wate (Ø)e. Bi vê çendê hevoka (223)ê ji alîyê gorî rêzkirina li jor hevokeke rêzimanî ye.

Her wisa ji alîyê wateyê ve hevoka (223)ê guncayî nîne. Ji ber ku çî rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Anko sîmayên pêkhênên hevokê ligel hev nayên guncandin. Lewre yek ji sîmayên navçavên mirovî ew e “-gorî” e. Wate agir ji navçavên mirovî naçe. Anko rêkeftin di navbera kirdeyê hevokê gorî ku di heman dem de kirdeyê rêzimanîye digel lêkerê hevokê “diçû” ku lêkerekê negerguhêz ye sîmayên wan digel hev naguncin. Anko çî rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Wate pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derkeftîne û guncandin di navbera wan de nîne. Wate hevoka (223)ê ji alîyê wateyê ve hevokeke neguncayî. Anko hevoka (223)ê ji alîyê rêzimanî ve sererast e. Lê belê ji alîyê wateyê ve hevokeke neguncayî ye.

224 - Ew mirovekê rîvî bû!³⁷

Hevoka (224)ê bi hevokeke rêzimanî tê hejmartin, ji ber ku rêzkirina pêkhênên wê li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî hatine rêzkirin û her pêkhênê li cihê xwe yê sererast hatîye bikaranîn. Kirdeyê hevokê ku cînavê serbixwe ye. Ew e û ketîye destpêka hevokê. Her wisa lêkerê hevokê jî peyva “bû” ye ku lêkerekê negerguhêz e bêhêze, girêya navî, “mirovekê rîvî” bihevra dibe temamkerê lêkerê hevokê. Wate rêzkirina pêkhênên hevoka (224)ê bi vî awayî ye “kirde + temamker + lêker”. Bi vê yekê rêkeftineka rêzimanî ji alîyê rêzkirinê ve di navbera pêkhênên hevokê de heye. Her wisa ji alîyê sîmayên rêzimanî ve rêkeftin di navbera kirde û lêkerî de dibe ji ber ku lêkerê hevokê ji borîyê negerguhêz ye. Lê nîşana rêkeftinê li dawîya lêkerî derneketîye ji ber ku kirdeyê hevokê kesê seyemîn yekjimar e wate nîşana rêkeftinê nîne. Bi vê çendê hevoka (224)ê ji alîyê rêzimanî ve sererast e.

Her wisa hevoka (224)ê ji alîyê wateyê ve hevokeke neguncayî ye, ji ber ku ti rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Lewre ji sîmayên peyva mirov ew e “-gîyanewer” û ketîye digel peyva “Rîvî” ku ji sîmayên wî “+gîyandar” e. Wate rêkeftina wateyî di navbera pêkhênên hevokê de nîne ji ber ku pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derketîne û guncandin di navbera

³⁷ Mihemmed Ehmed, 59 Salî, Bêkar, Devera Zaxo.

wan de nîne. Lewre hevoka (224)ê bi hevokeke neguncayî tê danan. Bi vê çendê hevoka (224)ê bi hevokeke rêzimanî. Lê belê neguncayî tê hejmartin.

225 - Te serê me xwar!³⁸

Hevoka (225)ê ji alîyê rêzimanî ve sererast e ji ber ku pêkhênên serekî yên hevokê li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî hatine rêzkirin, kirdeyê hevokêcînavê serbixwe “Wî” e û ketîye destpêka hevokê lêkerê hevokê jî peyva “xwar”e û lêkerê gerguhêz e ji borîye. Wate di hevokê de me pêdivî bi bireserekê yekser heye. Lewre peyva “serê me” di hevokê de bi erkê bireserê yekser wergirîye, li gor vê rêzkirinê rêkeftineka rêzimanî mîna “kirde, bireser, lêker” di navbera pêkhênan hevokê de heye. Bi vê çendê rêkeftineka rêzimanî di navbera pêkhênên hevokê de heye ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve. Her wisa ji alîyê sîmayên rêzimanî ve jî rêkeftin di navbera bireser û lêkerê hevokê de ye, ji ber ku lêkerê hevokê jî borîyê gerguhêz e digel lêkerê ji borîyê gerguhêz rêkeftin di navbera bireserî û lêkerî de ye. Di vê hevokê de ji ber ku bireser kesê seyemîn yekjimar e. Wate nîşana rêkeftinê ji bo kesê seyemîn yekjimar nîne. Anko (Ø), wate cînavê pêve li dawîya lêkerî derneketîye. Wate (Ø). Lewre hevoka (225)ê bi hevokeke rêzimanî tê danîn.

Her wisa ji alîyê wateyê ve hevoka (225)ê ne guncayîye. Lewre kirdeyê hevokê ku cînavê serbixwe “Wî” e, şîyanên encamdana karê xwarina “serê mirovan” nînin. Wate “- xwarin”. Her wisa ev çende jî di lojîkê de nayê pejirandin. Wate rêkeftina wateyî di navbera pêkhênên hevokê kirde û bireserê yekser de nîne û sîmayên wan digel hev naguncin. Wate pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derkeftîne û çî guncandin di navbera wan de nîne. Lewre li cem axaftvanên zimanî bi çî renekê hevoka (225)ê bi hevokeke guncayî di nava zimanê rojane de nayê dîtin. Lewre hevoka (225)ê bi hevokeke rêzimanî tê danan. Lê belê ji alîyê wateyê ve ne guncayî ye .

226 - Zêlamê vê kiçê mir!³⁹


³⁸ Amîna Mihemmed, 44 Salî, Navmalî, Devera Zaxo.

Di hevoka (226)ê pêgêrî bi yasayên rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî hatîye kirin, ji ber ku pêkhênên hevokê li gor yasayên rêzimanî hatine rêzkirin ku bi vî şêweyî hatine rêzkirin “biker + lêker”. Ku kirdeyê hevokê girêya navî “zêlamê vê kiçê” ye û lêkerê hevokê jî girêya lêkerî peyva “mir” e ku lêkerê jî borîyê negerguhêze. Wate hevok ji alîyê rêkeftina rêzimanî ji alîyê rêzkirina pêkhênana ve serrast e. Lê ji alîyê rêkeftina sîmayên rêzimanî ve ji ber ku lêkerê hevokê negerguhêz ye. Wate nîşana rêkeftinê dernakeve. Lewre kirdeyê hevokê kesê sêyemîn yekjimar e. Wate nîşane li dawîya lêkerî derneketîye. Anko li gorrê rêzkirinê hevoka (226)ê bi hevokê rêzimanî tê hejmaratin.

Her wisa ji alîyê wateyê ve hevokê neguncaye, ji ber ku sîmayên wateyî ên peyva “Zêlam” digel peyva “Kiç” naguncin. Lewre bihevra hatina wan di nava vê hevokê de hevok kirine hevokê neguncayî ji alîyê wateyê ve. Çunkî yek ji sîmayên peyva “Zêlam” ew e ku “+ bi jin”. Lê sîmayên peyva “Kiç” ew e “- şîkirî” ye. Lewre bihevra hatina wan bûye sedemê sererastkirina hevokê neguncayî ji alîyê wateyê ve. Wate hevoka (226)ê ti rêkeftin di navbera pêkhênên wê mîna kirde û bireserî de nîne. Lewre gotina vê hevokê di nava axaftvanên resenên zimanê Kurdî de bi hevokê neguncayî tê danan. Lewre axaftvanên resen ên zimanî li ferhenga peyvên zimanî de agehdarin û dizanin kîjan hevok guncayîye û kîjan guncayî nîne. Anko hevoka (226)ê ji alîyê rêzimanî ve sererast e. Lê belê ji alîyê wateyê ve neguncayîye.


Şirovekirina hevoka “Zêlamê vê kiçê mir!” ya xwerû bi rêya nexşeya derasa:

226 - Zêlamê vê kiçê mir!⁴⁰



³⁹ Ebdullah Elî, 51 Salî, Dukandar, Devera Zaxo.

⁴⁰ Jîyan Hisên, 33 Salî, Navmalî Devera Sêmêl.



227 - Te dilê min şikand.!⁴¹

Hevoka (227)ê li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî bi hevokeke rêzimanî tê danîn. Lewre di hevokê de pêgêrî bi yasayên rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî hatîye kirin. Ji ber ku pêkhênên hevokê li gor yasayên rêzimana zimanî hatine rêzkirin. Wate bi vî awayî “kirde + bireser + lêker”. Ku kirdeyê hevokê cînavê serbixwe ye. Ji bo kesê duyemîn yekjimar “Te”ye û bireserê hevokê jî girêya navî “dilê min” e. Her wisa lêkerê hevokê jî girêya lêkerî “şikand”e li gor vê rêzkirinê hevoka (227)ê bi hevokeke rêzimanî tê hejmaratin ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve. Her wisa ji alîyê sîmayên rêzimanî ve ji ber ku lêkerê hevokê ji borîyê gerguhêz e. Wate rêkeftinê de di navbera bireser û lêkerî de be. Lê ji ber ku lêkerê hevokê ji borîyê gerguhêz e ji ber ku bireser kesê sêyemîn yekjimar e. Wate nîşana rêkeftinê ji bo kesê sêyemîn yekjimar nîne. Anko (Ø)e. Lewre cînavê pêve li dawîya lêkerî derneketîye. Wate (Ø)e. Bi vê çendê hevoka (209)ê bi hevokeke rêzimanî tê danîn.

Her wisa ji alîyê wateyê ve bi hevoka (227)ê bi hevokeke neguncaye tê danîn, ji ber ku pêkhênên hevokê çî rêkeftinên wateyî di navbera wan de nîne. Lewre pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derketîne û guncandin di navbera wan de nîne. Çunkî sîmayên wateyî ên peyva “Dil” digel sîmayên peyva “şikand” naguncin. Lewrebihevra hatina wan di nava hevokê de hevok kirine hevokeke neguncayî ji alîyê wateyê ve. Ji ber ku yek ji sîmayên peyva “Dil” ew e ku “şiknadin”. Lewre bi hevra hatina van herdu pêkhênan bûye sedemê sererastkirina hevokeke neguncayî ji alîyê wateyê ve. Wate gotina vê hevokê di nava axaftvanên resenên zimanê Kurdî de bi hevokeke neguncayî tê danîn. Lewre axaftvanên resen ên zimanî li ferhenga peyvên zimanî de agehdarin û dizanin kîjan hevok guncayî ye û

⁴¹ Jîyan Hisên, 33 Salî, Navmalî Devera Sêmêl.

kîjan guncayî nîne. Bi vê yekê hevoka (227)ê ji alîyê rêzimanî ve sererast e. Lê belê ji alîyê wateyê ve neguncayî ye.

3.5.3. Hevoka Nerêzimanî û Guncayî

Ev cureyê hevokê rêzkirina pêkhênên wê ji alîyê yasayên rêzimana zimanê Kurdî ve sererast nîne. Anko rêzkirina pêkhênên wê ne li gor yasayên rêzimana zimanî ne. Ji ber ku rêzkirina pêkhênên serekî ên hevoka Kurdî bi vî awayî ye “kirde, bireser, lêker”. Wate her hevokeke ne li gor vî awayî be li wî demî dê bi hevokeke nerêzimanî bête hejmartin. Belê ji alîyê wateyê ve guncandin di navbera pêkhênên hevokê de heye. Wate di vê cureyê hevokê de dibe rêkeftin di navbera pêkhênên hevokê de hebe. Lê belê ji alîyê wateyî û lojîkî ve bi hevokeke sererast û guncayî tê hejmartin. Lê belê yasayên rêzimanî tê de nayên dîtin. Em dê li jêr hinek ji wan hevokên nerêzimanî û guncayî dine xuya kirin.

Mînak:

228 - Vejînê kirî kirasek.*⁴²


Hevoka (228)ê hevokeke nerêzimanî ye ji ber ku rêzkirina pêkhênên wê ne li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî ne. Wate yasayên rêzimanê di zimanê Kurdî de şikandîye ku rêzkirina wê bi şewê “kirde + lêker + bireser”e. Ku kirdeyê hevokê girêya navî “Vejîn” e girêya lêkerî “kirî” lêkerê hevokê ye û girêya navî “kirasek” erkê bireserê yekserê hevokê wergirtîye. Ev cureyê rêzkirinê jî di zimanê Kurdî de nayê dîtin. Anko her hevokeke rêzkirina pêkhênên wê bi vî awayî bê, li wî demî wê bibe hevokaka nerêzimanî. Wate ti rêkeftineka rêzimanî ji alîyê rêzkirinê ve di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Lê belê ji alîyê sîmayên rêzimanî ve ji ber ku lêkerê hevokê ji borîyê gerguhêz e. Wate rêkeftinê dê di navbera bireserî û lêkerî de be. Lê ji ber ku bireserê hevokê kesê sêyemîn yekjimar e. Wate nişana rêkeftinê li dawîya lêkerî dernakeve anko (Ø)e. Her çende rêkeftina rêzimanî ji alîyê sîmayan ve hejmar û kesî ve di navbera pêkhênên wê de heye. Lê belê ji alîyê rêzkirinê ve rêkeftin nîne. Lewre bi hevokeke nerêzimanî tê destnîşankirin. Anko bireserê yekser çî deman nakeve pişt lêkerê gerguhêz, hertim di hevoka lêkerê gerguhêz de dikeve di

⁴² Fatma Elî, 29 Salî, Navmalî, Devera Zaxo.

navbera kirdeyî û lêkerî de. Anko bireser nikare cihê xwe ji bo pişt lêkerî biguhere. Bi vê çendê hevoka (228)ê bi hevokeke nerêzimanî tê hejmartin.

Her wisa hevoka (228)ê ji alîyê wateyê ve. Wate guncandina ferhengî ya pêkhênên hevokê digel hev bi hevokeke guncayî tê hejmartin ji ber ku sîmayên pêkhênên hevokê digel hev tî guncadin. Ji bo mînak kirdeyê hevokê ku peyva “Vejîn” e şîyanên “+ kirîn” anko şîyanên kirîne ên heyin. Herwisa bireserê hevokê ku peyva “kiras” e di şîyan de heye bête kirîn. Anko ew jî “+ kirîn”. Bi vê çenda me gotî em dikarin bêjin rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de heye. Lewre hevoka (228)ê ji alîyê rêziman nesorast e. Belê ji alîyê wateyê ve bi hevokeke sererast tê danîn.

Şirovekirina hevoka “Vejîne kirî kirasek” bi rêya nexşeya derasa:



229- Çû ber dilovanîya Xodê ew.*⁴³

Hevoka (229)ê ji alîyê rêzimanê ve wate rêzkirina pêkhênan ve bi hevokekenerêzimanî tê danan. Anko guhartin di pêkhênên hevokê de hatine kirin û

⁴³ Karzan Ebdullah, 40 Salî, Karebavan, Devera Duhok.

rêzkirina pêkhênên wê ne li gor yasayên rêzimanî zimanê Kurdî ne ji ber ku rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî eger lêkerê hevokê negerguhêz be. Bi vî awayî ye “kirde + lêker”e. Belê hevoka (229)ê ne li gor vê yasayê hatîye sererastkirin. Lewre lêkerê hevokê ku peyva “çû” ye û lêkerekê negerguhêz ye ketîye destpêka hevokê. Girêya navî “Ber dilovanîya Xode” jî erkê bireserê neyekser ê hevokê wergirtîye. Her wisa kirdeyê hevokê jî ku cînavê serbixwe “Ew” e û ketîye dawîya hevokê. Wate rêzkirina pêkhênên hevoka (229)ê bi vî awayî ne “lêker + bireserê neyekser + kirde”. Ev çende jî berevajî yasayên rêzimanî ne û bûye sedemê hindê hevoka (229)ê bi hevokeke nerêzimanî bête hejmartin ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve. Belê ji alîyê sîmayan rêzimanî ve ji ber ku lêkerê hevokê ji borîyê negerguhêze. Wate rêkeftinê dê di navbera kirdeyî û lêkerî de be. Lê ji ber ku kirdeyê hevokê kesê sêyemîn yekjimar e. Wate nîşana rêkeftinê li dawîya lêkerî dernakeve anko (Ø)e. Bi vê çendê hevoka (234)ê bi hevokeke nerêzimanî tê danîn.

Her wisa ji alîyê wateyê ve jî hevoka (229)ê bi hevokeke guncayî tê danîn, ji ber ku rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de heye mîna rêkeftina di navbera kirde û lêkerê hevokê ku kirdeyê hevokê cînavê serbixwe “Ew” e û sîmayên wî digel sîmayên lêkerê hevokê diguncin ku ji sîmayên kirdeyê hevokê ew e “+ mirov”. Wate şîyanên lêkerê “çûn” hene. Lewre axafvanên resen yên dema hevokeke bi vî awayî dibîzin her yekser di wateya axafvanî digihên. Her çende dizane ku rêzkirina pêkhênên hevokê ne li gor yasayên rêzimana zimanî ne. Anko pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derketîne û guncandin di navbera wan de nîne. Lewre hevoka (229)ê ji alîyê rêzimanî ve bi hevokeke nerêzimanî tê danîn. Lê belê ji alîyê wateyî ve guncayî ye. Wate hevoka (229)ê bi hevokeke nerêzimanî û guncayî tê hejmartin.

230- Dê hêt ew zêlam.*⁴⁴

Hevoka (230)ê ji alîyê rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî ve hevokeke nerêzimanî ye. Anko pêkhênên hevokê li cihên xwe yên nerastnehatine bikaranîn. Anko rêzkirina wan ne li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî ne. Ji ber ku rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî, eger lêkerê hevokê negerguhêz be, dê bi vî awayî be “kirde + lêker”. Belê hevoka (230)ê ne li gor vê rêzkirinê hatîye avakirin. Lewre

⁴⁴ Barzan Ehmed, 23 Salî, Xwendekar, Devera Zaxo.

kirdeyê hevokê ku cînavê serbixwe “Ew” ye û ketîye pişt lêkerê hevokê “dê hêt” e ku lêkerê negerguhêz ye neji borî ye. Kirdeyê hevokê jî kesê sêyemîn yekjimar e û cînavê pêveyî ji bo kesê sêyemîn yekjimar “t” werdigire ji ber ku dawîya koka lêkerê hatin pîta “ê” ye. Anko dengdêre ji ber vê çendê pîta “t” ketîye dawîya lêkerî. Wate ti rêkeftinên rêzimanî di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Lewre ev çendê jî berevajî yasayên rêzimana zimanê Kurdî ne. Wate hevoka (230)ê bi hevokeke nerêzimanî tê hejmartin.

Ji alîyê wateyê ve hevokeke (230)ê bi hevokeke guncayî tê danîn. Lewre sîmayên pêkhênên hevokê digel hev tî guncandin mîna sîmayên kirdeyê hevokê ku peyva “Zelam” e ew e “+ pêgehiştî”. Wate şîyanên lêkerê “hatin” ên heyin. Lewre rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de ya heyî. Wate sîmayên wateyî yê pêkhênên hevokê digel hev diguncin. Ji ber vê çendê jî li cem axaftvanên resen yê zimanê Kurdî bi hevokeke guncayî tê danîn. Belê dema guh li hevokeke bi vî awayî dibe yekser di mebesta axaftvanî digeher çende dizane ku rêzkirina pêkhênên wê ne li gor yasayên rêzimanî zimanî nesererast e. Wate hevoka (230)ê ji alîyê rêzimanî ve nesererast. Lê belê ji alîyê wateyî ve sererast e. Anko hevoka (230)ê bi hevokeke nerêzimanî û guncayî tê hejmartin.

231- Ez digirim li nav bazarî.*⁴⁵

Hevoka (231)ê ji alîyê rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî ve ne ya rêzimanî ye. Anko guhartin di pêkhênên hevokê de hatine kirin û rêzkirina wê ne li gor yasayên rêzimanî yê zimanê Kurdî ne, ji ber ku rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî eger lêkerê hevokê negerguhêz be wê bi vî awayî be “kirde + lêker”. Lêbelê pêkhênên hevoka (231)ê bi vî awayî hatine rêzkin “kirde + lêker + bireserê neyekser”. Wate hevoka (231)ê ne li gor vê rêzkinê hatîye avakirin. Kirdeyê hevokê cînavê serbixwe “Ez” e û ketîye destpêka hevokê lêkerê hevokê jî peyva “digirim” ku lêkerê nederbaskirîyê ne ji borîye û girêya navî “li nav bazarî” bi erkê bireserê neyekser ye hevokê rabûye. Wate rêkeftineka rêzimanî ji alîyê rêzkinê ve di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Her wisa ji alîyê sîmayên rêzimanî ve ji ber ku lêkerê hevokê ji borîyê negerguhêz e. Wate rêkeftinê de di navbera kirde û lêkerê hevokê de be. Lê ji ber ku kirdeyê hevokê cînavê serbixwe ye, ji bo kesê yekemîn

⁴⁵ Karwan Samî, 25 Salî, Kirêkar, Devera Akrê.

yekjimar e. Wate nîşana rêkeftinê dê bikeve dawîya lêkerî ku cînavê pêveyê “m”e û vedigerê ji bo kirdeyê hevokê. Lewreli gor vê çende hevoka (231)ê bi hevokeke nerêzimanî tê hejmartin.

Ji alîyê wateyê ve hevoka (231)ê bi hevokeke guncayî tê danan, ji ber ku rêkeftinên wateyî di navbera pêkhênên hevokê de hene. Mîna rêkeftina di navbera kirde û lêkerê hevokê de ku kirdeyê hevokê cînavê serbixwe “Ez” e û ji sîmayên wî ew e “+ pêgehiştî”. Wate şîyanên geryanê hene. Lewre li cem axaftvanên resen yê zimanê Kurdî bi hevokeke guncayî tê danîn. Her çende dizane ku rêzkirina pêkhênên wê ne li gor yasayên rêzimanî zimanî neserast e. Wate hevoka (231)ê ji alîyê rêzimanî ve neserast e. Lê belê ji alîyê wateyî ve sererast e. Anko hevoka (231)ê bi hevokeke nerêzimanî û guncayî tê hejmartin.

232 - Nehatibûm Ez.*⁴⁶

Hevoka (232)ê ji alîyê rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî ve ne ya rêzimanî ye. Anko pêkhênên hevokê li cihên xwe yê resen nehatine. Anko rêzkirina wê ne li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî ye ji ber ku rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî eger lêkerê hevokê gerguhêz be dê bi vî awayî be “kirde + lêker”. Lêbelê hevoka (232)ê ne li gor vê rêzkirinê hatîye avakirin. Lewre kirdeyê hevokê ku cînavê serbixwe ji bo kesê yekem yekjimar “Ez” e û ketîye dawîya hevoke û lêkerê hevokê jî girêya lêkerî “ne hatibûm”e û ketîyê destpêka hevokê. Ev çendê jî berovajî yasayên rêzimana zimanî ne. Wate hevoka (232)ê ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve neserast e. Lê belê ji alîyê sîmayên rêzimanî ve rast e. Lewre lêkerê hevokê ji borîyê negerguhêz e. Wate rêkeftinê dê digel kirdeyî be û kirdeyê hevokê jî cînavê serbixwe ye ji bo kesê yekem yekjimar e. Wate divê lêkerê hevokê nîşana rêkeftinê. Anko cînavê pêveyî ji bo kesê yekemîn yekjimar werbigire ku nîşana “m”e û ketîye dawîya lêkerî. Bi vê çendê hevoka (232)ê bi hevokeke nerêzimanî tê hejmartin.

Ji alîyê wateyê ve bi hevokeke guncayî tê danîn. Lewre sîmayên pêkhênên hevokê digel hev tî guncandin. Wate guncandin di navbera wan de a heyî mîna ku sîmayên kirdeyê hevokê ku cînavê serbixwe “Ez” e û jî sîmayên wî ew e “+ mirov”. Wate şîyanên lêkerê hevokê ku peyva “ne hatibûm”e ên heyin. Ji vê çendê

⁴⁶ Nîroj Hemîd, 20 Salî, Kirêkar, Devera Duhok.

rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de a heyî. Wate li cem axaftvanên resen yên zimanê Kurdî bi hevokeke guncayî tê danîn. Lê belê dema guh li hevokeke bi vî awayî dibe. Yekser di mebesta axaftvanî digihê vê çende, ku dizane rêzkirina pêkhênên wê ne li gor yasayên rêzimana sererast e. Wate hevoka (232)ê ji alîyê rêzimanî ve nesererast e. Lê belê ji alîyê wateyî ve sererast e. Anko hevoka (232)ê bihevokeke nerêzimanî û guncayî tê hejmartin.

233- Min nîvro xwar xwarin.*⁴⁷

Hevoka (233)ê bi hevokeke nerêzimanî tê hejmartin, ji ber ku pêkhênên hevokê ne li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî hatine rêzkirin. Anko pêkhênên hevokê ên serekî bi vî awayî hatine rêzkirin “kirde + lêker + bireser”. Wate ev cureyê rêzkirinê ne li gor yasayên rêzimana zimanî ne ji ber ku di rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî de divê lêker bikeve dawîya hevokê. Lê di hevoka (233)ê de lêkerê wê ku peyva “xwar”e ketîye naverasta hevokê. Wate ketîye pêşîya bireserê yekser û ev çende jî berevajî yasayên zimanî ne. Lewre nabe bi ti şêweyekê lêker bikeve berî bireserê yekser. Wate hevoka (233)ê bi hevokeke nerêzimanî tê danîn. Wate hevoka (233)ê ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve nesererast e. Lêbelê ji alîyê sîmayên rêzimanî ve sererast e. Lewre lêkera hevokê ji borîyê gerguhêz e. Wate rêkeftin dê digel bireserî be û kirdeyê hevokê jî cînavê serbixwe ye û ji bo kesê yekemîn yekjimar e. Wateya lêkerê hevokê nîşana rêkeftinê. Anko cînavê pêveyî ji bo kesê yekmîn yekjimar wernagire. Wate (Ø)e. Lewre hevoka (233)ê ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve bi hevokeke nerêzimanî tê danîn.

Ji alîyê wateyê ve hevoka (233)ê bi hevokeke guncayî tê hejmartin. Ji ber ku rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de heye û sîmayên wan digel hev tene guncandin. Wekî kirdeyê hevokê ku cînavê serbixwe “Min” e û ji sîmayên wî ew e “+ xwarin”. Wate şîyanên wî karî hene. Lewre rêkeftin di navbera “kirde û lêker”ê hevokê de heye. Ankohevoka (233)ê bi hevokeke guncayî tê danîn. Wate hevoka (233)ê ji alîyê zimanî ve bi hevokeke nerêzimanî tê hejmartin. Lê belê ji alîyê wateyê ve hevokeke guncayî ye.

⁴⁷ Rizgar Fetah, 24 Salî, Bêkar, Devera Zaxo.

234 - Dilşadî firot tirumbêla xwe.*⁴⁸

Hevoka (234)ê bi hevokeke nerêzimanî tê hejmartin, ji ber ku pêkhênên hevokê ne li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî hatine rêzkirin. Wate rêzkirina pêkhênên hevoka (234)ê bi vî awayî hatine rêzkirin “kirde + lêker + bireser”. Belê pêdivîye di rêzkirina pêkhênên hevoka zimanî de lêker bikeve dawîya hevokê. Lê di hevoka (234)ê de lêkerê wê ku peyva “firot”e ketîye naverasta hevokê. Wate ketîye pêşîya bireserê yekser û ev çende jî berevajî yasayên zimanî ne ku çî rêkeftinên rêzimanî ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Her wisa ji alîyê sîmayan rêzimanî ve ji ber ku lêkerê hevokê ji borîyê gerguhêz e. Wate rêkeftinê dê di navbera bireserî û lêkerî de be. Lê ji ber ku bireserê hevokê kesê sêyemîn yekjimar e. Wate nişana rêkeftinê li dawîya lêkerî dernakeve, anko (Ø). Bi vî çendê hevoka (234)ê bi hevokeke nerêzimanî tê danîn.

Ji alîyê wateyê ve hevoka (234)ê bi hevokeke guncayî tê hejmartin. Ji ber ku rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de heye û sîmayên wan digel hev têne guncandin. Mîna rêkeftina di navbera kirde û lêkerê hevokê ku kirdeyê hevokê peyva “Dilşad” e û ji sîmayên wî ew e “+ pêgehiştî” û lêkerê hevokê jî peyva “firot”e. Wate di şîyanên mirovî de heye karê firotinê bike. Lewre hevoka (234)ê bi hevokeke guncayî tê danîn. Wate hevoka (234)ê ji alîyê zimanî ve bi hevokeke nerêzimanî tê hejmartin. Lê belê ji alîyê wateyê ve hevokeke guncayî ye.

235- Dê nivim Ez.*⁴⁹

Hevoka (235)ê ji alîyê rêzimanê ve wate rêzkirina pêkhênan ve nesererast e, ji ber ku hevoka me ya xwerû ye. Lewre cihguhertina pêkhênên hevokê di hevoka xwerû ya nawik de nayê dîtin ji ber ku ev cure hevoke bi tenê ji du pêkhênên serekî pêk tê. Ew jî “kirde û lêker”in û rêzkirina bingeha wan jî bi vî awayîye “kirde + lêker”e. Anko kirde li destpêkê û lêker li dawîya hevokê ye û guhartina cihê yek ji van pêkhênan dibe sedemê sererastbûna hevokeke nerêzimanî û neguncayî (Segvan Miho, 2012: 61). Mîna hevoka li jêr:


236 - Ez dê nivim(kirde + lêker) ⁵⁰.

⁴⁸ Xelat Sebrî, 29 Salî, Ajokar, Devera Zaxo.

⁴⁹ Eyaz Kemal, 27 Salî, Mekanîsyen, Devera Amêdî.

237 - Dê nivim Ez .* (lêker + kirde)

Girêyên “navî yan lêkerî” di pêkhata hevoka xwerû de ku mîna pêkhênên serekî têne bikaranîn û bi erkên “kirde û lêker”î radibin. Her wisa dibine bendên sentaksî li hemberî cihguherîna pêkhênên hevokê û çî pêkhênekê serekî nikare yek ji van bendan derbas bike. Lewre dê bibe sedemê peydabûna hevokeke nerêzimanî mîna di vî nexşeyê li jor de hatîye dîyarkirin:



Wate hevoka (235)ê ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve nesererast e. Lê belê ji alîyê sîmayên rêzimanî ve sererast e. Lewre lêkerê hevokê ji borîyê negerguhêz e. Wate rêkeftinê dê digel kirdeyî be û kirdeyê hevokê jî cînavê serbixwe ye ji bo kesê yekemîn yekjimar e. Wate divê lêkerê hevokê nîşana rêkeftinê. Anko cînavê pêveyî ji bo kesê yekemîn yekjimar werbigire ku nîşana “m”e û ketîye dawîya lêkerî. Anko hevoka (235)ê bi hevokeke nerêzimanî tê danîn.

Her wisa hevoka (235)ê ji alîyê wateyê ve bi hevokeke guncayî tê hejmartin. Lewre rêkeftineke wateyî di navbera pêkhênên hevokê de heye. Ji ber ku pêkhênên hevokê sîmayên wan bihevra têne guncadin. Mîna sîmayên kirdeyê hevokê ku cînavê serbixwe “Ez” e û ji sîmayên wî ew e “+ mirov”. Wate şîyanên lêkerê “nivistin“ ên heyin. Lewre hevoka (235)ê bi hevokeke nerêzimanî. Lê belê ya guncayî tê hejmartin.

238- Min wergirtin parên xwe.*⁵¹

Hevoka (238)ê ji alîyê yasayên rêzimana zimanê Kurdî, wate rêzkirina pêkhênên hevoka zimanî ve sererast e. Anko pêkhênên hevokê ne li cihên xwe yên taybetin û rêzkirina wan ne li gor yasayên rêzimanî ne. Ji ber ku rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî bi vî awayî ye “kirde + bireser + lêker”. Ku kirdeyê hevokê cînavê serbixwe ye ku ji bo kesê yekemîn yekjimar “Min” e û girêya navî “parên xwe” bireserê yekserê hevokê ye. Lêkerê hevokê jî girêya lêkerî “wergirt”e ku

⁵⁰ Bêwar Îsa, 32 Salî, Fermanber, Devera Zaxo.


⁵¹ Dilşad Remezan, 37 Salî, Ajokar, Devera Duhok.

lêkerê ji borîyê gerguhêz e. Wate hevoka (238)ê ne li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî hatîye avakirin. Wate çî rêkeftinên rêzimanî ji alîyê rêzkirinê ve di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Ji alîyê sîmayên rêzimanî ve ji ber ku lêkerê hevokê ji borîyê gerguhêz e. Wate rêkeftin dê di navbera bireserî û lêkerî de be. Lewre bireserê hevokê kesê sêyemîn kome. Wate divê nîşana rêkeftinê bikeve dawîya lêkerî ku “n”cînavê pêveye ji bo kesê sêyemîn kom. Bi vê çendê hevoka (238)ê bi hevokeke nerêzimanî tê hejmartin.

Ji alîyê wateyê ve jî bi hevokeke guncayî tê danîn, ji ber ku sîmayên pêkhênên hevokê digel hev diguncin, mîna girêya navî cînavê “Min” ku di heman dem de kirdeyê hevokê ye sîmayên wî digel lêkerê hevokê ku girêya lêkerî “wergirt”e digel hev diguncin. Lewre kirdeyê hevokê şîyanên wergiritna tiştan ya heyî. Wate “+ mirov, + pêgehiştî”. Lewre rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de heye. Wate axaftvanê resen yê dema hevokeke bi vî awayî dibîze yekser di wateya hevokê digehe. Lê belê dizane ku rêzkirina pêkhênên wê ne ya di sererast. Anko hevoka (238)ê ji alîyê rêzimanî ve nesererast e. Lê belê ji alîyê wateyî ve ya sererast. Wate hevoka (238)ê bi hevokeke nerêzimanî û guncayî tê hejmartin.

Şirovekirina hevoka “Min wergiritin parên xwe” bi rêya nexşeyê derasa:

238 - Min wergiritin parên xo.*



239- Min axifit.*⁵²

Hevoka (239)ê li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî bi hevokeke nerêzimanî tê hejmartin. Her çende rêzkirina pêkhênên wê li gor yasayên rêzimana zimanî ne. Lêbelê lewre karê axaftvan karekê negerguhêz e. Lewre cînavê “Min”e wekî kirde digel bikarnayê. Belkî divê cînavê “Ez” li cihê “Min” hatiba bikaranîn. Her wisa digel karê ji borîyê negerguhêz de rêkeftin dike dawîya lêkerî. Lê belê di hevoka (239)ê de rêkeftin nîne. Anko serederîya lêkerê gerguhêz yedigel vî lêkerê negerguhêz de hatîye kirin. Rêkeftin derneketîye li cihê kirdeyî rasteqîne me kirdeyekê din anîye ew jî kirdeyê “komela min” e ji ber ku digel vê komelê cînavên rêkeftinê nînin. Bi ti awayekê ji bo hemû kesên wê nîşane (Ø)e. Bi vê çendê hevoka (239)ê ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve ti rêkeftin di navbera pêkhênên wê de nîn e nesererast e. Her wisa ji alîyê sîmayên rêzimanî ve jî rêkeftin di navbera kirde û lêkerî de nîne ji ber lêkerê hevokê ji borîyê gerguhêz e. Wate divê cînavê pêveyî ya komela yekem werbigire. Lê di hevoka (239)ê de cînavê pêveyî neketîye dawîya lêkerê hevokê. Wate ji alîyên sîmayên rêzimanî ve pêkhênên hevokê guncandin di navbera wan de nîne. Lewre hevoka (239)ê bi hevokeke nerêzimanî tê hejmartin.

Ji alîyê wateyê ve jî hevoka (239)ê bi hevokeke guncayî tê hejmartin, ji ber ku cînavê serbixwe “Min”e di heman dem de ku kirdeyê hevokê ye sîmayên wî digel lêkerê hevokê ku peyva “axift”e digunce. Ku ji sîmayên wî “+ axaftin”. Wate di şîyanên wî de heye baxive. Lewre rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de heye. Bi vê çendê hevoka (239)ê ji alîyê rêzimanî ve nesererast e. Lê belê ji alîyê wateyî ve sererast e.

3.5.4. Hevoka Nerêzimanî û Neguncayî

Wan hevokan bi xwe ve digire ku hem ji alîyê rêzimanê ve, wate rêzkirina pêkhênan û hem ji alîyê guncandinê ve ku sîmayên pêkhênan bi xwe ve digire nesererast e. Wate pêkhênên hevokê ne rêkeftineka rêzimanî û ne rêkeftineka wateyî di navbera wan de nîne. Ev cureyê hevokê di nava axaftvanên zimanê Kurdî de kême

⁵² Semyan Salih, 21 Salî, Devera Zaxo.

têne dîtin. Wate behra bêhtir a axaftvanên zimanê Kurdî vê cureyê hevokê bikaranînin. Lewre axaftvanên resen ên her zimanekê bi şêweyekê xwezayî yasayên zimanê wan di serê wan de hatine çespendin. Anko bê ku agahîyê li ser rêzimana zimanê xwe hebin dizanin kîjan hevok sererast e û kîjan hevok nesererast e. Em dê li jêr behsa hinek ji wan hevokan kin.

Mînak:

240- Şikest dilê wî.*⁵³


Di hevoka (240)ê de pêgêrî bi yasayên rêzimana zimanê Kurdî nehatîye kirin. Ji ber ku pêkhênên hevokê ne li gor yasayên rêzimanî hatine rêzkirin ku pêkhênên hevokê bi vî awayî hatine rêzkirin “lêker + kirde” ku kirdeyê hevokê girêya navî “dilê wî”ye û ketîye dawîya hevokê. Lêkerê hevokê jî girêya lêkerî “şikest” e ku lêkerê jî borîye negerguhêz e. Wate ev cureyê rêzkirinê li gor rêzkirina pêkhênên hevoka Kurdî nesererast e. Lewre di hevoka de ti dema lêkerê hevokê nakeve destpêka hevokê. Lewre çî rêkeftinên rêzimanî ji alîyê rêzkirinê ve di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Her wisa ji alîyê sîmayên rêzimanî ve ji ber ku lêkerê hevokê jî borîyê negerguhêz ye. Wate rêkeftin dê digel kirdeyî be. Lê ji ber ku kirdeyê hevokê kesê sêyemîn yekjimar e. Wate nîşana rêkeftinê li dawîya lêkerî dernakeve. Anko (Ø)e. Bi vê çendê hevoka (240)ê bi hevokeke nerêzimanî tê hejmartin.

Ji alîyê wateyê ve jî hevoka (240)ê bi hevokeke neguncayî tê hejmartin. Lewre sîmayên peyva “dil” digel lêkerê hevokê ku peyva “şikest”e naguncin. Ji ber ku ji sîmayên peyva “dil” ew e “- şikestin”. Lewre ti rêkeftineka wateyî di navbera kirdeyê hevokê û lêkerê hevokê de nîne. Wate pêkhênên hevokê jî tixûbê wateya xwe ya ferhengî derketîne û guncandin di navbera wan de nîne. Wate hevoka (240)ê bi hevokeke neguncayî tê hejmartin. Bi vê çendê hevoka (240)ê bi hevokeke nerêzimanî û neguncayî tê hejmartin.

Şirovekirina hevoka “Şikest dilê wî” bi rêya nexşeya derasa:

⁵³ Xewla Mecîd, 30 Salî, Fermanber, Devera Duhok.

240- Şikest dilê wî.*



241- Divîya, berdaba te ew kiçe.*⁵⁴

Hevoka (241)ê li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî nesererast e. Wate bi nerêzimanî tê hejmartin. Lewre ji aliyê rêzkirina pêkhênên zimanî ve pêgêrî bi yasayên rêzimanî yên zimanî nehatîye kirin, ji ber ku hevoka (241)ê hevokeke aloz e. Wate ji du hevoka pêk hatîye ku yek ji wan serbixweye û ya din bende girêya “divîya” hevoka bende û hevoka “berdaba te ew kiçe” hevoka serbixweye ku pêkhênên hevoka bend bi tenê ji formekê pêk tê ku peyva “divîya” ye û pêkhênên hevoka serbixwe bi vî awayî hatine rêzkirin “lêker + bireser + kirde”. Ev rêzkirine jî berevajî yasayên rêzimana zimanê Kurdî ne. Wate çî rêkeftinên rêzimanî ji aliyê rêzkirina pêkhênan ve di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Her wisa ji aliyê

⁵⁴ Rêber Ebdulkerîm, 40 Salî, Dukandar, Devera Amêdî.

sîmayan rêzimanî ve ji ber ku lêkerê hevokê ji borîyê gerguhêz e. Wate rêkeftinê dê di navbera bireserî û lêkerî de be. Lê ji ber ku bireserê hevokê kesê sêyemîn yekjimar e. Wate nîşana rêkeftinê li dawîya lêkerî dernakeve. Anko (Ø)e. Lewre hevoka (241)ê ji alîyê rêzimanî ve nesererast e.

Ji alîyê wateyê ve jî hevoka (241)ê çî guncandinek di navbera pêkhênên wê de nîne. Lewre sîmayên peyva “Kiç” digel lêkerê “berdan” nagunce, ji ber ku navê “Kiç” ji sîmayên wê “- şikirî”. Wate neşikirî û lêkerê “berdan” jî di nava axaftvanên resen yê de ji bo wan kesan tê gotin yê şî kirîn. Wate “+ şikirin”. Ankoli cem axaftvanên zimanê Kurdî ya guncayî nîne lêkerê “berdan” ji bo peyva “Kiç” bête bikaranîn. Watepêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derketîne û guncandin di navbera wan de nîne. Lewre bi vê çendê hevoka (241)ê ji alîyê wateyê ve neguncayîye. Lewre sîmayên wê bihevra nayên guncandin. Anko hevoka (241)ê ji alîyê rêzimanî û wateyê ve nesererast e û bi hevokeke nerêzimanî û neguncayî tê hejmartin.

242- Mirovekê nemir bû ew.*⁵⁵

Hevoka (242)ê ji alîyê rêzimanî ve wate rêzkirina pêkhênan ve nesererast e. Ji ber ku lêkerê hevokê ku peyva “bû” e ketîye naverasta hevokê. Wate keftîye di navbera kirde û lêkerî de. Anko rêzkirina pêkhênên serekî ên hevokê bi vî awayî lê hatîye tamamker “+ lêker + kirde”. Ev rêzkirine jî digel rêzkirina pêkhênên hevoka Kurdî de nagunce. Lewre sererastîya hevokê divîya bi vî awayî ba “Ew mirovekê nemir bû”. Wate çî rêkeftinên rêzimanî ji alîyê rêzkirinê ve di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Her wisa ji alîyê sîmayên rêzimanî ve ji ber ku lêkerê hevokê ji borîyê negerguhêz e. Wate rêkeftinê dê digel kirdeyî be. Lê ji ber ku kirdeyê hevokê ji bo kesê sêyemîn yekjimar cinavê serbixweye. Wate nîşana rêkeftinê nakeve dawîya lêkerî. Wate rêkeftinê ji alîyê sîmayên rêzimanî ve di navbera pêkhênên hevokê de ya heyî ji alîyê hejmar, kes û nifişî ve. Wate hevoka (242)ê ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve bi hevokeke nerêzimanî tê danîn.

Her wisa ji alîyê wateyê ve jî hevoka (242)ê bi hevokekenerêzimanî tê hejmartin. Lewre çî rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de nîne, ji ber ku

⁵⁵ Kerîm Cehfer, 61 Salî, Bêkar, Devera Sêmêl.

sîmayên pêkhênên hevokê digel hev naguncin. Wate kirdeyê hevokê ku cinavê serbixwe “Ew” e ji sîmayên wî “+ mirov”. Belê ji sîmayên temamkerê hevokê ku girêya navî “mirovekê nemir” e ji sîmayên wî ew e “- mirov”e. Lewre her tiştêkê bi gîyan be wê rojek bê nemîne. Watesîmayên kirdeyê hevokê ku cinavê serbixwe “Ew” digel sîmayên temamkerê hevokê ku girêya navî “mirovekê nemir” e nagunce. Anko pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derketîne û guncandin di navbera wan de nîne. Wate ev hevoke ji alîyê wateyê ve neserast e. Lewre hevoka (242)ê ji alîyê rêzimanî û wateyî ve bi hevokeke nesererast tê hejmartin.

243- Zêlam bû ew biçîk.*⁵⁶

Hevoka (243)ê ji alîyê rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî ve rêzimanî nîne, ji ber ku li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî nehatîye ava kirin. Wate şewazê rêzkirina pêkhênên hevokê nerêzimanî ye ku kirdeyê hevokê “Ew biçîk” ketîye piştî lêkerê hevokê “bû” ye ku lêkerêkê ji borîyê negerguhêz ye. Girêya navî “biçîk” jî erkê temamkerê lêkerê bêhêz wergirtîye. Ev çende jî berevajî rêzkirina pêkhênên hevoka lêkerê negerguhêz e ku di binyat de rêzkirina pêkhênên hevoka xwerû ya lêkerê wê negerguhêz be bi vî awayî ye “kirde + lêker”. Lêbelê hevoka (243)ê berevajî vê rêzkirinê ye ev çende jî bûye sedemê peydabûna hevokeke nerêzimanî. Lewre ti rêkeftinên rêzimanî ji alîyê rêzkirinê ve di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Her wisa ji alîyê sîmayên rêzimanî ve ji ber ku lêkerê hevokê ji borîyê negerguhêz e. Wate rêkeftinê dê digel kirdeyî be. Lê ji ber ku kirdeyê hevokê kesê sêyemîn yekjimar e. Wate nîşana rêkeftinê li dawîya lêkerî dernakeve. Anko (Ø)e. Wate hevoka (243)ê bi hevokeke nerêzimanî tê hejmartin.

Her wisa ji alîyê wateyê ve jî hevoka (243)ê bi hevokeke neguncayî tê danîn. Ji ber ku çî rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Wate sîmayên pêkhênên hevokê ligel hev naguncin. Mîna ji sîmayên peyva “Zêlam” ew e “+ pêgehiştî”. Belê ji sîmayên peyva “biçîk” ew e “- pêgehiştî”. Anko pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derketîne û guncandin di navbera wan de nîne. Lewre hevoka (243)ê ji alîyê sîmayên wateyê ve bi hevokeke neguncayî tê hejmartin. Bi vê çendê hevoka (243)ê hem ji alîyê rêzimanî û hem ji alîyê wateyî ve bi hevokeke nesererast tê dîtin.

⁵⁶ Yasîn Elî, 57 Salî, Dukandar, Devera Duhok.

244- Cehneme, hindî germe evro.*⁵⁷

Hevoka (244)ê ji alîyê rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî ve rêzimanî nîne. Çunkî li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî nehatîye ava kirin, ji ber ku bi çî rengê di hevoka de hevalkarê cihî nakeve berîya hevalkarê demî mîna di hevoka (244)ê de ku hevalkarê cihî “cehenem” ketîye berîya hevalkarê demî “evro”ji ber ku hevoka (244)ê hevokeke girêdayî ye. Wate du cureyên rêzkirina pêkhênên hevokê hene. Rêzkirina pêkhênên hevoka yekem bi vî awayî ne “kirde + tamamker + lêke”ku kirdeyê hevokê derneketîye. Wate (Ø)e. Dîsan lêkerê hevokê gireya lêkerî nîşana “e” ye û lêkerê negerguhêz e ku ketîye dawîya tamamkerê hevokê peyva “cehenem” ku di heman demê de hevalkarê cihî ye jî. Hevoka duyem jî rêzkirina pêkhênên wê bi vî awayî bûye “kirde + tamamker + lêker + hevalkarê demî” ku kirdeyê hevokê derneketîye. Wate (Ø)e û girya navî “hindî germe” erkê tamamkerê hevokê wergirtîye. Dîsan nîşana “e” ya ku ketîye dawîya peyva “germe” erkê lêkerê hevokê dibîne ku lêkerê negerguhêz e girêya navî “evro” jî erkê hevalkarê demî wergirtîye. Wate ev cureyê rêzkirina pêkhênên herdu hevoka bihevra bûye sedemê peydabûna hevokeke nerêzimanî. Her dîsan ji bilî ku pêkhênên hevokê ne li gor yasayên zimanî hatine rêzkirin. Wate rêkeftina rêzimanî jî di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Lewrehevoka (244)ê bi hevokeke nerêzimanî tê hejmartin.

Her wisa ji alîyê wateyê ve jî hevoka (244)ê bi hevokeke neguncayî tê danîn. Ji ber ku çî rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Wate sîmayên pêkhênên hevokê ligel hev naguncin mîna ji sîmayên peyva “Cehenem” ew e “+ agir”. Lê belê ji sîmayên peyva “evro” ewe “- agir”. Lewre hevoka (244)ê ji alîyê sîmayên wateyê ve bi hevokeke neguncayî tê hejmartin. Bi vî çendê hevoka (244)ê hem ji alîyê rêzimanî û hem ji alîyê wateyê ve bi hevokeke nesererast tê dîtîn.

245- Rewî wekî seyî ew mirove.*⁵⁸

Di hevoka (245)ê de pêkhênên wê pêgîrî bi yasayên rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî nehatîye kirin. Ji ber ku pêkhênên hevokê li cihên xwe ên rastnehatine danîn ku rêzkirina pêkhênên hevoka (245)ê bi vî awayî ye “lêker + hevalkarê çewayî + kirde”. Kirdeyê hevokê girêya navî “ew mirove” ye û ketîye

⁵⁷ Wan Qadir, 29 Salî, Parêzer, Devera Amêdî.

⁵⁸ Remezan Salih, 53 Salî, Bêkar, Devera Zaxo.

dawîya hevokê. Lêkerê hevokê jî girêya lêkerî peyva “rewî” ye û ketîye destpêka hevokê. Her wisa girêya navî “wekî seyî” ketîye di navbera herdu pêkhênên serekî de û erkê hevalkarê çewayî wergirtîye. Wate çî rêkeftineka rêzimanî ji alîyê rêzkirinê ve di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Lewre lêkerê hevokê ku peyva “rewî” ye li cihê xwe yê rast ku di hevoka de dikeve dawîya hevokê nehatîye danîn. Belkî ketîye destpêka hevokê û kirdeyê wê ketîye dawîya hevokê ku li cihê xwe yê sererast ku destpêka hevokê ye nehatîye bikaranîn. Lewre ti rêkeftinên rêzimanî ji alîyê rêzkirinê ve di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Her wisa ji alîyê sîmayên rêzimanî ve ji ber ku lêkerê hevokê ji borîyê negerguhêz ye. Wate rêkeftinê dê digel kirdeyî be. Lê ji ber ku kirdeyê hevokê kesê sêyemîn yekjimare. Wate nîşana rêkeftinê dernakeve anko (Ø)e. Lewre ji ber vê çendê hevoka (245)ê bi hevokeke nerêzimanî tê zanîn.

Her wisa ji alîyê wateyê ve jî hevoka (245)ê bi hevokeke neguncayî tê danîn. Ji ber ku peyvên hevokê ti rêkeftin di navbera wan de nîne. Lewre sîmayên wan digel hev naguncin ji ber ku ji sîmayên peyva mirov “- rewîn”. Belê ji sîmayên peyva se ew e “+ rewîn”. Wate guncandin nîne. Lewre “rewîn” ji sîmayên seyî ne û ji bo mirovan nayê gotin. Bi vê çendê hevoka (245)ê bi hevokeke neguncayî tê danîn. Wate hevoka (245)ê ji alîyê rêzimanî û wateyê ve neguncayîye.

246- Sûtînin hinavên min ji têna.*⁵⁹

Hevoka (246)ê ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve pêgîrî bi yasayên rêzkirina pêkhênên hevoka zimanê Kurdî nehatîye kirin. Ji ber ku pêkhênên hevokê li cihên xwe ên rastnehatine danan. Wate çî rêkeftineka rêzimanî di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Lewre lêkerê hevokê ku girêya lêkerî “sûtînin”e ku lêkerê hevokê ye û li cihê xwe yê rast ku dikeve dawîya hevokê de nehatîye danîn. Belkî ketîye destpêka hevokê û kirdeyê hevokê ku girêya navî “Hinavên Min e” ketîye naverasta hevokê. Wate cihê xwe yê rast ku destpêka hevokê ye ne bikaranîn. Anko di navbera lêkerî û biresere neyekser de hatîye. Dîsan girêya navî “ji têna” jî bireserê neyekser yê hevokê ye û ketîye dawîya hevokê. Wate pêkhênên hevokê bi vî awayî “lêker + kirde + bireserê neyekser” hatine rêzkirin. Her wisa ji alîyê sîmayên rêzimanî ve ji ber ku lêkerê hevokê ji borîyê negerguhêz e. Wate rêkeftinê dê digel kirdeyî be ji ber ku kirdeyê hevokê kesê sêyemîn pirjimar e. Wate divê lêker jî nîşana rêkeftinê a kesê

⁵⁹ Sîpan Îbrahîm, 19 Salî, Kirêkar, Devera Akrê.

sêyemîn kom werbigire ku nîşana “n”e û ketîye dawîya lêkerî. Lewre ti rêkeftinên rêzimanî ji alîyê rêzkirinê ve di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Bi vê çendê ji ber vê çendê hevoka (246)ê bi hevokeke nerêzimanî tê zanîn.

Her wisa ji alîyê wateyê ve jî hevoka (246)ê bi hevokeke neguncayî tê danîn ji ber ku peyvên hevokê çî rêkeftineka wateyî di navbera wan de nîne. Anko pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derneketîne û guncandin di navbera wan de heye. Lewre sîmayên wan digel hev naguncin, ji ber ku ji sîmayên peyva hinav “- sûtin”. Lê belê ji sîmayên peyva hinav “+ endamên lêş”î wate guncandin nîne. Bi vê çendê hevoka (246)ê bi hevokeke neguncayî tê danîn. Wate hevoka (246)ê ji alîyê rêzimanî û wateyî ve neguncayî ye.

248- Wekî robarî dihatin xwarê rondikên wî.*⁶⁰

Hevoka (248)ê ji alîyê rêzkirina pêkhênan ve bi hevokeke nerêzimanî tê danîn. Ji ber ku ne li gor yasayên rêzkirina hevoka zimanê Kurdî hatîye kirin. Wate pêkhênên serekî ên hevokê li cihên xwe ên sererastnehatine bikaranîn ku bi vî awayî hatine rêzkirin “hevalkarê çewayî + lêker + kirde + bireserê neyekser”. Wate kirdeyê hevokê ku girêya navî “Rondikên Wî” ketîye dawîya hevokê. Ev çende jî dijî yasayên rêzimana zimanê Kurdî ne ku divê kirde li destpêka hevokê bê. Herwisa lêkerê hevokê jî girêya lêkerî “dihatine”e ku lêkerekê negerguhêz ye û ketîye naverasta hevoke û peyva “xwarê” jî erkê bireserê neyekser wergirtîye. Dîsan girêya navî “wekî robarî” ku erkê hevkarê çewayîdi hevokê de wergirtîye û ketîye destpêka hevokê. Ev çende jî berevajî yasayên zimanî ne. Anko li gor rêzkirina li jor çî rêkeftineka rêzimanî ji alîyê rêzkirinê ve di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Lewre lêkerê hevokê li cihê xwe yê sererast ku dikeve dawîya hevokê nehatîye bikaranîn. Belkî ketîye berahîya kirdeyê hevokê û kirdeyê hevokê ketîye pişt lêkerî. Wate li cihê xwe yê sererast ku destpêka hevokê ye nehatîye bikaranîn. Her wisa ji alîyê sîmayên rêzimanî ve ji ber ku lêkerê hevokê negerguhêz e û kirde jî kesê sêyemîn pirjimar e. Wate nîşana rêkeftinê nîne. Lewre ji ber vê çendê hevoka (248)ê bi hevokeke nerêzimanî tê hejmartin.

⁶⁰Segvan Casim, 18 Salî, Xwendekar, Devera Amêdî.

Her wisa ji alîyê wateyê ve jî hevoka (248)ê bi hevokeke neguncayî tê hejmartin, ji ber ku peyvên hevokê çî rêkeftineke wateyî di navbera wan de nîne. Lewre sîmayên wan digel hev naguncin. Lewre ji sîmayên peyva “Rondik” ew e ku “+ çipkên avê” anko “- robar”. Wate pêkhênên hevokê ji tixûbê wateya xwe ya ferhengî derketîne û guncandin di navbera wan de nîne. Bi vê çendê hevoka (248)ê bi hevokeke neguncayî tê danîn. Wate hevoka (248)ê ji alîyê rêzimanî û wateyî ve neguncayî ye.

249 - Peqî zikê min ji birsa.*⁶¹

Hevoka (249)ê li gor yasayên rêzimana zimanê Kurdî nesererast e, wate bi nerêzimanî tê hejmartin. Lewre ji alîyê rêzkirina pêkhênên zimanî ve pêgêrî bi yasayên rêzimanî nehatîye kirin ku pêkhênên wê ên serekî bi vî awayî hatine rêzkirin “lêker + kirde + hevalkarê çewayî”. Ev rêzkirine jî berevajî yasayên rêzimana zimanê Kurdî ne ku kirdeyê hevokê girêya navî “Zikê Min e” û ketîye naverasta hevokê û lêkerê hevokê jî girêya lêkerî “peqî” ye û ketîye destpêka hevokê û girêya “ji birsa” ketîye dawîya hevokê û erkê bireserê neyekser wergirtîye. Wate çî rêkeftineka rêzimanî ji alîyê rêzkirinê ve di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Herwisa ji alîyê sîmayên rêzimanî ve rêkeftin di navbera kirde û lêkerî de ye ji ber ku kirde kesê sêyemîn yekjimar e û lêkerê hevokê jî ji borîyê negerguhêz e. Wate rêkeftin nîne anko lêkerî nîşana (Ø) e bi vê çendê hevoka (249)ê ji alîyê rêzimanî ve nesererast e.

Ji alîyê wateyê ve jî hevoka (249)ê çî guncandinek di navbera pêkhênên wê de nîne. Lewre sîmayên peyva “Zik” digel lêkerê “peqî” nagunce. Ji ber ku peyva “Zik” ji sîmayên wî “- peqîn” e. Wate na peqe lêkerê “peqî” jî di nava axaftvanên resen yên de ji bo wî tiştî tê gotin yên ku ji nav diçin. Anko tiştê bê gîyan be mîna “tankê neftê”. Lewre li cem axaftvanên zimanê Kurdî ya guncayî nîne. Lêkerê “peqî” ji bo peyva “Zik” bête bikaranîn. Lewre bi vê çendê hevoka me ji alîyê wateyê ve neguncayî ye. Watesîmayên wê bihevra nayên guncandin. Anko çî rêkeftineka wateyî di navbera pêkhênên hevokê de nîne. Bi vê çendê hevoka (249)ê ji alîyê

⁶¹ Kamîran Şakir, 20 Salî, Kirêkar, Devera Akrê.

“hevalkarê çewayî + lêker + kirde” ku lêkerê hevokê peyva “diçû” ye ku di heman dem de lêkerê negerguhêz ye û ketîye berî kirdeyê hevokê. Lewre ev rêzîkirin jî berevajî yasayên rêzimana zimanê Kurdî ne. Wate ti rêkeftineka rêzimanî ji aliyê rêzîkirinê ve di navbera pêkhênan de nîne. Her wisa ji aliyê sîmayên rêzimanî ve rêkeftin di navbera kirdeyî û lêkerî de ye, ji ber ku lêkerê hevokê negerguhêz ye û kirdeyê hevokê cinavê serbixwe ye ji bo kesê sêyemîn yekjimar e. Wate nîşana rêkeftinê li dawîya lêkerî derneketîye anko (Ø)e. Bi vê çendê hevoka (250)ê ji aliyê rêzîkirina pêkhênan ve bi hevokeke nerêzimanî tê hejmartin.

Her wisa hevoka (250)ê ji aliyê wateyê ve jî bi hevokeke neguncayî tê danîn, ji ber ku çî guncandinek di navbera pêkhênan wê de nîne. Lewre sîmayên peyva “birîsî” digel sîmayên peyva “hesip” nagunce ji ber ku navê “birîsî” ji sîmayên wî “- zîndî, - gîyanewer”. Belê ji sîmayên peyva “hesip” ew e “+ zîndî + gîyanewer”. Wate li cem axaftvanên zimanê Kurdîya guncayî nîne lêkerê “diçû” ji bo peyva “birîsî” bête bikaranîn. Lewre bi vê çendê hevoka me ji aliyê wateyê ve neguncayî ye. Anko sîmayên pêkhênan wê bihevra nayên guncandin. Wate hevoka (250)ê ji aliyê rêziman û wateyê ve nesererast e û bi hevokeke nerêzimanî û neguncayî tê hejmartin.

ENCAM

Di dawîyavêlêkolînê de emgihîştine van xalan:

- Pêkhênên serekî yên hevoka rêzimanî wek kirde, biresera yekser, tamamker û lêker e. Rêzkirina wan di hevokê de payîdarin û nikarin cihên xwe biguherînin ji ber ku her cihguherînekê wana di hevokê de dibe sedemê peydabûna hevokeke nû ya nerêzimanî. Pêkhênên neserekî yên hevokê dikarin di hevokê de cihên xwe biguherînin. Anko di nava hevokê de dibe pêngavekê pêş yan paş ve di ser pêkhênên serekî de derbas bibin.
- Di rêzimana Kurdî de şeş cureyên rêzikirina pêkhênan hene. Ji bilî van şeş cureyan rêzikirineka din wê bibe sedemê peydabûna hevokên nerêzimanî.
- Di hevokê de pêdivîyê pêkhênên wê rêkeftineka rêzimanî di navbera wan de hebe, lewre nebûna wê rêkeftinê dê bibe sedemê nerêzmanîbûna hevokê.
- Guncandina hevokê girêdayî çalakîyê ye ji ber ku hinek sedem di vê astê de bandorê li guncandinê dikin. Ew jî sedemên zimanî, civakî, rewşenbîrî û derûnî ne. Ev jî wê çendê digehînin guncandina hevokan, girêdayî rewşenbîrîya axaftvana û amadebûna derûnî û astê wî/wê yê zimanî û rewşa gîhandinê.
- Her hevokeke asayî ya zimanî divê du alî beşdarîyê di nava wê de bikin. Ew jî guncandina rêzimanî û wateyî ye.

- Gelek caran hevok ji alîyê yasayên rêzimanî ve hevok nerêzimanî ye. Her wisa ji alîyê zimanî û civakî ve guncayî (wate) û neguncayî ye. Lê belê ev hevokan di civaka Kurdan de têne gotin. Anko ji alîyê civakî ve guncayî ne.
- Hinek caran hevok ji alîyê rêziman ve sererast in. Lê belê ji alîyê wateyê ve neguncayî ne. Digel vê neguncandina wateyî jî, ev hevok ji alîyê axaftvanên devokê ve têne gotin bi şêweyekê berbilav.
- Cureyêkê din yê hevokan ew e nerêzimanî ne. Lê belê ji alîyê wateyê (semantîk) ve guncayî ne. Dêmek bi gotineka din li cem axaftvanên devokê bi hevokên guncayî têne dîtin.
- Merc nîne ji alîyê wateyê ve hemû hevokên me rêzimanî yan guncayî bin. Wate para zêde ya wan hevokên em dibêjin. Lê belê ji ber ku ji alîyê civakî ve guncayî ne, ji ber hinde jî bi şêweyekî berfireh tê gotin û bikaranîn. Anko guncan û neguncan di vê devokê de girêdayî civakî ye, bêhtir ji alîyê wateyê ve anko alîyê pragmatîkê ve tê wergirtin.
- Sererastîya wateyî ya hevokê girêdayî peyrewkirina wan kotên wateyî ne, ku pêkhênêkê hevokê bi ser pêkhênêkê din yê hevokê ve pêve dike.
- Her teorîyêke zimannasî bi şêweyekê hevok pênase kirîye. Li gor teorîya “BV” ê hevok mezintirîn parçeya sentaksîye û ji du girêyan pêk tê. Girêya navî û girêya lekerî. Ku ev herdu girêye bi rêya yasayên sentaksî bihevra têne girêdan, ji bo sererastkirina hevokeke rêzimanî.
- Di devoka de vera Behdînan de gelek caran axaftvanên resen yê devokê di axaftinên xwe yê rojane de hevokên nerêzimanî bikartînin. Lê ev çende bi rêjeka kêmtê dîtin, ji ber ku piranîya axaftvanên zimanî li ser yasayên rêzimana zimanî agahî hene.
- Bi şêweyekê giştî, em nikarin bêjin, bi yek carî derbirîne ji hevokên nerêzimanî û neguncayî di zimanî de nînin. Lê belê, hinek sedem hene heta radeyekî kêmtê di hinek doxên (stîlên). dubarekirîne de dîyar dibin.
- Çi teorîyeka zimanî tunye ku hinek binemayên ziman bînpê neke takî bikare hemû xuyanekên zimannasî yê wî zimanî binirxîne yan ji şirove bike.

Piştî honandina wan xalan mirov dikare bi dil rihetî bibêje; di vê xebata dûvedirêj de em hatin vê encamê ku xebata me ji bo pêşeroja rêzimana zimanêKurdî, pirtûkxana akademîk a Kurdî û xwendekaran û lêkolînerên çalاک zêdetir pêwiste. Ji bo sûd wergirtinê û digel dewlemendîya xebatên zimanê Kurdî. Lê mixabin wek pêşta jî hatibû amajekirin me xwe jî dit ku di vî warî de xebateka rêkûpêk tune. Lêbelê sedemên vê amajê kirina me diyarin ku zimanê Kurdî di berêda, gelên Kurd di dîrokê de gelek elfaba û pît bikaranînê digel vê astengîyê di sedsala nûjen de jî kemasîya sazîyên bi pergal û pare nekirina zimanê Kurdî jiber wan heqîqetan qels ma yê. Me jî hewl da ku bi hevkarîya mamostêyen xwedî rêz û rûmet vê mijara “Hevoka rêzimanî û nerêzimanî” bixebitin. Lêbelê ev babet gelekî berfireh bu, ji ber vê qase me mijara xwe kurt kir. Bes li ser devoka herêma Behdînan û bi taybetdevokaduhokêqedand. Her wisa di dawîyê de em gehîştin van encaman ku heya niha zimannas ne karîne pênaseyeka guncayî ji bo hevokê xweya bikin. Derbareyî teorîyên rêzimanê jî xweyaye ku her teorîyekê li gor hinek yasayên taybet behsa hevoka rêzimanî ûnerêzimanî kirîye. Her yek ji wan jî kêmasîyên xwe di derbarê şirovekirina hevoka rêzimanî û nerêzimanî de hene. Ku ew kêmasî jî di nava tezê de bi dirêjî hatine behsikirin.

ÇAVKANÎ

- Amêdî, Sadiq Behaedîn** (1987), *Rêzimana Kurdî Kirmancîya Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Bexdad.
- Amir Bin Şetoh** (2014), *Cihod el-Lîsanîye ÎndeMazin El-We'ir*, Zanîngeha Qasidî Mirbah û Riqle: Kolîja Adab, Têza Diktora, Cezayîr.
- Archibald, Hill** (1961), Grammaticality, *Word*, hej: 17, r. 1-10.
- Aronoff, Mark & Riss, Janie** (2003), *The Handbook Of Linguistics*, Usa: Blackwell Publisher.
- Aso Ebdulrehman Kerîm**(2014), *Rûnanî Riste Le Şêwezari Feyilî Da*, Hewlêr: Weşanxaneya Mukrîyan.
- Atif Fezil Mihemmed** (2005), *Muqedîme Fî el-Lîsanîyat*, Urdin: Weşanxaneya Dezgehê Elrazî.
- Awaz Heme Sedîq** (1996), *Rêzbûnî Kereste Le Zimanî Kurdî Da*, Zanîngeha Selahedîn: Kolîja Adab, Têza Lîsansa Bilind Hewlêr.
- Awerhmanî Hacî Marif** (2000), *Rêzimanî Kurdî*, Suleymanî: Dezgehê Serdem.
- Awerhmanî Hacî Marif** (2004), *Ferhengî Zarawayî Zimannasî (Kurdî- Erebî - Îngilîzî)*, Suleymanî: Weşanxaneya Suleymanî.
- Azad Ehmed Hisên** (2001), *Erkê Edfêrbil Le Firawankirdinî Firêzî Karî Da*, Zanîngeha Suleymanî: Kolîja Adab, Têza Lîsansa Bilind, Suleymanî.
- Baqirî, Mehrî** (2005), *Muqedîmat Ziban Şinasî*, Tehran: Weşanxan Qitre.
- Batînî, Mihemmed Reza** (1993), *Awrêkê Taze Bo Ser Rêziman*, (Wergêr: Hesên Qazî), Sweden.
- Bayiz Omer Ehmed** (2002), *Têns Le Dîyalêktî Joroyî Zimanî Kurdî Da*, Duhok: Weşanxaneya Xebat.

- Bayiz Omer Ehmed** (2008), *Girê Di Dîyalêkta Serî Ya Zimanê Kurdî de* (Govara Behdîni), *Kovara Zanîngeha Duhok*, hej: 1, r. 77-92.
- Bayiz Omer Ehmed** (2012), *Riste Ji Layê Pêkhatinê ve Di Dîyalêkta Serî Ya Zimanê Kurdî de* (Govara Behdîni), *Kovara Zanîngeha Duhok*, hej:1, r. 40-52.
- Bekir Umer Elî** (2014), *Çend Layenêkî Zimanewanî*, Hewlêr: Weşanxana Hêvî.
- Bloomfield, Leonardo** (1976), *Language*, Great Britain: London Publisher.
- Boqire, Ne'man** (2016), *Arastekanî Zimanewanî Le Sosêrewê Ta Chomsky*, (Wergêr: Nerîman Ebdullah Xoşnaw), Hewlêr: Weşanxaneya Rojhelat.
- Chomsky, Noam&Morris, Halle** (1968), *The Sound Pattern Of English*, New York: Harper Publisher.
- Chomsky, Noam** (1985), *Cewanib Min el-nezerîye Elnêhu*, (Wergêr: Mirteza Cewad Baqî), Mûsil: Weşanxaneya Zanîngeha Mûsil.
- Chomsky, Noam** (1957), *Syntactic Structures*, Berlin: Mouton De Gruyter Publisher.
- Chomsky, Noam** (1965), *Aspecets Of The Theory Of Syntax*, London: Cambridge Mass MITTPress.
- Chomsky, Noam** (1976), *Reflection On Language*, London: Temple Smith Publisher.
- Chomsky, Noam** (1982), *Lectures On Government And Binding*, Usa: Mitt press.
- Chomsky, Noam** (1987), *Syntactic Structures (Elbonya Elnêhwîye)*, (Wergêr: Yûiêl Yosif Ezîz), Bexdad: Dezgehê Karûbarên Rewşenbîrî.
- Cigerxwîn** (1961), *Awa û Destûra Zimanê Kurdî*, Bexdad: Zanîngeha Bexdad.
- Cîhan Xeyas Mihê** (2016), *Rehendê Piragmatîkîyê Pirsyarê Di Axiftina Xelkê Govara Behdîni Da*, Zanîngeha Duhok: Kolîja Perwerda Binyat, Têza Lîsansa Bilind, Duhok.
- Crystal, Daved** (2008), *A Dictionary Of Linguistics And Phonetics*, Usa: Blackwell Publisher.
- Dara Hemîd Mihemmed** (2012), *Şîkarî Risteyî Aloz Le Riwangeyî Piragmatîkewe*, Zanîngeha Suleymanî: Kolîja Perwerde, Têza Dektora, Suleymanî.
- Deham Ebdulfetah** (2006), *Nav Di Zimanê Kurdî De (Kurmançîya Jorîn)*, Hewlêr: Weşanxaneya Wezaretê Perwerdê.
- Deham Ebdulfetah** (2012), *Kar Di Zimanê Kurdîde (Kurmançîya Jorîn)*, Hewlêr: Weşanxaneya Hecî Haşim.

- Derac, Ehmed** (2009), *el-Îtîcahat Elmi'asere Fî Dîrasat el-lîsanîye*, Qahîre: MektebetAdab.
- Derûn Ebdurehman Salih** (2012), *Îkonomî Le Astekanî Ziman Da*, Hewlêr: Weşanxaneyaya Hecî Haşim.
- Dilbirîn Ebdullah Elî** (2012), *Cudakirina Karê Lêkdayî Ji Karê Xûdan Tewawker û Berkar*, Duhok: Weşanxaneyaya Hewar.
- Dilvîn Se'îd Salih** (2016), *Ladan Di Rista Nesade Da (Govara Behdînî)* Zanîngeha Duhok: Kolîja Zanistên Mirovayetî, Têza Lîsansa Bilind, Duhok.
- Dîyar Elî Kemal** (2002), *Rêzimanî Kurdî Riwaneyekî Berhemhênan û Guwêzanewe*, Zanîngeha Selahedîn: Kolîja Adab, Têza Lîsansa Bilind, Hewlêr.
- Dizeyî, Ebdulwahid Mûşîr** (2011), *Watesazî Wûşe û Riste*, Hewlêr: Weşanxaneyaya Mardîn.
- Dizeyî, Ebdulwahid Mûşîr** (2013), *Ristesazî Rûnankarî û Gûwêzanewe*, Hewlêr: Rêveberîya Giştî Ya Pirtûkxaneyên Giştî.
- Dizeyî, Ebdulwahid Mûşîr** (2014^a), *Rêzimanî Kurdî*, Hewlêr: Rêveberîya Giştî Ya Pirtûkxaneyên Giştî.
- Dizeyî, Ebdulwahid Mûşîr** (2014^b), *Rêziman û Wata*, Hewlêr: Weşanxaneyaya Hecî Haşim.
- Ebdulbaqî Îkram Ehmed** (2012), *Wata û Mebest Le Pendî Pêşînanî Kurdî Da*, Zanîngeha Selahedîn: Kolîja Perwerde, Têza Lîsansa Bilind, Hewlêr.
- Ebdullah Hisên Resûl** (2014), *Nakirdin Le Kurdî Da*, Hewlêr: Weşanxaneyaya Hîvî.
- Ebdullah Hisên Resûl** (2014), *Pûxteyekî Wirdî Ristesazî Kurdî*, Hewlêr: Weşanxaneyaya Hîvî.
- Ebdullah Hisên Resûl** (2015), *Çend Basêkî Wirdî Zimanewanî-Kurdî*, Hewlêr: Weşanxaneyaya Hîvî.
- Ebdulselam Necmedîn Ebdullah & Şêzad Sebrî Elî** (2011), *Zimannasîya Tîyorî*, Hewlêr: Weşanxaneyaya Hecî Haşim.
- Ebdulsitar Fetah Hesên** (1996), *Rêzimanî Kurdî*, Duhok: Weşanxaneyaya Xebat.
- Ecîb Ebdullah** (1998), "Karê Bêhêz Di Zimanê Kurdî de Dîvçûn û Dîyarkirin Di Kirmancîya Serî Da", *Kovara Metîn*, hej: 79, r. 41-57.
- Ehmed Hesên Fethullah** 1990, *Kirde Wek Beşêkî Serekî Riste Le Zimanî Kurdî Da*, Zanîngeha Selahedîn: Kolîja Adab, Têza Lîsansa Bilind, Hewlêr.

- Ehmed Mûxtar Umer** (1998) *’ilim el-Delale*, Qahîre: Ji Weşanên Dezgehê Cîhana Pirtûkan.
- Elwe’ir, Mazin** (1988), *Qezaya Esasîye Fî Îlim el-Lîsanîyat el-Hedî*, Dîmeşq: Dezgehê Tillas Yê Lêkolîn û Belavkirinê.
- Elwe’ir, Mazin** (1992), *Nehwe Nezerîye Lîsanîye Erebiye Hedîse Lîtehlîl Terakîb el-Esasîye Fî el-Luxe el-Erebiye*, Dîmeşq: Dezgehê Telas Yê Weşan û Belavkirinê.
- Emayre, Xefîl Ehmed** (1984), *Fî Nehwe Ellûxe We Terakîbeha*, Erebestana Siûdî: Dezgehê Alem Elme’rîfe Yê Weşan û Belavkirinê
- Emayre, Xefîl Ehmed** (2004), *el-Mesafe Beyne Eltenzîr Elnehwî We Eltedbîq el-lûxewî*, Erebestana Siûdî: Dezgehê Waîl Yê Weşan û Belavkirinê.
- Fari’, Şûhde, Hemdan, Cîhad, Emayire, Mûsa&El’enanî, Mihemmed** (2006) , *Mûqedîme Fîel-Lûxewîyat el-Mû’asere*, Urdin:Dezgehê Elwaîl Ye Weşan û Belavkirinê.
- Fayiz Sobhî Ebduselam** (2010), *Mûstewîyat Etehlîl el-Lûxewî*, Lubnan: Dezgehê Pirtûkên Zanistî.
- Ferhadî, Sacîde Ebdullah**(2008), *Riste û Paş Riste*, Hewlêr:Weşanxaneyê Aras.
- Ferhadî, Sacîde Ebdullah** (2013), *Hendê Layenî Ristesazî Zimanî Kurdî*, Hewlêr:Weşanxaneyê Hecî Haşim.
- Finch, Geoffrey** (2003), *How To Study Linguistics*, NewYork: Published By Palgrave Macmillan.
- Fraassen, Van** (1971),*Formal Semantics Ans Logic*, New York: Originally Publisher
- Fromkin, Victoria, Rodman, Robert&Hayms,Nina**(2011),*An Introduction To Language*, Canada: WadsworthPublisher.
- German,Claude&Leblanc,Raymond**,(2006), *Watasazî*, (Wergêr: Yusif Şerîf Seîd) , Hewlêr: Weşanxaneyê Wezaretê Perwerdê.
- Gordon,Jarvie**(2007), *Grammar Guide*, London:A&C Black Publisher.
- Guherzî, Mihemmed Emîn** (1999),*Rêzimana Kurdî (Zarê Kirmancî)*, Duhok:Weşanxaneyê Xebat.
- Haegeman,Liliane** (1998), *Introduction To Government And Binding Theory*,Usa: Blackwell Publishers.
- Hashemi,Homa Bradaran** (2017),*Robust Parsing For Ungrammatical Sentences* ,University Of Pittsburg:Doctora Ldissertation,Russia.

- Hatim Wilya Mihemmed** (2006), *Peywendîye Rûnanîyekanî Niwandine Sentaksîyekan*, Zanîngeha Selahedîn: Kolîja Ziman, Têza Diktora, Hewlêr.
- Hawkins, John** (1978), *Definiteness And Indefiniteness*, London: Humanities Press Atlantic Highlands.
- Hawser Newzad Feqî Îbrahîm** (2014), *Morf û Piragmatîk Di Zimanê Kurdî de*, Zanîngeha Suleymanî: Kolîja Ziman, Têza Lîsansa Bilind, Suleymanî.
- Hemase, Mihemmed Ebdulletîf** (1990), *Min Enmat Etehwîlîye Fî Enehu el-Erebî*, Qahîre: Dezgehê Elnecaticî Yê Weşan û Bilevkirinê.
- Hemase, Mihemmed Ebdulletîf** (2000), *el-Nehû Weldelale*, Qahîre: Dezgehê Şiroq Yê Weşan û Belavkirinê.
- Hêro Ehmed Heme Xerîb** (2008), *Şêwekanî Gêranewe Le Risteyî Kurdî Da*, Zanîngeha Suleymanî: Kolîja Adab, Têza Lîsansa Bilind, Suleymanî.
- Heval Selîm Teyîb** (2006), *Binyatgerî Di Nav Rexna Kurdî Da*, Hewlêr: Weşanxaneya Hecî Haşim.
- Hewramî, Mihemmed Emîn** (1981), *"Zarî Zimanî Kurdî Le Terazûyî Berawirdî Da"*, Bexdad: Dezgehê Rewşenbîrî û Belvkirinê Yê Kurdî.
- Hîcazî, Mehmûd** (1998), *Medxel Îla 'Ilim el-Lûxe*, Qahîre: Dezgehê Qeba Yê Weşan û Belavkirinê.
- Îbrahîm Xefîl** (2016), *Tîyor û Rêbazekanî Ziman*, (Wergêr: Nerîman Ebdullah Xoşnaw), Hewlêr: Weşanxaneya Rojhelat.
- Îvic, Milka** (2000), *Îtîcahat el-Behis el-Lîsanî*, (Wergêr: Se'ed Ebdulezîz û Wefa Kamil), Mîsr: Encûmenê Bilind Yê Rewşenbîrî.
- Kanebî, Dilêr Sadiq** (2015), *Tîyorî Bargexistin û Rûnanî Riste*, Hewlêr: Weşanxaneya Mukrîyan.
- Karwan Omer Qadir** (2008), *Risteyî Basmend*, Suleymanî: Weşanxaneya Tîşk.
- Kawan Îsmayîl Xefîl** (2013), *Sîntaksî Karî Bineret Le Nêwan Dîyalêktî Serû û Lorîyê Zimanê Kurdî De*, Zanîngeha Zaxo: Kolîja Adab, Têza Lîsansa Bilind, Zaxo.
- Kemal Mîraw Zade** (2007), *Ferhengî Rêzimanî Kurdî*, Melbendê Kurdolojî, Suleymanî.
- Koremarkî, Ara Elî** (2008), *Kotên Wateya Şêwazî Bo Hevwataya Tewaw (Govara Behdînî)*, Duhok: Weşanxaneya Xanî.
- Lee Brandon & Kelly Brandon** (2011), *Sentences, Paragraphs*, Usa: Wadsworth Publisher.

- Lynn, Berk** (1999), *English Syntax*, New York:Oxford University Press.
- Lyons, John** (1977), *Semantics*, London:Cambridge University Press.
- Lyons, John** (1981), *Introduction To Theoretical Linguistics*, London: Cambridge University Press.
- Mehwî, Mihemmed**(2011), *Binemakanî Sentaksî Kurdî*Suleymanî, Zanîngeha Suleymanî.
- Merîc Nesîm&Mekdud Ferîd** (2017), *Hewle Lîsanîyat ecumle*, Zanîngeha Ebdulrehman Mîre:Kolîja Adab û Zimana, Têza Lîsansa Bilind,Urdin.
- Mihabad Kamil Ebdullah** (2010), *Çend Kirdeyekî Sentaksî Le Şêwezarî Hewramî Da*, Zanîngeha Suleymanî: Têza Lîsansa Bilind, Kolîja Ziman, Suleymanî.
- Mihemmed Me'rûf Fetah**(2010), *Lêkolînewe Zimanewanîyekan*, (komkirin û amadekirin: Şêrwan Hisên Xoşnaw û Şêrwan Mîrza Qadir), Hewlêr: Weşanxaneya Rojhelat.
- Mihemmed Mihemmed Yonis Elî** (2010), *Seretayek Bo Zanistekanî Watesazî û Piragmatîk*, (Wergêr: Nerîman Ebdullah Xoşnaw), Hewlêr: Weşanxaneya Mînare.
- Mihemmed Mihemmed Yonis Elî** (2010), *Derwazeyek Bo Zimanewanî*, (Wergêr: Nerîman Ebdullah Xoşnaw), Hewlêr:Weşanxaneya Rojhelat.
- Mîşêl Zekerîya** (1986), *el-Elsîne el-Tewlîdîye Wetehwîlîye We Qewaid el-Lûxe el-Erebîye*, Beyrut : Dezgehê Zanko Yê Lêkolîn û Weşan û Belavkirinê.
- Mohammed Me'rûf Fetah** (1997), *A Generative Grammar Of Kurdish*, University Of Amsterdam: Unpublished Doctora Disseation, Amsterdam.
- Mûhsin Elî Hûsên** (2013), *Hendê Layenî Rêzimanî Berhehênan û Gûwêzanewe Le Şi'rî Goran Da*,Zanîngeha Selahedîn: Kolîja Ziman,Têza Lîsansa Bilind,Hewlêr.
- Mukrîyanî, Kurdistan** (1986), *Sentaksî Risteyî Sade Le Zimanî Kurdî Da*, Bexdad:JiWeşanên Dezgehê Elhûrîye Yê Weşan û Bilavkirinê.
- Nawxoş,Selam** (2005), *Zimannasî*, Hewlêr: Weşanxaneya Çar Çira.
- Nawxoş,Selam** (2018), *Morfolojî û Sentaks û Morfosentaks*, Hewlêr: Weşanxaneya Rojhelat.
- Necar, Nadya Remezan** (2006), *Fisol Fî Ders el-Lûxewî Beyne ElqedîmWelmohdesîn*,Eskenderîye: Dezgehê Wefa Yê Weşan û Belavkirinê.
- Nehir, Hadî** (2011), *Dîrasat Fî el-Lîsanîyat*, Urdin:Dezgehê Cîhana Pirtûkên Nû Yê Wêşan û Belavkirinê.

- Nermîn Elî Îslam** (2017), *Taypolojya Ristê Di Zimanê Kurdî de "Govara Behdîni"*, Zanîngeha Zaxo: Kolîja Ziman, Têza Lîsansa Bilind, Zaxo.
- Norî Elî Emîn** (2013), *Rêzimanê Kurdî*, Hewlêr: Weşanxaneya Şehab.
- Pesar Mihemmed Hesên** (2013), *Rolê La Ristê Di Ristên Lêkdayî û Alozen Zimanê Kurdî Da*, Duhok: Kolîja Adab, Têza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Duhok.
- Pêşkewt Mecîd Mihemmed** (2013), *Regez Le Riwaneyî Zanistî Zimanî Komelayetîyewe*, Zanîngeha Suleymanî: Kolîja Ziman, Têza Lîsansa Bilind, Suleymanî.
- Qenatê Kurdo** (1981), *Zimanê Kurdî (Rêziman)*, Frankfurt: Weşana Komkar.
- Qeyis Kakil Tewfîq** (1995), *Curekanî Riste û Teyorî Kirde Qiseyekan*, Hewlêr: Kolîja Adab, Têza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Selahedîn.
- Radford, Andrew** (2009), *Linguistics An Introduction*, London: Cambridge University Press.
- Refîq Şiwani** (2011), *Wuşesazî Zimanî Kurdî*, Hewlêr: Weşanxaneya Rojhelat.
- Rozakis, Laurie** (2003), *English Grammar*, Usa: Alpa Publisher.
- Salim Hesên Ezîz** (2016), *Kirdarî Darêjraw Le Şêwezari Hewramî Da*, Têza Zanîngeha Suleymanî: Kolîja Ziman, Lîsansa Bilind, Suleymanî.
- Sanya Cebar** (2012), *Espêktên Karî Di Kurdîya Serî Da*, Duhok: Weşanxaneya Xanî.
- Segvan Cemîl Mihemmed** (2016), *Morfîma (A) û Taybetmendîyên Wê Di Kirmancîya Jorî Da*, Turkyaya: Weşanxaneya Matris.
- Segvan Îbrahîm Miho** (2012), *Cih Gihurîna Pêkhênên Ristê Di Axaftina Bajêrê Duhokê Da*, Zanîngeha Duhok: Kolîja Adab, Têza Lîsansa Bilind, Duhok.
- Selwa Ferîq Salih** (2009), *Karê Darêjraw Le Nêwan Kurdî (Dîyalêkta Jorî) û Farişî Da*, Duhok: Weşanxaneya Xanî.
- Silêman Hişyar Mihemmed** (2016), *Pêwendîya Beş û Gişt Di Zimanê Kurdî de (Govara Behdîni Weku Nimûne)*, Zanîngeha Duhok: Kolîja Perwerda Binyat, Têza Lîsansa Bilind, Duhok.
- Silêman Îsmail Receb** (2015), *Berawirdkirina Karê Kirde Ne Dîyar Di Navbera Zimanê Kurdî û Farişî Da*, Zanîngeha Duhok: Kolîja Ziman, Têza Lîsansa Bilind, Duhok.
- Sîrwan Simîn Ehmed** (2015), *Dirusteyî Sentaksî Le Şêwe Axawtinî Nawçeyî Kerkûk Da*, Zanîngeha Suleymanî: Kolîja Ziman, Têza Lîsansa Bilind, Suleymanî.

- Şe'ban Şe'ban Ehmed** (2000), "Kurte Basêk Le Bareyî Rêbazî "Guwastinewe - Weçekirdin" Ewe Le Boteyî Zanistî Ziman Da", *Kovara Raman*, hej:52, r. 137-144.
- Şêzad Sebrî Elî & Araz Mûnîb** (2016), *Wuşesazî*, Hewlêr: Weşanxaneyê Hîvî.
- Şêzad Sebrî Elî** (2011), *Wate Di navbera Semantîk û Piragmatîkê Da*, Duhok: Weşanxaneyê Xanî.
- Şêzad Sebrî Elî** (2015), *Watesazî*, Duhok : Weşanxaneyê Hewar.
- Şîlan Omer Hiseyîn** (2011), *Peywendî Sentaks û Semantîk Le Rêzimanî Kurdî Da*, Zanîngeha Suleymanî: Têza Dektora, Kolîja Ziman, Suleymanî.
- Şilêr Nayif Emîn** (2007), *Nasyarî û Ne Nasyarî Di Kirmancîya Jorî Da*, Zanîngeha Duhok: Kolîja Adab, Têza Lîsansa Bilind, Duhok.
- Şilêr Nayif Emîn** (2007), *Nasyarî û Ne Nasyarî Di Kirmancîya Jorî Da*, Zanîngeha Duhok: Kolîja Adab, Têza Lîsansa Bilind, Duhok.
- Şilêr Resûl Mihemmed** (2004), *Yasakanî Darîştinî Laristeyî Dîyarxerî Le Zimanî Kurdî Da*, Zanîngeha Selahedîn: Kolîja Adab, Têza Diktora, Hewlêr.
- Talib Hisên Elî** (2014^a), *Hendê Layen Le Peywendî Nêwan Riste û Wata Le Kurdî Da*, Hewlêr: Weşanxaneyê Hecî Haşim.
- Talib Hisên Elî** (2014^b), *Zanistî Ziman û Zimanî Kurdî*, Hewlêr: Weşanxaneyê Rojhelat.
- Talib, Xewle** (2006), *Mebadi Fî el-Lîsanîyat*, Cezaîr: Dezgehê Elqisbe Yê Weşan û Belavkirinê.
- Tallerman, Maggie** (1998), *Understanding Syntax*, London: Arnold Publisher.
- Tan, Samî** (2011), *Rêzimana Kurmancî*, Îstanbul: Weşanxaneyê Gün.
- Tara Mûhsîn Qadir** (2011), *Zimanî Kurdî û Mînî Mal Pirogram*, Zanîngeha Suleymanî: Kolîja Ziman, Têza Lîsansa Bilind, Suleymanî.
- Tariq Salih Mehmûd** (2014), *Binema Giştî û Taybetîyekanî Rêzimanî Kurdî Leber Rûşnayî Tîyorîyekeyî Chomsky Da*, Zanîngeha Selahedîn: Kolîja Perwerde, Têza Lîsansa Bilind, Hewlêr.
- Tirîfe Mûhsîn Elî** (2016), *Çemkî Rêzimanetî Le Tîyorî Berhemhênan Da*, Zanîngeha Selahedîn: Têza Lîsansa Bilind, Kolîja Perwerde, Hewlêr.
- Trask, Robert** (1993), *A Dictionary Of Grammatical Terms In Linguistics*, Great Birtai: Routledge Publisher.

- Umed Berzan Birzo** (2010), *Morfosentaks Dirustkirdinî Le Şêwezari Xaneqîn Da*, Zanîngeha Suleymanî: Kolîja Ziman, TêzaDektora, Suleymanî.
- Umêd Berzan Birzo** (2011), *Dirûsteyî Firêz û Riste Le Zimanî Kurdî Da*, Suleymanî: Weşanxaneya Suleymanî.
- Vîyan Îbrahîm Elî** (2015), *Dûx Di Zimanê Kurdî de (Govara Behdînî)*, Zanîngeha Duhok: Kolîja Adab, Têza dektora, Duhok.
- Vîyan Silêman Hacî** (2001), *Rêkeftin Le Şêweyî Jorî Zimanî Kurdî Da*, Zanîngeha Selahedîn: Kolîja Adab, Têza Lîsansa Bilind, Hewlêr.
- Vîyan Silêman Hacî** (2009), *Kerese Betalekan Le Riwaneyî Teyorî Desthelat û Bestinewe (Şêwezari Kirmancî Sero)*, Hewlêr: Ekademîya Kurdî.
- Wirya Omer Emîn** (1987), "Bîrkarî Le Ziman Da", *Kovara Rewşenbîrî Nûwê*, hej: 113, r. 226– 229.
- Wirya Omer Emîn** (2004), *Asoyekî Tirî Zimanewanî*, Hewlêr: Weşanxaneya Aras.
- Wirya Omer Emîn** (2011), *Pîtûtekanî Zimanewanî*, Hewlêr: Weşanxaneya Aras.
- Xalî Mihemmed Mehmûd** (1976), *Eîmet Elnihat Fî el-tarîx*, Qahîre: Weşanên Dar ElŞirûq.
- Xerîbe Egîd Xelîl** (2012), *Berawirdkirina Rista Aloz Di navbera Zimanê Kurdî (Devoka Badînî) û Zimanê Farişî Da*, Duhok: Weşanxaneya Xanî.
- Xilfan, Mistefa** (2010), *el-Lîsanîyat el-Tewlîdîye Min Nemoziç Ma Qeble el-Mi 'yar Îla Bernamec el-ednewî*, Urdin: Weşanxaneya el-helawe.
- Xirma, Nayif** (1978), *Ezwa 'ela Edîrasat el-Luxewîye el-Mu 'user*, Kuwêt: Civata Nişfîmanî Ya Rewşenbîrî û Honerên Edebî.
- Xolî, Mihemmed Elî** (1982), *Mu'cem 'İlim el-Luxe el-nezerî Îngilîzî - Erebî*, Beyrut: Weşanxaneya Lubnan.
- Xolî, Mihemmed Elî** (1999), *Qewaid Tehwîlîye lî-Luxe el-erebîye*, Urdin: Dezgehê Felah Yê Weşan û Belavkirinê.
- Xolî, Mihemmed Elî** (2001), *İlim el-Delale ('ilim el-Me 'na)* Urdin: Dezgehê Felah Yê Weşan û Belavkirinê.
- Xoşnaw, Nerîman Ebdullah** (2009^a), *Rêzimana Kurdî (Beşekanî Axawtin)*, Hewlêr: Weşanxaneya Mînare.
- Xoşnaw, Nerîman Ebdullah** (2009^b), *Rêzimanî Kurdî*, Hewlêr: Weşanxaneya Rojhelat.
- Xoşnaw, Nerîman Ebdullah** (2014), *Ristesazî*, Hewlêr: Weşanxaneya Rojhelat.

Xoşnaw, Nerîman Ebdullah (2016), *Kirde Nedîyar Lêkolîneweyekî Beranberî Ye Le Nêwan Zimanî Kurdî û Zimanî Erebi Da*, Hewlêr: Weşanxaneya Rojhelat.

Xoşnaw, Xisro Ehmed (2008), *Berkar Le Zimanî Kurdî Da Bepêyî Rêbazî Formî*, Hewlêr: Weşanxaneya Wezareta Rewşenbîrî.

Yaşilöz, Zafer (2011), *Türk Dili Ve Kompozisyon Bilgileri*, Ankara: Weşanxana Sözkese.

Yosif Norî Mihemmed Emîn (2015), *Risteyî Lêkdiraw Le Zimanî Kurdî Da Be Pêyî Rêzimanî Gûwêzanewe*, Hewlêr: Dezgehê Narîn Yê Weşan û Belavkirinê.

Zêmar Se'dullah Mihemmed (2017), *Şîyanên Zimanî Yên Gehandinê Zanîngeha Duhok: Kolîja Ziman, Têza Lîsansa Bilind*, Duhok.

<http://en.oxforddictionaries.com/grammar/sentences>. 11/10/2018

<http://www.google.com/amp/s/dictionary.cambridge.org/amp/english/sentence>.

18/2/2019